

SEMPOZYÛMA EDEBIYATA BERAWIRDÎ
JI DUH HETA ÎRO DI EDEBIYATÊN TIRKÎ
Û KURDÎ DE TEXEYULÊN NASNAMEYÎ

*SEMPOZYÛMA EDEBİYATA BERAWIRDÎ
JI DUH HETA ÎRO DI EDEBİYATÊN TIRKÎ
Û KURDÎ DE TEXEYULÊN NASNAMEYÎ*

*KARŞILAŞTIRMALI EDEBİYAT SEMPOZYUMU
TARİHSELDEN GÜNCELE TÜRKÇE VE KÜRTÇE
EDEBİYATLARDA KİMLİK TAHAYYÜLLERİ*

AMADEKAR

Nüket ESEN & Ramazan ÇEÇEN

Mardin Artuklu Üniversitesi

Yayımları

Çapa Yekem (Birinci Baskı) 2015, Mêrdîn

Berg û Rûpelsazî

Aysel Kazıcı Özalp (Şemal Medya)

ISBN: 978-605-4202-19-5

Baskı: 500 Adet



Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

47100 Mardin

Tel: (0 482) 313 13 05

www.artuklu.edu.tr

SEMPOZYÛMA EDEBIYATA BERAWIRDÎ
JI DUH HETA ÎRO DI EDEBIYATÊN TIRKÎ
Û KURDÎ DE TEXEYULÊN NASNAMEYÎ

AMADEKAR
Nüket ESEN & Ramazan ÇEÇEN



NAVEROK

Pêşgotin / Nüket Esen	VII
Li Dû Sempozyumekê / Ramazan Çeçen	IX

RÛNIŞTINA YEKEM:

BI PEYWENDA ROJANE TEXEYULÊN NASNAMEYÎ1

Moderator: Mehmet Tayfun (Malmîsanij)

Di Texeyula Civakê ya Halide Edipê de Nasnameya Etnîk û Kurd Zeynep Uysal	3
---	---

Di Edebiyata Kurdî ya Modern de Lêrasthatinên Kolonyal, Îmaja Netewî û Klîşeyeke Berevajîbûyî Remezan Alan	9
---	---

Di Çarbareya ‘Bir Ada Hikayesi’ ya Yaşar Kemal de Rexneya Dîrokê, Çîroka Kolektîf û Muxayîleya Civakî Erol Köroğlu	25
---	----

Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkên di Kovara Hawarê de Zülküf Ergün	40
--	----

Di Çîroksaziya Hevçerx a Tirkî de Nivîsîna Şidetê: <i>Tol û Cennetin</i> <i>Kayıp Toprakları</i> Olcay Akyıldız-Halim Kara	58
.....	

**RÛNIŞTINA DUYEM:
DÎROKÎBÛNA HEWZEYA ÇANDÎ.....73**

Moderator: Nüket Esen

Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkiliyên di Navbera Edebiyatên Kurdî
û Tirkî yên Klasîk de
Abdurrahman Adak75

Di Peywenda Edebiyata Klasîk de Mesnewiya *Mem û Zînê*
Zehra Toska111

Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatên Pêşiyên Folklorê Kurdî û Tirkî
Ramazan Pertev 146

Efsaneyê Şahmeranê û Jinûvenivîsînên Efsaneyê ku Wê bi Mêrdînê
ve Girê Didin
Nur Gürani Arslan163

Weke Qada Rengvedaneke Neteweperweriyê di Pratîkên Tirk
û Kurdan de Nîqaşên Li Ser Alfabeyê
Mikail Bûlbûl176

PÊŞGOTIN

Her sal beşa Ziman û Edebiyata Tirkî ya Zanîngeha Boğazîçiyê ku sohbet û çalakîyên edebiyatê saz dike, di gulana sala 2010an de jî bi mijara “edebiyata kurdî” bernameyeke konferansê çêkir. Bi vê minasebetê beş ji bo axaftineke wisan Ramazan Çeçen vexwend zanîngehê ku ew bi nivîsên xwe yên derbarê edebiyatên tirkî û kurdî de tê nasîn û bi îmzaya Remezan Alan dinivîse. Di wê axaftina ku sernavê wê “Gotûbêja Romana Kurdî” bû, rehmetyê Arjen Arî jî hazir bû û bi kurdî pêşkêşiya xwe kiribû.

Piştî li ser daweta Zanîngeha Mardîn Artukluyê, di Medreseya Zincîriyeyê de, ku avahiyeke şaheser e, bi navê “Destpêka Vegotinnasiyê” min konferansek da. Piştî van herdu bernameyan, min û Remezan Alan li hev kir ku em di beşên zanîngehên xwe de sempozyûmeke edebiyatê saz bikin, dê baş be. Bi hêsanîya riya e-postayê yek li Stenbolê, yê din li Mêrdînê ji bo sazkirina sempozyûmekê em xebitîn. Di dawîya vê pêvajoyê de wek beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Enstitûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê û beşa Ziman û Edebiyata Tirkî ya Zanîngeha Boğazîçiyê me sempozyûmeke hevpar amade kir.

Çend roj beriya sempozyûma ku dê li Mêrdînê çêbûya, wek heft mamosteyên Zanîngeha Boğazîçiyê em hatin Mêrdînê û li vî bajarê delal û nadîde geriyên. Enstitûya Kurdolojiyê em pir germ pêşwazî kirin û ji serî de Prof. Dr. Kadri Yıldırım û her kesî mêvanperweriyeke mezin nîşan da. Sempozyûma ku di 26ê Nîsana 2014an de pêk hat, bi beşdarî û tevkariya xwendekaran pir bi serkeftî derbas bû. Emên ku ji Stenbolê hatibûn, me civateke ewçend qerebalix hêvî nedikir. Di navbera teblîxan de jî xwendekar bi pirs û şîroveyan maqûl gelek qencî li çalakîyê kirin ku sempozyûma me di nav atmosfereke zindî de derbas bû.

Seba ku sempozyûma bi navê “Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî” yek rojî bû, her zanîngeh encax pênc teblîx pêşkêş kirin. Nivîsên ku di vê kitêbê de cih digrin, halê dawîn ê wan teblîxan in ku cardin di ber çavan re hatine derbaskirin û firehkirin. Kitêba sempozyûmê ya ku bi du zimanan, aliyekî wê kurdî û aliyê din jî tirkî hate amadekirin jî ji ber îhtiyaceke pratîk şikil girt.

Di sempozyûmeke wisan de li hatina cem hev a herdu edebiyatan girîng e. Ev-çend ji hev dûrbûna edebiyatên herdu zimanên ku li rexê hev dijîn, min aciz dike. Xasma jî kesên wek min ên ku bi edebiyata tirkî mijûl in, lê bi kurdî nizanin, derbarê edebiyata kurdî de xwediyê agahiyên hindik in. Ez wisa bawer im çalakiyên hev-par ên wek vê sempozyûmê dê kêmasiyên bi vî rengî hinekî din kêr bikin. Digel vê di wê baweriyê de me ku di edebiyatên kurdî û tirkî de “yê din” çawa tê temsîlkirin û dîtin mijareke gelek asoveker e. Ferqkirina gotarên vî miqamê dê bi xwe re xwerexnekirinekê jî bîne.

Ez bi riya vê sempozyûmê gelek tişt hîn bûm, hêvî dikim ku ev nivîs jî qencyekê tevî dinyaya me ya edebî û çandî bikin.

Prof. Dr. Nüket Esen

LI DÛ SEMPOZYÛMEKÊ

Zehmetiya sazkirina sempozyûmeke bi navê “Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî” ji şertên wê yên maddî zêdetir, ji naveroka wê dertê ku li wê derê wek potansiyel erdekî leximkirî û guftûgoyên tund hene. Ji ber ku giranî û berpirsiyariya helwesteke ku bi riya ziman dibe “yê din” tê û ji we re dibe bela. Wê demê avantajên pêzanîn û agahiyên wê yên ku bi riya metnên edebî an xebatên çandî şiklek girtine jî pere nakin. Hele ku ew metin, malê dewr û serdemê endîşeyên îdeolojîk û neteweperest bin, tew mirov nikare peyva ‘avantaj’ê jî zikir bike. Hema di wê kêliyê de ew hêviyên we yên mirovhez ên derbarê edebiyatê de fir didin diçin. Yanê dixwazim bibêjim ku sazkirina sempozyûmeke ku dil dike texeyulên nasnameyî hilgire merkeza xwe, pirr in. Qet nebe muhtemel e ku naxoşiya tiştêkî ji rastiya xwe ya siruştî dûr û di nav qefesa îmaj û texeyûlê de hepiskirî, we rapêçe. Wê demê jî berdêla analîzkirina helwesteke sivik a redûksiyonîst rû de. Çi ye ew berdêl? Bêguman hêrsek e ku miseletî zimanê we dibe. An hûn hîs dikin ku ji bo kontrolkirina hêrseke wisan, hûn daîm muhtacî xwînsariyekê ne. Tu ecêbiya vê yekê tune, heta ev rê dikare wek zeftkirina heqîqetê jî bê dîtin, bes bi şertê ku mirov adil be!

Dixwazim bibêjim ku sazkirina çalakiyê ku bi peywenda edebiyatên tirkî û kurdî re texeyulên nasnameyî mînaqêşe bike, ne warekî ewçend aram e. Lê derbasbûna tê re, bi xwebawerî û dilsoziyê, mimkun e. Tê bîra min ku dema me bi mamoste Nûket Esen re plana vê sempozyûmê çêdikir, axaftinên bi vî rengî di nav me de derbas dibû. Piştî roja sempozyûmê dema ev mijarên ha bi heman xwebawerî û dilsoziyê hatin guftûgokirin û sempozyûm di nav vê maqûliyê de derbas bû, kêfxweşiyê me tevan rapêça û miraz jî hasil bû. Bi min ev jî cardin destkeftiyê ve sempozyûmê bû ku divê li ciyekî bê qeydkirin.

Digel van, berawirdkirina giştî an edebiyata berawirdî ya ku berawirdkirin ber bi metnên edebî ve ajot, îro bi qasî tesîr û muessîrkinê, bûye hewildaneke ku mirov hevûdu fêm bike, derbarê hevûdu de bigihîje qenaetekê. Ji bo vê serdemê meyleke wisan a edebiyatên netewî û pratîkên çandî hene. Gerçî îro em edebiyatê, wek yek edebiyatê, wek yek “edebiyata dinyayê” (Weltliteratur) nabînin ku Goethe hem ew bilêv kiribû û hem jî jê hêvîdar bû. Em ji vê yekê dûr in. Goethe ev têgeh wek

destnîşankirina zemanekî ku hemû edebiyat bigihîjin hev, bi kar anîbû. Bi gotina Wellek, ev têgeh ji bo vê xewnê bû: Di konsereke gerdûnî de her kes para xwe lê bixe. Elbet dinya ji vê xweşbîniya romantîk gelek dûr e îro. Lê melûm e ku dema her edebiyat jî pratîkên xwe yên netewî îcra dike, çiqas ji helwestên redûksiyonîst, terefgîr dûr be û dewlemendî û dînamîzma ferqê derxe meydanê dê nêzîkî “ruhê dinyayê” be. Bêtir jî ew hêvî mirov kêfxweş dikin ku di dawiya çalakîyên bi vî rengî de derdikevin meydanê.

Lê ji bo ku hêviyên we bikevin qalibê rastiyê hin hazîrî, qet nebe hin manewra şert in ku ji hereketên we re zemînekî fireh dabîn bikin. Mesela di sempozyûmekê de ku xwe dispêre rêbaza berawirdkirinê, hebûna îfadeyeke “ji duh heta îro”, tenê fersend nade ku çalakî bibe du rûniştin, di heman demê de rê vedike ku hûn bi peywenda rojane û dîrokî wan texeyulên nasnameyî minaqeşe jî bikin. Bi gotineke din fersend dide ku mirov peywenda edebiyata modern û edebiyata klasîk, ya gelêrî û minaqeşeyên ziman û elîfbayê ango peywenda zemanê niha û zemanê borî û dîrokeke nêz jî bîne rojevê. Jixwe wisa jî bû. Teblîxên rûniştina yekem, awirên cihê yên nasnameyan, şîdeta ku ji lêrasthatineke mêtinkar diwelidî, mebestdariya ku sedemê wê texeyulên neteweperwer in anîn ziman û riya çareseriyê destnîşan kir. Ji van aliyan ve ev rûniştin têra xwe welût bû. Taybetî jî balkêş bû dema hat dîtî ku di dewra netewetî rabûye pêdarê de, nasnameya netewî ji aliyê nivîskarên her du neteweyan ve çawa ji bergehên cihê tê avakirin. Rûniştina duyem jî wekî navê xwe berê xwe da çanda hewzeyeke hevpar a dîrokî, bi peywendên wek edebiyata klasîk, gelêrî û guftûgoyên ziman û elîfbayê şênber bû. Ev rûniştin jî gelek welût bû. Balkêş bû dema hat dîtî ku ev warên ha beriya fikra netewî têkilî di mecrayeke siruştî de rapêçane (mesela edebiyata klasîk) û bi geşbûna fikra netewî re jî bi endîşeyên hevpar tije bûne. Hemin şahidiya van teferûatan, bi xwendina teblîxan mimkun e, nexwe hewce nîne mirov gotinê dirêj bike.

Lê ev teferûata ha jî layîqê destnîşankirinê ye: Bi qasî ku dixuye ev sempozyûm, platformeke yekem bû ku cara pêşîn li dor tema û kêşeyekê, edebiyatên tirkî û kurdî, di asta du zanîngehan de minaqeşe kir. Ev şanazî û bewtewarî jî bû nesîbê beşa Ziman û Edebiyata Tirkî ya Zanîngeha Boğazîçiyê û beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Kurdolojîya Zanîngeha Mardîn Artukluyê. Teblîx, bi tirkî û kurdî hatin pêşkêşkirin, ji bo fêmkirina van zimanan wergera sîmultane kete dewrê, beşdarî di asteke bilind û dînamîk de bû... Belkî yek kêmasî hebû, ger mirov wek kêmasiyek bibîne, ew jî laqeydiya çapemeniya herêmî û netewî bû.

Wekî dawî dixwazim derbarê aliyê kolektîf ê vê çalakîyê de çend tiştan bibêjim û spasiya wan kesan bikim ku kedeke helal danê. Spasiya yekem elbet ji bo hemû beşdaran e. Piştî di vê pêvajoyê de ji rêvebirê enstitûyê mamoste Kadri Yıldırım re ku îmkânên heyî ji bo me seferber kir; ji Resul Geyik û Erol Şaybak re ku di wergera sîmultane de bi têra xwe pratîk û mahîr bûn; ji mamosteyên wek Abdurrahman Adak, Ramazan Pertev, Zülküf Ergün û Mikail Bülbül re ku ne tenê teblîx pêşkêş

kirin, hem di werger û kontrolkirina teblîxên xwe û hem jî di yên mêvanan de ro-
leke aktîf lîstin; ji lêkolerên me yên wefadar ên wek Mesut Arslan, Umran Aran,
Kenan Subaşı, Güneş Kan, Ziyattin Yıldırımçakar, Yakup Aykaç, M. Şirin Filiz û
Erol Şaybak re ku mimkun kirin ev nivîs bi du zimanan bixuyin... Belê, ji tevan re
ji dil û can spas.

Bi hêviya ku ev teblîx ji bo xebat û guftûgoyên çêtir bibin destpêkek.

Ramazan Çeçen
04.02.2015/Mêrdîn

Rûniştina Yekem
**BI PEYWENDA ROJANE
TEXEYULÊN NASNAMEYÎ**



DI TEXEYULA CIVAKÊ YA HALÎDE EDÎPÊ DE NASNAMEYA ETNÎK Û KURD

Zeynep Uysal*

Halide Edip ji dawîya sedsala 19an heta nivê sedsala 20an di heştê sal emrê xwe de entelektueleke ku şahidiya rojên dawî yê Împaratoriya Osmanî, avabûna Komarê û netewedewletê kiriye û hin rêzeşerên wê demê dîtine. Di her serdemeke vê pêvajoyê de roleke aktîf ditiye û di alema edebiyat, fikr û polîtîkayê de yek ji navên avakar dikare bê hesabandin. Berhemên wê di nav kanona “Edebiyata Netewî” de cih girtine, bi Îttîhad û Teraqiyê re zêde li hev nekiriye, piştgirî daye Têkoşîna Netewî û her wiha wek jineke neteweperwer a tirk hatiye naskirin. Bi vê reng û helwesta xwe cudahiyeke di navbera wê û rewşenbireke tîpîk a Komarê de tunebû. Lê belê dema ku mirov bala xwe dide nivîsînên wê yê di rojname, kovar û romanên de, mirov dibîne ku di jiyana xwe de, her wext piçekî li derveyî xêza desthilatê ye, wextê ku li nêzî navendê jî tevgeriyaye, dîsa rengê xwe yê cîyawaz daye nîşandan. Dema ku li cem koma elît a avakar a Kemalîst bû, bi mebesta ku ew hêviyên demokrasî û azadiya şexsî pêk naynin, ji wan dûr dikeve. Li dijî gurûbên elitîst û jakobenên ku di nav kadroyên Kemalîst de her ku diçû xurt dibûn, wê di seranserê jiyana xwe de helwesteke lîberal, kemilîn-xwaz, xelkparêz û muhafezekar parast.¹

Halide Edip bi taybetî di romanên xwe yê ku piştî sala 1908an de nivîsîne, li dûv projeyêke civakî dikeve. Di vê projeya ku projeksiyonên xwe yê siyasî, civakî û çandî tê de dida nîşandan û heya romana xwe ya dawî pirsgirêkên ku ji xwe re wek derdekê dibîne, belkî heya roja îro jî ew bûye meseleya herî hasas a alema entelektuel a Tirkiyeyê. Babetên wek netewperwerî/tirkiyeyî/cihanîti, rojavayîbûn, gundî/bajêrî, nasnameya etnîk, azadiya şexsî, demokrasî/totalîterî, rola jinê û dîn bi rêya dîtinên xwe nîqaş kirine û dirûvekê daye projeya xwe ya civakê. Di vê nivîsê de di texeyula civakê ya Halide Edipê de çawaniya cihê kêşeya nasnameya etnîk û bi taybetî di vê texeyulê de çawaniya sazkirina nasnemaya kurdî tê nîşandan ku dê

* Asîstan Profesor, Zanîngeha Boğaziçi, Beşa Ziman û Edebiyata Tirkî.

1 Beşeke vê nivîsê ji gotareke min a berê ya ku min li ser texeyula civakê ya Halide Edip, bi navê “Li Dûv Projeyêke Civakê: Halide Edip Adıvar” de nivîsîbû, hatiye girtin. Bnr. *Doğu Batı*, s. 35 (Şubat Mart Nisan 2006): 87-108.

ev rengvedanên wê helwesta wê ya entelektuelî bin ku mesafe naxe navbera xwe û navendê û dem bi dem bi gotara serdest re di bingeha xwe de dijber nebe jî pê re dikeve pevçûnê.

Her çiqas bê îdiakirin ku sêwirandinên edebî neynikek e jî ji bo fikr û helwestên entelektuelî yên nivîskarên xwe, her wekî nivîskarên serdema berî komarê û serdema komarê ji bo Halide Edipê jî ku em bibêjin fikr û derd û xemên nivîskarên romanên bi rêya karakterên xwe yên çêkirî tî deşîfrekirin û guftûgokirin, ev dê ne xelet be. Roman carinan ji bo nivîskarên ku bi karakterek yan çend karakteran re dibin yek, wek rengvedana metnên derveyî edebiyatê ye di cîhaneke sêwirandî de. Lê belê ji vê jî wêdetir, dema ku em jînenîgariya nivîskar an jî metnên wê yên ku ne ji sêwirandinekê pêk hatibin, li derveyî vê bigirin, di alema sêwirandî de ya ku nivîskar ji xwe re afirandiye, hûrgiliyên tesewireke civakê an jî projeyeke eşkere ya civakê tê dîtin. Bi vê munasebetê helwesta nivîskar ya îdealîst, sazker û avakar, di wan romanên wê de yên ku piştî sala 1926an nivîsandiye wek *Kalp Ağrısı* (Êşa Dil), *Zeyno'nun Oğlu* (Kurê Zeynoyê), *Sinekli Bakkal* (Dikana Bimêş), *Tatarcık* (Pêşûle) û *Sonsuz Panayır* (Mîhrîcana Bêdawî) nêrînên wê yên civakî û siyasî yên ku her diçe zelal dibin, edî bi hêsanî tê fêmkirin.

Ji bo ku em tesewira nasnameya etnîk a Halide Edipê rave bikin, divê em pêşî qala têgihîştina wê ya neteweyî bikin. Ji romanên xwe yên ewil û pê ve em dibînin bi karakterên ku afirandiye xwestiye pêvajoya çêbûna hişmendiya neteweyî zindî bike. Lê belê têgehên wek netewetî û netewe di *Ateşten Gömlek* (Qutikê Agirîn) de dema ku qala yekbûna neteweyeke mezlûm dike, bi awayekî eşkere tê dîtin.² Di romanê de “netewe kî ye, çi ye” ji bo karakterê wê yê bi navê Çerkes Mehmet Çavuş ê ku li hemberî dijmin şer dike, ne diyar be jî “miletêkî tirk û misilman heye ku di bin zilm û qetlîama alema xristiyanî de ye” (r.92). Mehmet Çavuş “welatekî bê cendirme û yûnaniyan” xeyal dike. Tiştê ku tê fêmkirin ew e ku Halide Edip di romana xwe ya ku tê de qala “Têkoşîna Neteweyî” dike, nêrîna neteweyî li ser di-jayetiya Rojavaya xirîstîyan a zordar û tirkên misilman ên mezlûm ava dike. Çimkî dema ku qala Osmanîyan tê kirin, êdî navê ermenî û rûman nayê bilêvkirin, ew êdî zêdetir bi “îxanetên” xwe ve tî bîranîn. Ji ber vê yekê mirov nikare bibêje ku ji nasnameya “hemwelatiya Osmanî” veguherînek çêbûye ji bo nasnameya “tirk”. Em dibînin ku ji nav nasnameya Osmanî tenê kesên nemisilman hatine derxistin û hew.

Netewperweriya berevan a nivîskar ku di dema şer de bi awayekî tûj derketiye holê, di salên paşê de dê veguhere ser lêgerîna modelên civak û neteweyên îdeal. Di nav vê modelê de nêrîna netewperweriyê ya Halide Edipê her çiqas kêr û zêde bi diruşma serdema Komarê ya “Çend bextewar e yê ku ji xwe re bibêje ez tirk im” re li hev bike jî dîsa zêdetir li ser xeteke lîberal û nêrîneke “neteweperweriya piretnîkî” ye. Di romanên xwe yên ku piştî sala 1923an de nivîsiye wek *Kalp*

2 Halide Edip Adıvar, *Ateşten Gömlek* (İstanbul: Özgür Yayınları, 2004). Veguhastinên heyî ji vê çapê hatine girtin.

Ağrısı, Zeyno'nun Oğlu, Tatarcıkê hin îşaretên vê nêrîna xwe dane me. Bi taybetî jî li ser meseleyên nasnameya etnik kûr dibe. Haso di nav karakterên sereke yê *Zeyno'nun Oğlu* û *Tatarcıkê* wek karakterekî damezirîner ê modela civaka îdeal û netewperweriya Halide Edipê derdikeve pêş. Haso kurê bavekî tirk û dêyeke kurd e ku li gundekî kurdan mezin bûye. Dîsa wek karakterên îdeal ên nivîskar Laleya keça bavekî tatar û Recepê kurê Peregrînyekî Îspanyol di *Tatarcıkê* de derdikevin pêşiya me. Di romanên Halide Edipê yê vê serdemê de qala wan karakteran tê kirin ku bi nasnameya xwe ya etnik û kok û binyada xwe wek “tirk” xwe nîşan didin û qala xebatên wan ên ji bo Tirkîyê tên kirin. Li gor wê şexs berhemên senteza çanda dînî, nîjadî û kultûrî ne. Dîsa di *Zeyno'nun Oğluyê* de qala karakterê bi navê Saffet tê kirin ku ew hem texeyula “cemiyeteke mirovan” dike ku tê de ne netewe hene ne jî tebeqeyên çînî û di ser de jî Saffet wek “neteweperwerekî tirk” tê derpêşkirin.³ Halide Edip di vê çarçoveya heyî ya netewperweriyê de, di romana xwe ya bi navê *Kerim Usta'nın Oğlu* de, ku di sala 1958an de nivîsiye, rexneyekê li wan nîqaşên nîjadperestiyê dike ku di Şerê Cîhanê ya Duyem de zêde bûbûn. Di romanê de lehengê sereke Kasım bi ciwanên tibbiyê re danûstandinekê nake bi mebesta ku ew heyranê nîjadperestiya îtalyan û almanan in. Çimkî wî ji bîr nekiriye ku ew “kurê Çerkes Kerim Hosta ye”. Lê belê di nav wan “nîjadperestên har” de yê ku kalên wan ermenî û rûm in jî hene. Bi vê mebestê di serî de di modela pircivakî ya Halide Edipê de ku wek tirkîyecîtiyeke xas a Anadolê derdikeve pêşberê me, hê jî em dibîn ku mesafeyekê dixe navbera xwe û nemisilmanan.

Ji aliyekî din ve jî fikra nivîskar a ku dixwaze nasnameya etnik di nav modela pircivakî de bê parastin, her çi qas helwesta wê ya li dijî nemisilmanan bê zanîn jî, ew fikir perçeyek ji nêrîna wê ya demokrasî û azadiya şexsî ye. Bi tundî li dijî rejîmên totalîter e ku ew tenê civakê pîroz dibînin û qîmeta azadiya şexsî nagirin û yekreng in. “Di vê cîhanê de şaristaniyeke mezin a ku payîdar be “wek mînak” bi komkirina mirovan li derdorê armançekê nîne. “Mînakek” heke însaniyeteke derkeve holê jî ew rewşeke domdar nîne. Qanûna heyatî û ezeli ya tebiyetê guherîn û kemilîn e.”⁴ Ev rêzîkên han mînaka têgihîştina demokrasiya kemilîner û liberal a Halide Edipê nîşan dide ku nirxa sereke ya azadiya şexsî ye.

Romanên wê yê di vê çarçovê de, bi taybetî jî di romanên piştî salên 1923an de nêrîneke modela pircivakî heye ku bi temamî ji bertekên netewperweriyê azad nebûbe û her wiha xwediyê helwesteke azadiya şexsî û demokrasîyê be. Di *Kalp Ağrısı* û *Zeyno'nun Oğlu* de qala salên ewilî yê piştî komarê kiriye û li ser şiklê civakî yê netewedewleta di serdema restorasyonê de rawestayê ku li gor Halide Edipê ev îşaretên yekem in. Lê belê *Kalp Ağrısı* di eslê xwe de li dor çîrokeke evînê

3 Halide Edip Adıvar, *Zeyno'nun Oğlu* (İstanbul: Özgür Yayınları, 2006). Veguhastinên heyî ji vê çapê hatine girtin.

4 Halide Edip Adıvar, *Türkiye'de Şark, Garp ve Amerikan Tesirleri* (İstanbul: Doğan Kardeş Yayınları, 1956), 41.

geriyaye û meseleya rojavayîbûnê zêdetir derxistiye pêş, lê *Zeyno 'nun Oğlu* ji nav romanên nivîskar romaneke wisan e ku zêdetir li ser nasnameya kurd rawestayê û xwestiyê vê yekê derxe pêş.

Zeyno -lehengê sereke ya *Zeyno 'nun Oğlu*- di rêwîtiyekê de bi Bînbaşî Hasan û jin û keça Yarbey Mazlum Beg re diçe Diyarbekirê cem mêrê xwe yê Albay Muh-sin Beg. Di qismê mayî yê romanê de mekan êdî Diyarbekir û gundên kurdan ên li derdora Diyarbekirê ne. Ji aliyekî ve em şahidiya jiyana civakî ya leşker û malbatên wan dikin ku “temsîlkarên medenî” yên komara nû tînen qebûlkin; ji aliyekî din ve em şahidiya çîroka dayik û lawikekî kurd dikin ku jiyana wan bi wan leşkeran re di heman mekanê de dibore. Hasoyê zarok, duyemîn lehengê sereke yê romanê ye ku ji tîkiliya Bînbaşî Hasan Beg û keçeke kurd çê bûye ku ev keç berê li qerargahê dixebitî. Kürt Zeyno bi navê xwe yê din ê di nav leşkeran de “Kürt Şeftalîsi” piştî terkkirina bajêr a Bînbaşî Hasan Beg ku nîşangiyê Zeyno dixwest wî bikuje, Kürt Zeyno bi çawîşê kurd Hesen/Ramazan re dizewice. Em çîroka wan jî dixwînin. Helbet Halide Edip rêzêbûyereke rewan, bi devê vebêjêrekî ku her tiştî dibîne û dizane daye vegotin û zêdetir deng, hîsiyat û fikrên xwe di romanê de daye der.

Du lehengên sereke yê romanê Zeyno û Hasoyê zarok mîna Halide Edipê wek kesayetên nivî kurd û nivî tirk hatine danasîn. Her wiha Zeynoya Stenbolî ya lehen-ga sereke ya *Kalp Ağrısıyê* xwe di vê romanê de wiha pênase dîke: “Ez ciwaneke tirk a ku kurd im.” (r.15) Bavê wê “ji ber xûy û îxtîrasa xwe ya nîjadî” jê re gotiyê Zeyno. (r.5)

Ev dûpatkirina ku di *Kalp Ağrısıyê* de dest pê dîke di *Zeyno 'nun Oğlu* de zêdetir derdikeve pêş. Nasnameya nîjadî bi taybetî tê dûpatkirin, lê bi tirkçîtiyê re. Dûpatkirina duyem li ser taybetiyên nîjadî ne. Halide Edip azwerî û çavsoyîya kurdan di temamê romanê de vedibêje. Mesela mêrê Kürt Zeyno yê zalim Ramazan “çavên wê yê reş ên ku sor dibin û pozê wî yê wek pozên qertelan, şerûd û tecawizkar”(r.66) û “di nav çavreşîya wê de mîzaca wî ya hov çiqasî der bûbe, xiya-la tîjî nakokîya nijada wî, şefqata wî, halê wî yê ku wek birûskê guherbar e jî wisa derbas dibe û diçe.” (r. 67) Bi tenê serê xwe, xûy û taybetiyên nîjadî yê wek hovîfî, çavsoyî û azwerî têrê nake, dema ku ev tişt bi tirkçîtiyê re li nav hev ketin wê çaxê dê kesayetiyên civaka îdeal derkevin holê.” Halide Edip ji aliyekê ve tirkbûnê mezin dîke ji aliyê din ve jî helwesteke dudil dide nîşandan ku dixwaze nasnameya nîjadî bê parastin û neyê jibîrkin û her wiha bibe perçeyek ji senteza îdeal. Ev helwesta dudil di romanê de bi hiyerarşîya di navbera tirkbûn û kurdbûnê dirûv digire:

Li hember “xesleta hezkirin û parastina hejaran a her tirkekî baş” wek milletekî “ruhekî zarokî û basît ê kurdan” heye ku “li vî diyarê derebegan xwe davêjin bextê begên xwe”. Şayesandinên bi vî rengî ji romanê kêman nabin. Bînbaşî Hasan Beg derbarê Hasoyê zarok de piştî ku dibihîze ku ew kurê wî ye, wiha difikere: Zarok ji cinsê yekî çavsoyî zêdetir dişibiya berxikê cinsekî xwediferaset. Gelo bavê wî tirk bû? (r.220)

Nivîskar li beramberî sifetên çavsorî û azwerîbûnê bi sifeta sukûnetê tirkbûnê payebilind dike. Lê ya herî baş ew e ku di nav nîrxên ku li ser navê tirkbûnê derdixe pêş, zêdetir têkilhevîbûna her du nîjadên e: Apê Şaban ê ku Hasoyê zarok xwedî dike jî, nivî tirk û nivî kurd e: “Her çiqas ji aliyê dayîkeke kurd ve xwîneke çavSORIYÊ girtibe jî sukûnet û şêrînbûna tirkên rojhilatê di xwe de muhafeze kiriye.” (r.74)

Mînakî îdeal a têkilhevîbûnekê jî Haso ye: “Hasoyê zarok nimûneyekî serkeftî ye ku ji sifetên herî xweşik ên jina herî rindîk a kurd û mêrekî qeşeng ê tirk hatiye pê.” Ku ew jî xwe zêdetir nêzî tirkan û tirkî hîs dike: “Di eslê xwe de zimanê kurdî bi ahenga xwe ya biçîngîn û êrîşkar, ji bo Hasoyê zarok, zêdetir wek îfadeyeke macerayên trajîk a di navbera wî û Ramazan de ye. Dayîka wî pê re bi hesteke xerîb û xisûsî her gav bi tirkî axivî.” (r.139) “Hasoyê zarok ji ber aheng û hewayaya strana (Hey Zeyno, Zeyno) ji kurdîyê hez kiriye ku navê xweşik ê diya wî tê de derbas dibe. Tenê wê çaxê her çiqas ji xwîna wan be û di nav wan de be jî yekîtiyekê di navbera xwe û kurdan de hîs dike.” (r.153)

Di romanê de helwesta ku ji bo kurdî û nasnameya etnîk tê nîşandan, li ser hîsiyat û fikrên Hasoyê zarok tê avakirin. Metirsîdariya “Ahenga biçîngîn û êrîşkar” a zimanê kurdî ji ber wê yeke bû ku zilma Ramazanê ku wek bavê xwe dizanibû, dixiste bîra wî. Lê belê dema ku strana bi navê dayîka xwe guhdarî dikir, xwe wek kurd hîs dikir. Nasnameya Hasoyê zarok a ku tam ne zelal bû ku bi çi ve girêdayî ye, dê bi devê vebêjerê pîrzana yê Halide Edip bihata zelalkirin.

Du mirovên ku Haso jê hez dike, “Şebanê Tirk û dayîka wî Zeynoya Kurd” e. Ji ber vê yekê heya niha nefikiriye ku mirovan li ser navê tirk û kurd ji hev veqetîne. “Tenê xûy û xeslet ve çavSORI, qajewaj û halê kurdan ê zû guherbar xerîb dibîne; helwestên sekan û rêkûpêk ên apê xwe yê Şeban û çend tirkên li gundê K...yê ji xwe re mînak werdigirt. Tenê ji ber ku bi dayîka xwe ve girêdayî bû, ev rewşa neteweyî wî bi awayekî xerîb nêzî kurdan dikir, hundirê wê dikot û ji xwe dibir.” (r.144)

Di temamê romanê de dûpatkirina kurdên çavSOR û azwer ên ku ji tirkan hindiktir difikirin di kesayetiya Hasoyê zarok de dibe beşek ji nasnameyeke dureh. Lê ji hêla din ve hebûna Hasoyê zarok ji bo hevbeşandina her du alîyan tê dîtin, lewra ev roman tam jî piştî ku meseleya Şêx Seîd derdikeve tê nivîsîn. Halide Edip dema ku bi jiyana wan a taybet qala leşkerên ku serhildanên kurdan diçewisînin dike û wan di sêwirandina romana xwe de derdixîne pêş, leşkerbûna van leşkeran bi tenê dema ku li hember serhildanan dikevin pozîsyona parastinê, dibin mijara romanê. Lê di vê derê de jî dijayeti û têkoşîna ku di jiyana taybet a van kesan de hene, derdikevin pêş. Di vê kontekstê de vebêjer misêwa wek karakterekî kurd ê ku li ser ruh û fikrên Hasoyê zarok xwedî tesîr e û wek figureke dînî yê bihêz û ji “ruhên serdest” behsa Şêx dike. Belkî jî ev kesayetiya hêzdar û tesîrdar a ku îlhama xwe ji Şêx Seîd girtiye di nav figurên dînî yên Halide Edipê de cihekî xwe yê cuda heye. Her wiha Şêxê ku wek netewperwerekî kurd tê behskirin di romanê de amadekarê serhildana kurd tê hesibandin. Lê em ne dibin şahidê hûrgiliyên serhildanê û ne jî ji bilî mîsyona dînî

ya Şêx dibin şahidê hûrgiliyên rola wî ya di şer de. Heta em lehengê bi navê Şêx, bi têkiliya wî ya Hasoyê zarok re nas dikin.

Bi gotina vebêjer “di ber hestên dînî de Şêx xwestiye ku hestên netewî jî empozeyê Hasoyê zarok bike û kiriye ku bizane kurd evdên Xwedê ne û tirk jî mexlûqatên weha ne ku dê ji hêla Xwedê ve bête cezakirin.” (r.190) Gotiye ku Stenbolî zalim û gunehkar in û dişibin “Qewmê Lût”. Ji ber ku van ji ser rûyê erdê paqij bike, ew bi xwe ji hêla Xwedê ve hatiye peywirdarkirin. Her çiqas aresteya neteweperwer a ku Şêx daye Hasoyê zarok, serê wî tevilhev bike jî tirkên di jiyana wî de yê wek apê wî Şeban, Zeynoya Stenbolî û bavê wî Bînbaşî Hasan naşibin wan tirkên ku Şêx terîfa wan kiriye. Bi vê mebestê têkiliya Hasoyê zarok bi kesayetiya tesîrdar a Şêx re her çiqas bi awayekî girtî serhildan û pozîsyona kurdan meşrû bike jî tirkên di jiyana Haso de jî pozîsyona tirkên li hemberî serhildanê meşrû dike.

Di encamê de di dawiya romanê de Hasoyê zarok wek mînakê îdeal a neteweperweriya tirk tê nîşandan ku ji durehiya kurd û tirkek pêk hatiye: “Neteweperwerekî baş ê tirk ew e ku wek maskeyên erzane nekeve dilqên neteweyên din. Li gor min ew, tirkekî weha ye ku hem sîmaya xwe muhafaza dike hem jî di rewşa nû ya cîhanê de bi eql, qelb, sekaniya xwe û qudreta xwe ve dibe mînakê.” (r.271) Çimkî piştî Hasoyê zarok dê di romana *Tatarçikê* de bibe yek ji lehengên sereke û piştî ku Lîseyaya Galatasarayê diqedîne dê bibe bijîşk û bi vî halê xwe dê bibe sembola ciwanên nû.

Wek encam em dikarin bibêjin ku *Zeyno'nun Oğlu* di nav romanên Halide Edipê de di çarçoveya rojavayîbûn û projeya civaka modern de dibe romanek e ku tê de ceribandineke texeyula rola nasnameya etnîk tê kirin. Romannûs ji aliyekî ve mîsala Şêx Seîd û kurdan zêde derxistiye ber çavan, ji aliyekî din ve jî tirkbûnê wek nasnameyeke li ser her tiştî sêwirandiye. Kurdbûn bi durehbûnê bûye perçeyek ji nasnameya îdeal. Her çiqas dudil be û hiyerarşiyekê damezirandibe jî nivîskar modeleke neteweya pir etnîkî dûpat dike. Bêguman heke ev tişt îro bê xwendin ev “modeleke pir etnîkî” ji bo nêrîna Halide Edipê dibe ku wek şîroveyeke bêhed bê zanîn; mînakên ku li jorê hatin vegotin dibe ku wek rêçên neteweperweriyeke weha bê xwendin ku rê nedin pir etnîkîtiyê. Lê belê dema ku mirov temamê kuliyata nivîskar û nêrîna nasnameya etnîkî ya wê serdemê bikole, dê bê zanîn ku helwesteke cuda ya Halide Edipê heye ji hevdemên xwe û her wiha dê bê zanîn ku pozîsyona neteweperweriyeke dudil bi gotineke pir etnîkî re mezc kiriye û wisa pejirandiye.

Werger: Kenan Subaşı*

* Li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de lêkolker.

**DI EDEBIYATA KURDÎ YA MODERN DE
LÊRASTHATINÊN KOLONIAL, ÎMAJA NETEWÎ
Û KLÎŞEYEKE BEREVAJÎBÛYÎ**

Remezan Alan*

Qenaeta giştî ew e ku di navenda texeyulên nasnameyî de “yên din” hene. Lingên hebûna vê rastiyê jî li ser dijayetiyê “em” û “ew”an ava dibe. Ev dijayetî qîmet û quweta xwe ji tesewira “yê(n) din” digre. Dijayetî, di xwe de ittifaqan jî diyar dike, ango diyar dike ka em ê bi kê re bin û li hemberî kê bisekinin. Pêzanîna ku em li dijî çi/kê ne, destnîşan dike ka em xwe çawa dibînin. Ji ber vê yekê ye herhal di nîqaşên derbarê nasnameyê de ev gotina pêşyan a ereban gelek caran li ber guhê me dikeve: “Li hemberî birayê xwe ez; li hemberî xwarziyê me ez û birayê xwe; û li hemberî biyaniyan ez û birayê xwe û xwarziyê me.”

Ev prensîba “ez li hember yên din” (*ego versus autre*) lazim e bi xwe re “lêrasthatinek”ê jî bîne. Ji ber ku dijayetî hewceyî naskirinê an rastîhevhatinê ye jî. Di vê xalê de nasname û îmajê netewî ji hev vediqetin. Nasname bêtir ew e ku mirov xwe çawa tesewir dike, xwe nêzikî kê/çi dibîne; lê îmaj dîtina yekî ya ji aliyê biyaniyan ve ye. Bi gotineke din, nasname terîfkirineke ji hundir ve ye, îmaj dîtineke ji derve ye.¹

Ji ber vê yekê ez ji serî ve bibêjim, ew destnîşankirina ferqan a ku ji lêrasthatinan diwêlîde, ne texeyuleke nasnameyî ye, ew îmajê netewî ye. Qesta min ji têgeha “îmajê netewî” dê ev “dîtina ji derve” be. Bêguman ez çima jê re dibêjim “lêrasthatina kolonyal” û “klîşeya berevajîbûyî” jî muhtacî îzehê ye. Ji bo vê yekê em ê xwe bigihînin hin metnên edebiyata kurdî ya modern û tê de li serencama îmajê tirkî binêrin. Lê ji ber ku ew yek jî muhtacî “edebiyateke din” e, em ê car bi car jî xwe dirêjî edebiyata tirkî bikin û lê binêrin ka îmajê kurdan di wan de çawa hatiye nîşandan. Carna dê panaromayên biçûk bi kêrî me bînin, lê ji bo klîşeyê berevajîbûyî em ê serî li romanên *Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê* (ji vir pê de *Ronî û Tarî*) ya Mehmed

* Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

1 Bozkurt Güvenç, *Türk Kimliği, Kültür Tarihinin Kaynakları*, ç. 2, Boyut Kitapları, 2007, r. 8.

Uzun û *Ez ê Yekî Bikujim* a Firat Cewerî bidin. Jixwe armanca ve nivîsê jî ew e ku destnîşan bike ka çawa hin metnên edebiyata kurdî mazûbaniya klîşeyeke kolonyal a berevajîbûyî dikin, bi hemdê xwe an bê hemdê xwe dibin parçeyê oryantalîzmeke navxweyî.

Di Nav Edebiyata Berawirdî de Warê Temsîla Hin Têgehên

Bê guman dema mirov navê hin metnên edebî hilde û piştî bibêje ez ê bi riya wan hin mijarên civakî û siyasî nîqaş bikim, veceniqînek çêdibe. Rast e ku di bingeha dijayetiyên de aliyekî sivik, req û kêmkar heye. Bêşik aliyekî hişk ê van îmajên netewî jî heye. Lê belê wisan dixuye, ew ferqên ku em wan dikin armanca tîran, stratejiyeyê rabêjî (söylem) ya vê pêvajoyê ye.² Jixwe gava mirov ferq dike ku di bin van texeyulên siyasî de hin sebebên din hene, ew veceniqîn du car zêdetir dibe. Lê hinek jî ev nêrehetî ye ku mirov sewqî hesab û muhesebeyekê dike. Digel vê, em bêtir jî edebiyat û hunerê layiqê deftera qelsî û sivikkirinan nabînin. Ji me ve ye cihê van meşxuliyetên payebilind, di wê deftera xirab a qelsiyên de nîne. Em jidil bawer dikin an em pê hatine razîkirin ku rûyekî gerdûnî, humanîst, esmanî yê edebiyat û hunerê heye. Lewma dema em rastî tiştêkî derî vê payebilindiyê tînin, ew veceniqîna me bêtir tesîr li mirov dike. Lê belê, ev pêncî salek e êdî em dizanin ku edebiyat jî, ew “rabêj”ên ku poetîkaya wê ava dikin jî ne bêguneh in. Qet nebe kar û qezenca xwendina kesên wek Althusser, Foucault, Said, Spivak tiştêkî wisan derxistîye meydanê. Elbet ez wan hemû fikr û boçûnên ku edebiyatê dike zemînekî siyasî napejirînim û mafdar jî nabînim, ew mijareke din e. Lê dema ez bixwazim metneke edebî fêhm bikim an kod û rabêjên wan ên tije îdeojî û bawerî ji nêz ve bibînim û bi riya rêbazekê analîz bikim, mesela rêbaza postkolonyal a ku xwendin û helwesteke polîtîk e, ez ê nebêjim “ka deqeyekê, em çima ji safbûna edebiyatê dûr dikevin!” Ji ber ku pêşî, qeyrana edebiyata berawirdî û rexneyê³ ji ya mirovahiyê cihê nîne. Ya duyem, çalakiya edebî ji ya insanê ku afirîdeyekî polîtîk e (*homo politicus*) cihê nîne. Lewre ez ê vê pîrsa René Wellek ku di çarçoveya qeyrana rexneya edebî de anîbû rojevê pêşî wiha bi bîr binim: “Belkî pir xweş û balkêş e ku mirov guh bide ka frensîz derbarê elmanan an îngilîzan de çî difikirin, lê belê lêkolîneke wisan hê jî dikare di nav sînoren edebnasîyê de bê dîtin?”⁴ û piştî jî ez ê vê pîrsê wiha lokalîze bikim: “Ji bo ku em derbarê tirkên de qenaetên kurdan an derbarê kurdan de qenaetên tirkên hîn bibin, em dikarin serî li metnên edebî bidin û ev yek jî dikare bibe parçeyekî

2 Abbas Valî, redkirina “yê din” (*öteki*) ji bo îqrara “xwebûn”ê (*benlik*), ligel ferqên ku li ber armanca tîran tînin danîn, wek stratejiyeyê hevalbendên nasnameya netewî dibîne. Bnr. “Kürtlerin Soykütükleri: Kürt Tarih Yazımında Ulus ve Ulusal Kimliğin İnşası” dnd. *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, (amd.) Abbas Valî, wer. Fahriye Adsay-Ümit Aydoğmuş-Sema Kılıç, Avesta, rp. 94-133.

3 René Wellek, “Karşılaştırmalı Edebiyatın Krizi” wer. Adem Çalıskan, *Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi*, Havîn 2010, r. 109-114.

4 Wellek, heman nivîs, r. 110.

çalakiyeke edebî?” Erê dibe, çima nebe! An ev helwest çima di nav edebnasiyê de dê bibe sebebê bêxêriyekê! Jixwe wek ku Paul De Man jî diyar kiriye, wextekê rexneya edebî ji felsefeyê feyza xwe digirt û hemû kevir li cihê xwe bûn, lê her ku niha zanistên civakî ketine şûna felsefeyê, krîzek derketiyê⁵ û analîza metnên edebî rengguhertiye û her wiha rexneya edebî jî bûye warekî înterdisîplîner.

Li ser vê bingehê, bi min em dikarin têgehên wek “îmaja netewî”, “lêrasthatinên kolonyal” û “klîşeyeke berevajîbûyî” daxilî xebatên edebiyata berawirdî bikin. Qey nebe ez ê hewl bidim ku tiştêkî wisan bikim.

“Yên Din” ên Edebiyata Kurdî

Ger em qala îmaja netewî bikin, ev pirsê ha dê minasib be: Di edebiyata kurdî de “yên din” kî ne? Heke bersiveke kurtebir bidim, li vî parçeyê Kurdistanê pêşî ermenî ne, piştê jî tirk in.

Ermenî di destpêka helbesta “Xakî Cizîr û Botan” a Hacî Qadirê Koyî de dikevin nav vê behsê. Koyî qala xetereyên Peymana Berlînê (1878) dike ku ev peyman bi xala Wilayetên Sittê li ser axa kurdan hin destkeftan dê bide ermeniyên. Li gor Koyî ev yek dê demografi û jiyana civakî ya kurdan serobino bike; dê mescîd û dêr, qazî û metran cih biguherin; eşîrên beriyê havînan ji german bimrin jî dê nikaribin herin zozanan; dê gel ji destê zulma wan helak bibin; dê ew rewş bibe sebebê tofaneke duyemîn ku tê de top û tifeng û insan li bin guhê hev bikevin... Lê di dawiya helbestê de Koyî dîsa jî heqşinas e. Li gor wî di xîretkêşî, îttifaq, zept û reptkirina millet, pêkanîna fen û ilmê Ewrûpayî de ermenî ji kurdan xwedîferasettir in⁶

Esasen di vê helbestê de bêtir kurd tîr rexnekirin: Bêtifaqî, xizmetkariya zimanên din, kedxwiriya şêx û melayan, bêmixiya gewremalan, fêrnexirina ruhê serdemê, tembêlî û tiraliya daîmî ya li hember pêşketin û teraqiya muqedder, bi zimanekî tûnd tê rexnekirin. Ji vî aliyê ve Koyî, darê Şerefxan û Ehmedê Xanî girtiye, destê xwe ji rexnekirina van kêmasiyan neşûştîye.

Jixwe piştî ku ne-mumkîniya Ermenistaneke bi vî rengî hatiye dîtin, dijayetiyeke bi vî rengî jî zêf bûye çûye.⁷ Wek ku Bozarslan jî dibêje, dawîlêhatina endîşeya avabûna dewleteke ermenî⁸ ya li ser axa kurdan, dijayetiya ermenîtiyê jî ji holê ra-

5 Paul De Man, *Körlük ve İçgörü, Çağdaş Eleştirinin Retoriği Üzerine Denemeler*, wer. Ferit Burak Aydar-Cem Soydemir, Metis, 2008, r. 33.

6 Hacî Qadirê Koyî, *Dîwan*, tîpguhêzî: Xelîl Duhokî, Nefel, 2004, r. 83-86.

7 Gelo nivîseke Xelîl Xeyalî ya vê serdemê dikare wek delîlek bê nişandan? Ji ber ku Xeyalî tê de qala hişmendîya ermeniyên dike û piştê jî pesnê yekî bi navê Haçatur Abovyan dide ku wî otorîteya ermenîkiya klasîk a di destê çend keşeyan de şikandîye û di şûnê de ermenîkiya gelêrî binecih kiriye. Di dawiyê de Xeyalî gazindan dike ka çima di nav malmezînan kurdan de yekî wekî Abovyan dernakeve û zarokên xizan û belengaz ên milletê xwe nade xwendin. Ji bo vê nivîsê bnr. Babê Naco, “Fe’tebîru ya Ulîl Ebsar” *Hetawî Kurd*, j. 2, 1913.

8 Hamîz Bozarslan, “Türkiye’de Kürt Milliyetçiliği: Zımnî Sözleşmeden İsyana (1919-1925)” dnd. *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, r. 208.

kiriye. Merhaleya duyemîn a vê pêvajoyê (1931-1991) gelek cihê ye. Di vê serdemê de di nav edebiyata kurdên Sovyetê de îmaja ermenî bi temamî wesfekî erênî ye. Ger mirov *Gundê Mêrxasan* a Eliyê Evdilrehman, *Kurdê Rêwî* ya Sehîdê Îbo, *Şivanê Kurmanca*, *Hopo* û *Jiyana Bextewar* ên Erebe Şemo, *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo, *Hewarî* ya Heciyê Cindî û hê çendîn kurteçîrokên vî nîfî bixwîne, dê ev taybetî bête ber çavan. Di van roman û metnan de ermenî, gelek caran ew camêr in ku himbêza xwe ji kurdên êzidî yên mezlûm re vekirine û Ermenistana Sovyetê jî dilovaniya welatekî duyemîn e.

Mirov dikare bibêje ku îmaja tirk jî ji bo dewra modern,⁹ bi nîfşê Hawarê re wesfekî mêtinkar,¹⁰ zordar û destdirêj girtiye. Di nav nivîs û çîrokên pêşengên vî nîfî de, di nav nivîs û berhemên edebî yên Celadet Bedîrxan, Kamiran Bedîrxan, Nûredîn Zaza, Osman Sebrî û Cegerxwîn de, îmaja tirk nerênî ye. Di nav sebebên vê yekê de ew qehr û hêrsa têkçûna serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê, komkujiya Geliyê Zîlanê heye. Rehenda şexsî ya vê hêrsê jî digihîje sirgûn û nefîbûna yek bi yek a vî nîfî. Ji ber ku sirgûniyê di jiyana van şexsan de qelş û derzeke daîmî çêkiriye, zîyanên emrekî mezin kiriye. Bêyî ku em gotinê dirêj bikin, di metnên vî nîfî de tirk esker in, me'mûr û karmend in, serbirê serhildanên kurd û avakarê sêdaran in. Yanê nasnameya wan di rengê zabît û cendirmeyan de tê pêşkêşkirin. Ji bo vê yekê du çîrok dê bi kêrî me bînin. Mesela di çîroka "Perîşanî" ya Nûredîn Zaza de tirk, du cendirme ne. Yek ji wan dema bo serjêkirinê li pey berxeke qelew dikeve, yê din tîfingê dirêjî şivan dike ku dengê xwe dernexe. Lê encam trajîk e, şivanê ku bi kurdî îtiraz dike tê kuştin, kerî birr dibe, rengê bihuştê diqulibe rengê xwîne. Ev çîrok, di nav toneke gelek cidî de hatiye vegotin. Lê yên ku bayekî mîzehî dihewînin jî eynî ne. Mesela Hesên Qizilcî yê ku di hemû çîrokên xwe de cih daye pevçûn û nakokiyên navbera kurdan, di çîroka bi navê "Ji Berdêla Pereyên Bertilê ve Xwendina Qur'anê" de, dema serbaz û cendirmeyên faris ên qereqoleke Bokanê û gundiyên derdorê qîset

9 Beriya vê serdemê di metneke goranî ya sedsala 17an de, di nav şerekî axir zeman de behsa tirk û kurdan dibe. Di wan risteyan de tirk wek "serkeş", roja hikmê wan wek "rojê cevr, bedî bisyar", şûrê di destê wan de jî wek "şûrê kînê" tê destnîşankirin: "Ektradê etraf, turkanê serkeş", "Hukumê şahî tirk û tatar bû/ Roj rojê cevr, bedî bisyar bû", "Rûmî suwaran tîgê kîn e kef". Bnr. Xan Elmas, *Dîwan*, Nusxey Xetî: Xelîl Alî Nejad, 1376/1998. Spas bo Shahab Valî ji bo vê agahiyê.

10 Li gor hinekan Dewleta Osmanî tu car nebûbû koloniyek. Li dû encama hinek tiştan, mesela teşebîsên ku bi Abdulhemîd re nîfûsa misliman homojenîze kiribû û bi polîtîkayên Mehmûdê Duyem re jî merkezîbûnê pêkanîbû, Dewleta Osmanî gihiştîbû rêveberîyeke hişkîr û teqlîdkar a kolonyalîzmeke Rojavayî. Ev yek jî rêveberîyeke ku hebûna xwe dixwest zêdetir bide hîskirin derxist meydanê û elîtên wê jî cih û milletên din muhtacî îslehkirin û xelaskirinê dîtî. Bnr. Selim Deringil, *Simgeden Millete*, İletişim, 2013, s. 212. Lê ji ber vê fehma "roşinger" be jî, cardin hinek elîtan (ku bi piranî esker bûn) di dewra komarê de rasterast behsa rêvebirîneke "kolonyal" kiriye. Mesela Mareşal Fevzi Çakmak yek ji wan e ku ji bo Dêrsîmê dibêje "divê Dêrsîm wek rêveberîyeke kolonyal bête dîtî û li vê derê îdareyeke kolonyal bê avakirin." Bnr. Yalçın Doğan, *Savrulanlar Dersim*, Kırmızı Kedi, 2012, r. 99.

dike, sahnayê wisa datîne: Cendirme, bi tehdît, bêrê bac û xeracê ji gundiyan distînin. Gihîştine armanca xwe, lê bê ku vegerin ferq dikin ku ji mala mele dengê Qur'anê tê, tèn ber derî û wî li ber didin ku 2 fils deyndarê dewletê ye, digel îtirazan filsekê digrin, lê ji bo ya din, ji cendirmeyan yek dibêje ku madem tu deyndarê me yî, ji bo filsa mayî, li reh ruhê diya min a mirî lazim e xetmeyekê bixwînî.¹¹

Di romana *Der Adler von Kurdistan*¹² de jî, ku Kamiran Bedirxan bi Herbert Oertel re bi elmanî nivîsandîye, rewş zêde naguhere; di vê berhemê de tirk wek blokekê "dijmin" tèn binavkirin.

Belê, ev salên ha hişk in, bi taybetî jî ji bo nîfşê Hawarê. Ji ber ku ew bi xwe mexdûrê¹³ wî şerî ne ku di berhemên wan de tê teswîrkirin. Heta hin helbest û menzumeyên Cegerxwîn de "ew" bi temamî mêtinkar û hevkarên wî ne. Û lêrasthatina wan a fizîkî û mecazî jî di nav qiyaseke dijî hev de rengê digre: "Ew" şerîf û dewlemend, "em" xulam û bende; "ew" jê diçin "em" baxçevan; "ew" nivişkê teze dixwin, "em" rûnê genî...

Lê belê temsîlên tirk ên van berheman, di ber temsîlên kurd ên hin romanên tirkî de (mesela wek *Zeyno'nun Oğlu* ya Halide Edip, *Sevgim ve İstirabım* a Mükerrrem Kamil, *Dağları Bekleyen Kız* a Esat Mahmut, *Yezid'in Kızı*¹⁴ ya Refik Halid) bêguneh dixuyin. Qet nebe di edebiyata kurdî de temsîla neyînî ya tirkî xwediyê zemînekî objektîf e. "Yên biyanî", "kesên ku ji derve hatine" tirk in. Romanûsên wek Halide Edip, Mükerrrem Kamil, Esat Mahmut, Refik Halid bi xwe, tirkî wek esker/pîlot, jina esker, qeymeqam, hezkerên baloyên Ewrûpayî teswîr dikin. Di cepheya edebiyata kurdî de cihê vê teswîrê dibe "kesê biyanî". Bi rastî jî ji dewra Hawarê bigre heya edebiyata kurdî Sovyetê, ya diyasporayê û heya vê serdema dawîn a ku şahidiya şerekî kiriye, hema bibêje di tu roman û çîrokan de, kurd û tirk li ser zemînekî normal, wek du mirovên yeksan nayêne pêşberî me. Yanê di edebiyata kurdî de temsîlên van her du miletan di nav jiyaneke rojane û rîtmeke asayî de erzê endam nake. Dema şer li dar be, pevçûn û qerqêşûn mewzûbehs be, an li dû şer penaberiyek rû dabe derdikevin meydanê. Wê demê ye ku tirk ne wek karakterên xweser; wek serbaz, polis, zordar, karbidest,¹⁵ mitecawîz, endamên îstîxbaratê, bi kurtî wek otorîteya

11 Binêrin, Nûredîn Zaza, *Kurdên Nejbîrkinê Nûredîn Zaza*, Avesta, 2011 û Hesên Qizilcî, *Kenê Parsek*, Avesta, 2001.

12 Ji bo agahiyên berfirehtir derbarê vê romanê de bnr. Abdullah İncekan, "Bir Kürt Prensın Almanca Romanı", *Kürt Tarihi*, j. 5, 2013.

13 Şer û mexdûriyet, travmayên şer cara pêşîn bi nîfşê Hawarê bûne mijarên edebiyata kurdî. Lê ev nîfşê mexdûr, ji pasîfîya mexdûriyê derketine wek sujeyên gelek aktîf nerîtek (tradîsyon) ava kirine ji bo edebiyat û çanda nivîskî ya kurdî.

14 Ji bo analîzeke têr û tesel derbarê van romanên de bnr. Zeyno Zeynep, "Wekî Qadeke Şidetê, Temsîl: Di Romana Tirkî de Kurd, İsyân û Jin-I" wergera ji tirkî: Dawud Ozalp, *Zend*, Payîz 2008, r. 19-28.

15 Mesela di çîroka "Ber Tevna Mehfûrê" ya Celadet Bedirxan de, mekan ne diyar e Kurdistan e an Tirkiye ye. Lê di şerê Şêx Seîd de piştî şehîdîyê Bengî Axî û kurê wî Zinar, malbat

dewletê, derdikevin pêşiya me. Yanê di edebiyata kurdî de îmaja tirkî, ji peywenda lêrasthatinekê azad nîne.

Lêrasthatina çi? Ew temasa kolonyal e ku tê de nasname dibin “ew” û “em”! Nexwe ka em hinek jî li hişê mekanê vê lêrasthatinê binêrin.

Mekanê Lêrasthatina Kolonyal

Helbet ev ne lêrasthatina hevsengan e ku danûstendineke çandî an meleziyeke dewlemend jê çêbibe. Tiştê ku vê lêrasthatinê ji temaseke kultûrî vediqetîne, bi “awira çavê kesê biyanî” ve û bi “qenaetên dîtin”a wî çavî ve gelek eleqedar e. Ji ber ku “yê jidervehati” awira xwe û îmajên xwe yên hazir û qaîmbûyî bi xwe re anîne. Lewma bi refleksa ku ev biyanîbûn ferq kiribe tevdigere. Ew kes, bi wan temsîlan diaxive ku vê lêrasthatinê dike temaseke kolonyal. Di nezera wî de ev cihê ku jê re dibêje “Şerq” diyarekî “wehşî” û “xeyrî-medenî” ye.¹⁶ Ev yek, qedera yê ji derve hatî jî diyar dike: Ew dê “vî diyarî pak û paqij bike”,¹⁷ dê ronahiya medeniyetê û hikumraniya aqil bîne vî cihê. Yanê hinek jî ev weziyeta “jêr” e ku mîsyoneke ulwî dide yê biyanî: Lazim e ew insanê vê herêmê, ku bi adet û tore û zimanê xwe ve “ecêb” e, bixe ser riyeye rast û bibe pêkerê guhertineke ferz. Ez dizanim ev şemaya ha ji we re pir nasyar û oryantalist¹⁸ tê. Lê, ji elîtên Komarê, heta berî wan jî ji elîtên Osmanî¹⁹ (serbaz, burokrat, nivîskar, sirgûn, mamoste, doktor, qeymeqam) riya kê ketibe Kurdistanê, di serê wî de kê-m-zêde ev sehne hebûye. Terefgiriya vê sehneyê vê gotina Said tîne bîra mirov: “Şerq, bi temaşevan, derhêner û aktorên xwe ve sehneyeke tiyatroyê ye

hatiye bajarekî piçûk ê ku kes wan nas nake. Dê, paqijiya malan dike û her du keçên wê jî di kargehekî de ber û mehîrûn çêdikin. Vê carê di sehneya nêzik de “yê din” ne esker û zabîtin, serhosteyek e. Lê têkiliya vî kesî û keçikan di dereceya serdest û bindestan de cereyan dike. Ji ber ku serhosteyê tirk gelek caran erza wan dibe û ji wan re kufriyan dike. Ji keçan jî ya mezin (Rindê) dizane ku sebebê vê derbederî û zilmê, nebûna dewleta kurdan e. Ger li ser axa xwe azad bijiyana ji hakimîyan heya paleyan û elbet heya serhoste dê ji kurdan bûya û dê rastî heqaretan jî nehatana. (Bnr. Celadet Alî Bedirxan, *Gazinda Xencera Min*, Lîs, 2007.)

16 Bi vî awayî kurd gûruhek in ku davêjin ser partî û baloyan, medeniyana wek “qewmê Lût” dibinin, “eşqiya” û “olperest” in. Mesela di romana *Zeyno 'nun Oğlu* de Mesture Xanima jina qeymeqam, feqîrê, ji ber insanên vî “diyarê hov” nikare bi rehetî baloyên xwe bide.

17 Edward Said, *Şarkiyatçılık*, wer. Berna Ülner, Metis, 1999, r. 238.

18 Welat Zeydanloğlu, “Uygarlaştıramadığımız Kürtlerden misiniz? Kemalizm, Oryantalizm ve Kürtler”, *Kürt Tarihi*, j. 6, 2013, r. 48-51.

19 Belê mirov dikare van meseleyan heya dewra dawîn a Osmanî bibe. Selim Deringil îddia dike ku di vê dewrê de dewleta osmanî, wekî reqîbên xwe yên îngilîz û frensîz, bi nezereke kolonyal li gel û tebayê xwe yê li çeperê nihêriye. Di nezera elîtên Osmanî de texeyuleke İbn Haldunî hebû, lewre wan bawerî pê anîbû ku medeniyet karê bajarana e û pêşketina medenî jî şiklê xwe ji pevçûna navbera jiyana niştecîh û koçeriyê digre. Di vê pevçûnê de medeniyet li para xwendayên bajarî yên Osmanî diket; her cure zillet jî li para koçerî û çeperê diket. Li gor wan elîtan teba di nav halekî wehşî û koçeriyê de dijî (*Hal-i vahşet ve bedeviyette yaşarlar*). Lewma lazim e mirov wan hêdî hêdî bikişîne daîreya medeniyetê û medeniyetê bibe wan deran. (Selim Deringil, hb., r. 175-176.)

ku alîgiriya Ewrûpayê dike.”²⁰ Hema sirf ji vê terefgiriyê be jî “herêma temasê” ya vê lêrasthatinê dê bibe arenaya pevçûnê. Yanê li vê derê du çandên cihê, di nav tehekumeke asîmetrîk û serî tevandinê de, dê qayîşkêşiyê bikin û bixwazînan serî ji hev bistînin.²¹ Bi muqtedîrbûna wê derê ve girêdayî ye. Wek ku Larrain jî dibêje axirî di lêrasthatina çandî de jî daîma “îqtidar” dikeve navbera her du alîyan.²²

Ev temas her wiha ji aliyekî din ve jî girîng e. Wek ku Loomba jî destnîşan dike, temasa kolonyal, ne ku tenê derbasî ziman û mecazên metnên edebî dibe, an ne ku tenê ji dramayên kolonyal re dibe dekor, di heman demê de rehendekî merkezî ye ji bo wan metnên ku derbarê nasname, têkilî û çandê de ji me re tiştînan dibêjin.²³ Ji ber vê yekê ye ku “li wê derê” hebûna wî kesê biyanî girîng e. Tam jî ev “hatin” e ku pevçûn û vekêşanek tevî vê lêrasthatinê kiriye. Ferqa “em” û “ew” wisan sirayetî temsîlan dike ku piştî demekê jê klîşeyek diwelide: Dê guhertina “nemedî”, “şakî”, “cahil” “qaçaxçî”, “yobaz” an bibe qismetê yekî “medenî”, “xwedî-kemal”, “xwenda”, “bajarî”. Esasen di vê serdemê de (teqriben ji 1928an heya 1939an) medeniyetperwerî bûye “fetîş”ek jî. Her kesê ku riya wî ketiye “Şerqa ku diyarê esrar û wehşetê ye”²⁴ an her elitê Komarê yê ku derbarê Şerqê de nivîsiye, qala anîna medeniyetê kiriye.²⁵ Lewma divê em bibînin û bi awayekî wêrek muneqeşe bikin ka texeyula “kurdê asî û wehşî” yê van romanên, çawa rê li ber texeyula “tirkê qehreman û medenî” vekiriye.²⁶

Ji bo ku ji me re bibe mîna keke lêrasthatina kolonyal, ku di vî warî de klasîk e, ka em piçek li romana *Zeyno'nun Oğlu*²⁷ ya Halide Edip binêrin.²⁸ Di vê romanê de hemû şablon hene: Eşqa di navbera serbazê tirk (Yuzbaşî Hasan) û keça kurd (Zeyno)

20 Edward Said, hb., r. 81.

21 Ji bo vê têgeha postkolonyal, ku ji Mary Pratt hatiye wergirtin, bnr. Ania Loomba, *Kolonyalizm, Postkolonyalizm*, wer. Mehmet Küçük, Ayrıntı, 2000, r. 91.

22 Nql. Remziye Arslan, “Cumhuriyet Dönemi Romanlarda Kürtler”, dnd. *Resmî Tarih Tartışmaları-6*, (edîf.) İsmail Beşikçi, Özgür Üniversite Kitaplığı 76, 2010, r. 366.

23 Ania Loomba, hb., r. 95.

24 Mesela *Kalp Ağrısı* ya Halide Edip bi vê gotinê qala welatê kurdan dike; *Yüzbaşı Selahattin'in Romani* ya İlhan Selçuk, ji bo kurdên derdora Paloyê dibêje ev wehşî di nav şertên îptîdaî yên Serdema Navîn de dijiyan; di romana *Dağları Bekleyen Kız* a Esat Mahmut de ji bo Bînbaşî Adnanê ku seba mebesteke eskerî ketiye dilqê şivanekî kurd, tê gotin ku bûye mîna wehşiyekî afrikî.

25 Her çend ewqas wext tê re derbas bibe jî zihniyeta elitên Komara Tirkîyê eynî ye. Ayşe Gülsün Bilgehan a neviya İsmet İnönü û wekîla CHPê, qey du sal berê nebû, ji bo komkujiya Dersimê wiha gotibû: “Qetlîam adab û medeniyet anî herêmê, xwedêkirî hatin sirgûnkirin, bi xêra vê sirgûnê medenî bûn”. Bnr. www.postamedya.com, 26ê Kanûna 2011an. Û ger ku bê bîra insanen, di 2012an de Bülent Arınç jî di nîqaşa ziman de digot ku kurdî ne zimanekî medenî ye ku pê perwerdehî bibe.

26 Bn. *Zeyno Zeynep*, heman nivîs.

27 Halide Edip Adıvar, *Zeyno'nun Oğlu*, Can, 2010.

28 Ji bo avakirina otorîteya kolonyal roleke wan nebûya û hê jî xizmeta zihniyeteke wisan nekirana, di dinyayê de mirov serê xwe bi metnên wisan nedîşand! Lê hebûna rêzefilmên wek “Tek Türkiye”, “SakaryaFirat”, “Şevkattepe” pariyek îsbata berdewamiya û zihniyetê ne.

de; têkbirina neyarên pêşketinê (Şeyh M); hişyarkirin û parastina jinika mexdûrê şidetê (Zeynoya kurd ji destê mêrê xwe gelek dikişîne) ji aliyê yeka zana û dinyadîtî ve (Zeyneba Stenbolî ya jina Mîralay Muhsin Beg); cardin berterefikirina asiyên ku davêjin ser balo û partiyên, qaçaqxçitiyê dikin û tovê fesadiyê direşînin (Remezanê mêrê Zeyno, Fettah Efendî, Şêx M); û axir finala klasîk: Jina ku terka welatê xwe dike (Zeyno) û dide pey dildarê xwe (Yuzbaşî Hasan).

Esas di vê romanê de rewşa yekî din canê mirov pir diêşîne, ango nasnameya rasteqîn a Hesoyê kurê Zeyno. Ew kurekî bîaqil ê jîr ê xweşik ê siwarçak²⁹ ê ku ji her hêlî ve xwedî-qabîliyet e. Çi ecêb e hemû tirk jî heyranê vî ne. Lewma Şeyh M. yê ku amadekariya serhildanê dike, dixwaze ji vê yekê îstifade bike. Qaşo dê xeberên mala Mîralay Muhsîn Beg û yên qerargehê ji wan re bîne, lê Heso ji van insanên maqûl û kubar hez dike. Hele jî ji Yuzbaşî Hasan, jixwe tiştêkî nepen xwîna wan li hev dikelijîne, wan nêzîkî hev dike. Helbet nivîskar di finalê de sedemê vê xwînkeliyê eyan dike. Tu nebêjî Heso, ne kurê “kıllı Kürt Ramazan”³⁰ e, kurê serbazê tirk Hasan e. Hasan dema deh sal berê ji bo tefandina agirê serhildanê (jixwe karê kurdan serhildan, yê tirkan jî têkbirina wê ye) hatiye Diyarbêkrê, li garnîzonê, Zeyno (Kürt Şeftalî) nas kiriye. Zeyno jî, ku ji vî serbazî hez kiriye, êdî nexwestiye bi destgirtiyê xwe Selman re bizewice. Selman dema hîn dibe ku sebeb Hasan e, dixwaze bi destê Ramazan (ku wê demê Heso Çavuş e) wî bikuje, lê bi ser nakeve, tê girtin. Zeyno jî bi diya xwe Perîxanê³¹ re dide pey Ramazan tê gund û piştê jî ji mecbûriyetê bi Ramazan re dizewice. Lê belê wê tu carî Hasan ji bîr nekiriye, lewma navê kurê ku ji fêkiyê wê şevê ye daniye Hasan. Mirov dikare çî bêje?! Aqûbeta rasteqîn a vî kurê çavhingivînê ê siwarçak ê xweşik ê ku ji her hêlî ve ji Diyarbêkrê û kurdan dûr e (!) divê encax wisan be.

Wek ku Müslüm Yücel jî diyar dike, ev roman di şexsê “Şeyh M” de, Şêx Said û bizava wî rexne dike.³² Mebesta sereke ew e ku rexne li fikrên dînî û netewî yên Şeyh M bîr girtin. Ev yek jî peywendekê din a rewşên kolonyal tîne bîra mirov. Jixwe rewşên hevterîb (paralel), dîmenên nêzîkî hev ên aîdî milletên din derdixin meydana. Lewre Ranajît Guha dibêje ku di hin çavkaniyên îngilîzan de, nerazîbûn û serhildanên hindîyan ên dewra koloniyê, wek tevgereke fanatîk, tevgereke ku agirê fanatîzma niştecîhan geş dike, hatiye destnîşankirin. Û serekê van tevgeran jî ji aliyê

29 Ku di bezeke hespan de Heso, pêşî ji hemû leşkerên qerargehê stendiye û hunera xwe nişan daye.

30 Remziye Arslan, bi awayekî mafdar dibêje, hin romanên ku bi nezereke şoven hatine nivîsîn, kurdan ne tenê bi neyîniyeke derûnî nişan didin, neyîniyeke fîzyonomîk jî li wan bar dikin. Ferqa etnîkî ya ku ji aliyê serdest ve qebûlê nedîtiye, bûye sebebê piçûkxistin û ta'ndayîne. Bnr. “Cumhuriyet Dönemi Romanlarda Kürtler”, r. 370.

31 Halide Edip, dema Perîxana diya Zeyno dide nasîn, wan hemû kirêtiyên dijayetiye bi kar tîne. Şûna ku em drama diyeke ku hîn bûye keça wê bi zaro ye, em dibînin ku ji orf û exlaqê bi dûr, kêfxweş dibe ku dê keça xwe bide zabîtek û piştê xwe bide quweta dewletê.

32 Müslüm Yücel, *Osmanlı-Türk Romanında Kürt İmgesi*, agorakitaplığı, 2011, r. 201.

îngilîzan ve daîm wek “molla”yekî fanatîk hatiye teswîrkirin.³³ Lewma êdî dê zêde balkêş nabe ku di romana *Yezid'in Kızı* de Şeyh Şemun, di *Zeyno'nun Oğlu* de Şeyh M, di *Dağları Bekliyen Kız* de Şeyh ê ku ji serekên herкета Agiriyê yek e û xasma di *Cemo* de Şih Sayid (Şêx Seîd) di vê rolê de bèn pêşkêşkirin.³⁴ Her wekî ne ji van kesên fanatîk be, dê ne îsyân biqewimin û ne jî kesên saf ên xapandî bidin pey wan. Muxterîsiya wan fanatîkan, hinekên safik û ji dinyayê bêxeber avêtine nav agir.³⁵

Ev tiştên ku me heya niha behs lê kir lingekî vê axaftinê bûn, lewma li vir divê behsa mînakên tirkî biqedînim. Lê divê bibêjim ku ev tablo, romanên *Memo* û *Cemo* yên Kemal Bilbaşar jî tê de, heya salên 60î didome. Ger piştî îmajê kurd bi Yaşar Kemal, Bekir Yıldız, Ferit Edgü, Zülfü Livaneli, Vedat Türkali, Oya Baydar, Murat-han Mungan, Ahmet Altan, Murat Uyrukulak re reng û peywend guhertibe, mesela nasnameyeke “hûmanîst” an “qebûldîtineke hevseng” girtibe,³⁶ di vê yekê de hesta “hevîrîtiyeke çepgir” heye ku ew jî dikare bibe mijareke din.

Helbet divê vegerim ser edebiyata kurdî ya ku nivîsa min jî we’da wê daye. Ev lêrasthatina kolonyal li aliyê kurdan bi temsîlên çawa hatiye ziman? Li vir jî ji ber vê peywendê îmajê neerênî ya tirk nîne? Heye. Lê ne heya qirikê! Bi gotineke din, ev vebêja “yên din” tu carî nagihîje asta Halide Edip Adivar an Esat Mahmut Karakurt. Erê, di “Ber Tevna Mehîrê” û “Gazinda Xencera Min” a Celadet de; “Gulê”, “Hevîna Perîxanê” û “Perîşanî”ya Nûredîn Zaza de; “Li Goristaneke Amedê”ya Osman Sebrî de û hema bêje di hemû çîrokên Kamiran Bedirxan de³⁷ siya îmajê tirk di ber peyvên wek mêtinkar, qedexa, mitecawîz, sêdar, zordar de derbas dibe, lê ne

33 Nql., Selim Deringil, hb., r. 176.

34 Car bi car Kemal Bilbaşar, wê bi bêjeyên wek “kahpe”, “haym” destnîşan dike, ji wê wêdetir, wê wek despotekî serbir ê gundiyan qiset dike. Qaşo terefdarên Şêx wekî pez hin gundiyan ku piştigiriya serhildana wî nekirine ser jê dike. Ji bo van teferûatan binêrin Yücel, heman berhem, r. 460-461.

35 Di hinekan de dema dilê nivîskar tam rehet nabe, dixwaze vê carê jî bi lehengê ku qaşo aqilê wî hatiye serî, rûyê “eslî” yê van qurnazan nîşan bide. Bi vê minasebetê Zeynoya qîza şêx, di kêliya poşmaniyê de bi dengekî kîndar û coş ji bavê xwe re dibêje, hûn ê bi van çiyayan dewletê ava bikin, kanê sazîyên we, bi kîjan selehiyetê, ka wan bêrîkên xwe vala bikin, tev pereyên îngilîzan in, hûn diz û çapulci ne.

36 Li gor Arslan, di edebiyata tirkî de du nêrînen bingehîn hene derbarê temsîlên kurdan de: Nêrîna “nasyonalîst” û ya “demokratîk”. Ya yekem jî di nava xwe de dibin du beş: “Nêrîna nasyonalîst a şoven”, ku di wan de kurd bûne “yên din” ên îmajê tirk, lewre kurd bi temamî (derûnî û fîzyonomî) negatîf in. Di “nêrîna nasyonalîst a hûmanîst” de kurd, ji negatîfbûnê xelas bûne û qebehet çûye ser milê şertên civakî. Lê şert dîsa jî ev e, lazim e ev “paşmayîna çandî” bi riya asîmîlasyonê siruştî û insanî ji holê rabe. Îmajê kurdan bi êwra duyem, ya demokratîk re, ku kurdan hevsengê xwe dibîne pozîtîf bûye, kurd tê de ji mef’ûliyê xelas bûne, bûne biker. Bnr. heman gotar, r. 363-388.

37 Kamiran Bedirxan, di ciyekî çîroka “Eyloyê Pîr” de (ku ev çîrok di xwe de kompleksa Odîpal jî dihewîne, qala dewrên qedîm dike û peywendê wê jî ji pevçûneke tirk û kurdan gelek dûr e), wiha dibêje ji bo Gurgînê kurê Mîr Tacîn: “Gurgîn di şer de zora tirko biribû û dilê xelkê Kurdistanê xweş kiribû.”

ew çend bi zikreşî. Mesela, ji bo vê yekê em çîroka “Dildiziya Gulekê”³⁸ ya Kamiran Bedirxan mînak bidin.

Ev çîroka alegorîk qala baxçeyekî xweşik ê li Diyarbêkrê dike û dibêje di nava kortaleke vî baxçeyî de Şêx Seîd û hevalên wî bédeng razayî ne. Û di vî baxçeyî de her şev guleke sor vedibe. Dema destekî biyanî dirêjî wê dibe, pelên wê tên hev û gul destûr nade ku bê bêhnkirin. Jixwe di nav pelên wê de hezar axên birîndaran, hêsirên sêwî û jinebiyan veşartî ne. Şevêkê “zabîtekî dijmin” bi delala xwe re tê dikeve nav baxçe. Bi gavên hişk pê li çîmenan dike. Hêşnahiyên zirav dişkên û pelên kulîlkan ji hev dibin. Di wê kêliyê de zabît dest davêje gulê ku jê bike. Gul dil dike ku xwe teslîm neke, lê zabît wê diçîne. Dema ku gul dikeve destê zabît, singê xwe vedike û xwe geş dike. Ji bêhna wê, zabît û delala wî dikevin, dimrin.

Bêguman bi riya çîroksaziyê be jî rovanş û berxwedanê piçûk nabînim. Ew, bi gotina Said, taybetiyeke edebiyata berxwedanê ye. Lê naîfiya çîrokê jî li meydanê ye. Hewar û medet ji ax û kulên gulekê tê xwestin! Lê cardin qebûlnekirina tehekûmê ji aliyê niştecih ve serê meylên kolonyal diêşîne. Ji ber ku di vê çîrokê û di gelekên din de rastîhevhatin, di navbera esker (zabît û delala wê) û gel de ye (gula ku bi hezaran mexdûran temsîl dike). Di vê behsê de tesbîta Yücel a ku ji bo romanên tirk-osmanî rast e. Li gor wî di van romanên de îmaja kurdî di nav peywenda “eskerî, cinsiyet, netewetî û edebiyat”ê de şiklekî digre,³⁹ lewre di van berhemana de tirk û tirkbûn, nasnameyeke eskerî ye.⁴⁰

Di çîrok û romanên Medenî Ferho de, Laleş Qaso, Jan Dost, Helîm Yûsiv an yên kurdên Sovyeta kevin de, wekî hin romanên ku fezîletên modernbûna Komara Tirkiyê qiset bikin, em rastî “eşq û evîn”eke wisan nayên, di rastiyê de pêjna ku tê guhê me qerebalixa pevçûnekê ye, pilepila “yê din” e. Li ser riya vê lêrasthatinê, jina kurd ji tesîra serbazê tirk re vekirî nîne. Li ser vê riyê evîneke ku çiyê cinsiyetê guheriyê (lawê kurd, keça tirk) jî nîne. Ya rast, du sê mînak ne tê de, berdewamiya klîşeyekê heye ku vê carê naveroka wê berevajî bûye.

Navxweyîbûna Pratîkên Klîşeyekê

Dîsa bêyî ku gotinê dirêj bikim dibêjim, ev klîşe derxistin an dûrxistina jinê ye ji welatê wê. Bi gotineke din, jina xwecih li pey mêrê biyanî dikeve. Di vê tabloyê de, ku bala rexneya postkolonyal jî kêşaye, divê jin ji erdnîgariya xwe bê dûrxistin. Li gor vê teşebîsê, jin mexdûrê çanda wî qewmî ye. Ji aliyê wê çanda pederşahî û neşareza ve hatiye dorpeçkirin. Gayatri Spivak dibêje ku, di hin romanên îngilîz ên sedsala 19an de, temsîla jinên hindî û afrîkî yên mêtîngehê wisan dihat bikaranîn ku dîroka emperyalîzmê meşrû û masûm bikin: “Divê jina qemer ji mêrê qemer bihata rizgarkirin”!⁴¹

38 Bnr. Kamiran Alî Bedirxan, *Eyloyê Pîr*, Lîs, 2007, r. 31-32.

39 Müslüm Yücel, hb., r. 11-65-107.

40 Müslüm Yücel, hb., r. 194.

41 Nql. Zeyno Zeynep, hb., r. 21-22.

Di romanên serdema yekem a Komarê de ev klîşe heye. Mesela di *Zeyno'nun Oğlu* de, Zeynoya kurd bi evîndarê xwe yê berê Yuzbaşî İhsan re dizewice û diçe Tirkiyeyê. Di *Dağları Bekleyen Kız* de Zeynep a (li vir jî Zeyneb) ku li Agirî bêhn li tirkan diçikîne, dema aşiqê⁴² Teymen Adnan dibe, ne tenê xwe teslîm dike hemû belge û ewraqên şoreşê jî teslîmî tirkan dike. Şoreş têk diçe, Zeynep dide pey Adnan diçe Enqereyê, li wê derê ji ber van xizmetên xwe ji aliyê Femandariya Giştî ve tê xelatkirin. Di romana *Sevgim ve İstirabım* de, Teyareci Metinê ku balafira wî di bomberdimana serhildana Agirî de dikeve û ew jî ji mil û lingekî xwe dibe, heya salek û nîv ji aliyê qîzeke kurd ve tê dermankirin û xwedîkirin. Di dawiyê de, dema ev camêr cesareta xwe berhev dike diçe ber deriyê destgirtiya xwe ya kevin a ku qîza dîplometekî ye, ev keça kurd jî, ya ku nivîskar tenezûl nake navekê bidê, bi sêdaqeta koleyekî li pey Teyareci Metin diçe. Di romana *Yezid'in Kızı* de jî rewş zêde ne cuda ye. Hikmet Aliyê ku dostekî kevin ê Gazi Mustefa Kemal e, di rêwîtiyekê avî de Zeliya esilkurd a êzîdî nas dike. Ferq dike ku Zelî û hinekên din (Şeyh Şemun, li vir jî dîsa “şêx”!) dê li çiyayê Şingarê [di romanê de Sincar] agirê serhildanekê hil bikin. Hikmet Ali piştî şeveke têt-şehwet, Zeliyê îqna dike ku dev ji tiştên wisan berde û cardin berepaş vegere Arjantînê. Wisan jî dibe. Di romana *Dersim 1937* de, ku ev di sala 1975an de çap bûye, Nahideya Dêrsimî ji bo ku Binbaşî Kemal pê re bizewice û wê ji “wan deveran” xelas bike, hêvî û lavayan jê dike... Diyar e di vê klîşeyê de şewqa sahnayê li ser du kesan e: Serbazê tirk ê xwedî qudret û qîza kurd a dildar û ji tesîra wî re vekirî.

Zeyno Zeynepa ku di vê mijarê de gotareke hêja nivîsiye lewma di vê tesbîta xwe de mafdar e: “Di romanên tirkî de dema temsîla jinê di îşyanên kurd û mijara jinan de li hev diçerixe, li ser navê medenîkirin û modernkirinekê illeh vê dîmenê nîşan dide: Divê jina kurd ji welatê wê û mêrê wê bê xelaskirin.”⁴³

Wek ku min kêliya din jî diyar kir, ji ber guherîna peywendekê (hevrêtiya çepgir) di seyra van temsîlan de hin guherîn çêbûne. Qey nebe fanteziyên ev çend sethî û zayendperest ên mêtinkar ji holê rabûne. Dîsa jî çend mînakên van salên dawîn hene ku divê mirov ecele yê lê neke. Mesela, romana *Mutluluk* a Livaneli yek ji wan e. Meryema ku rastî tecawiza apê xwe hatiye (ku Meryem vê yekê heya dawiyê vedişêre) dê ji aliyê kurmamê xwe Cemal ve bê kuştin. Cemalê ku tezkereya xwe nû girtiye û ji şerê çiyayên Kurdistanê filitiye, bi vê mebestê Meryemê dibe Stenbolê. Lê her du ciwan dema ku ji hewa û îqlima welatê ku adet û toreyên wî mirovkûj e dûr dikevin, ev trajedî berteref dibe. Bi ser de li Stenbolê bi rêberiya profesorekî zana yê tirk (İrfan Kurudal) dê xwe û rastiya xwe nas bikin. Heta dê eşqê jî bi xêra vî camêrî nas bikin.

42 Nivîskar carek wan di şkeftê de tenê dihêle, di nav wan de nîqaşek saz dike û piştê jî wan teslîmî şehwetê dike, lewma carna peyva “eşq” ji bo vê tîkiliyê zêde ye.

43 Zeyno Zeynep, hb.

* Ku di wergera tirkî de ji bo vê têgeha Girard, “arzunun dolayımlyıcısı” hatiye gotin.

Ji ber ku hebûna vî kesê sêyem, bi qewlê Girard, dê bibe “reqîb”ek û arezûyan bide ber qamçûyan*, wan nêzikî hev bike û “bextewarî”yê bike nesîbê wan.⁴⁴

Baş e, di edebiyata kurdî de rengvedana vê klîşeyê çawa ye? An bi kîjan nivîskar û metnan, ev klîşe kete edebiyata kurdî? Bi qasî ku min ferq kir ev yek pêşî bi romana *Ronî û Tarî* ya Mehmed Uzun û dûre jî bi ya *Ez ê Yekî Bikujim* a Firat Cewerî kete edebiyata kurdî. Di romana *Ronî û Tarî* de keça kurd Kevok, bi serbaz Baz re (nivîskar pir hewl dide ku portreya wî ya insanî derxe) wî ji refleksên statûyeke serdest dût bike di nav eşqeke bêhêvî de li çareyekê digerin. Xelasi, terka welat e. Ji ber ku her du jî di xetereyê de ne. Ne Baz wekî berê karê qirêj ê dewletê jidil pêk tîne û ne jî Kevoka ku demekê gerîla bû û piştî dîlketinê bû yara Baz dikare vegere Welatê Çiyan. Li gor romanê tenê riyek heye ji bo jiyaneke nû: Divê ji Welatê Mezin û Welatê Çiyan veqetin. Ji ber ku her du jî ji ber şer bûne “cehenem”, bûne “diyarê Hades”.⁴⁵

Bi awayekî manend, di romana *Ez ê Yekî Bikujim* de jî eynî sehne saz dibe. Rizgariya Dîanayê, ku demekê gerîla bû, piştî dîlketinê bi riya qorçiyên dikeve destê hêzên kontra û rastî tecawiza wan tê û ev e niha bi zora wan hêzan jî bû yeka laşfiroş. Belê, her çend xwediyê têlefoneke mobîl be jî û tu astengî jî nebin ku xwe biavêje saziyeke sivîl û ji vî halî xelas bibe, xelasiya wê encax dê bi dîrketina ji welat mumkin be. Vê îmkanê jî, çi ecêb e, dê “nivîskar”ekî kurd bidê ku li Swêdê dijî û aniha ji bo panelekê hatiye Amedê.

Li vir tiştê ku mirov sewqî fikaran dike ew e ku klîşeyeke berevajîbûyî û/an jî oryantalîzmeke navxweyî dubare dibe. Bi vî halê xwe û bi çend teserufên hevbeş ên din, bi min ev du roman xwendevanê kurd aciz dikin.⁴⁶ Ji ber ku di romanên tirkî de dîrxistina jinê ji welatê wê, kê-m-zêde xwediyê vê wateyê bû: Jin, ji ber paşvemayîna civatê, ji ber adet û toreyên neinsanî mexdûr e; tê perçiqandin; ji germahiya eşqeke ku hisên wê yên jinane şiyar bike bêpar e; heta ji tetmînûnê jî mehrûm e; ji ber nezaniyê tevî îşyanan bûye û hatiye xapandin; ger zilamekî medenî yê qenc (ku ew bi piranî serbazek e) rastiye nîşana wê bide an wê ji vî cendereyê xelas bike, dê ew jî bigihîje felatê. An di van salên dawîn de ev klîşe wesfekî civakî girtiye: Jina kurd, qurbana şîdeta nav malê ye an mexdûra têkiliyeke veşartî ya enest e (wek romana *Mutluluk*); hê nebûye qurbana cinayeteke namûsê an hê qesta canê xwe nekirî em wê ji “wê derê” (*bölge*) dût bixin... Yanê di nav vî klîşeyê de rewşa jina kurd, di nav paşvemanekê çandî (kültürel gerilik) û çarçoveyeke derî-medeniyetê⁴⁷ de tê pêşkêşkirin.

44 Zülfü Livaneli, *Mutluluk*, Doğan Kitap, 2011.

45 Mehmed Uzun, *Ronî mîna evîne Tarî mîna mirinê*, Avesta, 1998.

46 Ji bo yek ji van nivîsan bnr. Receb Dildar, “Xwendineke cihê li ser *Ez ê Yekî Bikujim*”, Kowara W, j. 24, 2009, r. 3-6.

47 Ev rûyekî din ê “seferên kulturî” (kültür seferleri) yên Aziz Nesin e. Rewşenbîrên tirk demeke dirêj bawer dikirin ku mesele çandî ye, lewma Şerq dê bi seferên wisan medenî û sareza biba.

Lê belê, ew jinên ku ji aliyê Uzun û Cewerî ve dil heye ku ji welat bên dûrxistin (gerçî Kevok jî Dîana jî tên kuştin⁴⁸ bêyî ku bigihîjin vî mirazî) ji van wesfên “îbtidai” dûr in. Her du jî tevî gerilayan bûne (Kevok xwendekara zanîngehê ye), derbarê welat, paşeroj û rizgariya jin û jiyane de hişmend û zana ne. Lê ew jî wek Zeynoya paqijkera qerargehê muhtacî rizgarkirinekê ne. Kevok jî Dîana jî li ser koreriyekê asê ne. Vê carê ji ber rewşa polîtîk. Ji ber ku ûtopyaya wan têkçûye, hêviyên wan pûç derketine, teriqîne. An jî ji aliyê nivîskarên xwe ve wisan hatine nîşandan.

Elbet bi van gotinên dawîn, ez dizanim ku min qaîdeyeke vegotinasîyê bin pê kiriye: Ferqa navbera nivîskar û vebêjer. Lê di her du metnan de bi awayekî ecêb, çîrok ji aliyê “nivîskar” ve, ku lehengekî figûral ê metnê ye, tê qisetkirin. Dema mirov dikeve nav teferûatan pê dihesa ku ew “nivîskar”ê ku ji bo çavdêriya îhlalên mafên mirovan bi komeke rewşenbîr û rojnamegeran re ji welatekî Ewrûpayî hatiye û niha li lobiya otêlekê guhdariya Kevokê dike, pir dişibe Mehmed Uzun.⁴⁹ Her wiha ew “nivîskar”ê ku bi mebesta paneleke li şaredariyê ji Swêdê hatiye bajarekî Kurdistanê û aniha li odeyeke otêlê (li vê tesadûfê!) guhdariya çîroka Dîanayê dike hema bibêje siya Firat Cewerî ye. Helwêsta bimesafe ya van her du nivîskaran (di her du wateyan de “van nivîskaran”) a derbarê şerê çekdariyê de, di romanê de xwe diyar dike. Wisan bawerî bi daxwaza lehengên jin tînin, carekê be jî rîyeke din li ber wan danaynin. Qet nebe di *Ronî û Tarî* de êdî Kevok bê mecal e û Uzun di ber vê bêmecaliyê de rewşa lehenga xwe qiset dike. Lê Cewerî wisan bawerî bi vê xilasîyê aniye ku di çiyekî romanê de ev ji deve nivîskarê figûral ev derdikevin: “... û çawa be ez ê wê ji vî agirî, agirê *dojeha welatê wê* xelas bikim.” (r. 150, îtalîk yên min in). Ku bal li ser be, dibêje “*dojeha welatê wê*” û mensubiyeta xwe derveyî vê yekê dihêle. Di beşa “Biyani”ya *Ronî û Tarî* de jî dema Kevok di ber pesnan de dibêje, “Hades bang dike, divê herim”, nivîskarê figûral dibêje, “Mere wî welatî” (r. 151). Ku qesta wî ji “wî welatî” Kurdistan e, bi qewlê romanê *Welatê Çiyan* e. Di çavê nivîskarê figûral de ew welat bûye cihê şer, hilweşan û rûxandinê.

Bila mîletekî bindest şerê rizgariya netewî dabe destpêkirin, nivîskar derketibin bi zimanê wî mîletî berhevan bidin û piştî şerê wê cografîyê bi vî rengî nîşan bidin... Belê, îtiraz ji bo rê û rêbazan dê hebin, divê hebin jî, lê ji bo mîletê bindest tunebûna ûtopyayekê em ê çawa îzeh bikin? An em ê van temsîl û navlêkirinan daynin kû? Lê berî ku em daynin çiyekî, ka em li çend mînakên din jî binêrin. Mesela em sebebên derketina çiyê yên van jinan binêrin: Di *Ronî û Tarî* de Kevok, ji ber evîna Jîr, li dû Jîr derketiye çiyê. Dîana ne ji eşqa azadiyê, ji tehdeyên bavê xwe û tîrsa zewicandina ne bidil bûye gerîla. Yanê di her du romanên de tabloya reşbîn xwediyê vê paşxaneyê

48 Romanê dide hîskirin ku Diana miriye, lê Cewerî di *Lehîyê* de, ku dewama *Ez ê Yekî Bikujim* e, Dianayê dibe Ewrûpayê.

49 Di nav romanê de nivîskarê figûral bi navê “Tarîxa Evîneke Keserkûr” (di wergera tirkî de “Hüzünlü Bir Aşkın Tarihi”) xwediyê romanekê ye ku ev telmîhek e ji bo romana *Siya Evîne (Yitik Bir Aşkın Gölgesinde)* ya Mehmed Uzun.

ye: Îsyân û şerê ku pê re dest pê kiriye, tu nirx û qîmetek neafirandiye, berevajiyê wî bûye sebebê rizînekê!⁵⁰ Qey mirov dibêje her du nivîskar jî derketina vî şerî, di asta hin bernameyên televîzyonê de tînin rojevê ku ew bername gelek caran zemîne analîzên sosyolojîk ên gelek sethî û manîpûlatîf in. Gelo ji ber vê yekê ye di her du romanên de jî temsîlên req ên mêtinkar, hinekî nerm bûne? Mesela di *Ez ê Yekî Bikujim* de li hemberî Satilmîşê mitecawiz, Yuzbaşiyê “dilrehm” heye. (Ku serbestberdana Dîanaya şervan bi destê vî yuzbaşiyî, di nav xwe de problemeke din a romanê ye.) Di *Ronî û Tari* de nivîskar pir hewl dide ku portreya insanî ya Baz derxe û dilê me pê bide şewitandin. Jixwe di guherîna wî de ev naîfiya ha heye: Her çend li welatê tund û bêrehmê General Serdar hin serbaz, kujerên dest bixwîn bin jî (ku Baz yekî wisan e ku malbata wî hatiye qetilkirin û ew jî ji vê yekê bê xeber li ber destê serbazekî ji nasnameya xwe ya rasteqîn dûr mezin bûye), dema rastî ronahiya evîne hatin, dê bikarin ji karên xirab û jiyana xwe ya bêwate rizgar bibin.

Di vê guherîne de elbet muadîliya pratîka van salên dawîn heye ku ew pariyek bi destê nivîskarên wek Zülfü Livaneli, Ahmet Altan, Vedat Türkali, Mehmet Eroğlu nerm bû. Lê mirov her wiha şikê lê dibe qey tişteki ji vê yekê wêdetir hebe li bal van her du nivîskarên kurd, wek hesabekî li pey muzakereyê û dilxwazê qebûlkirinê, hesasiyeteke ku çav berdaye xwendevan û derdora rewşenbîrên tirk. Li gor nivîsên Fexriya Adsay û Receb Dildar, belê tişteki wisan heye.⁵¹ Deh sal berê ev qible ji bo Mehmed Uzun guherîbû. Wisan dixuye heman tişt ji bo Firat Cewerî heye ku daye ser riya Uzun. Jixwe aliyekî din ê hevpar ê wan ew e ku her du nivîskar bi salan li Swêde mane, li Stenbolê bi rêya heman kurdên “spi” ve nêzîkî derdora edebiyata tirkî bûne, ser destê heman wergêr û rexnegiran derketine pêş, auraya wan a etnîkî ji aliyê heman medya û weşanxaneyan ve hatiye mezatê.⁵²

Wisan dixuye rizgarbûna jinê jî maye li ser piştê van her du “nivîskar”ên figûral ku di jiyana rasteqîn de mesafeyek danîn navbera xwe û şerê qewimî. Ji ber vê yekê ye gelo di çiyekî van romanên de, ew şehweta ku li serbazan hasil dibû, qey mirov dibêje wek potansiyelekê dikare derbasî “nivîskar” jî bibe. Mesela, Kevoka ku gazindan dike da ku mijarên rojanetir, evînen rasteqîntir ên şer û têkoşîne binivîsîne, ji aliyê nivîskarê figûral ve bi vî çavê zayendperest tê qisetkirin: Keçeke spehî, çav reş, xwediyê kûrahiyeke bedew, mijang û birûyên wê gelek xweşik, lêvên wê fireh

50 Her çend navê wê nehatibe dayîn jî di *Ez ê Yekî Bikujim* de Diyarbekir wek bajarekî tê teswîrkirin ku xerqî fuhuşê bûye, zimanê xwe ji bîr kiriye, bûye xerîbê nasnameya xwe.

51 Fexriya Adsay nivîseke gelek balkêş nivîsî li ser sebebên bêhêziya temsîla mekanî û rastiya li piştê xumamiyê di romanên Cewerî de, bnr. Fexriya Adsay, “Bîreweriyeke birîndar: Bênaviya welatekî û bajarên wî, di romanên Firat Cewerî de bîreweriya nivîskar û rewşenbîriyê” *Wêje û Rexne*, j. 1, 2014, r. 152-161; û her wiha ji bo îtirazên din bnr. Metin Adıyaman, “Türkiye gazeteleri için Firat Ceweri vakti”, *Yüksekova Haber*, 24ê kanûna 2013an; Receb Dildar, hb.

52 Ez wisan bawer im ev yek didome, ji ber ku tu bernameya televîzyonê nema ku Cewerî tevli nebûbe û tu rojnemaya tirkî nema ku milaqatek nedabê.

û tijî ne, kî wan lêvan di nav lêvên xwe de dihebîne, keçika bejindirêj, stûdirêj, tilfidirêj, navteng û hêtên wê mîna tîrên vekîşiyayî, pêsrîrên wê yên vekîşiyayî sînga wê dike navenda bal û nêrînê, hêt, çîp û ling mîna stûnên antîk. (bnr. r.145). Di *Ez ê Yekî Bikujim* de nivîskarê fîgûral, Dîanaya ku ji bo alîkariyê lavayan lê dike û raziyê zewaceke formalîte ye, wiha qiset dike: “Heke ez ne zewicî bûma, dibe ku min tavilê destê xwe biavêta destê vê karxezalê û ew bikira şîrka jiyana xwe. Niha wek mîsala Zembîlfiroş û Xatûnê, xwe tobedar dibînim û rişma hisên ku dike serî ji min bistînin, bi paş ve dikişînim” (r. 102).

Di beşa yekemîn a romanê de Temoyê şîzofren jî Dîanaya bextreş jî (du şoreşger û şervanên berê ku yek jê hatiye ber sînore dînbûnê, ya din bûye qehbik) welatîyên xwe bi sersariyê sûcdar dikin, ji ber ku wan berdêla her du lehengan neşikirandine... Peyveke din jî ku li ba her duyan gelek caran dubare dibe “dojeh” e. Û nivîskarê fîgûral jî ji bilî xelasbûna ji vê dojhê tu riyên din nayîne rojevê an nîqaşek nîne ku riya xelasiyeke giştî nîşan bide. Gelo di vê encamê de dibe ku para hesasiyeteke dûrî muxatebên kurd (xwendevanê kurd) hebe?⁵³ Dibe. Wisa nebe jî tiştêkî sabît heye: Di lêkolînên derbarê edebiyata postkolonyal de, derxistin an dûrxistina jinan ji welatê wan ê ku îsyân an şerekî netewî lê dest pê kiriye, xwediyê wateyeke diyar û berçav e. Em çiqas wan metnên neteweperest û şoven ên duh, li ser vê hesasiyetê rexne dikin, lazim e em wê niyeta kevin a ku bi rengên lîberal û hûmanîst xwe cardin saz dike jî bibînin. Qey nebe hebûna ev çend klîşeyên kolonyal vê yekê zerûrî dike.

Li Şûna Encamê

Rita Felski di kitêba xwe ya bi navê *Edebiyat Ne Îşe Yerar* [Edebiyat bi Kêrî Çi Tê?] de qala du xwendinan dike, wek “xwendina asayî” û “xwendina akademîk.”⁵⁴ Dibêje ya ewil zewq û çêja şexsî dermale dike, lê ya duyem di bin hukmê tradîsyonên lêkolînê de karekî xwedî-disîplîn e û daîm jî hişyarbûnê derdixe pêş. Heya ku metnên ku me niha hinek qala wan kir hebin û rexneya edebî jî bi îmkanên warên din re ev çend berfireh bûbe, gelo mumkin e mirov xwe berde ser rehetiya kursiyekê û kêfa xwendineke saf bike? An xwendineke saf a ku ji niyetên me dûr, heye? Metnên ku tê de lêrasthatineke kolonyal hene, ji aliyê temsîlê ve dê xwediyê hin arîşeyan bin. Ew arîşe bi riya xwendineke postkolonyal dê bîn destnîşankirin û zewq şûna xwe bide teyaqûzê. Lê ji van girîngtir, heya rewşa kurdan wek îro be û bi ser de karûbarên miletên li ser cografyaya wan hikumran bi vî rengî bin, zehmet e ku îmajên netewî di rengekî insanî de bîn pêşberî me. Bi ser de ji aliyê hin nivîskarên xwecih ve tekrarkirina hin klîşeyên kolonyal, dê hinekî din mirov sewqî fikaran bike. Lê ji bo peydakirina sebebên van klîşeyan ne lazim e mirov dûr biçê.

Adar-Nîsan 2014/Mêrdîn

53 Fexriya Adsay, hb., r. 159.

54 Rita Felski, *Edebiyat Ne Îşe Yerar?*, wer. Emine Ayhan, Metis, 2010, r. 22.

ÇAVKANÎ

- Adıvar, Halide Edip, *Kalp Ağrısı*. İstanbul: Can, 2010.
- Adıvar, Halide Edip, *Zeyno'nun Oğlu*. Can, 2010.
- Adıyaman, Metin, "Türkiye Gazeteleri İçin Fırat Ceweri Vakti". Yüksekova Haber, 24 Aralık 2013.
- Adsay, Fexriya, "Bîreweriyeke Birîndar: Bênaviya Welatekî û Bajarên Wî, di Romanên Fırat Cewerî de Bîreweriya Nivîskar û Rewşenbîriyê". *Wêje û Rexne*, jimar 1, 2014.
- Arslan, Remziye, "Cumhuriyet Dönemi Romanlarda Kürtler". dnd. *Resmî Tarih Tartışmaları-6*, amd. İsmail Beşikçi, Özgür Üniversite Kitaplığı 76, 2010.
- Babê Naco, "Fe'tebîru ya Ulîl Ebsar". *Hetawî Kurd*, jimar 2, 1913.
- Bozarıslan, Hamit, "Türkiye'de Kürt Milliyetçiliği: Zımnî Sözleşmeden İsyana (1919-1925)". dnd. *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, İstanbul: Avesta, 2005.
- Celadet Alî Bedirxan, *Gazinda Xencera Min*. Stenbol: Lîs, 2007.
- Deringil, Selim, *Simgeden Millete*. İstanbul: İletişim, 2013.
- Dildar, Receb, "Xwendineke Cihê li ser *Ez ê Yekî Bikujim*". *Kowara W*, jimar 24, 2009.
- Doğan, Yalçın, *Savrulanlar Dersim*. İstanbul: Kırmızı Kedi, 2012.
- Felski, Rita *Edebiyat Ne İşe Yarar?* çev. Emine Ayhan, İstanbul: Metis, 2010.
- Güvenç, Bozkurt, *Türk Kimliği, kültür tarihinin kaynakları*. İstanbul: Boyut Kitapları, 2007.
- Hacî Qadirê Koyî, *Dîwan*. Tîpg. Xelîl Duhokî, amd. Arif Zêrevan, Stockholm: Nefel, 2004.
- Hesen Qizilcî, *Kenê Parsek*. Stenbol: Avesta, 2001.
- Kamiran Alî Bedirxan, *Eyloyê Pîr*. Stenbol: Lîs, 2007.
- Livaneli, Zülfü, *Mutluluk*. İstanbul: Doğan Kitap, 2011.
- Loomba, Ania, *Kolonyalizm Postkolonyalizm*. wer. Mehmet Küçük, İstanbul: Ayrıntı, 2000.
- Nûredîn Zaza, *Kurdên Nejbîrkinê Nûredîn Zaza*. Stenbol: Avesta, 2011.
- Receb Dildar "Xwendineke Cihê li ser *Ez ê Yekî Bikujim*". *Kowara W*, jimar 24, 2009.
- Said, Edward, *Şarkiyatçılık*. wer. Berna Ünver, İstanbul: Metis, 1995.
- Uzun, Mehmed, *Ronî mîna evînê Tarî mîna mirinê*. Stenbol: Avesta, 1998.
- Vali, Abbas "Kürtlerin Soykütükleri: Kürt Tarih Yazımında Ulus ve Ulusal Kimliğin İnşası". dnd. *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, wer. Fahriye Adsay-Ümit Aydoğmuş-Sema Kılıç, İstanbul: Avesta, 2005.
- Wellek, René "Karşılaştırmalı Edebiyatın Krizi". wer. Adem Çalıřkan, *Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi*, Yaz 2010.
- Yücel, Müslüm, *Osmanlı-Türk Romanında Kürt İmgesi*. İstanbul: agorakitaplığı, 2011.
- Zeydanlıođlu, Welat "Uygarlaştramadığımız Kürtlerden misiniz? Kemalizm, Oryantalizm ve Kürtler". *Kürt Tarihi*, Sayı-6, Nisan-Mayıs 2013.
- Zeynep, Zeyno, Wekî Qadeke Şidetê, Temsil: Di Romana Tirkan de Kurd, İsyana û Jin-I". *Zend*, wer. Dawûd Rêbiwar, Stenbol, Payız/Sonbahar 2008.

**DI ÇARBAREYA ‘BİR ADA HİKAYESİ’ YA
YAŞAR KEMAL DE REXNEYA DÎROKÊ,
ÇÎROKA KOLEKTÎF Û MUXEYÎLEYA CIVAKÎ**

Erol Köroğlu^{1*}

‘Bir Ada Hikâyesi’ [Çîroka Giravekê] ya Yaşar Kemal, çarbareya romanekê ye ku di 14 salan de hatiye weşandin. Xelekên vê çarbareyê û rêza weşana wan wiha ye: *Fırat Suyu Kan Akıyor Baksana* 1998 [Ava Çemê Feratê Xwîn e], *Karınca'nın Su İçtiği* 2002 [Henûniya Deryayê], *Tanyeri Horozları* 2002 [Dîkên Berbangê], *Çıplak Deniz Çıplak Ada* [Behra Tazî Girava Tazî] 2012.² Di navbera romana sêyem û çarem de 10 sal heye. Gelo cilda çarem, rêzeroman ber bi dawiyê ve biriye an jî çi li cildên pêşî zêde kiriye, divê ev mesele cuda ji vê nîrxandinê bîn nîqaşkirin. Ji xeynî vê, em dikarin çarbareya Bir Ada Hikayesi, wek rêzeromana çîrokeke şernexwaz qebûl bikin. Lê bi vê çarbareyê armanca Yaşar Kemal, ji vê tevlihevtir e. Helwesta rexneyî ya li hember hemû şerên dîrokê li temamê çarbareyê belav bûye, tenê qonaxek e bo destpêka rêwitiyê. Romanûsê ku ji vê qonaxê bi rê dikeve, zêdetir dixwaze tesîra deh salên herdu şerên di navbera 1915 û 1925an de, Şerê Cîhanê yê Yekem û Şerê Rizgariyê, li ser mirovan û hewldana wan a piştî şer, ya ji bo xwerizgarkirina ji travmayên şerî binivîse. Ji bo vê jî, li dijî hemû hikayetên ku van şeran wek mecbûriyet an jî wek qehremaniyekê bide zanîn, tevna romanên xwe li ser ‘çîrokeke dijber’ dihûne.

BAH, çîroka wan kesan e ku ji ber tevliheviya li Anatolyayê mişextî dibin, ji welatê xwe dûr dikevin, li giraveke sembolîk a bi navê ‘Karınca Adası’ [Girava Moriyân] kom dibin û hewl didin ku civakeke avakar û ahengdar pêk bînin. Her

* Asîstan Profesor, Zanîngeha Boğaziçi, Beşa Ziman û Edebiyata Tirkî.

1 Ev xebat, bi zêdekirin û kêmkirina vê nivîsa îngilîzî hatiye amadekirin: “Novel as an Alternative Collective Remembrance Text: Poiesis, Storytelling and Social Thinking in Yaşar Kemal’s *An Island Story Quartet*,” (amd.) Catharina Dufft, dnd. *Turkish Literature and Cultural Memory: “Multiculturalism” as a Literary Theme after 1980*, Wiesbaden, Almanya: Harrassowitz Verlag, 2009: rp. 163-192.

2 Ji vir û pê de di vê makaleyê de ‘*Bir Ada Hikâyesi*’ wek BAH, *Fırat Suyu Kan Akıyor Baksana* FSKAB, *Karınca'nın Su İçtiği* KSİ, *Tanyeri Horozları* TH û *Çıplak Deniz Çıplak Ada* jî wek ÇDÇA dê bîn kurtkirin.

takekes, di vê civakê de bi barê rabirdûyê û nasnameya xwe ya ciyawaz a ku ji ber vê barê rabirdûyê hilgirtiyê, pêwendiyê bi şexsên din yên vê civakê re datîne û ji bo pêkhatina civakê peywira xwe tîne cih. Lewma jî BAH, çîrokek e li ser hêza ragihanê. Her xelesa çarbareyê, ne bi awayekî qalibî û klîşe lê bi awayekî xumam li ser hin qonaxên vê pêwendiya qewî a civakî, zimanî û diyalogê ye. Ji vî alî ve xelesa pêşîn FSKAB çîroka tekoşîna takekesî ye bi tenêtiya xwe û barê rabirdûyê, pêre jî keşfkirina milmilaneya civakî û diyalogê ye di nav vê tekoşînê de. Romana duyem KSÎ cextê lê dike ku diyalog vediguhere civakîbûnê û çîrokên şexsî, derd û kulên kesane ‘aydê her kesî ne û nîşan dide ku çîrokên şexsî û tecrubeyên ji wan çîrokan derketî, çawa bi awayekî erênî tîr bikaranîn. Romana sêyem TH jî, ne tenê vegotina civakîbûnê din e, li hember civakîbûnê neyînî û ezmûnê ku ji xwezayê bi xwe diwelidin, vegotineke erênî ye. Dema mirov ber bi dawiya romana sêyem ve tê, gelek nihênîyên ku dê di romana çarem de bîrê eşkerekirin hene lê di dawiya cilda sêyem de ji nişkê ve ev hevok derdikeve pêş me “[d]ema dikên berbangê bang dan, girava me bû girav, gundê me jî bû gund” (423) û mizgîniyê dide me ku her tişt li kar e û pêvajoya xweş berdewam e. Cilda dawî ya çarbareyê *Çıplak Deniz Çıplak Ada* hewldanek e ji bo eşkerekirina nihênîyan û gehiştina dawiyê lê bi taybetî jî ji ber lezgîniya xwe ji hewldana hersê cildên pêşî dîr dikeve. Ji ber wê jî dê di nav vê cerebeya şîrovekirinê de neyê hesibandin.

Li jêr, ez ê îddia bikim ku BAH, ne tenê bi çîrokên şerxwaz re dikeve nav cengê lê tiştêkî ji wê kûrtir dike. Îddiya min ev e: Yaşar Kemal, bi vê çarbareyê bîranînetneke berfireh a çîroka jêrdestan (madûn) pêşkêş dike ku heta wê demê metnên şerxwaz tenê wek hêmayeke temamker sûd jê wergirtine an jî nexwestine wan bibînin. Tevî ku di versiyona îngilîzî ya vê makaleyê de dê eşkere bê dîtîna mihtacê şîrovekirineke berfirehtir e jî, ez ê li vê derê tenê hewl bidim ku xwezaya çîroka dijber a ku BAH pêşkêşî me dike, bidim ber çîroka serdest, nîqaş û teswîr bikim. Ji bo vê jî ez ê li ser du pirsan hûr bibim: Çîroka van romanên, bi çiyê xwe ji çîroka serdest a serdema xwe cuda ye, çawa, çima cuda dibe? Gelo em dikarin bêjin ku vê çîroka serdest a dijberî xwe xera dike?

Çîroka Dijber a ku bi Helwesta Rexneyî bi Dîrokê re Pêwendiyên Xeternak Saz Dike

Yaşar Kemal jî wek çîroka serdest hin rûdanên eşkere hildibijêre û çîroka xwe li ser wan ava dike lê ya wî ne tenê ji rûdanên qewimî pêk tê ku ji aliyê wê hişmendîya serdest ve nehatine dîtîna, herwiha ji wan metaforîk û edebîtir e. Dema ku Yaşar Kemal, wan tecrûbeyên xwe yên rûdayî diguherîne û bi şêweyê cuda dinivîse, hay ji tevlihevî û pirrêhîliya şiyana bîreweriyê heye û rabirdûyê wisa saz dike. Bi sîdwergirtina dubendiya lêkolînera bîreweriyê Luisa Passerini, em dikarin helwesta bîranîne ya çîroka serdest wek ‘pêwendiyên sazûyî’, helwesta Yaşar Kemal jî wek danîna ‘pêwendiyên xeternak’ bi nav bikin. (Passerini 2003, r. 240) Taybetiyeke

sereke ya çîroka serdest ew e ku danîna têtikiliyên nû di navbera lehzeyên bîreweriyê de piştguh dike; dema pêwendiya sazbiyûî pêk tê, helwesta wê ew e ku dê ev pêwendî her û her wisa bimîne.

Belam Yaşar Kemal, dijberî vê gotara (discourse) netew-dewletê ya li ser rabirdûyê, çîrokeke ciyawaz pêk tîne ku hêmayên wê ji aliyê vê gotara serdest ve hatine piştguhkirin, jê muhîmtîr, dixwaze bibe xwedî zimanekî guncav ji bo pêwendîdanînê, tevî ku ew hêmayên ji hev cuda bikevin nav dubendiyekê jî. Ji bo têgehiştina hewldana Yaşar Kemal, em dikarin ji fikrên feylesofê navdar Friedrich Nietzsche yên li ser dîrokê sûdê wergirin. Nietzsche, bi makaleya xwe ya dirêj a bi navê “Bikaranîna Dîrokê bo Jiyanê û Dezavantajên Wê”, hişmendîya xirab a pêwendiyên li gel dîrokê, ya civaka almanan di sedsala 19emîn de rexne dike, ku ew bi xwe jî tê de jiyaye û li pey dîrokzaniyeke bo jiyane sûdwer, behsa sê helwestên dîrokzaniyê dike: Abîdewî, pabendê serdemên qedîm û rexneyî. (Nietzsche 1997, r. 70) Ez ê li ser helwesta rexneyî hûr bibim, ji ber ku BAH, wek ‘çîrokeke dijber’ di ‘esasê xwe de li ser helwesteke rexneyî û revîzyonîst, li hember dîrokê teşe digre. Nietzsche, bi gotina “Heke mirovek bixwaze jiyana xwe bidomîne, divê xwedî hêz be ku pêwendîya xwe bi perçeyê dîrokê re qut bike, vê pêwendiyê betal bike û car caran vê hêza xwe bi kar bîne” (hb. r. 74) balê dikşîne ser girîngiya vê helwestê. Ji ber ku dîrok, her ji rûdanên mezin û ‘ezamet pêk nayê; tê de tundûtîjî, qelsî û bê’edaletî jî heye. Naxwe divê em vê dîroka ku çavkaniya me ye jî, efû nekin û “şûrê xwe di koka wê de biçikînin”. Ev meseleya çavkaniyê an jî ‘eslê me, dê bike ku ev kirina me hem elzem be hem jî xeternak. Hemî em berhemên nifşê beriya xwe ne, naxwe divê em berhemên dubendî, azwerî û xetayên wan jî bin. Em wan xetayan mehkûm bikin an jî bêjin em ne berpirsyarê wan in, tiştê naguhere; dîsa jî em ê berhemên wan bin. Nietzsche ji vê re dibêje xwezaya yekem. Lê em dikarin hisaba van xetayan bidin, xwezayêke duyem pêk bînin û tesîra wan a neyînî ji holê rakin. Bi vî hawî em dikarin bibin xwedî dîrokeke cudatir ji wê dîrokê ku çavkaniya me ye. Ev karekî zehmet û xeternak e, fikra Nietzsche ew e ku xwezaya duyem her tim ji xwezaya yekem qelstir e: “Pirranî wiha ye: Em qenciyê dizanin lê em ya qenc nakin, ji ber ku em ya qencîr jî dizanin û em nikarin wê jî bikin.” (r. 76) Lê dîsa jî me hêviyek heye û Nietzsche, serî li cexteke diyalektîk dide da ku wan kesên dîrokê bi kar tînin, dilê wan hênik bike: Her xwezaya yekem wextekî xwezayêke duyem bû û xwezaya duyem a serkeftî jî hêdî hêdî dibe xwezaya yekem. (hb. r. 77)

Lêbelê dîroka rexneyî çawa tê tetbîqkirin, ji bo vê rê û rêbaz hene gelo? Rêbazêke gelemperî nîne lê cerebeyên spesîfîk hene. Em dikarin BAHê jî wek cerebeyeke bi vî rengî qebûl bikin. Naxwe em ê pîrsa xwe jî wiha bipîrsin: Bi çarbareya BAHê, Yaşar Kemal, li hember çîroka serdest, li ser dîroka rexneyî xwedî helwesteke çawa ye? Gelo dikare, bo mînak bi rewşa dîrokî ya karakterên xwe li ser xeta û nakokiyên rabirdûyê rexne û xwerexneyan pêk bîne? Belê, di hersê romanên de jî nimûneyên wisa hene. Bo nimûne, karakterê sereke yê romanê Poyraz Musa, şerm dike ku tev

li qirkirina êzdiyan bûye û ev şerma wî, çiqas bê gotin ku wî kes nekuştiye jî, rê li ber vedibe ku her û her tamamê vê pêvajoya dîrokî û di vê pêvajoyê de berpirsariya xwe bide ber tîrên rexneyê.

Mirov dikare wekî vê gelek nimûneyan peyda bike. Lê belê di hersê romanên BAHê de jî rexneya dîrokê ‘esas bi hişmendiya xwe ya mîzahî derdikeve holê ku hem komîk hem jî trajîkomîk e û ber bi dawiyê ve jî têra xwe dibê hicva mîzahî. Di hersê romanên de jî, tevî ku tona sereke ne ev e jî, ji nişkê ve em rastî mîzahê tên. Bo nimûne, di romana yekem de, fermanzarek (qolaxasî) ji artêşê, tê giravê ku ji rûman re bêje, ew ê ber bi Yewnanistanê ve bîn tehcîrkirin. Nivîsa fermî ya di destê xwe de dixwîne lê baş pê dizane ku kes ji gotinên wî fêhm nake. Wê demê, Milto Angeloyê safîk dibîne ku bi baldarî û amadebaşiyê de sekiniye û fermanzar wî hembêz dike, hêviya wî ew e ku ji vê wezîfeya zehmet xwe xilas bike. Wezîfeyê dide Milto û jê re wiha dibêje: “Ha wisa Milto. Ji bîr neke, tu kurê vî xakê yî ku ji berê ber de esker e.” (FSKAB, 74) Li gor gotara serdest, yê ku ji berê ber de wek esker ji dayik bûye, ne xak e, wek nasnameyê etnîk, gelê tirk bi xwe ye. Ne pêkan e ku Rûmek daxilî ve kategoriyê bibe, wê demê taybetiya gel bo xakê tê veguhestin û Miltoyê ku bi rastî jî li wê derê hatiye dinyayê bi saya vê veguhestina taybet, vê payeyê bi dest ve tîne. Li wê derê çêbûye, eskerî jî kiriye helbet, lê ev yek di dema tehcîrkirina Milto de jê re tê gotin ku tê de mîzaheke trajîk xwe dide der.

Lê belê di hersê romanên de jî, beşên ku rexneya dîrokê di hewînîn, bi taybetî jî li ser helwesta dîrokî a abîdewî, bi awayakî nermemîzahî tên rexnekirin. Her ku gotara serdest xwe dispêre wê koka çavkaniyê û ji wan kêliyên qehremaniyê dûr dikeve, zimanê wê yê qehremaniyê jî ber bi mîzahê ve diguhere. Bo nimûne di romana sêyem THyê de, merasîma vekirina navenda hizba CHFyê (niha navê vê hizbê Cumhuriyet Halk Partisi ye) tê qisekirin. Bo vê merasîmê ji Enqerê mebûs hatine û ji wan yê herî mezin û xwedî tecrube, ku albayekî qehremanê şer e, diaxive:

Ey gelê min, gelê min ê qehreman ku dijmin ji Sakarya, İnönü û Afyonê derxistiye, di cenga Dumlupınarê de bi xwîna dijminên xwe tevahiya deştan av daye, Dumlupınar bi cendekên dijminan tijî kiriye, ey gelê min ê birûmet, yê ku li Îzmîra rengîn bermahiyên dijmin rijandiye behrê tu yî, eyy gelê min ê bala, qehremanên kurê qehremanan, ma ne tu yî ji Asyaya serbilind bi rê ketiyî û di rê de li her qonaxê te dewletek ava kiriye heta tu gehiştîyî Anatolyayê, yê ku Bizansê li ber wî çok daye ‘erdê ma ne tu yî? Yê ku 900 salan li vê dinyaya qerace hukm kiriye, ma ne tu yî? Yê ku Atilla, Cengîz Xan û Tîmûr mezin kiriye û berdaye ser dinyayê, bi tîr û kevan û şûr û rimên xwe dinya hejandiye, çiya û deşt û derya tev lerizandiye, ma ne tu yî? (118)

Niwaja (nutuq) albay bê qalîte ye û tevî vê ji aliyê teknîkî ve pîrsgirêk heye di nav guhdaran de. Serokê navçeyê yê CHFê Kavlakzade Hacı Remzi, ev girse ji gund û mezrayên derdorê berhev kiriye aniye, bi ser de jî ‘edetê “lihev xistina destan” hînî wan kiriye. Di axaftinê de yek li ber maseyê sekiniye, di dest de alek heye û ji bo destpêkirina çepikan, ew ê alê bilind bike, îşaretê bide girseyê. Herwisa, alê bilind dike û çepik dest pê dike. Lê Kavlakzade hînî wan nekiriye ku çepikê biqedînin. Ji

ber wê dengê çepikan bi tu awayî nasekine. Her ku Kavlakzade ji bo sekinandina wan alê li ba dike, çepik berztir dibin. Axir, ber bi ‘esmanan ve guleyek tê berdand û çepik wisa tîn sekinandin.

Wek ‘Çîroka Me’ BAH

Gelo ji bo helwesta rexneyî bo dîrokê têrê dike ku mirov tenê komîkbûna gotara serdest pêşkêş bike? Rexneyeke bi vî rengî, xîmên gotara serdest pûç bike û wê bihilweşîne jî dê yekalî bimîne. Jixwe helwesta rexneyî ya çarbareyê jî di asoyeke berfirehtir a çîrokê de watedartir dibe. Ev yek, tenê bi pêkanîna civakîbûneke nû li Girava Moriyan pêkan e ku gelê wê û gelê derdorê yê nêzîkî wan bi tecrubeyên cuda yên piştî şer dişibin hev lê ji aliyê gelek hûrgiliyan ve tecrubeyên wan ji hev cuda ne jî. Di BAHê de pêkanîna vê civaka nû, bi saya parvekirina rabirdûyên travmatîk ên karakterên romanê û avakirina ‘niha’yeke erênî berev dahatûyê ve çêdibe. Li vê derê, em dibînin ku cîhana çîrokî ya BAHê, bi tevna çîrokeke hevpar ku “dema niha pêk tîne û berê wê li dahatûyê ye” li ser çîrokeke rabirdûyê, bîreweriyeke kolektîf, nasname û ragihanê tê avakirin.

Bi rêkeftina ji van gotinan, gelo em dikarin bêjin ku BAH, bi helwesta xwe ya rexneyî, çîroka xwe ya kolektîf wek alternatîf ava dike û helwesta wê çîroka serdest betal dike? Yaşar Kemal, navê rêzeromana xwe ‘Çîroka Giravekê’ daniye û bi karakterên ku tîn û diçin, vê çîrokê li ser serpêhatiyên şexsî yên wan karakterên “giravî” û çîrokên wan ên niha vedibêje. Naxwe BAH, “çîroka me” ye; stratejiya sereke ya vegotinê, bikereke kolektîf a qisekirinê (*agent*) pêk tîne. Li gor teorîsyenê vegotinzaniyê Uri Margolinê Îsraîlî, heke di çîrokê de rola karakterê sereke ‘aydê bikereke kolektîf be, tiştê li ber me çîrokeke kolektîf e. Lê belê hemû girse nabin bikerên kolektîf. Ji bo ku çîroka kolektîf derkeve meydanê, divê komek bi navê “em” hebe, endamên wê xwedî armancên hevpar bin û hewl bidin ku bi hev re bigehijin wan armancên komê. An jî divê cema‘eteke xwedî hesta nasnameya hevpar be. (Margolin 200, r. 591)

Margolin herwiha niqaş dike ka em ê çawa fêhm bikin ku metna li ber me ‘çîroka me’ ye. Ji bo vê nîşaneyê herî muhîm, perspektîfa berev karakterên çîrokê ye. Çîrokeke xwedî hişmendiya ‘em’ê, bi reaksiyonên karakterên xwe ve takekesên taybet û tekane nahewîne, li şûna wê, bi rolên civakî yên endamên komekê watedar dibe. Di BAHê de jî pirrî caran ev yek heye. BAH, çîroka bertekên wan kesan e ku bi cudahiyan xwe yên şexsî dihesin ku ew mecbûr in kolektîvîteyekê pêk bînin. Ev çarbare çîrokên xwe jî li ser vê hişmendiya ava dike. Lê ev hemû bertek ne wek hev in. Ji ber ku çalakîya zêhna her endamê komê tekane û cuda ye; her yek ji wan cuda difikire, cuda hest dike û cuda têdigehe. Li ser vê yekê, Margolin dibêje ku di çîrokeke ‘me’ de, takekes, li hember bûyer an jî rewşekê, bi hevpar-bertekekê tevnerin, li şûna wê *heman-bertekekê* (*coaction*) nîşan didin. (hb. r. 605) Hevpar-bertek, encax dema çalakîyên zêhnî yên şexsan, bo bergeheke zimanî bîn veguhestin

derdikeve holê û ev bergêh jî di dawîya pêvajoya axaftin-nîqaşkirinê de dibe ku pêk bê. Herwisa, ji xeynî çîrokên şexsî yê rabirdûyê, şayesandina tişt û motîfên ‘aydê vê demê ne tê de, pîrraniya BAHê li ser vegotina vê pêvajoyê ye. Rewşek derdikeve holê, endamên civakê vê rewşê wek rewşeke şexsî qebûl dikin, li ser vê fikrên xwe tînin ziman, fikr li nav hev dikevin, pev diçin, pev dikelijin û dibin sersebebê berteka hevpar. Ji vî alî ve BAH, derheqê vegotina bikera kolektîf a bi navê ‘gel/milet’ de, ku bi awayekî telepatîk her kes, her dem wek hev difikire, diaxive û tevdigere, ji çîroka serdest jî zêde zêde realîsttir e.

Metna Bibîrxistina Kolektîf û Dualîzma Karîger

Piştî vê nîqaşê, em dikarin bêjin ku BAH, li hember reduksiyonîstbûna kolektîf a çîroka serdest, çîrokeke cuda û kolektîf pêk tîne û bi vî hawî li hember dîrokê jî dibe xwedî helwesteke rexneyî. Lê gotina vê ji bo çareserkirina pîrsgirêka me ne bes e. Gava me îddia kir ku BAH, çîroka cima‘etekê ye, divê em eşkere bikin ka kartêkeriya vê di romanên de çawa pêk hatiye. Ji bo vê jî divê em bala xwe bidin meseleya ‘bîreweriya kolektîf’.

Têgeha bîreweriya kolektîf, li gel civaknasîyê derketiye meydanê. Ji bo vê jî rola Durkheim, pîr muhîm e. Durkheim, ne tenê bîreweriya kolektîf, herwiha hafîzeyê bi xwe jî di nav binyada civakî de binecih dike û difikire ku ev binyad, amrazên têgehî pêşkêşî şexsan dike ku rabirdûyê binin bîra xwe. (Winter û Sivan, 1999, r. 20) Şagirdê wî Halbwachs, ku îro navê wî li gel têgeha bîreweriya kolektîf tê zikirkirin, ev fikra wî ber bi lûtkeyê ve hilkêşa. Halbwachs dibêje ku, kesek bi komek an komên civakî, an jî di nav bizaveke fikrî ya kolektîf de, dikare xwe bîne bîra xwe. Her li ser vê fikrê, watedariya bibîrxistina tiştêkî, bi saya awirên wê koma civakî derdikeve holê û tê bîra me ku em wê bûyerê ji çavê wê komê dibînin. Ji ber vê jî bîreweriya kolektîf, matrîsa bîreweriyên şexsî yê di nav civakê de ye. Halbwachs, ebeden bîreweriyê wek tiştêkî ji takekesan cuda qebûl nake lê ev bîrewerî hetmen (teqez) ne şexsî ye jî. (hb. ji bo fikrên Halbwachs yê li ser bîreweriya kolektîf, bnr. Halbwachs, 1992)

Ev nêzîkkewtin rast e û ne dûrî aqîlan e lê xuya ye ku rola takekesî zêde paşguh dike. Jixwe lêkolînerên vê mijarê, gelek fikrên jev cuda pêşkêş kirine. Ji van fikrên li ser bîreweriya kolektîf, duduyên muhîm, yê Winter û Sivan in, ku têra xwe xêra wan bi vê mijarê heye. Bi taybetî jî têgeha *homo actans* dibe ku alîkariya me bike ji bo qenctêgehiştina BAHê. *Homo actans*, di navbera du cure insanan de gehînekek e; *Homo psychologicus*, ku insanê xwedî bîreweriyê ye taybet e û *homo sociologicus*, ku ew jî insanê xwedî bîreweriya civakî ye. Taybetiya wî ew e ku *actans* (çalak) e; ango aksiyonel e. Gelek caran ew, çalakiya bibîrxistinê, nek bi fermandayîna di nav hiyerarşiyekê de, lê wek beşdarê civakekê pêk tîne. (hb. r. 10)

Ev kartêkeriya Winter û Sivan, cextê li ser dînamîzma bibîrxistinê dike. James V. Wertsch, di kitêba xwe *Voices of Collective Remembering* de [Dengên Bibîrxistina Kolektîf] li gel dînamîzma xwe ya hevterîb bi têgeha *homo actans*, peyva “hafîze”yê

red dike û teklîf dike ku em li şûna wê “bibîrxistin”ê bi cih bikin. “Ji ber ku temamê rasterêbûnê, bi awayekî micid cextê li ser pêvajoyê an jî çalakiyê dike, ez li şûna têgeha ‘hafize’yê, ‘bibîrxistin’ê tercîh dikim. Li şûna ku em behsa bîranînê ‘aydê xwe bikin, em cextê li ser bibîrxistinê dikin ku ew jî kirineke me ye.” (Wertsch 2002, r. 17) Wertsch, êdî meseleyê wek “bibîrxistina kolektîf” bi nav dike li gel cextlêkirina dînamîzm û guherbariya wê û vê pêvajoyê jî wek “belavkirina berdest bo reqabetê” pênase dike. Li vir, temsîla rabirdûyê, dibe ku wek reqabet û qayîşkêşanê derkeve meydanê. (hb. r. 23-24) Belam ‘esas kartêkeriya ciyawaz a Wertsch, bi têgeha “metnên bibîrxistina kolektîf” berbiçavtir dibe. Ji bo wî watedartir e ku bifikire; temsîla rabirdûyê ya vê komê bi çavkaniyên hevpar ên metnî tînan afirandin, ne ku bibîrxistinê wek pêwendiyê xef di navbera endamên komê de pênase dike. (hb. r. 26)

Bi xêra vê fikra Wertsch, em dikarin kitêbên fermî yênan dîsa tarîxê, niwaj/nutqên rayedarên dewlêtiyê yênan di cejnên netewî û yadî salan de û hwd, wek metnên bibîrxistina kolektîf binirxînin. ‘Esas, BAH jî metneke wisa ye. Naxwe ferqa wan çi ye? Ji bo zelalkirina vê pirsê, dîsa Wertsch, xwe digehîne hawara me: Bakhtin, di kitêba xwe ya bi navê *The Dialogic Imagination* de [Muxeyîleya Diyalojîk] têgehên wek “desthilatdarane” (audboritative) û “jixweve qanehker” (internally persuasive) dirêje ber çerxa rexneyê û ferqa herdu gotaran nîşan dide. (Bnr. Bakhtin 1981 r. 342-348) Li gor Bakhtin, gotara dîni, siyasî û exlaqîfiroşî ya desthilatdarane ku ‘aydê bavan, mezinan an jî mamosteyan e, dixwaze em wê qebûl bikin û malê xwe bihesibînin. Wê demê du rê li ber me hene: An em ê bi temamî qebûl bikin an jî ji binî ve red bikin. Ji bo vê, bazarî nayê kirin. Lê belê di gotara ‘jixweve qanehker’ de zordayîna hiyerarşiyê wisa nîne. Axêver tê gazîkirin bo sazkirina diyalogê li gel kesên din, ji ber ku “gotina ku jixweve qanehker e, nîvî ‘aydê me ye nîvî jî ‘aydê insanekî din”. Lewma jî gotina jixweve qanehker, destpêka bersivê ye ku hem di nav gotinên berî xwe de cih digre, hem jî dê paşê wan biguherîne û bibe “amrazeke fikirîne”. (Wertsch 2002, r. 118-119)

Dîsa jî bi alîkariya vê çarçoveya têgehî, li hember wan metnên kolektîf ên çîroka serdest, em BAHê wek metneke erênî tesdîq bikin jî, ev yek tîrê nake ku em xwe bigehînin hizreke bêqûsûr. Ji ber ku BAH jî, metnên bibîrxistinê yênan li hember wan disekine jî, melûlê qusûrekê ne. Qusûreke ji tebîeta bibîrxistinê bi xwe: Brevajîkirin (distortion). Lêkolînerê navdar ê bîreweriyê Michael Schudson, vê meselê wiha t’erîf dike:

Brevajîkirin, mecbûrî ye. Bîr/hafize bi xwe brevajîkirin e, ji ber ku bi her halê xwe û bi awayekî misoger, ew hilbijêr e. Celebeke dîtinê, herwa nedîtinek; celebeke bibîrxistinê jî jibîrkirinek e. Heke hafize, celebeke qeydiyê bûya, me dikarî em behsa hafizeyê “rast” bikin. Lê hafize, pêvajoyê kod-kirina enformasyonê, veşartin û bi awayekî stratejîk bibîrxistin û paşdeanîna wê ye. Di her qonaxa vê pêvajoyê de jî tesîrên civakî, derûnî û tarîxî hene. (Schudson 1995, s. 348)

Winter û Sivan jî li ser vê meselê, wek Schudson difikirin. Ew jî ji fikra hilbijêrbûna bibîrxistinê bi rê dikevin û pêş de diçin. Îddia dikin ku hilbijêriya hafizeyê, berî kod-

kirina rûdanê, dibe sebebê berevajîkirina wê. Şûnpêyên tecrubeyê di hafizeyê de, bi şert û mercên bêhempa jî, bi temamî nabe kopiyeke tecrubeyê bi xwe. Bo nimûne, rêzerûdanek an jî gelek kes, dibe ku bên kêmkirin û wek rûdanekê û kesekî bên bibîrxistin, an jî dibe ku cext li ser hin taybetiyên tecrubeyê bê kirin. Tecrube, gava ber bi hafizeyê ve tê şandin, careke din tê şîrovekirin. Wê demê jî “şema û senaryo” (*schemata and scripts*) xwedan tesîr in. Bo nimûne, şexs gava tecrubeyekê li hafizeya xwe qeyd dike, ihtimal heye ku şopa wê tecrubeyê wek “va çîroka jiyana min ev e”, bi şemayên takekesî an jî wek “her kes dijminê tirkan e”, bi şemayên li ser çanda xwe, şîrove dike. (Winter û Sivan 1999, r. 13)

Ji aliyê xwe ve Wertsch jî, berevajîkirinê wek perçeyek ji pêvajoya bibîrxistinê qebûl dike û li ser du karîgeriyên wê, vê fikra xwe eşkere dike. Li gor fikra Wertsch, ji aliyekî ve em hafizeyê li ser pêşkêşkirina rabirdûyê, bi awayekî rast û durist, dinirxînin û bi vî hawî jî em wê didin ber “pîvana rastiyê” (accuracy criterion). Ji aliyekî ve jî em jê dixwazin ku hafizeya me “rabirdûyeke kêrhatî” (a usable past) pêşkêşî me bike, ango rûdan û karakteran bîne bîra me ku xizmeta dema niha, armanca me ya îroyîn bikin. Wê demê hafize mecbûr e ku herdu lazimiyên me; hem temsîla rast ya rabirdûyê hem jî rabirdûyeke kêrhatî, pêk bîne. Wertsch vê rewşê, bi têgeha Lotman ya bi navê “dualîzma karîger rave dike. Wek ku ev herdu daxwazên me nakokiyekê pêk tînin, lê dîsa jî bi awayekî hevdemî em dixwazin pêvajoya bibîrxistinê hem rabirdûyê rast û durist temsîl bike hem jî rabirdûyeke kêrhatî ji me re peyda bike ku em nasnameyên takekesî û komelayetî li ser wê ava bikin. (Wertsch 2002, r. 31)

Lêgerîna Hilatinê ya Şeniyên Giravê li gel Roja Nû

Em dikarin bêjin ku çîroka BAHê, li gor wê dualîzma karîger ku Wertsch behsê dike, bi rê ve diçe; hem dixwaze rabirdûyê bi awayekî rast û durist temsîl bike hem jî dixwaze rabirdûyeke kêrhatî pêşkêşî me bike. Lê pirseke muhîm heye ku divê tam li vê derê em bipirsin: Gelo ev çîroka ku tenê li ser vegotin û texeyyula Yaşar Kemal, ango tekane afirînerê metnê saz bûye, ji aliyê temsîla rastî û kêrhatîbûna rabirdûyê ve, helwesta çîrokeke yekpare pêşkêş dike? Ango BAH, helwesta xwe li ser wê meseleya ku qal dike, perçe perçe pêşkêş dike an hemû perçeyan îdare dike û çîrokeke yekpare jê derdixe?

Fikra min ew e ku karakterekî dekoratîf ê rêzeromanê, dikare fersendekê bide me, ji bo têgehiştin û manepêdayîna yekpare. Ew karakter dengbêjê kurd Uso ye; di romana KSÎ de bi malbata xwe re tê û li giravê binecih dibe. Piştî ku ev karakter, Uso, dikeve romanê, yek dirêj û yek jî kurt, du çîrokan dibêje. Destana duyem a dirêj ‘Kilama Feqiyê Teyran’ e. Çîrokeke pîrr xweş e. Di navbera rûpelên 335 û 374an de ye. Erê, çîrokeke pîrr xweş e lê dîsa jî mirov ji xwe dipirse: “Aya ev kilama dirêj çima di vê romanê de cih digre?” Feqiyê Teyran ê vê kilamê, kurê mîrekî kurdan e. Rojekê, ji dengê dengbêjekî, çîroka teyrekî guhdarî dike û bi rê dikeve ku wî teyrî bibîne. Kêmkiran dengê wî teyrî bihîstiye û tu kesî jî ew nedîtiye. Tekane karê

Feqiyê Teyran dibe peydakirina wî teyrî. Bi salan lê digere û axirî wî dibîne. Gava teyrî dibîne, ji ser hişê xwe diçe. Dema hişyar dibe, êdî dibe dengbêj û destanbêjek. Li her derê digere, çîroka xwe dibêje û pê dihesa ku êdî ew dikare li bilûr û sazê jî bide. Piştî wê jî navûdengê wî li temamê bajarên kurdan belav dibe, her kes rêz û hurmetê nîşanî wî dide. Kal dibe, vedigere mîrektiya babê xwe û li wê derê jî dîsa destanan dibêje, heta xilasiya ‘umrê xwe. Di mirina wî de, ew teyrê ku lê geriyabû û dîtîbû jî tê de, hemû teyr tên, li ‘esmanan difirin û xatirê xwe jê dixwazin.

Di BAHê de, ne tenê di vê beşa Feqiyê Teyran de, herwiha di beşên din de jî karakter dikevin pêy wî teyrî. Di romana FSKABYê de dîsa em rastî vî teyrî tên. Lê vê carê çîrok ne di nav çîrokeke dî de ye; Poyraz bi ‘eşîreke ‘ereb re dikeve nav pevçûnekê, birîndar dibe, paşê xwe dispêre ber bextê Mîr Selaheddîn û ev çîrok jî di wê dema aramiyê de tê gotin. Rojekê, serê sibê Mîr û Poyraz derdikevin geştê, dengê teyrekî dibihîsin. Mîr ji Poyraz re dibêje, gelek kesan bi lêgerîna wî teyrî umrê xwe pûç kirine lê kesî ew nedîtiye. Poyraz, wê demê pê dihesa ku ew jî dixwaze li wê derê be û li wî teyrî bigere lê divê ji ber ‘eşîra xwîniyên xwe bireve.

Lêgerîna teyrî, di romana KSÛyê de heta Kilama Feqiyê Teyran wisa dimîne. Di romana yekem de Poyraz, vê daxwaza lêgerînê talox dike (lê di romana çarem de jî xuya nake, ango ev niyeta wî ya lêgerînê tenê wek daxwaziyekê dimîne) û armanca lêgerîna wî naçe serî. Di KSÛyê de em yekî dibînin ku vê daxwazê pêk tîne; ew kes Feqiyê Teyran e. Bi rastî jî gava lêgerîn digehe encamê, teyr tê dîtin –û tenê carekê tê dîtin, ne ku kesek dibe xwediyê wî teyrî- hem derdora çîrokbêj bi hêza vegotina bedewî û qencyîê tê rapêçan hem jî hazîrên civatê ku guhdarî li çîrokbêjê kamil dikin, nesîbê xwe ji qencî û başiya gotinên wî werdigirin. Ne di jiyana rastîn a BAHê de lê di çîrokekê de ew armanca lêgerînê diçe serî. Naxwe çîroka Feqiyê Teyran, pêşî ji bo şênîyên giravê ku guhdarên çîrokê ne û paşê jî ji bo me xwîneran, li ser “lêgerîna qencyîê” û çîroka me ya kolektîf ya ku li gor rabirdûyê, îroya me û dahatûya me, modelekê pêk tîne. Li ser vê xeta têgehiştinê, çîroka Feqiyê Teyran, navenda BAHê ye. Heçko ji me re wiha dibêje: “Ji vê derê li rabirdû, roja îro û dahatûya xwe temaşe bike”; heçko dibêje; “bi awirên qencî û başiyê, bi afirîneriya çîrokê temaşe bike, çîroka ku dewlemendiya vegotinê pêk tîne, çîroka ku cîhanan ava û abad dike.” Wê demê em dikarin bibexşînin û bîn bexşandin.

Meseleya bexşandinê, di romana FSKABYê de, dîsa li ser gotinên Mîr Selaheddîn tê qisetkirin. Mîr, derheqê qetliyama Êzdiyan de, cextê li ser berpirsariya her kesî dike: “Insanek tenê çiqas êşê bikêşe, hemû insan jî ewqas êşê dikêşin. Ma ne bi kuştina insanekî temamê insaniyetê tê kuştin?” (245) Lê dema behsa van tiştan dike, dibîne ku Poyraz, ji ber sûcê xwe yê di qetliyamê de bi van gotinan diêşe û wê demê deriyekî nû li ber wî vedike:

Go, “Xeman nexwe, em benîadem in, ji roja ewil heta roja mirinê tiştêk namîne ku neyê serê me. Lê vê bizane birako, insan her roj wek roja jidayikbûna xwe, ter û taze, careke dî tê dinyayê, bi her roja ku hiltê, careke dî ew jî hiltê” Poyraz xwe negirt û pirsî, “Ji dil, hiltê?”

Mîr gotê, “Bes li gel her roja nû em vê bixwazin.” Gotê, “Em ê xwe ji hemû sûc û guneh û xirabiyan bişon, pak û paqij bin. *Insan gava ruhê xwe jê bişo*, dikare xwe bibexşîne. Wê demê jî insan careke dî tê dinyayê, pak û paqij dibe.” (248-249. Cexta hevokê ‘aydê min e.)

Gotina Mîr, “insan gava ruhê xwe jê bişo” mifteya lêgerîna motîfa teyrî jî dide dest. ‘Esas Poyraz bi hatina xwe ya giravê û pêşengiya li civaka wê derê, dikeve pêy wî teyrî; ango dikeve pêy lêgerîna şuştina ruhê xwe ji wan qirêjiyan. Lê tişta ku ruhê wî dişo, pak û paqij dike, ne dîtina teyrî, maweya lêgerîn û pêdeçûna teyrî bi xwe ye. Poyraz jî, karakterên dî yên giravê jî, hewl didin ku xwe ji qirêjiyên rabirdûya xwe bişon da ku hem ji bo niha hem ji bo dahatûyê wê bikin çavkaniya jiyanê ronî û watedar. Ev yek, hewldana “hilatîna li gel roja nû ye” ji bo şênîyên giravê.

Barê dikeve ser milê dengbêj/çîrokbêj, di lêgerîna şênîyên giravê de feyzek û rênîşandayînek e ji bo pêkanîn û pêşkêşkirina “metneke kolektîf a bibîrxistinê”. Di *Tanyeri Horozlari* de, Uso destanê dî dibêje. Ev destan, şer û şervanan dide ber tîrên rexneyê. Gava destanê tamam dike, şahî û keyfxweşiya Uso, bê payan e: “Gava roj hilat, keyfxweşiya wî zêdetir bû. Wî kilama xwe ji teyr û tiyûran, kurm û kêzikan, şev û rojan, deşt û çîyan re gotibû, ji bayê hênîk û kulîlka bêhnxeş re gotibû. Dê rojekê ji insanan re jî bêje, insanên ku meydanan devedev tijî dikin, dê ji wan re bêje xirabî û zilma ku insan li insanan dikin. Ê ew girseyên li meydanan, wek wî, ku îşev pîrr şad û bextewar e, dê bextewar bibin.” (254) Lê Uso tişteki jî bîr dike. Şênîyên giravê tevan guh dane wî, Cemîlê Beytar jî gotinên wî yên kurdî wergerandine tirkî, heta berdestê sibê xew neketiye çavê zarokan. Gava jina wî vê ji Uso re dibêje, keyfxweşî û bextewariya wî zêdetir dibe û wê demê baş pê bawer dibe ku bi berbelavbûna vê destanê, dê şer bi tamamî xilas bibin.

Dîtina Dinyayê bi Awirên Çîrokbêjekî

Ji bo xwînerên bedbîn, ev baweriya Uso belkî pûç be. Lê di romanê de ne tenê Uso, her kes ji vê bawer dike. Kes nabêje ev xewn û xeyalên “nivîskarekî ruhzarok” in. Tenê rûpeleke hersê romanên çarbareyê jî li dijî vê baweriyê nîne. Heçko BAH bi tamamî, ji bo vegotina vê baweriyê hatiye nivîsîn. Aha li vê derê, em dikarin bifikirin ku nivîskar li ser karakterê romanê, xwe dinivîse. Uso, Yaşar Kemal e û BAH jî destana wî ya l’enetkerê şerî ye û ‘ihtimala derketina şerê ku qal dike jî nahêle. Êdî ne muhîm e ka em kêm yan zêde li gel vê fikrê ne an na. BAH, bi forma romanê hatiye sazîkirin û wek model an jî stratejiya çîrokkirinê jî destan, kilam û çîrokkên folklorîk ji xwe re bijartine. Gava em BAHê wek performansa çîrokbêjekî li gel hazir û guhdarên wî, an jî çîroka çîrokbêjiya gelêrî qebûl bikin, wê demê hemû nîqaş û kêşeyên di vê xebatê de me serê xwe pê êşandiye, xasma jî taybetiyên qisetkirina romanê, tam cihê xwe digrin.

Erê, lê Yaşar Kemal, me, yên ku li cîhanê modern dijîn, çima ewqas dide zorê? Heçko em ê rûnî ji xwe re rûpelên romanekê biqulipînin lê piştî cehd û xebateke

giran, me tédigehîne ku romaneke bi dirûvê qisetên çîrokbêjîyê an jî çîrokbêjîyeke bi dirûvê romanekê hatî sazîkirin li ber me ye; çima gelo? Li paşxaneyê wê, armanceke serwextane heye an ev yek her tenê keyfîyeta nivîskarekî ye? Bi min armanceke serwextane heye û ji bo nîşandayîna wê jî em dikarin sûtê ji teorîsyenekî edebiyatê wergirin ku gelek caran behsa avantajên çîrokbêjîyê kiriyê. Ev teorîsyen Walter Benjamin e; metna wî ya ku dê alîkariya me bike jî gotara bi navê “Çîrokbêj” e. (bnr. Benjamin 1969, r. 83-109) Teorîsyenê marksîst Benjamin, ev gotara xwe sala 1936an nivîsiye û wê demê li Almaniyê Nazîzm desthilatdar e. Gotar, li ser çîrokbêjî û tunebûna şiyana çîrokbêjîyê wek lawjeyêke dilsoj dest pê dike. Benjamin li ber vê tunebûnê dikeve, ji ber ku li gor wî, çîrokbêjî, transferkirina rasterast a tecrubeyan e. (hb. r. 83-84)

Benjamin, ji ber tunebûna çîrokbêjîyê, kapîtalîzma wê demê û rasyonelîzasyona ku ew pêk aniye sûcdar dike. Lê di vê tunebûnê de du celeb sersebebên eşkere hene: Yek ji wan, derketina romanê ye. Roman, şiklê edebî yê tenêtiyê ye. Ji aliyê nivîskarekî tenê ve tê nivîsîn û piştî ku bû kitêb jî dîsa ji aliyê xwînerên xwe ve bi tenêtiyêke mîna wê tê xwendin. Lê belê qisekirina çîrokekê, di nav atmosfereke performansî de çîrokbêjî û guhdaran tîne hemberî hev. Çîrokbêj, gotinên xwe li ser tecrubeya xwe û tecrubeyên guhdaran saz dike, di performansê qisekirinê de vê yekê dike tecrubeya guhdaran jî. (hb. r. 91) Ji ber ku guhdar dê gotinên wî transferî hafîzeyê ya xwe bikin û vê tecrubeyê bigehînin kesên di. Bi vî hawî tecrubeya wê qisetê, dê afirîneriyekê pêk bîne ku şexsan û nîşan bi pêvajoyêke bibîrxistina kolektîf bi hev ve girê dide. ‘Eynî wekî li jor me behsê kir; Uso dixwaze destana wî gotî, navdar û berbelav bibe.

Sersebebê duyem a tunebûna çîrokbêjîyê, enformasyon e. Ji çapemeniyê ber bi mejîyê me ve, barana enformasyonê dibare û li me nayê nîşandayîna ka em ê wan têxin kîjan qaliban, an jî ji ber lezgîniya wê enformasyonê em bi xwe nikarin rêyekê jê re peyda bikin. Lê çerxa qisekirina çîrokekê, berevajî digere: “Tiştên derasayî, tiştên ku bawerî pê nabe, bi hessasî tîne pevgirêdan lê pêwendîya psikolojîk a wan rûdanan, bi xwîneran bi darê zorê nayê dayîn. Destûr heye ku xwîner, wan gotinan çawa fêm dike wisa şîrove bike û berebere rê lê tê xweşkirin ku çîrok xwe bigehîne pirrhalîyekê, jixwe ew halên zêde û cîyawaz jî di enformasyonê de nînin. (hb. r. 89)

Benjamin, di dawîya wê gotara xwe de, ku ewqas berfireh û kûr e em nikarin hemû hûrguliyên wê li vê derê nîqaş bikin, cextê li ser dike ku çîrokbêjî/qisekirina çîrokan ne huner e lê zena’etek e. Kûzkerê (cêrçêker) çawa destê xwe bi hêminî bide kûzê, qisekerê çîrokê jî wisa destê xwe dide çîrokê. Jixwe di performansê çîrokbêjîyê de, erê hemû beden tesîrkarê vegotina çîrokê ye lê bi taybetî dest, m’aneya peyvan dewlemendtir dikin.

Ne ku Benjamin bi lorandîna ji bo qisekeriya tunebûyî dibêje “De ka, êdî em romanên nenivîsîn, em berê xwe bidin çîrokan berê, em wan bêjin”. Simonetta Falasca Zamponi, di makaleyêke xwe de dahûrînekê li ser dewra faşîst a Îtalyayê dike

û bi bîr tîne ku Mussolini, bi projeyeke hafizeyê dixwest mîtosê bal bi modernê ve bîne. Û Zamponî di heman makaleyê de cextê li ser dike ku Benjamin behsa vegera li berê nake. ‘Esas Benjamin dixwaze nîşan bide ku ew aûra/haleya ku bi çîrokbêjiyê derdikeve meydanê, dibe ku ji aliyê rejîmên totalîter ve bi şiklekî seqet li gel çîroka modern bên pevkelijandin û ev sentez jî bo armancên xirab bê ‘emilandin. (Zamponi 2003, r. 45) Benjamin nîşanî me dide ku ew haleya qisekeriya çîrokê jî xwedî tarîxekê ye.

Siyasetmedarê totalîter ku xwe wek çîrokbêjekî dide nasîn, an jî yê ku bîranînên erênî yên wê rabirdûyê talan dike, xeternak e. Lê belê mirov dikare wê pêvajoya Benjamin behsê dike, ji xwe re bike mal û sermiyan. Siyasetzan û hevala Benjamin, Hannah Arendt, dema teoriya xwe ya siyasî ava dike, vê yekê diceribîne. Arendt, qisekirina çîrokekê ji bo pênasikirina “helwesta rexneyî ya ji tecrubeyê pêkhatî” bi kar tîne. (Disch 199, r. 666) Fikra Arendt jî, ji kaniya fikrên Benjamin avê vedixwe:

“Çîrokbêjekî xwedîşiyar, ne ku *tiştêkê* nîşanî xwînerên xwe dide, wan hîn dike ku ew jî *wek* wî binêrin/bibînin. Bi vî hawî, hem tecrubeya dîtina ji perspektîfên ciyawaz û ‘sermestker’ pêşkêşî wan dike, hem barê berpirsyariya rexnekirin û pêkanîna şiroveyeke xweser li ser milê wan bar dike.” (hb. r. 687 Cextên hevokê ‘aydê çavkaniyê bi xwe ne.)

Ji vî alî ve, ji bo Arendt, qisekirina çîrokê serê pêşî ji şahidî (testimonial) û nimûnekirinê (illustration) cuda ye. Di şahidiyê de súbjektîfî li pêş e, qiseker wiha dibêje; “Va ez dinyayê wiha dibînim”. Lê nimûnekirin razber e; hewl dide ku bi awayekî anektodal/tinazî, piştevaniya teoriyekê bike, wate, ne ji aliyê tecrubeyê ve lê ji aliyê çarçoveyê razber ve tê diyarkirin. ‘Esas di paşxaneyê qisekirina çîrokekê de ev pîrseteklîf heye: “Heke te ji vî alî ve dinya bidîta, gelo dê ev dinya *bi te* çawa xuya bikira?” (hb.) Lewma jî çîrok, ji ber ku hem dudil (ambiguous) hem watedar (meaningful) e, muhîm dibe. Helwesteke rexneyî ya ku pala xwe bide vê fikrê, ne ku konsensus an jî teqeziyê, lê pirjimarî (plurality) û xwerexnekirinê dê derxe pêş. (hb. r. 688)

Efsûn, Muxeyîle û Tarîxa Poietîk

Naxwe em dikarin vê îddia bikin: Di vegotina çîrokê de tevna rûdanan hema bêje dê ji serî de diyar be. Tekane armanc ne ew e ku mereqa me zêde bike. Lê ji ber kûrahiya awirvedana xwe jî xwedî bingeheke vekirî ye. Hûn çiqas bixwazin, dikarin çîrokê berfirehtir û dirêjtir bikin. Jale Parla, di makaleyêke xwe de lêkolînekê li ser eksantrîkên sêbareya *Dağın Öte Yüzü* [Aliyê Dî yê Çiyê] dike û fikrekê derbarê vê de pêşkêş dike: “Heke xwîner bikare ji awirên kesên li çeperê li rûdanên navendî binêre û daxilî wan rûdanan bibe, bi ya min dê du tiştên herî muhîm ên hunera Yaşar Kemal bizanin: 1) Efsûna mirovayetiye ya ku em çiqas têbigehin jî zêdetir dibe, 2) hêza mirovan a xweragirtina li hemberî neheqî, hejarî, êş û êşkencê, ji serekaniya vê efsûnê der dibe. (Parla 2006, r. 77)

Ji bo vê em dikarin ji kitêba *Yaşar Kemal Kendini Anlatıyor* [Yaşar Kemal Behsa Xwe Dike], nimûneyeke xweş û eşkere bidin. Alain Bosquet, heçko piştgiriya gotara Benjamin bike, ji Yaşar Kemal re wiha dibêje: “Em difikirin ku li ‘Rojava’ (mebest Ewropa ye) ji zarokatîyê ve efsûn û muxeyîle winda dibe, li şûna wan jî aqil û rasyonâlîte cihê xwe digre.” Lê Yaşar Kemal, bersiveke ecêb dide wî:

Ez bawer nakim ku li rojava efsûn û muxeyîle winda dibe. Ji bo cenabê te rêz û hurmeta min heye, lê gava tu wisa hişkehişk diaxivî, ez dilteng dibim. Gava efsûn û muxeyîle winda bibe, aliyê me yê herî muhîm, insanîyeta me hildiweşe, nexweşî dest pê dikin. Tu çawa dikarî tişteke wisa bêjî? (...) Yê ku muxeyîleya xwe winda bike, qey hêviya wî dimîne? Ma hêvî ne ji wan nixêr herî bala ye ku muxeyîleya insanî pêk anîye, ma ne nixê herî bilind e ku insan xwediyê wê ye? Heke insan her û her hêviyê neafirîne, ma dikare bijî? (...) Yê ku muxeyîleyê, kûrtirîn efsûna insanan dinivîse, Dostoyevskî ye û welatê ku (Ewropa) ew keşf kiriye, dê çawa muxeyîle û efsûna insanbûnê winda bike? Tiştê ku winda kiriye, divê tişteke di be. Ewropa dê wê tiştê bibîne. Bawer im ev hişkesalî demdemî ye. (Yaşar Kemal 1997, r. 79-80)

Muxeyîle, efsûna insanî û hêviya ku ji təkiliya van herduyan diwêlîde. Ev melzemeyên çîrokbêj Yaşar Kemal in ku di zena’eta xwe de di’emilîne. Belkî gotina Bosquet û Benjamin ji aliyê materyalan ve di cih de ne, lê wek Yaşar Kemal gotî, ji bo ku hişkesalîyê wisa demdemî heye, mirov rabe bêje lêgerîna efsûna insanî li Ewropayê sekiniye, ev yek ne rast e û ne lihevhatî ye jî. ‘Esas Yaşar Kemal li ser vê meselê ne tenê ye jî. David Price, di xebata xwe *History Made, History Imagined* de [Tarîxa Çêkirî, Tarîxa Xeyalkirî] romaneke Carlos Fuentes, Susan Daitch, Salman Rushdie, Michel Tournier, Ishmael Reed, Graham Swift û Mario Vargas Llosa, bi têgeha *poiesis* şîrove dike. Ev têgeh, ji zimanê Yewnaniya Qedîm e, pêwendîya wê bi *mîmesîsa* Arîsto heye û ma’neya wê jî “afirandina zimanî” ye. Ji bo Arîsto mîmesîs, poiesîs e, ne texlîdkirîneke ji dera hanê ye. Price, îddia dike ku di romanên tarîxî yên van nivîskarên de rabirdûya tarîxî, li ser hafîze û çîrokeke dijber tê sazîkirin. Li gor Price, romanên ku derçûne, nimûneyên “tarîxa poietîk” in. Ev roman ji aliyekî ve li ser qisekirîna tarîxê a klasîk/serdest, helwesteke rexneyî pêşkêş dîkin, ji aliyekî ve jî ji bo dahatûyê texeyyula ‘ihtimalên nû pêk tînin. Ev texeyyulên rabirdûyê, dê tesîra xwe li ser fikra dahatûyê ya xwîneran (me) jî bike. “Ji vî alî ve tarîxa poietîk, dijberî tarîxa konvansiyonel, tenê xwe nade ber rabirdûyê. Jê pê ve, yek ji armancên sereke yên tarîxa poietîk, alîkarîkirîna me ye da ku em ji nû ve rabirdûyê tenzîm bikin ji bo pêkanîna dahatûya xwe. (Price 1999, r. 4)

Ev roman, li ser vê xeta têgehiştinê, ne tenê ceribandînen edebî-fîkrî ne, herwiha metnên xwedîarmanc in ku ji bo guhertina dinyayê gazî xwînerên xwe dîkin. Gava serencama kesên li çeper û şîpandaran hatî tepisandin û tecrubeyên wan ên bi êş û jan û heqaretan tijî, transferî qada edebî dike, tekane armanca wan ne ew e ku di dilê xwîneran de empatiyekê pêk bînin; herwiha ji bo guhertina van şert û mercên ku vê rewşê pêk tînin, dixwazin xwîneran bikin xwedî helwest û hişmendiyekê. Disa jî Price, qebûl nake ku metnên wisa, erênî an neyînî, wek metnên “postmodern” bèn

binavkirin. Pisporên ku li ser têgeha romana postmodern dixebitin, gelek çarçoveya armanca van romanên wek lêpîrsînên epîstemolojîk teng û berteng dikin. Lê belê Price, îddia dike ku romanên tarîxa poîetîk, tenê lêpîrsîn û jêveçirandina nirxan nakin, herwiha nirxên nû jî pêşkêş dikin. Bo nimûne, Carlos Fuentes, di romana xwe *Terra Nostra* [Axa Me] de teklîf dike ku hêmanên cihûtî û îslamê, careke dî tev li tarîx û çanda Îspanyayê bibin. An jî Salman Rushdie, di romana *Midnight's Children* de [Zarokên Nîvê Şevê], li ser dîroka Hindistanê, 'helwesta abîdewî' qebûl nake û ji bo helwesteke rexneyî, gazî xwînerên xwe dike. Ev roman ji epîstemolojîkbûnê zêdetir aksiyomatîk e; ango daxwaza pêkanîna nirxên nû, van romanên ji yê din cuda dike. (hb. r. 298)

Em dikarin BAHa Yaşar Kemal jî wek tarîxa poîetîk qebûl bikin. Wek ku me di temamê vê xebatê de cext li ser kir, Yaşar Kemal dixwaze deh salên Komara Tirkiyê, tecrube û dengên wê demê ku çîroka serdest ew bi temamê paşguh kirine an jî nexwestiye wan bibîne, ji xwe re dike mijar û qada referansên tarîxî jî berfirehtir dike. Her deng û her çîroka ku tevlî BAHê dibe, derbeke giran a rexneya tarîxî li wê helwesta teng a çîrok û gotara serdest dide. Lê ji bo BAHê ev jî ne bes e; bi destaneke ku çîrokê bi rê ve dibe, bi tevna xwe ya mîtosî, teklîfa çalakiyekê li me dike û ev çalakî jî hem ji metnê wêdetir e hem jî ji rabirdûya ku metnê qise dike. Heke em vê teklîfê qebûl bikin, li ser xweragirtina li hember rabirdûyê û ji nû ve binavkirina wê, dê roja me ya îro jî, dahatûya me jî ji nû ve teşe bigre; belê, armanca metnê ev e.

Werger: Erol ŞAYBAK*

* Nivîskar, li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de xwendekar e.

ÇAVKANÎ

- Bakhtin, Mikhail. 1981. *The Dialogic Imagination*. Austin: University of Texas Press.
- Benjamin, Walter. 1969. *Illuminations*. New York: Schocken Books.
- Disch, Lisa J. 1993. More Truth Than Fact: Storytelling as Critical Understanding in The Writings of Hannah Arendt. *Political Theory* 21 (4): 665–694.
- Halbwachs, Maurice. 1992. *On Collective Memory*. Chicago and London: The University of Chicago Press.
- Köroğlu, Erol. 2009. Novel as an Alternative Collective Remembrance Text: Poiesis, Storytelling, and Social Thinking in Yaşar Kemal's *An Island Story* Quartet. dnd. *Turkish Literature and Cultural Memory: "Multiculturalism" as a Literary Theme after 1980* amd. Catharina Dufft, 163-192. Wiesbaden, Almanya: Harrassowitz Verlag.
- Margolin, Uri. 2000. Telling in The Plural: From Grammar to Ideology. *Poetics Today* 21 (3): 591–618.
- Nietzsche, Friedrich. 1997. *Untimely Meditations*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Parla, Jale. 2006. Yaşar Kemal'in Eksantrikleri (Eksantrikên Yaşar Kemal) dnd. *Victoria R. Holbrook'a Armağan* (Diyarî Ji Bo Victoria R. Holbrook) amd. Walter Andrews&Özgen Felek, 75–107. Stenbol: Kanat Kitap.
- Passerini, Luisa. 2003. Memories Between Silence and Oblivion. dnd. *Memory, History, Nation: Contested Pasts*, (amd.) Katharine Hodgkin ve Susannah Radstone, 238-253. New York: Routledge.
- Price, David W. 1999. *History Made, History Imagined: Contemporary Literature, Poiesis, and The Past*. Urbana and Chicago: University of Illinois Press.
- Schudson, Michael. 1995. Dynamics of Distortion in Collective Memory. dnd. *Memory Distortion: How Minds, Brains, and Societies Reconstruct The Past*, amd.
- Daniel L. Schacter, 346–364. Cambridge, Mass.: Harvard University Press.
- Wertsch, James V. 2002. *Voices of Collective Remembering*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Winter, Jay and Emmanuel Sivan. 1999. Setting The Framework. dnd. *War and Remembrance in The Twentieth Century*, amd. Jay Winter&Emmanuel Sivan, 6–39. Cambridge: Cambridge University Press.
- Yaşar Kemal. 1997. *Yaşar Kemal Kendini Anlatıyor: Alain Bosquet ile Görüşmeler*. (Yaşar Kemal Behsa Xwe Dike: Hevdîtinên Li Gel Alain Bosquet) Çapa 2em. Stenbol: Weşanên Adam.
- . 1998. *Fırat Suyu Kan Akıyor Baksana* (Ava Çemê Feratê Xwîn e). Stenbol: Adam.
- . 2002. *Karınca'nın Su İçtiği*. (Henûniya Deryayê). Stenbol: Adam.
- . 2002. *Tanyeri Horozları*. (Dikên Berbangê). Stenbol: Adam.
- . 2012. *Çıplak Deniz Çıplak Ada*. (Behra Tazî Girava Tazî). Stenbol: Yapı Kredi.
- Zamponi, Simonetta Falasca. 2003. Of Storytellers and Master Narratives: Modernity, Memory, and History in Fascist Italy. dnd. *States of Memory: Continuities, Conflicts, and Transformations in National Retrospection*, amd. Jeffrey K. Olick, 43–71. Durham and London: Duke University Press.

GOTARA DIJKOLONYAL Û WÊNEYÊ SERDESTIYA TIRKAN DI KOVARA HAWARÊ DE

Zülküf Ergün*

1. Destpêk

Di sedsala nozdehan de, piştî ku di nav sînoren siyasî yên dewleta Osmanî de, bi taybetî li herêma Balkanan, serhildanên neteweyî rû dan, kurd jî ketine nav liv û tevgerê. Bo yekem car, Hacî Qadirê Koyî bû berdevkê vê serdema nû û dengê pêşwext ê gotara dijkolonyal di edebiyata kurdî de. Hacî, Kurdistan wek welatekî “bindest û pestkirî” pênase kir û riya serxwebûnê nişanî kurdan da. Li ser vê zemîne piştî Meşrûtiyeta Duyem, ronakbîr û çalakgerên kurd ên li Stenbolê bi riya komele û kovar û rojnameyên xwe xwestin vîneke siyasî û civakî çê bikin û rêberiya gel bikin. Ev hewldan negihîştin armanca xwe û di encama Cenga Cîhanê ya Yekemîn de welatê kurdan di nav çar dewletên neteweyî de hat parvekirin û di wateya modern de Kurdistan bû welatekî kolonî û navûnişanên wê yên dîrokî, civakî û çandî ketin ber pêla qedexê û asîmîlasyona çar dewletên neteweyî yên serdest.

Li hember vê rewşê, li Tirkiyeyê çendîn serhildanên bêencam çê bûn û di dawiya her serhildanekê de zext û metirsiya li ser kurdan û welatê wan her ku çû zêdetir bû. Di zemîneke weha de pêşengên siyasî, civakî û ronakbîrî yên kurdan jî ji neçarî riya koçberiyê dan ber xwe û ji bo rizgarkirina canê xwe û peydakirina derfeta têkoşînekê mecbûr man ji welat derkevin. Kovara *Hawarê* jî di çarçoveya rewşeke siyasî ya weha de li ser destê çalakgerên siyasî yên penaber di sala 1932yan de li Şama paytexta Sûriyeyê derket ku di wê serdemê de ev welat di bin rêvebirîya Fransayê de bû. Damezrînerê kovarê Celadet Alî Bedîrxan û birayê wî Kamiran Alî Bedîrxan, berî avakirina Komara Tirkiyeyê, piştî ku ji aliyê kemalîstan ve biryara bidarvekirina wan hat dayîn, bi dizî ji Tirkiyeyê derketin. Her du bira pêşî çûn Ewrûpayê û çend sal paşê jî hatin Sûriye û Lubnanê û li wir bi cih bûn. Nivîskarên din ên *Hawarê* jî çend kes ne tê de piraniya wan di encama têkçûna serhildana Şêx Seîd de ji welatê xwe reviyên û hatin li Sûriyeyê niştecih bûn, ku bi xêra fransiyan tê de azadiyeke nisbî hebû.

* Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstitûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

Kovara *Hawarê* di zemîneke weha de û li ser destê van kesayetên siyasî, yên ku di qada siyasetê de negihîştibûn armancên xwe, bû zimanhalê edebiyateke neteweyî û dirêjepêdera hêvî û daxwazên neteweya kurd. Loma jî nivîskarên *Hawarê* her tim wêneyê serdestî û sitemkariya dewleta tirk/romê ya li ser kurdan û Kurdistanê anîn ber çavan û hêrs û vîna gel zindî hiştin. *Hawarê* bi gotar, helbest, çîrok, şanoname, sehîfî (ceribandin) û hevpeyvînên xwe ji aliyekî ve nasname û hişmendîya neteweyî geş kir, ji aliyê din ve jî berê vê hêrs û kerba gel da desthilata kolonyal a tirkan û Kurdistan wek welatekî kolonîkirî, kurd jî wek gelekî bindest û çewisandî pênase kirin. Ji ber vê jî, em ê di vê xebatê de hewl bidin bi perspektîfa teorî û lêkolînên kolonyalîzmê di kovara *Hawarê* de rewşa kolonyal a Kurdistanê, wêneyê serdestiya dewleta tirk, rêbaza vejandina bikerên çewisandî, awayê çêkirina mertalê zanistî yê dijkolonyal li hember şûrê zanista kolonyal destnîşan bikin û gotara dijkolonyal a nivîskarên *Hawarê* berçav bikin.

2. Kurdistan Wek Welatekî Kolonîkirî û Rewabûna Tundûtîjîyê

Eger em kolonyalîzmê wek dagirkirin û kontrolkirina welat û malên mirovên din û destêwerdana pergala siyasî û çandî ya welatekî pênase bikin (Loomba, 2000: 19), bêguman rewşa Kurdistanê û gelê kurd ya di wê serdemê de bi kolonyalîzmê dikare bê şîrovekirin. Lewra mîna ku Aime Cesaire jî dibêje, gelên kolonîkirî ew gel in ku kanfêvên wan hatine miçikandin, çanda wan hatiye binpêkirin, damûdezgehên wan hatine hilweşandin, axa wan hatiye dagirkirin, dînê wan hatiye belawelakirin, berhemên wan ên hunerî yên şikomend hatine jinavbirin û derfetên wan ên boş hatine talankirin (Cesaire, 2005: 78). Ev gotin nîşan didin ku kolonyalîzm ne tenê ezmûneke dîrokî ya welatên Ewrûpayî ye li hember welatên Asya û Afrîqayê, kolonyalîzm şêweyekî serederîkirinê (muamele) ye û navê bindestkirin û bêhêzkirina gel û welatekî ye ji aliyê hêzeke serdest ve. Ji ber vê jî hebûn û nebûna kolonyalîzmê ne bi demeke diyarîkirî, ne jî bi dewletên diyarîkirî ve dikare bê sînorkirin, lê bêtir bi naverok û şêweyê serederîkirina xwe dikare bê destnîşankirin. Ji ber vê çendê ye ku civaknasê Amerîkî Michael Heacter behsa kolonyalîzma navxweyî dike û berxwedana li hember vê kolonyalîzmê jî wek cureyekî netewetîyê dide zanîn. (Özkırımlı, 2013: 118).

Di rewşa welatekî kolonîkirî de bi armanca şikandina hêza desthilata kolonyal di nav ronakbîr û edîbên gelên kolonîkirî de gotareke dijkolonyal peyda dibe ku li hember hebûna kolonyalîzmê tundûtîjîyê (xuşûnet, şîdet) rewa dikin. Frantz Fanon, di berhema xwe ya navdar *Yeryüzünün Lanetlileri* (Lenetiyên Cîhanê) de, bêdengkirina meydanxwaziya kolonyalîstan û şikandina tundûtîjîya wan wek erkeki rewîştî/exlaqî li qelem dide (Fanon, 2001: 42) û hilweşandina dinyaya teng a kolonyalîzmê ya tijî qedexe bi tundûtîjîyeke reha (mutleq) mumkîn dibîne (2001: 35). Lewra, bi dîtina wî, kolonyalîzm ne makîneyeke xwedan fikir e, ew tundî ye û li hember tundîyeke mezintir serê xwe ditewîne (2001: 57). Ji ber vê çendê, edebiyata li hember kolonyalîzmê edebiyateke şer e. Di vê edebiyatê de, ji bo bercestekirina hebûna neteweyî, gel ji bo

şer tê gazîkirin, ji bo teşedana hişmendiya neteweyî bi riya çîrokên trajîk û helbestan, wêneyên çewisandina welat û hovîtiya dijminê serdest tê nîşandan û endamên neteweya kolonîkirî bi hilgirtina berpîrsiyariya neteweyî tîn peywirdarkirin (2001: 222).

Mirov dikare bibêje ku ev tesbît ji bo hemû edebiyatên dijkolonyal kodên hevbeş in û wek edebiyateke dijkolonyal di deqên edebî yê *Hawarê* de jî em rastî van kodan tîn. Lewra nivîskar û helbestvanên *Hawarê* di nav realîteyê kolonyal de çavê xwe vekirin û, bi gotina Hebeş (1996: 29), di nav şeş salan de bûn şahidê lidarxistin û tîkçûna du serhildanên mezin. Loma qelema wan karî wêneyê bindestî û çewisandinê bikêşe û bi riya her du serhildanên tîkçûyî yê Şêx Seîd û Agiriyê rewşa welat bi awayekî zindî raxe ber çavan.

Di *Hawarê* de Kurdistan meydana şer e, di bin destê dijmin de dinale û li çiya û bajarên wê berxwedan li dar e. Herwekî ku di helbesta “Tola Welêt” de tê nîşandan, welat gelek nexweş e, ji ken û geşiya berê tiştek nemaye, welat îro dilreş û bêmad e. Loma jî bi kurên xwe re naaxive. Kul û kovanan ji her alî ve welat dorpêç kiriye û ji ber vê jî dinale (Hawar, 2012: 24). Dema welat di bin dagirkeriya dijmin de dinale kurd jî wek gelekî bindest di rewşeke şerpeze de ne. Loma Kamiran Alî Bedirxan di helbesta “Welat û Dilê Min” de destnîşan dike ku di riya welat de hezaran kes mirine, gelek kes sêwî û bê mal, bê gund û bajar mane (Bedir-Xan K., 2012: 216). Celadet Alî Bedirxan jî, di çîroka xwe ya “Ber Tevna Mehfûrê” de, Bakurê Kurdistanê di bin dagirkeriya tirkên de nîşan dide û diyar dike ku bi destê wan gelek serek, şêx û mezinên kurdan hatine bidarvekirin, jin û zaroyên wan hatine kuştin, mal û milkên wan hatine talankirin û jin û zarokên wan ên bêxwedî li bajarên xerîb birçî û tazî hatine hiştin (Bedir-Xan C., 2012: 51). Celadet dîsa di “Tola Karwên” de êş û azara gelê kurd û rewşa wan a kolonyal bi awayekî trajîk li ber çavan radixe. Lewra di bin çavdêriya eskerên dijmin de karwanek di rê de ye. Keç, kur, zaro, eşîr, cotkar, axa, mîr, mela, şêx û seyda di nav êş û keserê de di bin berf, pûk, zîpik û teyrokê de tazî û birçî ne û di bin tajangên eskeran de dinalin (Bedir-Xan C., 2012: 273-274).

Ev hemû dîmenên trajîk di encama serînegirtina serhildanên neteweyî yê kurdan de qewimîne; ji ber vê jî, di gelek deqên *Hawarê* de amaje bi serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê tê kirin. Di *Hawarê* de ev serhildan yan wek mijarên esasî tîn behskirin yan jî digel mijarên din tîn bibîrxistin. Di çîroka “Ber Tevna Mehfûrê” de, bavê Rindê û Zizê Bengî Axa, birayê wan ê mezin Zinar û çend pismamên wan di serhildana Şêx Seîd de, di “şerê serxwebûna kurdan de ji bo welat û milletê xwe” hatine kuştin (Bedir-Xan C., 2012: 51). Di Çîroka “Dildiziya Gulekê” de bûyerên çîrokê di parîzekê (park/baxçe) de diqewimin ku di bin wê parîzê de kortaleke tarî heye û Şêx Seîd û hevalên xwe tê de veşartîne (Bedir-Xan K., 2012: 69). Di “Li Ber Tirba Şêx Seîd” de, Kamiran Alî Bedirxan gazî Şêx Seîd dike û dibêje, “gora wî hêj nerm e, tirba wî nenavkirî û bêrewş e, navê wî li ser riya Pîran, Xarpût û Diyarbekirê bi xwînê hatiye nivîsîn. Rêç û şopa piyên wî di çiyayên Kurdistanê de tîn dîtin” (Bedir-Xan K., 2012: 261). Kamiran Alî Bedirxan di çîroka xwe ya “Mêrê Min di Şerî de ye” de

jî, bê ku navê serhildanê bide, di destpêka çîrokê de dibêje, “di welatî de şerekî xurt û serhildaneke mezin çê bûye” (Bedir-Xan K., 2012: 95) û van serhildanan ji çîroka xwe re dike paşxane. Di “Tola Karwên” de, Celadet di encama van serhildanan de behsa sirgûnkirina karwanekî kurd dike û dîsa serhildan di paşxaneyê vê bûyerê de cih digire (Bedir-Xan C., 2012: 273). Di şanonameya “Hevind” de, Celadet behsa şerê dawî yê serhildana Agiriyê dike û cihê qewîmîna vê şanonameyê jî Çiyayê Agiriyê ye (Bedir-Xan C., 2012: 322-334). Cegerxwîn di “Şehnama Şehîdan” de kesayetên van serhildanan wek qehremanên neteweyî nîşan dide û hêvî dike ku careke din serê xwe rakin û pêşengiya kurdan bikin (Cegerxwîn, 2012: 291-292). Di çîroka xwe ya “Li Goristana Amedê” de Osman Sebrî di xewna xwe diçe Diyarbekirê, li Derê Çiyê cihê bidarvekirina Şêx Seîd bang lê dike û dibêje, “Ey ke’ba qewmîyeta min Şêx Seîdê Kal!” (Sebrî, 2012: 349) Nûredîn Êsif jî di “Keskesor”ê de amaje bi serhildana 1925an dike ku di wê serdemê de şervanên kurd dikevin nav bajêr û piştî şikestinê vedikişin (Êsif, 2012: 503). Bi vî awayî derdikeve holê ku di Hawarê de her du serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê wek serhildanên dijî kolonyalîzma dewleta tirk tên nîşandan û wek remzê berxwedana gelê kurd û hewldana rizgariya neteweyî tîrên pênasekirin.

Di vê çarçoveya dîrokî û siyasî de, herçend piştî têkçûna serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê kovara Hawarê xwest destê xwe ji siyaseta bişo û tenê bi karê çandî re jî mijûl bibe, berdewamiya desthilata kolonyal û ezmûn û bîranînên nivîskarên Hawarê nehişt ku siyaseta û tundûtîjî ji rojeva wan derkevin. Ev rastî di nivîsa Celadet Alî Bedirxan a bi navê “Gazinda Xencera Min” de bi awayekî aşkera derdikeve holê. Lewra, piştî çendîn salan, dema Celadet xencera xwe ya jenggirtî ji bo tûjkirina serê qelema xwe ji banê kitêbxaneyê derdixe, neçar dibe ku guh bide gazîdên wê. Xencer bi dûvdirêjî behsa qenciyan xwe dike û diyar dike ku bê wî tu tişt, ne ziman, ne xwendin û ne jî nivîsîn naçe serî. Ji serdemên dêrîn heta roja îro di parastina hebûn û çanda kurdan de behsa rola xwe dike û ji Celadet dixwaze ku jê dûr nekeve (Bedir-Xan C., 2012: 179-180).

Bi dîtina Firat Aydınkaya, Celadet Alî Bedirxan, bi vê nivîsê, li hember înkara û asîmîlasyona kurdan tundûtîjîyê rasyonelîze dike, erkê wê jinûve pênase dike û tundûtîjîyê wek bikerekî siyasî yê damezirîner destnîşan dike (Aydınkaya, 2010: 214). Lewra, herwekî li jorê hat behskirin, li gor paradîgmaya dijkolonyal, rizgariya neteweyî bê tundûtîjîyê ne mumkîn e. Ji ber vê di kovara Hawarê de, xencer wek sembola tundûtîjîyê di gelek deqan de derdikeve pêşberî me. Di çîroka “Gulê” de, Gulê bi armanca parastina welatê xwe serê zabîte dijmin bi xencerê dibire (Êsif, 2012: 490). Di gotara “Xwe Binas” de, Celadet xortên kurd li ser xencarê dide sondxwarin (Bedir-Xan C., 2012: 286). Di şanonameya “Hevind” de, dema dijmin dora serhildanê Çiyayê Agiriyê digirin, kalek dest davêje xencerê û li ser xencerê dibêje, “lê xencerê, lê xencerê / Qevdreshê kal nezerê / Ez li te geriyam delalê! Çavreshê delalê! Tu kanê, enî zêrê kanî” û êrîşî dijmin dike (Bedir-Xan C., 2012: 330). Di çîroka “Ber

Tevna Mehfûrê” de, xencera Bengî Axayê şehîd bi dîwar ve hilawestî ye, zarokên wî di dema tengî û zîziyê de ziyareta xencerê dikin û bavê xwe bi bîr tînin (Bedir-Xan, 2012: 54). Ev mînak nîşan didin ku di *Hawarê* de xencer wek sembola tundûtîjiyê hêmayeke dijkolonyal e û parêzer û berevanê welatekî kolonîkirî ye.

3. Wêneyê Serdestiya Tirkan di Hawarê de

Kurdistan herçend ji aliyê çar netewe-dewletên cîran ve hatibe kolonîkirin jî di *Hawarê* de tirk wek kolonyalîstên welat tînin nîşandan. Nivîskarên *Hawarê* her tim li dijî sîbera vî dijminê serdest di nav têkoşînê de ne û bi wan re diaxivin. Bêguman, para serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê diyarker e di wê yekê de ka çima, ji nav her çar dewletên kolonyal ên Kurdistanê, dewleta tirk wek kolonyalîstên welat hatiye hilbijartin. Lewra, nivîskarên *Hawarê*, bi awayek ji awayan, leheng û piştevanên çalak ên van her du serhildanan bûn. Loma, di piraniya deqên *Hawarê* de, tirk di van her du serhildanan de êrîşî gund û bajarên kurdan dikin, xelkê sirgûn dikin, li çiyayên Kurdistanê şervanên kurd dorpêç dikin, serhildêran bi dar ve dikin û xelkê mayî jî birçî û tazî dihêlin.

Di helbesta “Tola Welêt” de, “tirko destê xwe dirêjî welat kiriye, xwîn rijandiye, mîr û melayan bi dar ve kiriye û xort û xurtan ji nav biriye” (Hawar, 2012: 24). Di şanonameya “Hevind” de, dewleta tirk dora Çiyayê Agiriyê girtiye û bi balafirên xwe yê cengî bombe davêje ser şervanên kurd (Bedir-xan C., 2012: 324). Di çîroka “Gulê” ya Nûredîn Êsif de, leşker êrîşî gundê Şadiyan dikin (Êsif, 2012: 489), di “Keskesor”ê de jî, piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd, esker wek gurên birçî dikevin nav bajêr, hin kesan di cih de dikujin, hin kesan bi dar ve dikin û zaro û jinên ducanî jî didin ber singûyan (Êsif, 2012: 503).

Ev hemû dîmenên serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê ne. Lê belê, ji bilî vana, Kamiran Alî Bedirxan di çîroka xwe ya “Eyloyê Pîr” de, mîlmilaneya navbera tirk û kurdan vedigerîne serdemên kevintir. Ji ber vê çendê, dema Gurgînê kurê mîrê Cizîra Botan, rojekê, di şerekî mezin de zora “tirko” dibe, xelkê Kurdistanê bi tevahî pêşa dibin û Mîr dixwaze ji ber vê serkeftina mezin diyariyeke biqîmet bide kurê xwe (Bedir-Xan K., 2012: 340). Ev jî nîşan dide ku li ber çavên nivîskarên *Hawarê* tirk ne tenê dijminên îro ne, di heman demê de dijminên dîrokî ne jî û heta bibêjî li ber çavên wan reş û tarî ne.

Tirk di *Hawarê* de, bi gotina Louis Althusser, bi amrazên xwe yê zext û zordariyê (Althusser, 1989: 28) serdestiyê li kurdan dikin. Lewra tirk dewlet in, esker in, jendirme ne, zabit in, serleşker in, onbaşî ne, çawîş in, mulazim in, yûzbaşî ne, serhosta ne; xwedan top, cebilxane û balafir in, li baregehên xwe yê eskerî kurdan dikujin; her tim di nav êrîşê de ne, dema bi kurdan re diaxivin bi zimanê xwe yê serdest, bi tirkî, heqaretan li wan dikin, dema serhildanên wan dîtêşînin alaya xwe ya ku nîşaneya serdestiyê ye li ser banên damûdezgehên mîrî bi dar ve dikin. Ev jî nîşan dide ku di *Hawarê* de tirk, wek hêzeke kolonyal, bi hemû simbolên xwe yê çewşîner li ser serê kurdan mîna hêmayeke tirs û hişyariyê hatine nîşandan.

Wêneyê serdestiya tirkan di *Hawarê* de gelek çaran rasterast, hin çaran jî bi riya metaforan hatiye nîşandan. Di çarçoveya vê serdestî û bindestiyê de, Cegerxwîn, di fabla xwe ya “Serxwebûna Mirîşkan” de, serdestiya tirkan û bindestiya kurdan bi hin metaforên watedar berçav dike. Cegerxwîn di vê helbestê de mezinên kurdan bi dîkan, şervanên kurd bi mirîşkan û gelê kurd jî bi elok, tûtîk û qazan sembolîze dike (Cegerxwîn, 2012: 335-337). Taybetiya van ajelan ew e ku baskê wan heye lê nikarin bifirin. Li hember vê, serokê tirkan bi bûm, serleşkerê wan bi baz û leşkerên wan jî bi teyran sembolîze dike. Taybetiya van ajelan jî ew e ku xwedî bask in û dikarin bifirin. Cegerxwîn bi vê hêmaya helbestî, bendebûn û bindestiya kurdan û rewşa wan a kolonîkirî, bi nefirînê û serdestî û hukumraniya tirkan jî bi şiyana wan a firînê, anku bi hêza wan a kolonyal, destnîşan dike.

Di *Hawarê* de, tirkî jî nîşaneyê serdestiya tirkan e û amrazê serkutkirin û heqaretê ye. Ji ber vê, dema tirk bi kurdan re diaxivin, bi tirkîyeke tîjî ferman û heqaret xîtabî wan dikin. Di vê fabla Cegerxwîn de jî, dema dîk (mezinê kurdan) bi armanca bidestxistina “îstîqlal”a kurdan amadekariyê dike û dixwaze rûbirûyê tirkan bibe, baz bi awayekî amirane jê re dibêje, “Ûlan sen nerelisin” “Sizin burda ne iş war” û bi vî awayî tirkîyê wek amrazê êrîş û heqaretê bi kar fîne (Cegerxwîn, 2012: 336-337).

Di *Hawarê* de kesayetiyên ku dewleta tirk temsîl dikin xwedan taybetiyên nerênî ne, lewra her tim li kurdan zilm dikin, davêjin ser gund û bajaran û wan talan dikin. Di “Tola Karwên” de, dema kurdên sirgûnîkirî di nav koma muhafizên siwarî, jendirme, eskerên reş, onbaşî, çawîş û mulazimek de tîr birêkîrin, esker tajangan diweşînin wan û di cihê tajangan de xwîn ji canê wan tê der. Qêrîn, nalîn û axîn ji xelkên karwan bilind dibin, lê jendirme dil bi wan naşewitînin û bi tirkî dibêjin, “Hey kafir kurd yürü”. Di rê de dema berf û pûk karwan digire, mulazim ji bo hespê xwe germ bigire kulavê kalekî jê distîne û davêje ser piştê hespê xwe. Bi şev zabit, jendirme û esker xwe di bin banekî de dihewînin; lê keç, kur û jinên kurd li derve di bin berf û baranê de dimînin. Sibehê çawîş bi tajangan dikeve nav karwan û dibîne ku ew kalê ku kulavê wî jê hatibû stendin miriye. Dema çawîş vê rûdanê ji mulazim re radigihîne, bi tirkîya xwe ya serdest dibêje, “Efendim işte halo / Geberdi gitti kalo / Hiç demedi lo lo.” Mulazim jî di bersiva xwe de dibêje, “Ulan be” û kêfxweşiya xwe diyar dike. Mulazim û eskerên wî wisa ji kurdan nefret dikin ku mirina kurdan ji bo wan cihê kêfxweşiyê ye. Ji ber vê, dema xelkê karwan ji westan û bêhaliyê di rê de dimînin û dimirin, mulazim pê kêfxweş dibe û dibêje, “bi kêmbûna pûran dê bi ser keve tûran.” Loma jî berê xwe dide onbaşî, çawîş û eskeran û careke din bi tirkîya xwe ya serdest dibêje, “Arkadan yandan sürün düşürün be topdan.” Li ser vê fermanê esker bi tajang û şûran dikevin nav karwan û hemûyan dikujin (Bedir-Xan C., 2012: 274).

Bi vî awayî, Celadet, di vê helbestê de, ji aliyekî ve tirkî wek zimanê serdestanê heqaretkirinê nîşanî me dide, ji aliyê din ve balê dikêşe ser hişmendiya bikerên

kolonyalîst ku ajelên xwe jî ji gelên kolonîkirî çêtir û hêjatir dibînin. Ev jî vê gotina Frantz Fanon tîne bîra me ku dibêje kolonyalîst dema behsa xelkên kolonîkirî dikin, zimanê ajelnasiyê bi kar tînin û her tim ji bo pênasikirina wan, bêjeyên ku peywendiya wan bi ajelan re heye bi kar tînin (Fanon, 2001: 40). Di vê helbestê de jî mirina zilamê kal bi bêjeya “geberdi” û birêvebirina karwan jî bi bêjeya “sürün”ê tê destnîşankirin, ku peywendiya van her du bêjeyan jî bi ajelan ve heye. Ji ber vê çendê, Aime Cesaire kolonyalîzmê digel objebûnê yek dibîne (Cesaire, 2005: 77) û bi vî awayî amaje bi bêvînkirina mirovên kolonîkirî dike.

Celadet Alî Bedirxan, di çîroka “Ber Tevna Mehîfûrê” de, careke din balê dikêşe ser zilma bikerên kolonyalîst û wek çekêkî bikaranîna zimanê tirkî li hember xelkê bindest. Di vê çîrokê de, Rindê û Zîzê di kargeheke mehîfûran de dixebitin. Bi tirkî nizanin û serhostayê wan bi tirkî dijûnên wan dide. Dema Rindê û Zîzê diaxivin dibêje, “Yine mi lakırdı kurd piçleri.” Her du keçik têdigihîjin ku serhosta li wan heqaret dike, lê dîsa jî ji neçarî dijûnên wê dadiqurtînin. Ji bilî Rindê û Zîzê keçikên din ên kargehê kêr zêde bi tirkî dizanin û Celadet sedema hînbûna wan a tirkî bi xweparastinê ve girê dide (Bedir-Xan C., 2012: 53), lewra tirkî li ser zimanê bikerên kolonyalîst wek çek tê bikaranîn û bikerên çewisandî ji bo xwe biparêzin tirkî hîn dibin. Wek ku tê dîtin, di vê çîrokê de jî, dema zimanê tirkî wek hêmayeke kolonyal arasteyî bikerên bindest dibe, bi hemû hêza xwe ya biçûkkirinê di ser serê wan de wek bombeyekê tê xwarê û dibe nîşaneyê êş û azardanê.

Celadet Alî Bedirxan, bi navê Herekol Azîzan, di hevpeyvîna “Biyaniyekî di Kurdistanê de Çi Dîtine” de li ser zimanê rojnamenivîsekî biyanî careke din balê dikêşe ser kiryarên leşkerên dewleta tirk û tehdaya wan a li ser gelê kurd. Rojnamenivîs diyar dike ku di nav şeş mehên ku li Kurdistanê geriyaye gelek bûyerên tirsnaq dîtine û destnîşan dike ku rojekê di rê de kurdekî kal ê pêncî-şêst salî dibîne ku zarokêkî du salî di himbêza wî de ye. Di rê de jendirmeyekî tirk ê bîst salî dijûnî wî dide û dirêjî wî dike. Bi tajangan lê dixê, lê zilamê kal ji bo parastina zarokê biçûk ê di himbêza xwe de li jendirme dinêre û digel êşa canê xwe bi rûyê wî de dikene (Azîzan, 2012: 310). Herweha ev rojnamenivîs rojekê jî diçe gundekî serdana dostekî xwe yê 102 salî. Jendirme bi armanca berhevkirina çekan davêjin ser wî gundî. Xortên gund dibin û serê wan wîndî dikin. Digel ku di gund de kêrîkek jî nîne bela xwe di zilamê kal jî didin. Wî davêjin erdê, pêncî çov li bin lingên wî dixin heta ku xwîn ji lingên wî vedizike. Ji ber vê kalo dikeve nav çîyan. Dema rojnamenivîs sedema lêdanxwarina wî jê dipirse, pêşî dibêje ji ber ku ez kurd im, paşê bi tirs li dora xwe dinêre û dibêje na, ez şaş bûm, berê ez kurd bûm, niha ez tirk im. Di vî welatî de her kes tirk e. Celadet li ser zimanê rojnamenivîs dîsa bi van gotinên tirkî “Türk en büyük millet, Türkiye’de yaşar Türk, yok başkası” balê dikêşe ser serdestiya tirkan û armanca wan a jinavbirina kurdan (Azîzan, 2012: 309-311). Bi vê ragihandinê Celadet Alî Bedirxan rûyê zordar û asîmîleker ê dewleta Tirkiyeyê nîşanî me dide ku bi tu awayî tehemulî hebûn û nasnameya kurdan nake.

4. Vejandina Bikerên Çewisandî di Hawarê de û Tolhildan Wek Hêmayeke Dijkolonyal

Li ser vejandina bikerên [fa'îl] çewisandî û komelên kolonîkirî boçûnên ciyawaz hene di nav teorîdancerên kolonyalîzmê de. Bi ya Gayatri Spivak, vejandina dengê komên bîndest û bikerên çewisandî mumkîn nîne (Loomba, 2000: 261). Li hember vê, bi nêrîn û helwesta xwe ya erênî, Frantz Fanon di nav teorîdancerên dijkolonyal de, bi gotina Albert Memmi, wek “pêxemberê cihana sêyemîn û qehramanê romantîk ê hilweşandina koloniyê” derdikeve pêş (Loomba, 2000: 169) û baweriya wî bi vejandina bikerên çewisandî heye. Fanon, rizgariya ji kolonyalîzmê di çarçoveya neteweyî de mumkîn dibîne. Bi dîtina wî tiştê ku çavkaniya xwe ji netewetiyê digire ji bo gel rast e û rênîşander e. Ev rastî bilindbûna neteweyê bi xwe re tîne û desthilata rejîma kolonyal dilezîne (Fanon, 2001: 47). Aime Cesaire jî kêşeya bîngêhîn a gelên kolonîkirî di çarçoveya neteweyî de dinirxîne û li dijî wê yekê derdikeve ku kêşeyên neteweyî di çarçoveya têkoşînê çînî yan jî têkoşîna li dijî kapîtalîzm û sosyalîzmê de bê nîrxandin. Lewra, bi dîtina wî, têkoşîna çînî nikare kêşeya gelên kolonîkirî çareser bike (Cesaire, 2005: 29).

Di *Hawarê* de, cara pêşî, Hevindê Sorî neteweyê wek hêza rizgariya ji kolonyalîzmê û riya serbestiya gel pênase dîke. Nivîskar di nivîsa xwe ya “Yeketîman”ê de netewetiyê wek dîne gelperestiyê bi nav dîke û têkoşerên neteweyî û dijkolonyal ên mîna Mustafa Kamil, Sa'd Zexlûl, Yûsif Mazîni, Xaribaldî, Waşinxton de Valira, Xandî û Îhsan Nûrî Paşayê serkirdeyê serhildana Agiriyê wek pêxemberên vî dîni dide nasîn. Bi dîtina wî, pirtûkên pîroz ên vî dîni destûrên serbestî û serbixweyiyê ne û dua û wirdên wî jî sirûdên neteweyî ne (Sorî, 2012: 214). Ev mijar di jimareya 18an a *Hawarê* de ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve jî tê behskirin. Celadet jî herwekî Hevindê Sorî kurdetiyê wek dîne kurdan dide nîşandan û di bin sernavê “Pendên Ayîna Kurdaniyê” de ji bo rizgariyê rê û rêçikan dide ber xortên kurd (Bedir-Xan C., 2012: 286). Ne tenê Hevindê Sorî û Celadet, nivîskarên *Hawarê* yên din jî hilweşandina kolonyalîzmê bi avakirina nasnameya neteweyî û afirandina lehengên neteweyî mumkîn dibînin. Loma jî edebiyata *Hawarê* ji aliyekî ve edebiyata neteweyî ye, ji aliyê din ve jî edebiyateke dijkolonyal e. Ji bo vê jî, di gelek deqên *Hawarê* de, kesayetên edebî di riya rizgariya neteweyî û têkbirina desthilata kolonyal a tirkan de bi nasnameya xwe ya neteweyî dihesin û bi vê nasnameya kolektîf roleke çalak û erênî digêrin.

Kesayetên deqên edebî yên *Hawarê* di çarçoveya rizgariya neteweyî de bi deng û rengên xwe yên dijkolonyal derdikevin pêş. Nivîskarên *Hawarê* bi armanca pêgihandina lehengên xwe yên neteweyî gelek çaran dîmenên çewisandina welat û bînpêkirina nîrxên neteweyî berçav dikin û bi vî awayî ji êş û şerpezetîya gel û niştîman kesayetiyên neteweyî yên dijkolonyal diafirînin. Ji ber vê jî, nivîskarên *Hawarê*, di deqên xwe yên edebî de, bi rûdanên trajîk zemîna hişyarî û haydariyê amade dikin. Bi gotina Fanon, rizgarbûna ji kolonyalîzmê tu çaran bê haydarî û

hişyariyê pêk nayê. Lewra bikerê çewisandî dema ji rastiya xwe agahdar dibe, bi çavekî nû li xwe û li derûdora xwe dinêre û bi vê nêrîna nû hebûnê ji binî ve diguherîne. Bi vî awayî bikerê çewisandî ji temaşevaniyê vediguhere û dibe çalakgerê avakirina çarenûsa xwe (Fanon, 2001: 35). Ji ber vê jî, rizgariya ji kolonyalîzmê bi afirandina mirovên nû mumkîn dibe ku ev mirovên nû bi coşeke têkoşerane rastiya kolonyalîzmê têk dibin û serbestiya neteweya bindest misoger dikin.

Nivîskarên *Hawarê*, di şikandina hukmê kolonyalîzma tirkan de, herî zêde bi xortan re diaxivin. Lewra xort xwedî hêza guherînê ne û bi hişyariya wan desthilata kolonyalîst dikare bê jinavbirin. Ji ber vê çendê, Celadet Alî Bedirxan di gotara xwe ya “Xwe Binas” de bangî xortan dike û di pileya yekem de dixwaze çîna xortan rake ser piyan. Nivîskar bi pirsiyarên “Tu kî yî? Ji kîjan millet û nîjad î? Zimanê te çi ziman e? Tu berê çawan bûyî? Îro di çi halî de yî? Jê çawan dikarî bifilitî?”* dixwaze haydarî û wê hişyariya ku Fanon behs dike pêk bîne. Lewra bersiva van pirsiyaran dê xortan bikêşe ser realîteya neteweyî û deriyê cîhaneke nû li ber wan veke. Bi dîtina Celadet, xortên kurd di roja qewimandinê de (di rewşa kolonyal de) hatine dinyayê û divê mirinê bidin ber çavên xwe. Lewra neviyên miletekî kevin, yên ku rehê wan digihîje Medan û Ariyan, nabe ku vê bindestiyê qebûl bikin. Bi dîtina wî armanca xortan divê rizgariya welat û neteweyê be, navê armanca wan divê kurd be, kurdayetî be, Kurdistan be. Nivîskar welat wek cesteyekî jihevketî dişayesîne û sedema vê jî bi nebûna yekîtîyê ve girê dide (Bedir-Xan C., 2012: 286). Ji ber vê, dixwaze di kesayetiya xortên kurd de mirovên nû biafirîne ku ji nexweşî û kêmasiyên berê azade bin.

Celadet, di vê hewldana afirandina mirovên nû de, cih dide keçên kurd jî. Ji ber vê çendê, di paragrafa dawî ya vê gotarê de bang li keçên kurd dike û dibêje, “Keçê! di van gotinan de para te ne hindik e, lewra tu yê vî xortî perwerde bikî, pê re bijî û pê re bimirî” (Bedir-Xan C., 2012: 290). Bi vî awayî Celadet Alî Bedirxan li tenişt xortan rola arîkariyê dide keçên kurd û wan jî wek bikerên kara vedîxwîne meydana têkoşînê. Ji ber vê jî di gelek deqên edebî yên *Hawarê* de jin li tenişt xortan di têkoşîna neteweyî de cihên xwe digirin û hewl didin ji wan kêmtir nemînin.

Kamiran Alî Bedirxan jî, di gotara xwe ya “Hewekî Hate Gotin” de, bangî xortan dike û ji aliyekî ve xortan ji bo têkoşîn û parastina welat han dide, ji aliyê din ve rev û sistiyê riswa dike. Bi dîtina Kamiran, di riya welat de mirin “spehî” ye, destjêberdan û rev jî “şermezarî” ye. Ji ber vê jî berê xwe dide xortên kurd û bi dengêkî bilind dibêje, “Sîng û bedena xwe bi mêranî û dilxweşî ji welat û jin û zaroyên xwe re bike mertal! Rabin... Rabin xortno! Rabin ji bo şerî! Dilê we bila tucar sist mebe!!.. Ne mirin lê tirs tehl e.” Kamiran ji bo pêşî li sistbûna têkoşîna xortan bigire dibêje “revîn” ne gotineke kurdî ye. Yê ku bireve dê jin û zaroyên xwe, welat û namûsa xwe radestî dijmin bike, loma jî ji xortan re dibêje:

1 * Mirov dibêje qey ev gotar wek alternatîva “Ey Tük Gençliği”ya Atatürk hatiye nivîsin.

Berde, bila sînga te de gulên şerê welatî bibişkivin! Ji hejmara dijminan, ji boşbûna wan metirsin!! Xwe bavêjin baza êrîşkaran! Bila tîrsa ji jînê neêxin dilê xwe de!! Dilê we bila geş be, dilê we bila şa be, di siha mirinê de azahiya welatî û bext û namûs veşartîne. Roja xweşiya Kurdistanê ji siha mirinê dê xwe hilavêje. Qedr û mezinahî û nav û deng di siha mirinê de veşartîne. (Bedir-Xan K., 2012:378-379)

Bi vî awayî Kamiran Alî Bedirxan di riya welat de pesnê canfîdayan dide û ruhê têkoşînê vedijîne. Ji xwe dema mirov li karekterên edebî yên *Hawarê* dinêre mirov dibîne ku ev karekter di bin siha van gotinên Celadet û Kamiran de hatine afirandin ku hemû jî bi nasnameya xwe ya neteweyî û bi têkoşerîya xwe derdikevin pêş.

Vejandina bikerên çewisandî di *Hawarê* de li ser rêzîkekê pêk tê. Pêşî hêzên kolonyal êrîşî gundek, bajarek yan jî komeke serhildêr dikin û gelek caran jî bavê kesayetê çîrokê dikujin. Bi vî awayî zilm û tehdarî hêzên kolonyalîst bikerê çewisandî hişyar dike û di dilê wî de hesta tohildanê dilivîne. Ev hest kesayetê edebî ji bo têkoşînê han dide û bi vî awayî bi armanca derkirina dijmin û parastina gel û niştîman xwe fîda dike. Dema ev diqewime, mîna ku Celadet jî diyar kiribû, xortên kurd û keçên kurd digel hev in û dema lê diqewima keçên kurd jî mîna xortên kurd derdikevin pêş û di têkoşînê de ji wan kêmtir namînin. Mirov dikare bibêje ku di kovara *Hawarê* de vejandina bikerên çewisandî li ser vê qaydeyê xwe nîşan dide û dengê wan di encama vê pêvajoyê de tê bilindkirin. Di vê çarçoveyê de em ê niha di deqên edebî yên *Hawarê* de berê xwe bidin pêvajoya vejandina bikerê çewisandî û kesayetên van deqên edebî bidin nasîn.

Rindê û Zîzê her du kesayetên keç ên çîroka Celadet a “Ber Tevna Mehfûrê” ne. Di Serhildana Şêx Seîd de dema bavê wan tê kuştin her du xwişk digel dayka xwe û birayê xwe yê biçûk Gefo li bajêr bi cih dibin. Her du xwişk ji bo dabînkirina mesrefên xwendina birayê xwe di kargeha mehfûran de dixebitin. Lewra Gefo li ser wesiya bavê wan ê şehîd divê bixwîne, rêzika dinyayê bigerîne û li hember dijmin wek bikerekî bihêz derkeve pêş. Loma zivistanê her du keçik bi cilên xwe yên tenik dixebitin û heqaretên serhostayê xwe dadîqurtînin. Dema Zîzêya biçûk ji ber sermayê ji kar dikeve, Rindê armanca xebata wan jê re diyar dike û Zîzê jî ji bo vê armanca pîroz zêdetir dixebite û pereyên zêdetir qezenc dike. Wek ku tê dîtin her du kesayetên keç, ji bo ku birayê wan wek bikerekî bihêz û hişyar rûbirûyê dijimin bibe di amadekirina wî de roleke çalak digêrin û erkên xwe yên neteweyî bi awayekî serkeftî bi cih tînin.

Di şanonameya “Hevind” de Hevind kurekî biçûk e û di nav serhildana Agiriyê de ji bo bergirîya welat ketiye nav şervanan. Herçend biçûk be jî, ji armanca serhildanê baş têgihîştîye û bi zanîna tevdigere. Di bin top û bombeyan de jî bi derûdora xwe re henekan dike û hemûyan bi xwe dikenîne. Bi wêrekiya xwe diçe ji çeperên dijmin narincokan berhev dike û ji Qeşem û Menîjeyê re dibêje, “Min ji we re sêv berhev kirine.” Dema ku hêzên dijmin êrîşî girê ku şervanên kurd lê bi cih bûne dikin, li ser daxwaza Serwer Beg, jin û zarok ji çekdaran tîne veqetandin. Di vê gavê de Hevind, ji bo ku wî jî bikin nav hêzên çekdar ji bijîşk re lava dike û bi arîkariya bijîşk dikeve

nav çekdaran (Bedir-Xan C., 2012: 333). Celadet Alî Bedirxan, bi karakterê Hevind, di kesayetiya zarokêkî de wêrekiya zilamekî gihîştî nîşan dide û zarokên welat jî di berevaniya welat de kara û bihêz nîşan dide.

Qeşem û Menîje du karakterên jin in di şanonameyê de û digel destgirtiyên xwe, Felemez û Gurgîn, çar sal in li serê çiya di nav şer de ne. Her du keç ne di eniya şer de ne, li cihekî nîsbeten ewletir in. Dema dengê top û çekan tê, Menîje ji bo destgirtiyê xwe digirî, lê Qeşem dil didiyê û dibêje ewên ku şer dikin hemû mîna mêr û birayên me ne û bi vî awayî helwesta neteweyî tîne bîra wê. Dema leşkerên dijmin nêzî wan dibin, ew jî dest davêjin çek û rûbirûyê dijmin dibin. Di vê navê de Menîje bi bombeyên balafirên dijmin birîndar dibe. Digel vê yekê jî dema çekdar û xelkê sivil jî hev tên veqetandin, Qeşem û Menîje dixwazin bikevin nav çekdaran. Berê xwe didin Lewend Axa û dibêjin, “Ma axa em jî ne çekhilgir in. Te bi çavên xwe dît, me çawan şer dikir.” Lewend Axa wan himbêz dike û dibêje çek nînin. Li ser vê yekê Qeşem dibêje, “Xwezî em keç nebiwana.” Qeşem û Menîje jî wek du karakterên jin bi fîdakari û dilberziya xwe derdikevin pêş, ku Celadet bi riya van kesayetan dixwaze nîşan bide ku jinên kurd jî di şerê parastina welat de dikarin rûbirûyê dijmin bibin û dema pêwîst be bi qehremanî têbikoşin.

Di şanonameya “Hevind” de Serwer Beg jî kesayetekî nimûneyî ye. Sewer Beg fermandarê serhildanê ye, di şerê dawî de birîndar dikeve. Her kes dibêje qey miriye, lê çavê xwe vedike û dibêje ez hîn nemirime. Berî ku bimire, rênumayiyên xwe yên dawî ji bo hevalên xwe radigihîne û ji Qubad re dibêje, “Tu kirasê min ê bixwîn bibî dotmama min, kurê min tê de bi xwedî bikin, wî zû bigihînin û bêxin xizmeta miletî. Millet nikare gelek li hêviyê bimîne. Jê re canfeda û canbêzarî divêtin. Ji diya wî re holê bêje” Serwer Beg gotinên xwe yên dawî jî weha rêz dike, “Di herderî de mêranî, di herderî de kurdanî, lê dijmin serdest, em di herderî de qels û bêkeys, ji lewra di herderî de bindest in” (Bedir-Xan C., 2012: 327). Serwer Beg bi van gotinên xwe digel ku li bindestî û qelsiya kurdan mikur jî tê, tu caran bêhêvî nabe û hêviya serketinê bi riya kirasê xwe yê bixwîn dispêre nîşên paşerojê û bi dengê berz ji kurê xwe re wêrekî û têkoşîna xwe mîrat dihêle, herweha wek bikerekî neteweyî rola perwerdekirina kurê xwe jî dispêre jina xwe û bi vî awayî mêr û jin û zarok di riya serkeftinê de dibin pişkdarên rizgariya neteweyî.

Di kovara *Hawarê* de, Nûredîn Ûsif jî gelek serkeftî ye ji bo afirandina kesayetiyan neteweyî. Di çîroka “Gulê” de bi du kesayetên balkêş derdikeve pêşiya me. Gulêya kesayeta sereke ya çîrokê jî gundê Şadiyan e. Berî çend salan bavê wê bi zor ew daye mêrekî. Li ser vê, Gulê mêrê xwe dikeve û bi pey Qoço yê rêbir dikeve. Ji ber vê çendê, gundî bi çavêkî nebaş li Gulê dinêrin û jê re dibêjin “Gula qehpik! Gula bênamûs!”. Gelek caran Qoço wê davêje ber tajangan, lê ji ber ku Gulê xwe bi wî disitirîne dengê xwe nake û pê razî ye. Dema esker dor li gundê Şadiyan digirin, ew jî bi armanca berevaniya gundê xwe digel Qoço û gundiyan çek hildigire. Dema dijmin nêzîk dibin, Gulê ji bo parastina welatê xwe û Qoço yê parêzvanê xwe li çareyekê digere, destê xwe davêje xencerê û winda dibe. Qoço digel çil gundiyan di kemînê

de li benda dijmin in. Wê gavê zêrevanek dibêje yek tê ji aliyê dijmin ve. Her kes dibêje “Gula qehpik” em xistin kemînê. Qoço ji neçarî tîfinga xwe dirêjî wê dike û wê dikuje. Piştî demekê têdighîjin ku Gulê bi dizî çûye bin konê zabitê dijmin û serê wî ji laşê wî biriye. Ji ber vê çendê, Qoço dibêje, “We bi min gunehê paşîn da kirin, ji Gula qehpik re me qehpîf kir!”

Kesayetê duyem ê çîrokê jî Qoço ye. Dema dijmin dor li gundê Şadiyan digirin, digel heşt zilamên xwe tê gund û ji gundiyan re dibêje, “Gundîno! Ev panzde sal in ko ez gunehan dikim. Xelkê dikujim. Xerabiyê dikim. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe min sond xwar ko dijmin ji welêt derêxim” (Ûsif, 2012: 489-490). Bi vî awayî Nûredîn Ûsif ji du kesayetên gunehkar du lehengên neteweyî diafirîne û di çarçoveya rewabûna berevaniya welat û derkirina eskerên dagirker de kesayetiyên nerênî yên civakî vediguherîne û rewabûnê dibexşîne wan. Di vê çîrokê de, ne ku dagirkeriya dijmin bikerên bindest bêdeng dike, berevajî zemîna veguherîna van kesayetên nerînî amade dike dengê wan bilindtir dike.

Di çîroka “Hevîna Perîxanê” de lehenga çîrokê Perîxan e. Hêj di diwazdeh saliya xwe de li hember romiyan kîneke wê ya venekuştî, kûr û bêpayan heye. Dema digel hevala xwe Eyşeyê di baxçe de dileyîze ew dibe eskerê kurd, Eyşe jî dibe eskerê romî. Ji ber vê kîna xwe ya kûr bi kevir û dar û sîlan tê Eyşeyê û ji bîr dike ku ev lîstik e. Dema ku Eyşeyê têk dibe, dirûşmên neteweyî berz dike û dibêje, “her bijî kurd! Her bijî Kurdistan”. Perîxan, ji ber ku tu kurên wî nînin, ji aliyê Mûsa Beg ve wek kurekî hatiye xwedîkirin. Her şev dema bavê wê keça xwe dike himbêza xwe, li çavên wê dinêre û jê re dibêje ez di çavên te de qedera Kurdistanê û bicihanîna hêviyên xwe dibînim. Mûsa Beg ji bo serbestî û serbilindiya gelê xwe civateke veşartî digerîne û dema dijmin pê dihesin, wî dibin baregeha eskerî û dikujin. Piştî kuştina wî, Perîxan şîretên bavê xwe tîne bîra xwe û ji bo hildana tola wî û welat dide ser şopa bavê xwe. Piştî ku xwendina xwe tamam dike, dibe endameke çalak a civata bavê xwe û di rojê cejna romiyan de, dema civat biryara kuştina serdarê dijmin, hakimê Kurdistanê, dide, wek canbêzar Perîxan xwe davêje meydanê. Roja cejnê cilên xwe yê hevrişim û spî li xwe dike, bombeyek dike bin kulîlkan û li ser navê xelkê bajêr diçe pêşwazîkirina serekê dijmin. Dema Perîxan nêzîkî hakim dibe bombeyê diteqîne û xwe û hakim dikuje. Piştî demekê, hevalên Perîxanê tînan meydanê cihê bombeyê. Hinekî erdê dikolin dibînin ku laşê Perîxanê li ser laşê hakim e û pencên wê li dora histûyê wî kilît bûne (Ûsif, 2012: 622-624). Nûredîn Ûsif bi kesayeta Perîxanê jinên kurd ewçend bihêz nîşan dide ku bi zanîn, hêz û wêrekiya xwe dikarin hakimê kolonyal ê Kurdistanê ji nav bibin û serê miletê xwe pê bilind bikin. Ji vî aliyê ve Perîxan di nav kesayetên edebî yê *Hawarê* de kesayetiya herî bihêz e û di çarçoveya dijberiya kolonyalîzmê de mîna keke serkeftî ye.

Kamiran Alî Bedirxan jî di çîrokên xwe de kesayetên têkoşer ên dijkolonyal diafirîne. Di çîroka “Lawikê Min” de, dema serhildan dest pê dike, Gurgîn, digel ku nû zewiciye jî, dest davêje çeka xwe diçe bereya şer. Di vê maweyê de jina wî kurekî tîne. Gurgîn rojê bi destê xwe yê xwînî tê malê, kurê xwe ji dergûşê derdi-

xe û dibêje, “Tacîn! Dilê te ji bona arîkariya Kurdistanê ye. Xwîna te ji bona şer û rijandinê ye.” Di ser vê bûyerê re pênc sal derbas dibin. Rojekê Tacînê pênc salî ji diya xwe re dibêje, “dayê ji bavê min re binivîse ku ez mezin bûme, dilê min ji bo hezkirina Kurdistanê hildavêje, xurtiya min ji bo arîkariya Kurdistanê ye, xwîna min ji bo şer û rijandinê ye” (Bedir-Xan K., 2012: 61-62). Herwekî diyar e di vê çîrokê de Gurgîn şervanê roja îro ye û Tacîn jî bi van gotinên xwe nîşan dide ku jî paşerojê ew dê cihê bavê xwe bigire û dirêje bide xebata rizgariyê. Gotinên weha hişmendane li ser zimanê kurekî pênc salî ji aliyê hunerî ve kêşedar be jî, nimûneyeke balkêş e ji bo nîşandana vîna bihêz a xelkê Kurdistanê.

Di çîroka “Mêrê Min di Şerî de ye” de jî serhildan û şerê welat di roja daweta Zîn û Zendên ku deh sal in evîndarên hev in dest pê dike. Zend tenê şevêkê bi jina xwe re dimîne û serê sibehê zû di saet şeşan de digel çil xortên kurd diçe bereya şer. Di şeveke sar û tarî de bêriya jina xwe dike, tîfinga xwe dide hevalê xwe û diçe mala xwe. Li derî dixwe, dibêje “ez Zend im, mêrê te me.” Zîn derî vedike û bi çavekî sar û tehl jê re dibêje, “mêrê min Zend bi welatîyên xwe ve di şerî de ye!” û derî digire (Bedir-Xan K., 2012: 95). Helwesta Zînê hişmendî û dilqehîmiya jina kurd nîşan dide ku parastina welat di ser hestên xwe yê takekesî de digire.

Di çîroka “Du Egîd” de, Kamiran Alî Bedirxan behsa du egîdên kurd ên bênav dike. Ev her du şervan piştî şikestina serhildanê dîl dikevin. Li hember vê, şervanek mirinê ji qebûlkirina vê rewşê baştir dibîne. Hevalê wî jê re dibêje eger jin û zarokên min nebûna min jî dixwest ez bimirim. Şervanê aza ji hevalê xwe re dibêje, “Jin û zarok çi ne? Di dilê min de pêteke bilintir heye, piştî welatê min winda bû qîmeta tiştêk nîne.” Herweha ji hevalê xwe dixwaze ku dema bimire laşê wî bi xwe re bibe û wî li erdê Kurdistanê veşêre. “Kolosê min dane ser sînga min, tîfinga min bide destê min û xencera min bêxe ber piştê min.” Ji hevalê xwe re diyar dike ku ew dê wek nobetdarekî di gorê de bimîne heta dengê topan û şehîna hespan bê wî. Lewra egîdên kurdan dema di ser gora wî re derbas bibin, ew dê bi çekên xwe ji gorê derkeve ji bo stendina welatê xwe tevî wan bibe (Bedir-Xan K., 2012: 27). Bi vî awayî Kamiran Alî Bedirxan di serdema têkçûnê de jî hêviyên kesayetên xwe zindî dihêle û tolhildana bavan vediguhezîne kuran.

Di gotara dijkolonyal a *Hawarê* de tolhildan cihekî girîng digire. Lewra nivîskarên *Hawarê* ji ber şikandina her du serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê li hember dewleta tirk di nav hêrs û kîneke kûr de ne. Wekî ku li jorê hat dîtin piraniya kesayetên edebî yê *Hawarê* wek tolhilderên şikestina serhildanên kurdan derdikevin pêşberî me. Lê ne tenê kesayetên edebî, gul û kulîlkên Kurdistanê jî di hildana tola kurd û Kurdistanê de beşdariya kesayetên edebî dikin. Di çîroka “Dildiziya Gulekê” ya Kamiran Alî Bedirxan de, şevêkê, zabitekî dijmin digel delala xwe di nav parîzeke Diyarbekirê de digerin. Ev parîz li serê kortalek e ku Şêx Seîd û hevalên wî tê de hatine veşartin. Di nav vê parîza mezin de sosin, rihan, lale, binefş û kulîlkên curbicur hene. Her şev guleke vê parîzê vedibe û gava destekî biyanî jî dirêjî wê dibe pelên gulê tèn hev. Zabitê dijmin wek nîşaneya serdestî û çewsîneriyê, dema di nava parîzê de digere bi

gavên hişk pê li çîmen û bihnûniyan dike. Ji ber vê hêşinahiyên zirav dişkên û pelên kulîlkan ji hev dikevin. Zabit tê ber vê gulê û dest davêjê. Gul dil dike xwe rabigire, lê zabit wê diçîne. Di destê wî de gul sînga xwe vedike û xwe geş dike; lê dema zabit û delaliya xwe wê bêhn dikin di cih de dimirin. Bi dîtina Kamiran, tenê kesên ku di şerê welat de beşdarî kirine dildiziya wê gulê dizanin, lewra ev gul nîşaneya hêviyên Kurdistanê ye, di nav her pelekê wê de hezaran axên birîndaran, hezaran evdên şehîdan, hezaran hêstirên sêwî û jinebiyan û hezaran şînen welatiyan di xew de ne (Bedir-Xan K., 2012: 69-70). Ji ber vê jî di amadenebûna şervanên kurd de erka tolhildanê digirin ser milên xwe û ew jî herwek şervanên kurd peyama qebûlnekirina rewşa kolonyal radigihînin.

Di çîroka Telet Qedûr ya “Kulîlkên ko ji Kurdistanê Tê” de jî, kulîlkên çiyayên Kurdistanê wek hêmayeke neteweyî derdikevin pêş. Di vê çîrokê de, her sal kulîlk li derekê dicivin behsa karekî xwe yê baş dikin û di encamê de kîjanê karekî baştir kiribe ew tê padaştîkirin. Di roja civînê de hemû kulîlkên tîn, lê Nêrgis, Beybûn û Xecxecok ne amade ne. Piştî demekê ev her sê kulîlk bi xwêdayî dikevin hundir. Dema sedemê derengmayîne ji wan tê pirsîn, lêborîna xwe dixwazin û diyar dikin ku ji dereke gelek dûr, ji çiyayên Kurdistanê hatine. Li wê derê rastî sê cendekên xortên kurd hatine ku di riya welat û miletê xwe de bi şeref û rûmet hatine kuştin. Ji ber vê jî ji wan re sih çê kirine heta ku hevalên wan hatine û ew veşartine. Li ser vê gotina wan, kulîlkên din radibin wan didin ser milên xwe, ji wan re çepikan lê dixin û padaşta salê didine wan (Qedûr, 2012: 506). Di vê çîrokê de jî bi rêzgirtina şehîdên Kurdistanê kulîlk di berevaniya welat de aliyê xwe diyar dikin û dibin wesîleya derbirîna fîdakariya şervanên kurd.

Ev mînak nîşanê didin ku tolhildan, wek hêmayeke dijîkolonyal, nîşaneya zindîbûna kesayetên edebî yê kovara *Hawarê* derdikeve pêşberî me û hesta tolhildanê wek hêza têkoşîna li hember desthilata kolonyal, di bilindkirina dengê bikerên çewisandî de roleke girîng digêre.

5. Li Hember Zanista Kolonyal Danîna Zanista Dijîkolonyal di Hawarê de

Em ji Michel Foucault û Edwar Said dizanin ku zanist ne tişteki bêguneh e û bi kûrahî bi karên siyasî û desthilatdariyê ve girêdayî ye (Loomba, 2000: 64). Said zanistê wek baskê pêşeng ê kolonyalîzmê pênase dike û bi dîtina wî, ev zanista ku jê re dibêje oryantalîzm di bin xizmeta berdewamiya desthilata kolonyal de kar dike û bi tu awayî ne objektîv e (Said, 1991: 320). Lewra qadên zanistî di bin karîgeriya komel, çalakiyên çandî, xwendîngeh, pirtûkxane û hukumetan de dimînin; ji ber vê jî ne berhemên zanistî, ne jî yê fikîfî “azad” nînin û bi niyet, girîmane (fereziye) û xiyalên desthilatdaran ve sînorkirî ne (Said, 1991: 320).

Zanista ku bi destê Rojava li hember Rojhilat hat bikaranîn, bi berbelavbûna pergala dewletên neteweyî re, ji aliyê hemû desthilatdarên serdest ve li hember netewê û mirovên bindest hat bikaranîn û, bi riya amrazên îdeolîk ên mîna xwendîngeh, çapemenî û pergala polîtîk ên dewletê (Althusser, 1989:29), wek çekeke veşartî li

beramber gelên kolonîkirî hat bikaranîn. Lewra tundûtûjîya kolonyal xwedî rehendên “epîstemîk” bû û bi êrîşkirina ser çand, fikir û nirxên gelên kolonîkirî, pêgeha xwe bihêztir dikir (Loomba, 2000: 75). Ji ber vê, ne tenê di qadên şer de divê di qadên zanistî de jî gelên bindest li xwe varqiliyana û li hember van êrîşên zanistî yên serdestan berevaniya hebûn û kerameta xwe bikirana.

Dewleta Tirkiyeyê jî piştî ku serhildanên kurdan serkut kirin û di warê eskerî de pêgeha xwe xurt kir, li gor bernameya asîmîlasyona netewe-dewleteke serdest, bi amrazên xwe yên asîmîlasyonê rûbirûyê komela kurdî bû. Bi vê armancê kurdî hat qedexekirin û bi riya xwendingehan tirkî wek çekekê li beramber zimanê kurdî hat bicihkirin. Ji bilî vê, dewletê bi riya dezgehên xwe yên “zanistî”, wek Dezgeha Zimanê Tirkî û Dezgeha Dîroka Tirkî, di bin navê zanistê de dîrok, ziman, hebûn û nasnameya kurdan înkâr kir û bi amrazên xwe yên îdeolojîk, bi awayekî tund êrîşî kurdan kir. Li hember vê rewşê, Celadet Alî Bedirxan jî, bi geşkirina zimanê kurdî û danîna alfabeyeke nû, kurdî kir mertal li hember zimanê fermî yê asîmîleker (Ay-dinkaya, 2010: 212) û bi vî awayî *Hawar* wek dezgeheke dijkolonyal derxist pêşiya dezgehên “zanistî” yên kolonyal.

Di *Hawarê* de eger “xencer” sembola tundûtûjîya dijkolonyal be, “qelem” jî wek sembola hişyarkirina li hember zanista kolonyal derdikeve pêş. Lewra piştî şikestina serhildanên kurdan em dibînin ku Celadet û hevalên xwe ji xencerê zêdetir berê xwe didin qelemê û bi riya qelemê dixwazin dijberiya kolonyalîzma dewleta tirk bikin. Jixwe di nivîsa “Gazinda Xencera Min” de, Celadet Alî Bedirxan, li ser zimanê xencerê, zêdetir rola qelemê destnîşan dike û di navbera xencer û qelemê de tercîha xwe diyar dike. Herwekî ku dibêje, bi riya qelemê dixwaze miletê xwe bi xwendin û nivîsandinê, bi kurmanciyê vejîne, miletê xwe bike xwedan zanîn û bi vê rêgehê bigihîje armanca xwe. Madem zimanê kurdan tê înkarkirin, bi nebûna nivîs û pirtûkan di çavê kurdan de tê kêmkirin û tenê wek zimanê axiftin û danûstendinê tê nîşandan (Bedir-Xan C., 2012: 180), divê kurdî bê geşkirin û pêşvebirin da ku bikare çanda kurdan biparêze, rê li ber dagirkeran bigire, ku nekarin bi ziman û zanista xwe ya îdeolojîk hişmendîya gel bimehînin.

Bi dîtina Celadet, ev êrîş û bînxirxkirinên “zanistî” divê bi riya xwendin û zanîneke din bînxirxkirin û bi geşkirina zimanê kurdî bînxirxkirin. Di vê çarçoveyê de, Celadet, di gotara xwe ya “Zilamek û Zimanek” de, bi kesayetîya Elyêzer bînxirxkirinê behsa çîroka vejandina zimanê mirî yê Îbranî dike ku bi ked û hişmendîya kesekî dibe zimanê miletekî (Azîzan, 2012: 669). Bi vî awayî, Celadet peywendîya ziman û vejandina neteweyekê berçav dike û kurdîyê dike navenda vejandina neteweya kurd. Her di vê çarçoveyê de dema ku li Tirkiyeyê zimanê kurdî tê qedexekirin, ji Mustafa Kemal re nameyekê dişîne û bi argumentên zanistî berevaniya zimanê kurdî dike û îdia dike ku kurdî ji gelek aliyan ve ji tirkî pêşketîtir e û nabe ku kurdî bi riya zimanê tirkî bê kuştin.

Di gelek deqên *Hawarê* de “xwendin, kitêb, zanîn û ziman” wek rîyeke têkoşîna li hember dagirkeriyê tên nîşandan. Eger ev amraz di destê kolonyalîstan de wek

amrazên îdeolojiya dagirkeriyê bên bikaranîn, di destê nivîskarên *Hawarê* de wek amrazên berevanî û tolhildanê derdikevin pêş. Loma jî nivîskarên *Hawarê* xwendin û zanîne gelek caran digel sembolên tundûtîjîyê bi kar tînin û di riya vekirina tola welat de zanîne dikin pişkdarê xencerê. Di “Helbesta Tola Welêt” de, helbestvan ji bo tolhildanê dibêje, “divê ez bixwînim, bibim mezin û zana, piştî wî bibim mêrkujekî binavûdeng, top û tîfing hilgirim û tola welat vekim” (Hawar, 2012:24). Di çîroka “Ber Tevna Mehfûrê de”, Bengî Axa, berî ku ji aliyê dewletê ve bê kuştin, wesiyet dike ku kurê wî Gefo bixwîne û tola bav û welatîyên xwe bistîne. Ji bo vê armancê her du keçên Bengî Axa di nav mercên dijwar de kar dikin da ku mesrefa xwendina birayê xwe dabîn bikin û bi zanabûna wî tola bav û bira û welatê xwe hilînin. Di çîrokê de li ser zimanê Rindêya keça Bengî Axa tê diyarkirin ku eger kekê wan Zinar qenc bixwenda, roja ku eskerên Kurdan bi ser Diyarbekirê ve girtin nedihîşt esker bibin çend bir û biçin bajarên din. Ji ber vê jî Rindê berê xwe dide Gefoyê birayê xwe yê biçûk û dibêje bixwîne û welat serbixwe bike (Bedir-Xan C., 2012: 53). Di çîroka “Hevîna Perîxanê” de jî dema bavê wê ji aliyê eskeran ve tê kuştin, Perîxan bi armanca tolhildana bavê xwe diçe kitêbxaneyê bavê xwe û, piştî şeş salan bi temamkirina xwendina xwe, dibe endameke kara ya civata bavê xwe û di cejneke romîyan de serekê wan ê li Kurdistanê dukuje (Ûsif, 2012: 624).

Ji van nimûneyan tê fêmkirin ku di kovara *Hawarê* de xwendin û zanîn bi armanca berevaniya welat û tolhildan û raqewirandina dijminê dagirker tê pêşniyazkirin. Jixwe di dirûşma *Hawarê* de jî hatiye, “Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike” (Hawar, 2012: 10). Ev jî nîşan dide ku zanîn di *Hawarê* de, wek rîyeke rizgariyê tê nîşandan û ji bo ferqkirina rewşa kolonyal a Kurdistanê û azadkirina wê wek merceç tê danîn. Ji ber vê têgihîştina kovarê û rola wê ya girîng, *Hawar* ji aliyê dewleta tirk ve û bi îmzeyê Mistefa Kemal wek weşaneke “muzir” tê nîşandan û ketina wê ya nav Tirkîyeyê tê qedexekirin (Akturk, 2012: 13).

Encam

Kovara *Hawarê* di encama dabeşkirina Kurdistanê û serkutkirina her du serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê de derdikeve. Damezirîner û nivîskarên *Hawarê*, piştî van şikestinên siyasî, bi riya edebiyatê bal dikêşin ser rewşa kolonyal a Kurdistanê û li dijî desthilata dewleta Tirkîyeyê bi gotara xwe ya dijkolonyal derdikevin pêş. Damezirînerê kovarê Celadet Alî Bedirxan û birayê wî Kamiran Alî Bedirxan xwedan roleke sereke ne di berçavkirina gotara dijkolonyal a *Hawarê* de. Ji bilî wan, nivîskarên wek Nûredîn Ûsif, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Telet Qedûr Hecî Elî Begzade û Hevîndê Sorî jî li ser rêça wan di gotara dijkolonyal a kovara *Hawarê* de beşdarî dikin.

Nivîskarên *Hawarê* Kurdistanê di nav rewşeke kolonyal de pêşkêş dikin. Dewleta Tirk bi hemû hêza xwe ya serkutker êrîşî gund û bajarên kurdan dike, serhildêrên kurdan bi tundî tepeser dike û bi leşkerên xwe yê zordest zulm û zorê li xelkê dike.

Li hember vê tundûtîjîya dewleta tirk a li ser kurdan, nivîskarên *Hawarê* berxwedanê wek erkeki niştimanî û neteweyî dibînin û bikaranîna tundûtîjîyê li hember hêza kolonyal a dewleta Tirkiyeyê rewa dikin. Wek nîşaneya rewakirina vê tundûtîjîyê jî, “xencer” di kovarê de roleke kara digêre û gelek caran qelema wan di pesindana vê xencera kurdparêz de tê bikaranîn.

Dewleta Tirkiyeyê û kesayetên tirk, wek dagirkerên Kurdistanê, xwedan wêneyekî nerînî ne di *Hawarê* de. Dewlet bi amrazên xwe yên zext û jinavbirinê li ser hebûna kurdan û welatê wan metirsiyeke mezin çê dike. Kesayetên tirk ên ku di deqên edebî yên *Hawarê* de jî cih digirin yan leşker in yan jî rêvebir in. Ev kesayet, wek nûnerên hêza kolonyal a Dewleta Tirk, ne tenê bi hêza xwe ya leşkerî, bi zimanên xwe yên serdest jî kurdan diçewisînin. Ji ber vê, dema ku rûbirûyê kurdan dibin, bi tirkiyeke tijî ferman diaxivin û bi her awayî xwe li ser wan zal dikin.

Nivîskarên *Hawarê* hilweşandina hukmê kolonyal di geşkirina hişmendîya neteweyî de dibînin. Ji bo çêkirina vê hişmendiyê jî hewl didin rûdanên trajîk ên sitemkariya li ser kurdan berçav bikin, dengên bikerên çewisandî bilind bikin û bi riya van kesayetên hişyar hêz bidin berxwedanê. Ji ber vê, hemû kesayetên edebî yên *Hawarê* wek nûnerên neteweyê bîndest ji bo hişyarkirina endamên neteweyê wek kesayetên nimûneyî hatine hilbijartin. Di nav vê çarçoveya nûnertiya neteweyî de, ne tenê xortên kurd, keç û zarokên kurdan heta kulîlkên Kurdistanê jî erkê xwe bi cih tînin. Loma jî Serwer Beg û Hevindê Celadet, Perîxan û Gulêya Nûredîn Êsîf û kulîlkên Kamiran Alî Bedixan û Telet Qedûr wek cengawerên edebiyata *Hawarê* derdikevin pêş.

Têkoşîna li hember kolonyalîzma Dewleta Tirk, di *Hawarê* de, ne tenê bi riya şerê çekdarî, bi zanîna û xwendinê jî tê kirin. Lewra kolonyalîzma dewleta tirk ne tenê bi tundûtîjîyê, bi riya biamrazkirina (enstrûmentalîzekirin) zanîna jî xwe nîşan dide. Qedexkirina kurdî, bêrûmetkirina dîrok û nasnameya kurdan û belavkirina zimanê tirkî di nav kurdan de dibe sedem ku Celadet û hevalên xwe jî li hember zanîna kolonyal zanîneke dijkolonyal li nav gelê kurd belav bikin û bi riya xwendin û hînbûna zimanê kurdî vê êrîşê pûç bikin. Ji ber vê çendê jî di *Hawarê* de “zanîna” xwedan naverokeke siyasî ye, şeweyekî têkoşîna neteweyî ye û ji bo parastina neteweyê ji xencerê girîngtir e.

ÇAVKANÎ

Althusser, Louis, *Îdeoloji ve Devletin Îdeolojik Aygıtları*, wer. Yusuf Alp, Mahmut Özışık, İletişim Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 1989.

Aydınkaya, Fırat, “Golgotha Tepesinden İnmenin Arifesinde Vicahiye Çevrilmiş Kürt Modernleşmesi Eleştirisi”, *Dipnot*, j. 1, İstanbul, 2010, r. 205-225.

Azîzan, Herekol Celadet, “Biyaniyekî di Kurdistanê de Çi Dîtine”, *Hawar*, (j. 19), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 309-311.

Azîzan, Herekol, “Zilamek û Zimanek”, *Hawar*, (j. 40), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 668-670.

Bedir-Xan, Celadet A., “Ber Tevna Mehîrê”, *Hawar*, (j. 4), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 51-54.

- Bedir-Xan, Celadet A., “Gazinda Xencera Min”, *Hawar*, (j. 12), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 179-180.
- Bedir-Xan, Celadet A., “Tola Karwên”, *Hawar*, (j. 17), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 273-275.
- Bedir-Xan, Celadet A., “Xwe Binas”, *Hawar*, (j. 18), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 286-290.
- Bedir-Xan, Celadet A., “Hevind”, *Hawar*, (j. 20), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 321-334.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Du Egîd”, *Hawar*, (j. 2), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 27.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Lawikê Min”, *Hawar*, (j. 4), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 61-62.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Dildiziya Guleqê”, *Hawar*, (j. 5), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 69-70.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Mêrê Min di Şerî de ye”, *Hawar*, (j. 7), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 95.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Welat û Dilê Min”, *Hawar*, (j. 14), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 216.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Li ber Tirba Şêx Seîd”, *Hawar*, (j. 17), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 261-262.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Eyloyê Pîr”, *Hawar*, (j. 21), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 340-343.
- Bedir-Xan, Dr. Kamiran A., “Herweqî Hate Gotin”, *Hawar*, (j. 23), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 378-379.
- Cegerxwîn, “Şehname Şehîdan”, *Hawar*, (j. 18), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 291-292.
- Cegerxwîn, “Serxwebûna Mirîşkan”, *Hawar*, (j. 20), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 335-337.
- Cesaire, Aime, *Sömürgecilik Üzerine Söylev*, Wergêr: Güneş Ayas, Doğu Kütüphanesi, İstanbul, 2005.
- Fanon, Frantz, *Yeryüzünün Lanetlileri*, wer. Lütfi Fevz, Topaçoğlu, Avesta Yayınları, İstanbul, 2001.
- Hawar, “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, *Hawar*, (j. 1), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 10-11.
- Hawar “Tola Welêt”, *Hawar*, (j. 2), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 24.
- Hebeş, Husên, *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de*, Belavgeha Hogir, Çapa Yekemîn, Bonn, 1996.
- Loomba, Ania, *Kolonyalizm Postkolonyalizm*, Wer. Mehmet Küçük, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2000.
- Özkırmı, Umut, *Milliyetçilik Kuramları Eleştirel Bir Bakış*, Doğu Batı Yayınları, Çapa Çarem, Ankara, 2013.
- Qedûr Hecî Elî Begzade, Telet “Kulîlkên ko ji Kurdistanê Tê”, *Hawar*, (j. 30), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 506.
- Said, Edward, *Oryantalizm Sömürgeciliğin Keşif Kolu*, Wer. Selahattin Ayaz, Pınar Yayınları, Çapa Çarem, İstanbul, 1991.
- Sebrî, Osman, “Li Goristanek Amedê”, *Hawar*, (j. 21), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 348-353.
- Serdar Akturk, Ahmet, “Li Xerîbiyê Ronesansa Çandî ya Kurdî: Ekola Hawarê”, Wer. ji tirkî Aysel Çetin, *Zend*, j. 19, İstanbul, 2012, r. 10-15.
- Sorî, Hevindê, “Yequetîman”, *Hawar*, (j. 14), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 214-215.
- Ûsîf, Nûredîn, “Gulê”, *Hawar*, (j. 29), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 489-490.
- Ûsîf, Nûredîn, “Keskesor”, *Hawar*, (j. 30), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 503-504.
- Ûsîf, Nûredîn, “Hevîna Perîxanê”, *Hawar*, (j. 37), Belkî, Diyarbakır, 2012, r. 622-624.

DI ÇÎROKSAZIYA HEVÇERX A TIRKÎ DE NIVÎSÎNA ŞİDETÊ: TOL Û CENNETİN KAYIP TOPRAKLARI

Olcaç Akyıldız û Halim Kara*

Ev gotar, ew kom û grubên ku derî civatê mane û dûçarî şidetê bûne, ka çawa bi riya romana Murat Uyrkulak a *Tol: Bir İntikam Romanı* [Tol: Romaneke Tolê] û ya Yavuz Ekinci ya *Cennetin Kayıp Toprakları* [Erdên Bihuştê yên Winda]¹ hatine bilêvkerin bi awayekî berawirdî vedikole. Li ser vê xetê, ev gotar dixwaze bi taybetî bi riya van romanên, anîna ziman a her cure pirsgirêka kiryarên şidetê yên ku li civat û cografyaya Tirkîyê hatine tecrubekirin, ji xwe re bike armanc. Şideta² ku em wek azara psîkolojîk û fîzîkî ya mirovekî li ser yekî yên din, ya civakekê li ser ya din, ya civakekê li ser takekesekî an jî ya dewletê li ser takekes û civakê pênase dikin, di çîroksazî, tema û rabêja her du metnan de diyarker e. Hem Uyrkulak û hem jî Ekinci di romanên xwe de balê dikêşin ev şideta ku xwe berdeyamî dubare dike, problemeke sereke ya civaka Tirkîyeyê û ya giştî ya mirovahiyê ye. Her çiqas şideta ku di van metnên wêjeyî de hatiye teswîrkirin tişteki tekstual jî be, seba ku ev metin wê şideta ku bi awayekî dîrokî û aşîkar tê zanîn bi riya konvansiyonên çîroksaziyê ji me re kirine çîrok, derbarê rûyê şideta siyasî, civakî û çandî ya li Tirkîyê de delîlên girîng didin me. Dema ew vê yekê dikin, rexneyeke şidetê jî pêşkêş dikin. Tam jî ji ber vê yekê rexneya şidetê ya di romanên Uyrkulak û Ekinci de, bi gotina Walter Benjamin bi giştî li dinyayê, bi taybetî jî li cografyaya Tirkîyeyê “felsefeya dîroka

* Asîstan Profesor û Doç. Dr. Zanîngeha Boğaziçi, Beşa Ziman û Edebiyata Tirkî.

1 Ev roman ji aliyê Kawa Nemir ve (Doğan, 2013) bi vî navê hatiye wergerandin ku me jî hemû iqtîbasan ji vê çapê wergirtiye (nota wergêr)

2 Ji bo şeweyên rûdana dîrokî, civakî, siyasî, çandî û bîrayî yên şidetê û nîqaşên felsefî û hiqûqî bnr. Idelber Avelar, *The Letter of Violence: Essays on Narrative, Ethics and Politics* (New York: Palgrave Macmillan, 2004); Walter Benjamin, “Şidetin Eleştirisi Üzerine,” dnd. *Şidetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 19-42; Jacques Derrida, “Yasanın Gücü: Otoritenin Mistik Temeli,” dnd. *Şidetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 43-133 û Slavoj Žižek, *Violence: Six Sideways Reflections* (New York: Picador, 2008).

şidetê” ye. Bi gotineke din temsîla şidetê ya di van vegotinan de bi xwe “felsefeya dîroka şidetê ye, lewra fikreke sirf derbarê encamê de jî, derbarê daneyên wê yên demkî de nêrîneke rexneyî, analîtîk û diyarker gengaz dike”³ û di babeta şeweyên rûdana şidetê de haydariyekê çêdike.

Vegotinên Uyrkulak û Ekinci dewsa ku şidetê wek bûyer û tevgerêke munferîd û derasayî vebêjin, wê wek pratîk û diyardeyêke berbelav a civakî, çandî û sazûmanî ya ku bi awayekî dîrokî têkiliyên mirovan tayîn dikin, pêşkêşî me dikin. Lê belê di nava vê çarçoveya giştî de her du roman jî bi taybetî herêmên cografî yên cuda yên Tirkiyeyê û demên dîrokî rasterast destnîşan dikin û li ser rûdana şidetê ya li ser van erdan disekin. Her çend xala nîvendê û temayên wan hevpar bin jî, romanên ku em ser wan disekin, şidetê bi rêya stratejiyên cuda yên vegotinê dinivîsin. Ev amûrên cuda yên vegotinê rê li ber cudabûna erkê şidetê ya metnan de jî vedike. Li ser vê xetê *Cennetin Kayıp Çocukları* ku xwe zêdetir wek metneke şahidiyê saz kiriye, bi awirên cuda rastiyê, bibîranînê û bibîranîna ku “tê ziman” problematîze dike; *Tol* jê cihêtir cexta jîhaydarbûna xwe, pêvajoya nivîsandina xwe û car bi car zimanê xwe yê ku digihîje asta xerabûnê, bi rêya lîstikên rabêjî û zimanî yên ecêb derdixwe meydanê û vegotina xwe dike şidet. Hazal Halavuta ku di kovara *Mesele* de bi sernava “Tol: Bir İntikam Romanı” (Tol: Romaneke Tolê) gotarek nivîsiye, dema dibêje “... *Tol*, vebêjera tolhildanê nîne, ew bi xwe tol e” kêm zêde tiştêkî nêzî gotinên me qest dike. Li gor Halavut tiştê ku *Tolê* dike romana tolhildanê, vegotina metnê ya tolê an di metnê de temsîlkirina tolê nîne – ku vê yekê jî dike – lê bêtir vexwendina wê ye ku hemû insanên koh û kenarî dawetî ser dikê dike. Halavut, wan kesên ku me di vê nivîsê de wek mexdûrên her cure desthilatdariyê bi nav kirine, bi bîrxistinekê dibe romana *Harê* ya di nava Uyrkulak û ji wan re dibêje “kesê xaromaro” û bi van gotinan rave dike ka *Tol* çawa bi xwe tol e:

Tol, romana yên xaromaroyan e ku ji dîrokê hatine qewirandin. Yusufê ku di treneke de diçe Diyarbekirê, heta domahiya rê çîrokên di dosyaya kesk a Şair de dixwîne û bi xwendinê re pirtûkekê tê nivîsandin. Çîrok, çîroka Şair, ya Ahmetê ku xwe ji Oğuzbûna xelas dibe, ya Cananê, ya Adnan, ya Sadî, ya Esmêrê, yên li serê Tûmê û çîroka wan mirovan e ku demekê bi îhtîmala şoreşê jiyana wan xweş bû lê bi derbeyên leşkerî re ji jiyana demê û herî zêde jî ji hev hatine dûr xistin. Tiştê ku *Tolê* dike romaneke tolê çîrokên mirovan e ku li pêncî salên dawîn ê Tirkiyeyê derbas bûne û di pêncî salên dawîn de sê derbe dîtine. Tol rizgarkirin e. Tol îadekirina navê xwe ye. Tol derketina li pêşberî dîrokê ye û nivîsandina romaneke ye ku dibêje û diqire “ulen dîzê lawê dîzan, em li vir in.”⁴

Eger em bi amraziya şidetê bifikirin jî *Tol*, wek metneke ku şidetê qiset dike namîne, ew bi xwe dibe şidet. Roman Jacobson îddia kiriye, seba ku wêje, zimanê

3 Walter Benjamin, “Şiddetin Eleştirisi Üzerine,” dnd. *Şiddetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 41.

4 Hazal Halavut, “Tol: Bir İntikam Romanı,” *Mesele*, hej, 28 (Nisan 2009): 35.

rojane tîr dike û diguherîne û bi awayekî sistematîk wê ji bikaranîna rojane dûr dike, şideteke organîzekirî ye.⁵ Uyrkulakê ku hem domdarî xwendevan nerihet dike û dihejîne, û bi awayê qisetkirinê zorê dide sînoren şidetê, piştî demekê awayê wî bi xwe dibe şidet. Roman şidetê bi şidetê vedibêje, ne ku bi tenê konvansiyonên wêjeyî –heta yek caran bi bikaranîna konvansiyonên herî jirêzê vê yekê dike-⁶ tevgerên xwendevan ên rojane û têgihîştinên wî yên xwecih, serobino dike.

Di *Tola* Uyrkulak de şidet wek yek ji pirsgerêkên sereke yên Tirkiyeyê, ku bi awayekî girseyî û sazûmanî ji aliyê dewletê ve tê sepandin, tê teswîrkirin. Di romana Ekinî de jî şidet dîsa wek meseleya civakî tê vegotin ku ku navenda wê dibe Mir-şita ya gundê Batmanê ye. Uyrkulak hem şideta ku dewlet li ser rêxistinên çepgir disepîne û hem jî şideta ku her cure desthilat li ser kesên çeperê/koh û kenarî, yên bêhêz, yên bêxwedî disepîne pêşkêşî xwendevanan dike. Ekinî jî bi rêya têkoşîna jiyane yên gundiyên ku di navbera şerê dewlet û PKKê de mane hem şideta sistematîk a ku dewlet disepîne û hem jî şideta jiyana rojane ya ku takekesan diçewisîne, bi awayekî gelek biteferûat teswîr dike. Lewra metna yekem şideta li ser kesên dûrî navendê (rêxistinên çepgir, kurd, jinên xerab, yên hêjar, yên bêxwedî), wek pergalê desthilatê dike çîrok; metna duyem jî me bi rûdanên cuda yên şideta ku wek parçeyekî siruştîya mirov hatiye destnîşankirin re rû bi rû dihêle. Di *Cennetin Kayıp Çocukları* de şideta fîzîkî û psîkolojîk a ku dewletê sepandiye tê vegotin, lê belê ji vê yekê wêdetir, şideta ku komeke etnîk li ser komeke etnîk a din sepandiye wek pirsgerêkeke aîdiyet û nasnameyê tê zimên.

Lê belê di her du metnan de jî ka li îroniyê binêre, yên ku dûçarê şidetê mane di heman demê de wek sepînerên şidetê jî cih digirin. Ev rewş jî destnîşan dike ku her çend xala wan a nîvendê ji hev zêde cuda jî be, di van metnan de qurbanên şidetê her wext dikarin bibin pêkhênerên şidetê jî. Di romana Uyrkulak de Şairê ku yek

5 Terry Eagleton, *Literary Theory: An Introduction* (Oxford: Willey-Blackwell, 2008), r.2.

6 Hazal Halavut di nivîsa xwe de, bi lîstika vegotinê re tîkildar qala sahnayekê dike. Şair di trêne de dosyayakê dide Yusuf û jê dixwaze wê bixwîne. Halavut vê sahnaye neqil dike û piştê wiha şîroveyan xwe didomîne:

‘Bi alîkariya agirê ku ber bi mîdeya min ve diçe min dilê xwe tehl û tîrş kir û min pîrsî:

‘‘Mirovên cur bi cur, çîrokên cur bi cur û em bi hev re pirtûkekê dinivîsin, ha?’’

Fehm nekir:

‘‘Çawa em pirtûk dinivîsin?’’ (...)

‘‘Ez ê heta domahiya rê wan bixwînim, ez çendî bixwînim jî dê pirtûkek bê nivîsandin. qey, ez şaş im?’’

Gêjokî bûbû.

‘‘Min ji wan pirtûkan ecêbek rast kir’’ min got. Bi awayekî çeleng kenîya û pîrsî:

‘‘Qe nebe, rast bûn?’’

Eve tolhildan li vir û wiha dest pê dike. Pîrsa Şair a ‘‘qe nebe, rast bûn?’’ sîleyek giran a Uyrkulak e ji bo xwendevanê ku qîma xwe bi şahidiya şeweyê nayîne. Lewra, çîrokên ku dê bîna vegotin, ne di wê rewşê de ne ku bi hewildana muşkilpesend a musehihekî bîna rastkîrin. Çîrok xwaromaro ne, dîrok ew çend dîz e ku her çîrokê xwar dike.’’ Halavut, Tol, 36.

ji lehengên sereke ye û demekê dûçarê şidetê maye, di nava vegotinê de wek kesekî ku şidetê disepîne jî tê teswîrkirin. Romana Ekinci jî vê îroniyê li ser bîranînên karakteran, bi taybetî li ser yên Hatice/Almastê datîne û şideta ku ermen salan berê dûçarê wê mane problematîze dike.

Romana Murat Uyrkulak a ku bi kurdî navê wê *Tol* e, dema di 2002an de hat weşandin, ji ber reseniya çîroksazî, ziman û temayên ji xwe re kiriye mijar, li derdorên wêjehez pir zêde hatibû ecibandin. Uyrkulak, di vê romana ku çîrokên tê de gelekî aloz, vekêşan û nepenî yên mirov, mekan, bûyer û têkiliyên siyasî yên têkel bi çîroksaziyeke parçeyî hatine teswîrkirin, beranberê veguherîn, şikestin û transformasyonên ku di pêncî salên dawî de li Tirkîyeyê hatine tecrûbekirin û welatekî ku êdî xerqî xwînê dibe û ber bi serhildaneke belawela ve diçe qiset dike, bi taybetî jî van tecrûbeyan bi riya şexs û komên mexdûr û marîjînal ên ku rastî xezeba îqtidarekê hatine qiset dike. Yusuf ê ku li derdora sih saliya xwe ye û di weşanxaneyekê de musêhîhiyê dike, rojekê ji aliyê patronê xwe ve seba ku “cudaker”, “terorîst”, “deximandî” ye ji nişka ve ji kar tê qewirandin. Di romanê de ev tawanbarkirina terorîst mekanîzmaya sereke ya “êndinkirin”ê ye. Yusufê ku berê ketiye nav çalakiyên îlegal, di salên xwe yên sihî de dilê wî li dinyayê sar bûye, bi tenê ye, jiyana wî bi çûnûhatina kar û meyخانê sînorkirî ye, piştî ku ji kar tê qewirandin dixwaze serxweş bibe, lewra li gor wî ev tişt dê xwekuştina wî hêsan bike. Dema şiyar dibe wardiqile ku di kompartimana trenekê de bi Şair re, ku ew jî demekê mudawîmê heman meyخانê bû, li ser rêwitiya derekê ne. Dema tren ji Stenbolê diçe Diyarbekirê, li bajarên cur bi cur ên welêt raperînên girseyî dibin, bi awayekî bipergal avahî tînen bombekirin. Vegotina ku tê de mekanên wek Îzmîr, Enqere, Stenbol, Diyarbekir û çiya, ku geh xuya dibin û geh winda dibin, di navbera îroj û rabirdûyê de diçe û tê, kesên cuda yên di jiyana van de her daîm du tîpên daîma serxweş cih girtine û jiyana wan a ku ji hev cuda jî bi awayekî qismî, bihewrik, parçe parçe daxilê çîroksaziya xwe dike. Ev yek jî atmosfera vekêşan, nepenî û nediyariya romanê zêdetir dike. Xêta di navbera rastî û çîroksaziyê de bi rewşa serxweşî û rewrewkiya her du karakteran her ku diçe şêlo û nediyar dibe, ne ku bi tenê Tirkîye, gelek welatên din jî hêdî hêdî dikevin destê serhildêrên şoreşger. Û weha xwendevan ji aliyekî ve şahidiya sitemkariya şideta sistematîk dike ku desthilatdar wê disepîne û ji aliyê din ve jî şahidiya bajarên di nava xwînê de mayî dike ku ew bi çalakiyên bombekirina kesên xwedî armanc pêk tînen. Di heman demê de xwendevan xwe li ber cazîbeya zimanê îronîk, tinazker, mîzahî û helbestkî yê romana ku hilberîna wêjeyî û xwendinê problematîze dike nema digire. Şideta sistematîk a ku dewlet disepîne û kuştinên li ser navê dewletê tînen kirin di dinyaya romanê de ya ku bi awayekî hostetî hatiye honandin vediguhêze malzemeyêke estetîk û bi dinyaya romanê ya bisehr, surrealîst û vekêşan re dibe yek. Di dawiya vegotinê de ligel lehengên bêçare yên pelîşî, parî, nîvco em bi civakeke bêpergal a ku piştî êrîş û bombebaranên şoreşgeran kontrol û desthilata xwe winda kiriye re rû bi rû dimînin. Vegotin derbarê tiştê ku li cihê karesatê de tê weadkirin an jî tê avakirin de, ketum e.

Weke ku berê jî hate destnîşankirin di romana *Tolê* de şidet ne ku bi tenê temaya romanê ye, di heman demê de stratejiyên çiroksazî û vegotinê jî diyar dike û roman bi rêya zimanekî şeddad û hemû konvansiyon rûxandinê re bi xwe dibe şidetek. Li pêşberê teswîrên şidetê yên gelekî tund û tîr xwendevan ji dil tê hejandin. Xwendevan dema van vegotinên biteferûat û tîr tecrûbe dike nerihet dibe, dikerixe lê belê ji aliyê din ve nikare xwe ji dilnewaziya bêgav a çiroksaziyê biparêze. Wek mînak yek ji lehengên li pêşê romanê Ahmet/Oğuzê ku jixwe di zaroktiya xwe de her cure sitemkariya şidetê tecrûbe kiriye û piştê gelek caran dûçarê şideta polîsan a kêfî bûye, di vê sehneya jêrîn de êdî hînî şidetê bûye. Ev mînak destnîşan dike ku şidet di çî radeyê de rasterast û bi peyvên sereke yên banal tê veguhestin. Ligel vê mînakê jî temamiya çîrokê nayê vegotin. Peyv û hevalnavên ku şidetê bibîrtînin weke helbestekê tîr rêzkirin: “Wiha lê dixin ku li qereqolê, wek strîna stranê, “Minteniyo dînikê bikuncî”. Pihîn û şeqam, şeqam û pihîn, dûre derpêyê min tînin xwarê, rûn li çî didin ku, komîser pozê xwe di nava her du pêçikên xwe de dişidîne... *Bibin, wî yê qûnbigû zû bavêjin derve ...*” (Tol, 133) Xwendevanê ku tê ferzkirin ji berbelavî û tundiya şideta li Tirkiyeyê haydar e, ji bo tijekirina valahiyên sehneyên wiha û nivîsandina metnê, tê vexwendin.

Di romanê de asta şidetê car caran ew çend bilind dibe ku vebêjer xwe û zimanê xwe wînda dike. Peyv nîvco dimînin, deng dixeniqin. Di vê rewşê de vegotina şidetê hema bêje êdî ne mimkun e: Wek mînak, Şairê ku weke kesekî li hemberê rewşa şidetê bêhiş bûye, hêdî hêdî ji zimanê xwe dibe:

“Û sibehê diperçiqînî û tîr. Bi topên xwe, bi tivingên xwe, bi qesetûreyên xwe, bi rikên xwe tîr. Hemû pir gir, hemû pir xakî, paçên keskî zerî li serên wan pêçayî, rûnên reş li ser rûyên wan danî, postalên wan qirase, palasqeyên wan ê bi qasê bihostekê, madlyonên wan ê sorê gz, gustlk, kenn wn ku psk diqrsîn... Çarknrk vîşî xêz dîkn... Komutaxne, şkenxan, myxne, tecwxa... Cwnên ku pê dkrin didn ber kurş... Esmer’ê, Sle’î, KMam’î, Brc’yê û yên din dikişn mydnê... parç... taz dkn... drçknin... pr cran... l dxin bi seatn... xwn di nav dmn xwn... sng wn lme lme... Şr xw kaşdk derdikv isknx... yek dkeve pyê wî, Salih, qamyonet piçek li pêş e... Hadê... hd... Sr mê di... Esm... dû wê de sorê gz... çavên wê çilspî... çvn w çlsp... Aaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaa...” (Tol, 191)

Ev îqîbas, ji hîsên Şairê ku taxa kolîtan jê re bûbû stare re dibe “tercûman” dema ku ew tax bi destê tîmên taybet tê wêrankirin. Şair di vê îqîbasê ku tê de peyv ji holê radibin û hêdî hêdî vediguherin dangan û wêrankirina taxa kolîtan pêk tê, qîset dike ku ew tax piştî ziyareta Îsmailê kekê Şair a di 11ê Îlona 1980an de ku di metnê de wek şîfreyek (yek, yek, sifir, neh, heşt, sifir) tê dayîn û di sibeha 12ê Îlonê de bi destê tîman hatiye wêrankirin. Ev bûyer rê li ber hişavêtina wî vedike û îfadeya vê rewşê ya zimanî bi peyv û tîpên ku ji holê radibin ve tê veguhestin. Tîmên taybet ên ku avêtine ser taxê, her kesî li ba hev dicivînin û îşkence li piraniya wan dikin. Tecawizê hinekan dikin û ciwanan didin ber guleyan. Hevalên Şair jî bi erdê re

dikişnin meydanê, tazî dîkin, qor bi qor bi seatan ew çend li wan dixin ku ji nava çîmên mêran xwîn diherike, singa jinan jî wesle wesle dibe. Ev rewşa şidetê dibe sedem ku Şairê ku ligel hişyariyên birayê xwe yê ajan İsmail tax neterikandibû, hiş û zimanê xwe winda bike. Ya rastî ev windakirina ziman, asta şideta ku nikare bê ziman destnîşan dike. Weke ku Robert Cover di maqaleya xwe ya “Şidet û Peyv”ê de diyar kiriye, trawmaya mayînde ya şidetê sedema wê ye, “her tişt li cihekî, êş, zimên bi xwe winda dike.”⁷

Ne ku bi tenê ziman winda dibe, di heman demê de bi rêya fontên ku bi cuda hatine bikaranîn, muxlaqiyek çêdibe ka kî diaxive. Li herî dawî yê ku wek “aaaaa” diqîre kî ye? Şair di dema aktûel a vegotinê de li dû xwe mêze dike û wan rojan vediguhêze me? Ev deng aîdê wî ye an jî weke yekî ku şahidiya wan rojan kiriye dengê hinekên din vediguhêze? Dengê aaaaaayê aîdê wê rojê ye an jî destnîşan dike ku trawmayên êşên wan rojan, îroj jî berdeyam in? Belkî jî yê her duyan e.

Di vê sahneyê de pêşî şidet pir biteferûat tê teswîrkirin û tê dabînkirin ku xwendevan şahidiya şideta herî xwerû bike. Xwendevanê ku di metnê de dûçarê vê şidetê dibe, ji wê çendê ditirse ku di jiyana rasteqîn de ew jî her wext dûçarê heman muameleyê bibe. Di dawîya dawîn de ev sahne, wê rûxandina şideta di laşê mirovan de dibe asta herî bilind. Û bandora wê ya dramatîk a li ser xwendevan derdixîne zîrweyê. Ev teferûatên ku destnîşan dîkin laşên eziyetkirî ketine çî rewşê, dibe sedem ku xwendevan bikeve nav dehşetê, şok bibe, biteyse û ji teferûatan dilxelên bibe. Ev sahne li hemberê shekên dîtin, bînkirin û hestkirin ên xwendevan êrîşeke wahşî ye ku “şok”a Rita Felski tîne bîra mirov ku wê ev taybetî îsnadî metnên wêjeyî kiribû.⁸ Di vê keliya saw a saf de ku “pêşîrên jinan wesle wesle dibin” û “mêr bi çoyan tîn tacîzkirin” estetîka şokê, dikeve rewşeke wisan, xwendevan nema dikare tehemûl bike. Dema lîstikên nejrêzê yên vê romana tecrûbê û zimanê wê yê helbestkî, dîtarî û biyanîkirî tîn ba hev, estetîka şokê dabîn dike ku xwendevan di heman demê de hem dilxelên be û hem jî zewqa estetîkê tecrûbe bike. Nerihetîya ku ji naverokê tê û bi ser de dayîna naverokê bi şideteke ku bi rêya ziman û şeweyek nejrêzê konvansiyonên xwecih ên çîroksaziyê hildiwêşîne, vê heza estetîkê xurttir dike. Roman bi vê taybetîya xwe, sînorên navbera şokbûn û zewqê, bi berdeyamî nediya dike.

Şairê ku di sahneya jorîn de bi hevalên xwe re dûçarê şideteke tîr bûye, em bi awayekî îronîk dibînim ku di beşên din ên romanê de ew bi xwe li ser lehengekî din ê romanê, mesela li ser Yusuf, şidetê disepîne. Teswîrkirina wî kesê ku dûçarê şidetê bûye lê niha ew bi xwe li ser hinekan şidetê disepîne û dubarekirina wê, yanê ev cihguhertinên vî rengî, ji bo xwendevan jî dibe îmayek ku ev potansiyela şidetê bi wî re jî hebe.

7 Robert Cover, “Şiddet ve Söz,” dnd. *Şiddetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 176.

8 Rita Felski, *Edebiyat Ne İşe Yarar*, wer. Emine Ayhan (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 151-153.

Li ser vê xetê, Uyrkulak, dem bi dem şideta endamên rêxistinan jî bi bîr tîne ku demekê ew marûzî tiştêkî wisa bûn. Ew rêzeçalakiyên şidetê ên ku bi riya bombekirinan bajaran di nava xwînê de hiştine, piştî demekê di nav lehengan de dibin listikên şertî. Ev yek, hem destnîşan dike ku pozîsyona sepînerên şidetê dikare biguhere û hem jî di heman demê de dibe rûdaneke din a ku navê romanê ye. Tol, rewşek e ku pir caran bi rêya karakterê Oğuz jî dubare dibe. Oğuz ji malê derdikeve, ku ew û Cananê tê de ketine înzîwayê û mîna ku biçê dikanê, nîşeyeke bêxem datîne şûşeya meyê: “Ez derdikevim. Ez ê tolê hilînim û vegerim...” (Tol, 95) Şair jî di rêwîtiya trenê de bi hemû cidiyeta xwe ji Yusuf re dibêje min tola bavê xwe hilaniye. (Tol, 96) Îmaya ku kesê mexdûr di heman demê de dikare bibe sepînerê şidetê, di romana Yavuz Ekinci de jî îcar bi peywenda şidetê tê rojevê ku kurdan li ermeniyên kiriye.

Romana Yavuz Ekinci *Cennetin Kayıp Çocukları* (2012) ku ji sê beşên sereke yê bi sernavên “Tirî”, “Hinar” û “Hêjîr”ê pêk tê, bi pêşgotina dengekî vedibe ku em texmîn dikin vebêjerê beşa yekem e û ev deng bi awayekî rave dike ka çima pirtûk nivîsiye an jî vegotiyê. Kalikê dengê vebêjerê ku behsa êşên sedsalan jî dike, di nava êşan de miriyê û bavê wî bêyî ku li benda ecelê xwe bimîne xwe kuştîye. Ne mimkûn e ku vebêjerê bêyî nivîsandinê jiyana xwe bidomîne, ji ber ku bûye şahide hinek êşan. Ev romana şahidiyê ya ku piştî vê îzahê dest pê dike ji sê beşan pêk tê ku ji devê sê vebêjerên cuda tê vegotin. Beşa yekem a bi sernavê “Tirî”, demeke ku em texmîn dikin salên 80 û 90an e, bi çavê zarokêkî li gundê Mişritayê (Batman) tê qisetkirin, ev beş jiyana rojane û bi vî yekê şideta dewletê ya li ser gelê kurdê û herêma vedibêje. Piştî ku hemû malên gundiyan ji aliyê leşkeran ve tên şewitandin, beş bi koçberiya Rustem û malbata wî encam dibe. Vebêjer di vegotinê de çîrokeke mezinbûnê vedibêje. Ev vegotina ku bi rêya çîrokê û efsaneyên kalikê zarokê tê vegotin, carna silavek jî dide Yaşar Kemal û bi qisetkirina wê ya bi çavê zarokêkî, dabîn dike ku şideta rûdaye bê parzûn were veguhestin.

Beşa duyem a bi sernavê “Hinar”, bi çavê dapîra zarok/Rustemê tê qisetkirin ku îcar rabirdûyêke dûrtir e mijara wê. Xwendevan bi rêya tiştên ku di nava xewê û şiyarbûnê de dikevin bîra Xetîceya li ber sikratê, ku ew bi eslê xwe ermenî ye û navê wê yê rasteqîn jî Almast e, hîn dibe ku Xetîce di dema qetlîama ermeniyên de ji aliyê kalikê Rustemê û vebêjerê beşa yekem Hesên ve ji mirinê hatiye rizgarkirin. Hemû malbatê û Aramê destgirtiyê Almastê ji aliyê mirovên dinê herêma ve hatine qetilkirin. Jixwe di beşa yekem de jî Hesênê kal li ber sikratê, vî qetlîama ku ew jî tê de bûbû faîlek bi bîr tîne û tiştên bûyî parçe bi parçe dipispisîne guhê neviyê xwe. Hesên dike nake namire. Bi mehan li ber xwe dide, di doşeka mirinê de li hemû bedena wî birîn vedibin û kurmî dibin. Bi gotina herî sivik roman li vir edaleta helbestkî dixê dewrê. Dibe ku edaleta îlahî tunebe lê belê dikare di metnê de pêk bê. Belam ev sahne di xwendevan de erkê dilpaqijiyekê pêk nayîne. Lewra ev sahneyên ku mirov gelekî nerihet dikin, careke din êş û şidetê dide ber pozê xwendevan. Ligel ku xwendevan hîna bi temamî derûniya çîrokê nizane. Encax ew

ê di beşa li dû de bi bîranînên Xetîce/Almastê hîn bibe ku ka sûncê Hesên çi ye, berdêla çi dide. Kurdên gundî yê nîfşê kalîkê Rustem ê zarok û vebêjerê vê beşê, ermeniyên li heman herêmê dikuşin û li bin dara tûyê binax dikin. Hesên Almasta ku hemû malbata wê hatiye kuştin bi darê zorê digire. Bi vî awayî hem wê azad dike û hem jî berdest. Rustemê vebêjer, agahiya derbarê vê yekê de tenê di zaroktiya xwe de bihîstiye, ew jî bi awayekî kurt û wek pisepisên nexweşekî li ber sikratê. Lê belê, dapîr nabêje. Tenê bi bîr tîne. Yanê yê ku nîfşê Rustem/nevî bihîstiye bi tenê îmayek e, bibîranîna kêliya lapsuseke biçûk e. Almasta ku her tiştî li ber mirinê bi bîr tîne û ji nû ve dijî, bîranînên xwe bi yê derdora xwe re parve nake. Roman di vê beşê de bi dengê dapîrê û bi rêya şahidiya wê, wê heyamê ji nû ve dinivîse. Bi vî awayî bi rêya çîroka şexsî ya Almastê, xwendevan neçar dimîne ku bi şideta girseyî re rû bi rû bimîne, ew şideta ku gelê ermen lê dûçar maye. Ev yek di heman demê de îzafîbûn û guherbariya pozisyonên mexdûr û zordar jî destnîşan dike. Ekinî kiryarên bişedet ên li ser gelê kurd ê ku Xetîce weke mensûba wê tê xuyakirin biteferûat vedibêje û kurdan bi temamî ne wek leheng û ne jî mehsûm dinexşîne. Çîrokeke ku ne di nava malbat û ne jî di nava civakê de tê behskirin, çîrokeke ku bûye tabû tê qisetkirin, lê belê ev bi xwe wek pêvajoya bibîranînê pêk tê. Tew belkî ji ber vê sedemê vebêjer –em dikarin di vê nuqteyê de bibêjin ku dengê vebêjer Rustem e– dikeve nav karê vegotina rastiyên trawmatîk ku ev rastî nayên gotin, tenê bi dizî tînin bibîranîn an jî herî zêde tînin pispisandin. Rûhevketina bi qetlîama ermeniyên re, ku yek ji bûyerên herî trajîk ê dîroka modern a Tirkîyeyê ye, ji bo xwendevan jî aliyekî qels e. Ji ber vê sedemê jî dilpaqî nayê dabînkirin.

Di romanê de bi taybetî bi rêya Hesên û Almastê, rûhevketin di astên cuda de pêk tînin. Di asta şexsî de pêşî Hesên kirinên xwe yê rabirdûyê bi bîr tînin; dûre Xetîce/Almasta li ber sikratê şideta ku lê dûçar maye bi bîr tînin, ji aliyekî ve bi van êşan re hevrû dibe, ji aliyekî ve di hundirê xwe de nasnameya ku dûre wergirtiye û pêvajoya asîmîlebûnê guftûgo dike. Di encama vê guftûgoyê de bi pêkhatinên ku ji lawê xwe re vediguhêze û di nefesa xwe ya dawîn de jî bi awayekî vekirî diyar dike ku dixwaze li cem hezkiriyê xwe yê heqîqî Aram, bê binaxkirin. Nema dikare êdî xwe li ber vê înkare ragire, nasnameya xwe ya heqîqî dixwaze û dixwaze bi wê bê binaxkirin. Tazyîqa dîrok, dewlet û neteweperestiyê li ser takekes û civakê ew çend zêde ye ku Almast ji bo ku nasnameya xwe ya heqîqî ji lawê xwe re bibêje, neçar e ku li benda mirina xwe bisekine. Rê li ber rûhevketinên navmalbatî vedibe û ew jî dibe sedema mukirhatina Almastê û xwekuştina Mîrza. Rûhevketin ne bi van tiştan sînordar e. Di vê peywendê de şideta ku di romanê de tê teswîrkirin dibe alîkar ku civak bi şidetê re hevrû bibe, ku ev civak aniha dûçarê şidetê dibe lê demek berê ew bi xwe failê wê şidetê bû. Her cure xwendevan jî eger heya wê kêliyê roman ji destê xwe neavêtibin, bivênevê dikevin pêvajoya pirsyarîkirin û hevrûbûnê.

Di beşa duyem de, ku bi rêya bibîranînên Xetîce/Almastê rabirdûya dûr destnîşan dike, dema rojane salên 2000an e. Malbat, ku gava Rustem dibistana seretayî diqedîne,

ji gund derdikeve û li bajarekî din binecî dibe ku navê wî nehatiye dayîn. Vebêjerê beşa yekem Rustem mezin bûye û xwendekarê zanîngehê ye. Ji ber ku dapîra wî li ber mirinê ye, çûye mala malbata xwe û ligel bav û xwişkên xwe li benda mirina dapîra xwe ye. Di vê beşê û ya li pey wê de Rustem ji pêkhatinan bêhtir bi xwe, dildara xwe û telefona xwe mijûl e. Lê belê bi taybetî di beşa dawîn de tiştên lê bûye şahid ew çend dilbîşewat û tije şidet in ku, di beşa destpêkê de, ku çarçoveya vê romanê pêk tîne, vediguhere kesekî ku di encama hemû tiştan de ev metn nivîsiye. Rustemê ku êdî xwedî şexsiyeteke tije hêrs, kîn û nefret e, di vegotina çarçoveyî ya romanê de, vê veguherîne wiha rave dike:

Dema ku ez bi jiyaneke çavçilî û hêviyên hinekên din dêranbûyî berdeyam bûm, piştî wextekê, ez ketim dilqê yekî ku li kê derê binihêre, mirinê bibîne û hişê xwe bavêje. (...) Xwekuştina bavê min, a ku piştî hêviyên wî yên nemayî rû da, ku ti kesî guman nedikir, pêşî nivîne min veguherande gorekê, paşê xaniyê min veguherande goristanekê, pê re jiyana min jî veguherande termekî. Ku min qincilê xwe kiribû û xwe dabû bendê ku ez razê, rik û xezeb ji nişkê ve mîna Cebrailê di Şikefta Hîrayê de ji Hezretî Mihemed re gotî, “Bixwîne!” hat û li ser singê min rûnişt û ji dêvla ku bibêje, “Bixwîne!” weku bike ser min, got, “Bibêje!” (*Erdên Bihuştê yên Winda*, 12-13)

Rustemê ku bi karîgeriya şideta îşkenceyê dibe vebêjer an nivîskar, encax dikare bi rêya vê yekê bîne ziman, têxe bîra kesan û bi mayîndekirina wê jî jiyana xwe bidomîne. Kîryara tahkiyekirina vê tecrûbeya ku bi qasî dirêjahiya dîrokê bûye qedera gelê herêmê, vegotina Rustem bi tena serê xwe dike rûhevbûna takekes a bi şidet û hesabjêpîrsînê re, lê erkê van tiştan ji xwe wêdetir e. Li vir, Rustem bo ku bi rêya nivîsê re karîgeriya trawmatîk a şidetê têk dibe û bo ku bi bavê xwe re heman qederê nejtî, li ber xwe dide. Bi çîroka ku qîset dike re Rustem ji aliyekî ve balê dikêşe ser komaleyetiya vegotina şidetê, ji aliyekî ve jî wek bikerekî vê vegotina hevpar xwe, yanê ya gelê kurd, diguherîne.

Beşa ku nexweşiya wextdirêj a dapîrê, demên wê yên ciwaniyê, salên ku ew û ermenî dûçarê qetlîam û şidetê bûne qîset dike, ev beşa ha ya ku bi pestgotin, bîranîn û xewnerêşkan bûye çîrok, bi mirina dapîrê re diqede. Beşa dawiyê ku navê wê “Hejîr” e û ji bo gelê herêmê pîroz tê hesibandin, bi epîgrafeke ji Încilê dest pê dike: “Yên ku guhên wan hene bila bibihîsin!” Ekinciye ku bi vê epîgrafê destnîşan dike ku metna wî metneke şahidiyê ye, di beşa dawîn de bi rêya rûdanên veşartina termê Xetîceyê, binê wê şidetê xêz dike ku ew şidet di nav dîrokê de bêçaretîya qedera gelê herêmê tayîn dike. Beş bi mirina dapîrê ya ku dibêje “Aram” û dimire û bi dubarekirina daxwaza wê ya dawîn vedibe. Bi rêya vebêjerê kesê sêyem mirina dapîrê vê carê bi çavekî derveyîn tê vegotin. Ev beş, şideta li ser van erdan –erdên wînda yên bihuştê- vedibêje ku Mîrza û Rustem tê de dûçarê şidetê dibin û neçar dimînin ku wê erdê biterikînin. Mîrza û Rustem ji bo ku daxwaza dawîn a dapîrê yanê xwesteka wê ya ji bo ku li van erdan bê binaxkirin bînin cih, bi darbesta wê dikevin ser rêya gund, ku malbata dapîrê jî di van erdan de binaxkirî ye. Piştî teswîra termê dapîrê seba ku nehatiye binaxkirin riziya, bi awayekî têkçûyî vegera Mîrza ya li bajêr û

bi awayekî trajîk a xwekuştina wî beş bi dawî dibe. Mîrza û Rustem hewil didin ku li nêzika gundê xwe yê kevin, ku niha herêma operasyonê ye, termê dapîrê binax bikin. Lê di wê gavê de şideta fîzîkî û psîkolojîk a ku –dapîr jî para xwe jê digireleşker li qereqol û nezaretxanê disepînin, hem ji bo karakter û hem jî ji xwendevan digihîje astên bêgav:

Gava ku serbazan hahanga Rustem û Mîrza kaş û berkaş dikirin û dibirin, serbazê qambihust jî bi piyên têrm girtibû, di erdê re kaş dikir. Ku *Mîrza xîret kir bireve ser termê dayîka xwe yê ku di erdê re dihat kişandin*, serbazê li pişt wî sekinî pê ket bi pihînan li wî xist, serbazê din ket ortê û ew sekinand.

Deriyê hesin bi xezeb vebû. Serbazan Mîrza, Rustem û Xetîceya ku di erdê re kaş kirin û anîn, avêtin naverasta jûrê. Du serbazan destên xwe di kêlekên pantorên xwe dan *ji bo ku xwîna di destên wan geriyayî paqij bikirana*. Ku yê pozpîjîn bêvila xwe hişkehişk girt û çû, yê bejinbilind î enîbilind piçekî sekinî, gerikê ku di ser destê wî re diçû ser milê wî zeft kir û di nava du tiliyên xwe de perçiqand. Siya pîltan a serbêz dida ser dîwêr. Gava ku Mîrzayê bi pišta xwe girtî hewil da li ciyê ku lê velezîyabû xwe rast bike, serbazê bejinbilind perpitîn û nalenala wî bihîst, çû balê û *singê wî li ser hev da ber pihînan*. Mîrza, weku ji hindav de tîrek ketibe mîdeyê, daqûl bû û heta ku duta bû qincilê xwe kir, gava ku êdî kelek jî pê re nema, got kurm û deverû ket erdê. Piştî ku wek mirîşka ku serî bê jêkirin û sêrî bavêjin erdê sê çar daran perpitî, weku ruhê wî ji bedena wî kişiyabe pelişi. Serbazê bejinbilind xwêdana li eniya xwe ya bilind civiyayî paqij kir û dikira derketa, yeqîn hê dilê xwe lê rihet nekiribû, *dîsa hat û yek du pihînen din jî dawêşande kêleka Mîrzayê ku pelişi bû*. Te got qey wî pihîniyê dadiweşandin qurmê darekê yê hişk, wisa dengên qube jê diçûn. Serbazê pozpîjîn î jarik li ser xirecir û repîniya ku lê tesele bû reverev hat nezaretxaneyê û berê xwe da hevalê xwe, got, “Lênexe lawo! Tu tirredîn î? Ji Xwedayê xwe bitirse!” Ku wî bi milê hevalê xwe girtibû û hewil dida ku wî bikişîne derve, yê ku ji xezebê û ji hêrsa tolhîlanînê çav li sêrî bûbûn kasikên xwîne, hevalê wî wek zinarekî li ber xwe dida ku ji nezaretxaneyê dernekeve. Serbazê bejinbilind î enîbilind ji nava destên hevalê xwe filitî, *tûka xwe di devê xwe de top kir û tîfî bedena tazî ya Xetîceyê kir*, ku beşek ji kefenê wê qelişibû û ji hev vebûbû, zilam bi fitefit ji nezaretxaneyê derket. (*Erdên Bihuştê yên Winda*, 363-364)⁹

Di vê sahneyê de xwendevan hengava ewkkirin û heywanîkirina mirovekî bi tevgereke wahşiyane ya kesekî sadist, bi awayekî herî xwerû tecrûbe dike. Di vê sahneyê de ku sepînerê şidetê tê de mirovayetiya xwe winda dike, ji ber îşkenceya fîzîkî, yê dîçar jî bi darê zorê dîrî mirovayetiya dibin, xwendevan bi karîgeriya “şok” a ku Felskiyê teorîze kiriye careke din lertzîneke mezin derbas dike. Ev sahnê li ser xwendevan karîgeriyek dramatik çêdike ku her çend ji aliyê vegotinê ve ji hev cuda bibin jî dişibe karîgeriya sahneya *Tola* Uyrkulak a ku Şair zîmanê xwe winda kiribû. Bi bandora îşkenceya fîzîkî û psîkolojîk a li ser bedena mirov ku bi awayekî xwerû hatiye şayesandin, bi tahde, biçûkkirin û êşê re

Seheka me ya hevsengê ji holê radibe; em xwe di rewşeke şaşomaşobûyî, sergêj û serobinoyî de dibînin, ji bona ku em peyvên guncan bibînin digevizin lê belê em nikarin

9 İtalîk aîdên me ne.

hişê xwe bidin serê xwe û bertekek hevgirtî bidin. Şoka ku bi hatinacemhev a hestên cur bi cur ên kerx, tirs û pênewletiyê pêkhatiyê, dikare hem beden û hem jî zêhn ji bo demeke kin ji erkê xwe bixîne. Karîgeriyên nişkavî yên ku şokê çêdike, yekcaran zûzûka belav be û here jî, şokên paşing dikarin di ruh de demeke din bèn hîskirin û dewam bikin; silsileyê bertekên somatik û ruhî yên demdirêj ên ku derengmane an hatine derengxistin jî dikarin bidin pey şopa karîgeriya pêşîn.¹⁰

Di dirêjayiya vê beşê de ji aliyekî ve şerê li herêma operasyonê ya di navbera PKK û leşkeran de tê vegotin, lê belê nîvenda esil şideta fîzîkî û psîkolojîk e ya ku Mîrza û Rustem lê dûçar dibin. Jixwe karîgeriya ku li ser xwendevan çêdibe tam jî ev e. Li pêşberî dîmena şidetê weke lehengên van her du romanên em ê xwendevan jî bi berdewamî dikevin şokê, dilerizin, ditirsin û pêjna bêewletiyê dikin û ji demekê şûn de dikevin rewşeke wiha ku em nema dizanin çi bikin. Gava ku ew miriyekê li ser milên xwe digerin û di bin barê pêkanîna xwesteka wê ya dawîn de dipelçiqin, xwendevan jî ji ber ku bûye beşdarê vê dîroka bixwîn li ber xwe dikeve. Lewma şideta li ser van erdan ji binaxkirina miriyekê re dibe asteng. Û bédengbûn an nedîtîna jî, şidetek e.

Di dema vê binaxkirinê de ku nêzî dawîya romanê biteferûat tê vegotin, Mîrza bi qasî ku jê nayê hêvîkirin, ezîmkar û birik e. Lê belê lawê wî Rustem hem pir ditirse û hem jî vê hewildana bavê xwe fehmanake. Hişê wî hîn li ser hezkiriya wî ye ku dê ew ê were mal û wî nebîne. Di dawîya beşê de “dema ku bedena bavê xwe ya bi kindirê ve daleqiyayî datîne xwarê” çemberê temam dibe. Rustemê ku dibe şahidê vê yekê jî bi awayekî hay ji nasnameya xwe dibe û vediguhere vebêjerê vê çîrokê. Bi gotina kalîkê xwe ya ku di zaroktiya xwe de bihistiye, “Kurê min, dinya siya darekê ye” adeta ji nû ve vedigere zaroktiya xwe û ji sêrî de dest pê dike û tiştên bûyî vedibêje.

Ekinci şideta ku takekes û hemû sazîyên dewletê disepînin ji xwe re kiriye derd. Lewma romana wî bi biteferûatkirina sahneyeke şidetê vedibe ku mirovek li ser heywanekî disepîne. Yek ji serlehengên romanê Hesen di destê wî de şûjin bi awayekî bêeman mişkêkî nêçîr dike. Heman Hesen piştê jî mişkên din bi xedarî di bin lingên xwe de dipelçiqîne. Li gor wî mişk ji bo wî afirîdeyek ziyankar û kerax e. Her wiha ev modeleke mîkro ya kategoriyên her cure şidetê ye ku di romanê de em leqayî wê dibin. Roman her cure şideta ku dewlet li ser kurdan disepîne –gef, kotek, jêpîrsîn, îşkence, kuştin- vedibêje û di heman demê de bi bîr tîne ku ev koma ku dûçarê şidetê bûye di rabirdûya xwe de bûye sepînerê şidetê. Di romanê de rûdanên cuda yên şidetê tê vegotin. Ligel şideta fîzîkî ya ku cara pêşîn îşkence an jî kuştinê bi bîr tîne, şideta aloztir a psîkolojîk jî tê qisetkirin weke dînguhertinandina bi darê zorê, navguhertin, astengkirina pîrozbahiyên Newrozê an jî qedexekirina zimanê zîmkakî hwd.

Di romana *Tolê* de ji bo balê bikêşe ser asta şidetê, cureyekî bêzîmaniyê tê bikaranîn; di romana Ekinci de asta şidetê li gelek cihan bi rewşa herî dramatîk tê biteferûatkirin. Bi vê peywendê, di romanê de sahneyên gelekî girîng hene ku ev

10 Felski, r. 141.

şert û mercên jiyane, keftûlefa man û nemanê û bêçaretiya gundiyan ku di navbera dewleta Tirkiyeyê û PKKê de mane destnîşan dikin. Di cihekî romanê de gerilayek tê mala yek ji giregirên gund, Mela Mehfüz. Mela jî wî derman dike. Piştî leşkerên ku gerîla bi awayekî birîndar derdest dikin, ji bo îbretî alem wî bi erdê ve dikişînin û di nava gund re dibin qereqolê. Roman, bi çavê Xetîce/Almast, tiştên ku ji vir şûnde dibin, wiha tîne zimên:

Çar rojan piştî vê rûdanê, dema ku du peyayên çekdar dîsa bi şev li deriyê Mela Mehfüz xistine, Mela Mehfüz ji tîrsa xwe pêşî derî venekiriye, gava ku peyayên çekdar gotine ku ew ê êgir berdin malê, mela li hevsera xwe, zarokên xwe û neviyan xwe yê li malê fikiriye û derî vekiriye. Peyayên çekdar ew girtin û di erdê re kişandin birin weku pezekî biherin. Keça wî û hevsera wî çendî jî qûjiyan û giriyan, ne peyayên çekdar sekinîn ne jî cîran derketin derve, yê ku li paş pencereyan ketibûn temaşeya tiştê ku diqewimî. Serê sibehê, wexta ku seyên gund baz dan ber cihokê û lê xistin, gundi jî tirsitirs çûn wir û termê Mela Mehfüz li ber cihokê dîtî, ku her du çavên wî hatibûne derxistin, batiyê wî û guhên wî hatibûne jêkirin. Wê rûdanê xofeke giran xiste zikên gundiyan û ji wê şevê û pê ve hemûyan biryar girt ku hinekan li dêrî bixista jî wan ê venekira. (*Erdên Bihuşte yên Winda*, 219)

Yek ji xalên ku şideta fîzîkî derdixe zîrweyê, di dema tehcir û qirkirina ermeniyên de ew tişt e ku tê serê Aramê hezkiriyê Xetîce/Almastê ku belkî yek ji karakterên herî dramatîk a romanê ye. Roman lêrasthatina Xetîce/Almastê bi bedena mîrî ya Aram re, bi awayekî gelekî biteferûat teswîr dike:

Dema ku min hêwirzeya li terazin veçiqand û li Aram derketim, ez felişim. Ewr, balinde, sêla esmanî û hêwirze li dora min çerx dibûn. Bextbireşê min, Aramê melhema kulên min wek beranekeî şerjêkirî û gurandî bi dar ve kiribûn bi darberûyeke li nava zinaran ve. Bêvîla wî û guhên wî ji binî ve jê kiribûn, devê wî jî ji kêlekan ve heta bi guhên wî qelaştibûn. Xwîna li ser rûyê wî ya hişkbûyî, derên qusiyayî yê pelixî, birînên ku dişibiyên qefayan û dewşên şewata cixareyê, ku her yek jê bûbûn birîn, kiribûn ku kesî nikaribûya ew nas bikira. Pantorê wî yê ku heta jûniyan wî şiqitandibûn reş bûbû li ber xwîna ku ji batiyê wî yê sunetkirî dilop kiribû; gêrik li ser xwîna hişkbûyî digeriyan, mêş li dorê difirikîn. Hemû neynûkên piyên wî yê xas ên ku li ber bê dihejiyan wek bizmarên ku mirov ji depan rake rakiribûn û avêtibûn erdê. Li dewşên neynûkên rakirî, çermê qelişî û xwîna hişkbûyî ya derderkî hebû. Bi sedan gêrik û kurm ketibûn birînên li ser singê wî, piştî wî û rûyê wî, tê de digeriyan, mêş li dorê difirikîn. (*Erdên Bihuşte yên Winda*, 206)

Xetîce/Almasta ku neçar dimîne nasname û evîna xwe ya heqîqî veşêre, li ber sikratê trajediya xwe ya şexsî û drama gelê xwe bi awayekî pestgotinî û parçeyî bi bîr tîne û dixê bîra xwendevanan. Almasta ermenî ya ku berê dîn, nav û nasnameya wê bi kotekî tê guherandin îroj jî ji ber ku weke kurd tê hesabandin dûçarê şideteke herî xedar dibe. Ew bi xwe vê rewşê wiha tîne zimên:

Bîrhatiyên min di gundên xalî de wîna bûn. Pêşî gundê ku ez lê ji diya xwe bûm, mezin bûm û evîndar bûm veguheriya xopanê, piştî jî gundê ku ez lê zewicim û min zarokên xwe anîn dinyayê û tirşika wan xwariye hat şewitandin û rûxandin. Ew rojên

min ên xweşik ên ku bi baranan şil dibûn û bayên biharê hênik dibûn ka li ku derê ne?
Di nava kaviên her du gundan de ma bi tenê bîrhatiyên min man? An na ew jî firiyan
û çûn? Na, ne ku bi tenê li wir bîrhatiyên min man! Di nava kaviên wan gundên de ku
vegahariyane xopanê, ruhê min, bedena min, rabirdû û hêviyên min man.

Xetîce/Almasta ku di dil û giyanê xwe de tucarî misilmantî nepejirandiye û di
dirêjayiya jiyana xwe de bêdeng maye, di romanê de ji ber ku xwedî du nasnameyan
e, du qatê her kesî mexdûriyetê dibîne. Mîna ku dûçarîbûna wê ya li şideta herî xedar
ne bes be, dema dimire destûr nayê dayîn ku li erdên tê de ji dayik bûye û mezin
bûye, li cem evîna xwe ya ciwanîyê bê binaxkirin.

Tol û Cennetin Kayıp Çocukları ji sînorên berhemên wêjeyî yên ku şideta mutleq
teswîr dikin derdikevin û her wiha di cografyaya Tirkîyeyê de veguherîna şideta ku
pêyderpêy ber bi pratîkeke civakî û sazûmanî ve diçe jî rexne dikin. Her çend ku
vê yekê bi stratejiyên vegotinê yên ji hev cuda bikin jî di dawîya dawîn de her du
jî xwendevan vedixwînin ku bi vê pêvajoyê re rû bi rû bin û hesab jê bipirsin. Di
vegotina şidetê de pozîsyoneke têkel a wêjeyê heye. Metna wêjeyî şidetê rasterast
wek belgefilm venaguhêze, bi tenê tiştê tê zanîn vediguhêze çîrokê û ji bo rûbirûbûna
ku me li jor qal kir, dibe navgîn û amrazek. Di vê peywendê de divê şidet bi derfetên
konvansiyonên wejeyê bê nivîsîn. Lewra ev yek dabîn dike ku vegotinên şidetê
yên ku xwe veguherandine malzemeyekî estetîk û derfetên zimanî heta dawiyê bi
kar tînin, bandoreke dramatik li ser xwendevan daynin û ji ber vê nahêlin ew ji
rûbirûbûnê birevin. Lewra li gor me di kêlî û qadên ku dîrok bêdeng dimîne de,
wêjêkirina şidetê beravajiyê problemekê, derfetek e.

Romana *Tolê*, dinyaya parçeyî ya takekesê modern ê ku dûçarê şidetê bûye, dê
çawa bê temsîlîkirin, ji xwe re problematîze dike û her wiha vê yekê tîne cih. Ji vî
alî ve ew li gor vê problematikê ziman û çîroksaziyeke parçeyî însa dike. Şûna ku
tiştên qewimî bi awayekî eşkere ji xwendevan re qiset bike, bî îma û bîrxistinan, di
nava dinyayek wêjeyî ya surrealîst û helbestkî de vê yekê estefîze dike û xwendevan
pê dihesîne.

Di peywendê pirsên me yên jorîn de yek ji meseleyên bingehîn a romana Yavuz
Ekinciye ku şidetê ji xwe re kiriye mijar, şideta ziman e. Çîrokên zarokên seba ku tirkî
nizandin di dibistana seretayî de rastî trawmayan hatine; çîrokên dê û bavên seba ku
kurdî qedexe ye nikarin bi qîz û lawên xwe yên girtî re xeber bidin; an çîrokên kesên
seba ku tenê kurdî xeber dane rastî şidetê hatine, ev tev bi çavê mexdûrekî hatine
qisetkirin. Ewe di çiyekî romanê de di navbera kal û pîran de axaftineke wiha derbas
dibe. Zubeyirê ku tinazên xwe bi her tiştî dike û bi vê yekê navdar e, ji giregirekî
gund Mela Mehîfûz, biisrar zimanê bihuştê dipirse. Gelek gundî dil dikin ku zimanê
ku li bihuştê tê bikaranîn erebî be û baweriya xwe bi vê yekê tînin. Ev mirov, eger
zimanê bihuştê bi tirkî be dil dikin biçin dogehê. Lê di ber de ev romana ku çîroka
van mirovan vedibêje jî bi tirkî hatiye nivîsîn. Ev mexdûriyeta wî kesê ku bi zimanê

netewa serdest xeber dide û bi wî zimanê serdest dinivîse, gelo tê çi wateyê? Beşa yekem a romanê epîgrafeke ji Xelacê Mansûr dest pê dike: “Dojeh ne ew cî ye ku em tê de êşê dikişînin, lê ew cî ye ku kes nabihîze em êşê dikişînin.” Belkî jî yek rêya ragihandina êşan heye ku mirov bi zimanê xwe gazî serdestê xwe bike.

Werger: Güneş Kan*

Çavkanî

- Avelar, Idelber. *The Letter of Violence: Essays on Narrative, Ethics and Politics* (New York: Palgrave Macmillan, 2004).
- Benjamin, Walter. “Şiddetin Eleştirisi Üzerine,” dnd. *Şiddetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 19-42.
- Cover, Robert. “Şiddet ve Söz,” dnd. *Şiddetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 175-213.
- Derrida, Jacques. “Yasanın Gücü: Otoritenin Mistik Temeli,” dnd. *Şiddetin Eleştirisi Üzerine*, amd. Aykut Çelebi (İstanbul: Metis Yayınları, 2010), r. 43-133.
- Eagleton, Terry. *Literary Theory: An Introduction* (Oxford: Wiley-Blackwells, 2008).
- Ekinci, Yavuz. *Cennetin Kayıp Toprakları* (İstanbul: Doğan, 2012).
- Felski, Rita. *Edebiyat Ne İşe Yarar*, wer. Emine Ayhan (İstanbul: Metis Yayınları, 2010).
- Halavut, Hazal. “Tol: Bir İntikam Romanı,” *Mesele*, hej, 28 (Nisan 2009): 35-36.
- Uyurkulak, Murat. *Tol: Bir İntikam Romanı* (İstanbul: Metis Yayınları, 2002).
- Žižek, Slavoj. *Violence: Six Sideways Reflections* (New York: Picador, 2008).

* Li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, di beşa Ziman û Çanda Kurdî de lêkoler.

Rûniştina Duyem
DÎROKÎBÛNA HEWZEYA ÇANDÎ

LI GORÎ SERDEMÊN TARÎXÎ TÊKILIYÊN
DI NAVBERA EDEBIYATÊN
KURDÎ Û TIRKÎ YÊN KLASÎK DE

Abdurrahman Adak*

DESTPÊK

A. Çarçoveya Giştî

Piştî ku di serdemên tarîxî de kurd û tirk rastî hev hatine û piştî jî wekî du cîranan bi hev re dest bi jiyaneke nû kirine, di navbera edebiyatên wan de jî bi awayekî jêneger têkilî û danûstandinek çêbûye. Herçiqas têkiliya edebiyata kurdî bi edebiyata tirkî re, ji têkiliya wê ya bi edebiyatên erebî û farisî re derengtir dest pê kiriye jî, lêbelê dîsa jî têkiliya di navbera wan de ji texmînê zêdetir dewlemend û balkêş e, loma jî hêjayî lêkolînê ye. Ji ber ku têkiliya di navbera her du edebiyatan de paralelî têkiliya her du gelan a siyasî çêbûye, bi awayekî xwezayî çawanî û çendahiya têkiliya edebî li gorî reng û asta têkiliyên siyasî guheriye. Loma jî ji bo ku ev têkilî baştir bê fêmkirin, divê mijar di çarçoveya merhele û serdemên tarîxî de bê pêşkêşkirin û taybetiyên serdeman li ber çavan bînin girtin.

Çawa ku ji sernavê jî diyar e, di vê xebatê de tenê di çarçoveya edebiyata klasîk de dê li ser têkiliyên edebiyata kurdî û tirkî bê rawestan. Loma jî têkiliyên ku di çarçoveya edebiyata modern de derketine meydanê derveyî sînorên vê xebatê ne. Heta niha di çarçoveya edebiyata modern de têkiliyên edebiyata kurdî û tirkî bala hin lêkolîneran kişandiye û di vî warî de hin xebat jî hatine kirin.¹ Lêbelê di çarçoveya edebiyata klasîk de dikare bê gotin ku tu xebat nehatine kirin. Ev jî dide nîşandan xebateke bi vî rengî grîng e û dê valahiyeke mezin dagire.

Li gorî serdemên tarîxî tesbîtkirina têkiliyên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî yên klasîk de armanca yekem a vê xebatê ye. Armanca duyem, ji aliyê destpêkirin,

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.

1 Bo nimûne bnr. Rohat Alakom, *Türk Edebiyatında Kürtler* (çapa sêyem), Avesta, İst. 2010; Selim Temo Ergül, "Türkçe'de Kürt Edebiyatı", *Dipnot*, j.2/ 2010, r. 213-231; Haidar Khizri, "Mîratî Şûm: Wênay Kurdekan le Kulturî Turkî da", *Kovara Nûbihar Akademî*, 1/1, Stenbol 2014, r. 55-68.

pêşveçûn û rawestanê ve tesbîtkirina pileya van têtikiliyan û ya sêyem jî tesbîtkirina cureyên van têtikiliyan e.

Di vê xebatê de têtikiliyên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî yên klasîk de, li ser du serdemên sereke hatiye dabeşkirin: Têtikiliyên serdema klasîk û têtikiliyên serdema modern. Têtikiliyên serdema klasîk jî li gorî kronolojî û asta têtikiliyan di nav xwe de li ser sê serdeman hatiye dabeşkirin: Têtikiliyên pêşî (Ji destpêkê heta bi sedsala XV.), serdema destpêkirina têtikiliyan (sedsal: XVI û XVII) û serdema pêşveçûna têtikiliyan (sedsal: XVIII û XIX). Serdema pêşveçûnê jî li ser du qonaxan hatiye dabeşkirin: Qonaxa yekem (ji dawiya sedsala XVII heta bi dawiya mîrektiyan) û qonaxa duyem: (ji dawiya mîrektiyan heta bi dawiya Osmaniyan). Lêbelê berî ku dest bi mijarê bê kirin, di çarçoveya amadehiyê de, dê li ser têtikiliyên kurd û tirkan ên siyasî nêrîneke giştî jî bê dayîn. Di encama xebatê de jî dê li ser hinek analîz û nirxandinan bê rawestan.

Herî dawî di warê rêbaza vegotinê de li ser du xalan divê bê rawestan. Yek jê, ji ber ku di xwezaya têtikiliyan de dualîtî heye, ji bo her serdemên navborî rengvedana edebiyata tirkî di edebiyata kurdî de û rengvedana edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de cuda cuda hatiye nîşandan. Ya duyem jî mijar di çarçoveya edîben kurd û tirk ên ku wekî aktorên rengvedanê dikarin bînin dîtin de hatiye pêşkêşkirin. Bi gotineke dî rengvedan û danûstandin bi riya kîjan edîbî çêbûbe, di sernavê de navê wî edîbî hatiye bikaranîn. Di bin sernavê de jî cureyên rengvedan û danûstandinan hatiye pêşkêşkirin.

B. Nêrîneke Giştî Li Têtikiliyên Kurd û Tirkan ên Siyasî

Ji aliyê tarîxî û siyasî ve têtikiliya kurd û tirkan heta bi sedsala XIem paş ve dizivire. Dema ku di vê sedsalê de Dewleta Selçûkî ava bûye û tirkan ji ber sedemên curbicur dest bi koçê kirine, tirk pêşî li Kurdistana Rojhilat, piştê jî li Kurdistana Bakur rastî kurdan hatine. Di wê pêvajoyê de li gelek deveran di navbera wan de şer û mîlîlaneyên curbicur çêbûne. Di rasthatina kurd û tirkan a siyasî de têtikiliya Merwanîyên kurd û tirkên koçber gelekî balkêş e. Lewra li aliyekî di navbera wan de şer û mîlîlane derketine, li aliyê dî hêzên tirkan bi piştgiriya hêzên Merwanîyan di şerê Melazgîrê de li hember Bîzansê bi ser ketine. Lê di encamê de li hemû bajarên Merwanîyan desthilatdariya wan ji destê wan hatiye girtin.

Piştî vê qonaxê li Kurdistanê gelek hikûmetên tirkan ên wekî Zengî, Artukî, Karakoyunî û Akkoyunî hatine avakirin. Di sedsala XIIem de, têtikiliya van hikûmetên tirkan bi Eyyûbiyên kurd re çêbûye. Piştî Selaheddînê Eyyûbî vê carê têtikiliyên van hikûmetan bi mîrektiyên kurdan re çêbûye. Vê pêvajoyê jî sedsala XIIIem heta bi sedsala XVem dom kiriye.

Piştî ku Dewleta Osmanî bi hêz bûye û hemû hikûmetên tirkan xistine bin desthilata xwe de, îcar têtikiliyên kurdan bi Osmaniyan re dest pê kirine. Di sedsala XVIem de mîrektiyên kurdan li Çaldîranê di şerê Osmaniyan û Sefewîyan de piştgiriya Osmaniyan kirine û piştî şer di navbera wan de peymanek çêbûye. Têtikiliya kurdan bi Osmaniyan re heta bi dawîlêhatina Osmaniyan dom kiriye. Bi avakirina Komara

Tirkiyeyê re qonaxa herî dawî ya têkiliyên kurd û tirkan dest pê kiriye ku ev qonax niha jî didome.²

BEŞA YEKEM: TÊKILIYÊN SERDEMA KLASÎK

I. Têkiliyên Pêşî (Sedsal XI-XVI)

Serdema têkiliyên pêşî yên edebiyatên kurdî û tirkî, beramberî rasthatinên pêşî yên kurd û tirkan tê. Di vê serdema dirêj de ku ji sedsala XIem heta bi sedsala XVIem dom kiriye, herçiqas di navbera kurd û tirkan de, ji aliyê siyasî ve gelek têkiliyên zindî çêbûne jî, ji aliyê edebî ve di wê astê de têkiliyên berbiçav çênebûne. Bi baweriya me sedemê herî grîng ê vê yekê ew e ku di vê serdemê de kurd û tirkan wekî du aliyê hevseng hev qebûl nekirine û di navbera wan de aramiyeke siyasî çênebûye. Sedemêkî dî jî ew e ku bi taybetî edebiyata kurdiya kurmancî hê tam rûnenîştîye ku ev sedem bi xwe jî heta pileyekê bi nebûna aramiya siyasî ve girêdayî ye. Loma jî têkiliya edebiyata kurdî û tirkî a vê serdemê tenê bi riya hin kurdên ku berhemên xwe yên edebî bi tirkî dane çêbûye.

A. Xelîlî

Xelîlî, di derdora 1407an de li Diyarbekirê hatiye dinyayê, di dema Siltan Fatihê Osmanî de li Îznîkê bi cih bûye û li wir li dergahekî postnişînî kiriye û di sala 1485an de li Îznîkê koçî dawiyê kiriye. Xelîlî, bi zimanê tirkî berhemeke bi navê *Firqetnameyê nivîsiye*.³ Xelîlî, ji bo têkiliya di navbera edebiyatên tirkî û kurdî de wekî nimûneya herî kevin dikare bê dîtîn. Lêbelê ev têkilî tenê di çarçoveya welatê wî û aîdiyeta wî de ye.

B. Şah Îsmâîlê Sefewî

Şah Îsmâîlê Sefewî (k.d. 1524) damezirînerê Dewleta Sefewî ye û helbestvanekî girîng ê edebiyata tirkî û farisî ye ku di helbestên xwe de mexlesa “Xetayî” bi kar anîye. Têkiliya Şah Îsmâîl bi kurdî re tenê di çarçoveya pêşiyên wî yên kurd de ye. Bapîrê wî yê mezin Şêx Sefiyuddîn ku dewleta Sefewî bi wî hatiye binavkirin, di çavkaniya herî kevin a derheqê malbata Sefewiyan a bi navê *el-Mewahibu’s-Seniyye fî Menaqibi’s-Sefewiyye (Sefwetu’s-Sefa)* yê de ku di sala 1358an de ji aliyê xwendekarê Şêx Sedreddînê Sefewî, Îbn Bezzaz ve hatiye nivîsîn wekî kesekî nijadkurd hatiye qeydkirin. Herweha ev agahi ji aliyê pisporê faris Ehmed Kesrewî û pisporê tirk Zeki Velidi Togan ve jî hatiye piştrastkirin.⁴

2 M. Emin Zeki, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, (wer. V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan), Nûbihar, Stenbol 2010, r. 137-257; M. S. Lazerîv, *Tarîxû Kurdistan* (wer. Ebdî Hacı), Spîrêz, Hewlêr 2011, r. 44-322; V. Minorsky, “Kürtler”, *İslam Ansk.*, weş. MEB, İstanbul 1993, VI, 1089-1114.

3 Ali Emiri, *Tezkire-i Şu’arâ-yı Âmid*, Matba’ a-i Âmidî, İst. 1327. r. 277-291.

4 Adel Allouche, *Osmanlı Safevi İlişkileri Kökenleri ve Gelişimi*, (Ji ingilîzî wer. Ahmed Emin Dağ), weş. Anka, İst. 2001, r. 44, 173-181.

Di destxeta *Sefwetu 's-Sefayê de Şêx Sefiyuddîn* weha hatiye nasandin:

“*Der zikrî nesebî quddise sirruhu Şeyx Sefiyuddîn Ebu'l-Feth Îshaq ibn eş-Şeyx Emînuddîn Cebraîl ibn es-Salih Qutbuddîn Ebûbekir ibn Selaheddîn Reşîd ibn Muhammed el-Hafîz li kelimallah ibn 'Ewwad ibn Pîrûz el-Kurdî es-Sincanî rehmetullahî eleyhim.*”⁵

Li gorî vê îfadeyê bapîrê mezin ê Şêx Sefiyuddîn, Pîrûzê kurdî ye û xelkê Sincan/ Sincarê ye. Dikare bê gotin ku zarokên Şêx Sefiyuddîn piştî ku ji Erdebîlê derketine di nav turkmenên elewî de zimanê xwe winda kirine û dest bi axaftina tirkî kirine. Loma jî têkiliya Şêx Sefiyuddîn bi kurdî re tenê bi riya kurdbûna bav û kalên wî çê dibe.

C. Şikriyê Bedlîsî

Şikriyê Bedlîsî, di dawiya sedsala XVem û destpêka sedsala XVIem de jiyaye û di sala 1523yan de koçî dawiyê kiriye. Wî temenê xwe zêdetir di serdema berî peymanana kurd û Osmanîyan de bûrandiye. Berhema wî ya herî girîng *Selîmname* (1521) ye ku mijara wê jiyanameya Siltan Selîmê Osmanî ye.⁶ Şikrî ji bilî berhema xwe *Selîmnameyê*, kurdî jî tê de bi şeş zimanan helbest nivîsandine. Wî bi xwe ev taybetmendîya xwe di fexriyeya xwe de ku pêşkêşî Siltan Selîm kiriye, weha aniye zimên:⁷

Şairem îşte ortalıkda sözüüm
Altı dilde gazel dirin ben özüm

Türkî dirin revân Nevaî gibi
Fârisîde hemân Benâyî gibi

Arabî söylerüm velî **Kürdüm**
Aybsuz Tanrıdur bu derhordum
Ermenî dilini kemâlince
Bilürüm **Hindî** dahi halümce⁸

5 Wergera wê weha ye: “[Ev beş] derheqê bineriha, sirrê wî pîroz be, Şêx Sefiyuddîn Ebu'l-Feth Îshaq kurê Şêx Emînuddîn Cebraîl kurê Salih Qutbuddîn Ebûbekir kurê Selaheddîn Reşîd kurê Muhammedê hafîzê kelimê Xwedê kurê 'Ewwad kurê Pîrûzê Kurdiyê Sincanî de ye, rehma Xwedê li ser hemûyan be.” Allouche, h.b., r. 178.

6 Gelibolulu Alî, *Künhü'l-Ahbâr'ın Tezkire Kısmı*, (amd. Mustafa İSEN), weş. AKM, Ankara 1994, r. 233, Kınalızade Hasan Çelebi, *Tezkiretü'ş-Şu'arâ*, (amd. İbrahim Kutluk), weş. T.T.K., Ankara 1989, II, r. 519.

7 Alî, h.b., r. 233.

8 Wergera van beytan a bi kurdiya kurmancî weha ye:
Ez şair im eva ne gotinên min
Bi şeş zimanan xezel dibêje şexsê min

Tirkî rewan dibêjim wekî Nevayî
Di fârisî de tam wekî Benâyî

Ev şeş zimanên ku Şikrî bi wan helbest nivîsandine ev in: Tirkî, farisî, erebî, kurdî, ermenî û hindî. Lê mixabin helbestên wî yên kurdî heta niha neketine destê me û nehatine dîtin.

Bi qasî ku tê dîtin, di serdema pêşî ya tîkiliyên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de kesê ku cara yekem tîkiliya edebiyata kurdî û tirkî rasterast temsîl dike Şikriyê Bedlîsî ye. Lewra herçiqas kesên wekî Xelîlî û Xetayî wekî nijad kurd jî bin, nayê zanîn ka gelo wan li kêleka tirkî bi kurdî jî helbest nivîsîne, yan nenivîsîne. Lêbelê Şikrî hem bi kurdî hem jî bi tirkî helbest nivîsîne ku ev tişt ji aliyê wî bi xwe ve hatiye îfadekirin. Lê divê bi zanîn ku helbestên Şikrî yên kurdî heta niha nehatine dîtin. Di vê mijarê de îfadeya tezkîrewanê Osmanî Kinalizade Hasan Çelebi ya bi şeweya “Çawaniya nezma kurdan malûm û mefhûmê xwediyên eql û bîreweriyê ye.”⁹ gelekî girîng e. Kinalizade, di danasîna Şikrî de piştî ku gotiye ‘ew xelkê Kurdistanê ye’ ev hizra xwe ya derheqê helbesta kurdî de derbiriye. Ji vê îfadeya wî tê fêmkirin ku Şikrî ji aliyê wî ve wekî helbestvanekî kurdî nêwê tê naskirin.

II. Destpêkirina Danûstandinan (Sedsalên XVI-XVII)

Herçiqas ji aliyê siyasî ve rашhatina kurd û tirkan vedigere heta bi sedsala XIem jî, ji bo ku tîkiliya edebiyatên kurdî û tirkî rasterast dest pê bike, pêwîst e li hêviya sedsalên XVI-XVIIem bê mayîn. Dema mirov lê dinêre, ev her du xalên jêrîn wekî sedemên sereke yên vê yekê derdikevin pêş:

1. Peymana Kurd û Osmaniyan:

Dikare bê gotin ku di tarîxa siyasî ya kurd û tirkan de her du aliyên cara pêşî di sedsala XVIem de hevdu wekî du aliyên hevseng qebûl kirine û di navbera wan de di çarçoveya meşrûiyeteke siyasî de tîkiliyeke bihêz dest pê kiriye. Çawa ku tê zanîn, di vê sedsalê de dewletên Sefewî û Osmanî hatibûn hember hev, mîrên Kurdan jî bi dîplomasiya Îdrîsê Bedlîsî û ji ber hinek sedeman Osmanî tercîhî Sefewîyan kiribûn û di encamê de jî bi hev re peymanek îmze kiribûn.¹⁰ Ev bûyer di destpêkirina tîkilî û danûstandinên kurd û tirkan ên di warên edebî de jî bûye faktoreke gelekî girîng.

Bi erebî dibêjim lê ez kurd im
Bê eyb Xuda ye ez derxord im

Zimanê ermenîyan di kemala wî de
Zimanê hinduyan di halê xwe de

9 Orjînalê wê weha ye: “Nazm-ı Ekrad ne makûle idüğü malûm ve mefhûm-ı ashab-ı akl û reşaddir.” (Kinalizade, h.c.)

10 Derheqê tifaqa Kurd û Osmaniyan de bnr. Zeki, h.b., r. 161-171; Lazerîv, h.b., r. 80-82; Minorsky, h.g., VI, 1089-1114; Şakir Epözdemir, *İdris-i Bitlisi ve Kürt Meselesi*, weş. Fanos, Ankara 2011.

2. Pêşketina Edebiyata Kurdî:

Berî sedsala XVIem edebiyata kurdî ya kurdên bakur di warê edebiyata nivîskî de zêde pêş neketibû. Ev edebiyat piştî vê sedsalê, bi rewşa siyasî ya nû ku piştî peymanê kurd û Osmaniyan derketibû meydanê û pêşxistina sîstema perwerdeyê ya kurdî ve girêdayî gelekî pêş ket. Ev pêşketina edebiyata kurdî di vê sedsalê de di destpêkirina danûstandinên kurd û tirkên ên edebî de bû sedemê duyem. Lewra eger edebiyata kurdî li holê tinebe, bi tu awayî behsa têkiliya wê û edebiyata gelekî dî nikare bê kirin.

Naxwe, divê destpêkirina danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî yê klasîk de, bi serdema nû ya ku piştî tifaqa kurd û Osmaniyan a ku di destpêka sedsala XVIem de çêbûbû ve bê girêdan. Maweya ku ji piştî vê tifaqê heta bi dawiya sedsala XVIIem dom kiriye, serdema destpêkê a danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de tîne meydanê. Di vê serdemê de danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de hem nû dest pê kirine hem jî ne zêde ne. Bi qasî ku tê dîtin di vê serdemê de du cureyên danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de hene:

1. Damezirîner û nûnerên herî girîng ên edebiyata kurdî yê wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî di helbestên xwe de hinek peyvên tirkî bi kar anîne û edebiyata tirkî bi awayekî rengê xwe daye edebiyata kurdî.

2. Hinek gerok û burokratên dewleta Osmanî yê wekî Gelibolulu Alî û Ewliya Çelebi ku li Kurdistanê rastî kurdan hatine, di berhemên xwe de cih dane hinek deqên edebî yê kurdî û edebiyata kurdî bi awayekî rengê xwe daye edebiyata tirkî.

Li jêrê di vê çarçoveyê de dê li ser rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de û rengvedana kurdî di edebiyata tirkî de bê rawestan.

A. Rengvedana Tirkî di Edebiyata Kurdî de

Di vê serdema piştî tifaqa kurd û Osmaniyan de, edebiyata kurdî ya klasîk ji aliyê helbestvanên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî ve hatiye damezirandin. Danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de jî cara pêşî di vê serdema damezirandinê de dest pê kiriye. Di vê serdemê de di warê rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran derdikevin pêş.

1. Melayê Cizîrî

Rengvedana tirkî li cem Melayê Cizîrî bi çend cureyan çêbûye.

a. Peyva “Tirk”

Cureya pêşî ya rengvedana tirkî li cem Melayê Cizîrî bikaranîna peyva “tirk” e. Mela, di dîwana xwe de di heft cihan de ev peyv bi kar anîye. Herçiqas Mela ev peyv wekî mezmûnekê bi kar anîye jî, lêbelê dîsa jî ji ber ku ev bikaranîn têgihîştina Mela ya ji peyva “tirk” a wê serdemê nîşan dide girîng e. Bi qasî ku tê dîtin Mela, di dîwana xwe de peyva “tirk” wekî mezmûnekê ji bo xweşikayîya xweştiriyê bi

kar aniyê. Mela di vê xalê de peyrewiya Hafîzê Şîrazî kiriye ku herduyan jî di van beytên xwe yê jêrîn de peyva “tirk” bi wateya xweştîyê bi kar anîne:

Hafîz:

Eger an turkê Şîrazî bi dest ared dilê ma ra
Be xalê hinduyêş bexşem Semerqend û Buxara ra

(Eger ew tirk/xweştîyîya Şîrazî berê xwe bide me û dilê me bigire
Ez ê Semerqend û Buxarayê fedayî şanikên wê yê wekî hindê reş bikim)

Mela:

Xemze in ya gezme in ya tîr ya sihrê helal
Sahirê î n ya çêşmê şoxê **Tirkê** bêperwast in

Lê di vê navê de Mela, wêfên talan û xwînrijandinê jî nisbetî tirkan kiriye. Ji nav gelek wateyên ku peyva tirk jî bo wan tê bikaranîn¹¹ de, tercîha vê wateya talan û xwînrijandinê, dikare bi êrîşên tirkan ên li ser kurdan ve bê girêdan:

Tirkê xwînriş û xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhda çîlsale li min zîr û zeber kir jî esas

Herweha Mela di vê beyta jêrîn de jî peyva “tirk” di wateyê erênî de bi kar aniyê ku ew jî “cengawerî” ye:

Ristem û Cimşîd û Xalid Hemze yan şêrê Elî
Aferîn ya şehsiwarê **Tirk** û rimbazê Ereb

b. Peyvên Tirkî

Rengekî dî yê tirkî di dîwana Melayê Cizîrî de bikaranîna wî ya hinek unsurên zimanê tirkî ye. Mela, di dîwana xwe de di cihekî de hevokê bi şêweya “mirwet û insaf yox” û di du cihan de jî peyva “Yexma”yê bi kar aniyê:

Netrik û tayên birîşî ê dizêrin pê ve wîşî
Min du fêris dîn di pêşî **mirwet û insafî yox**

Geh dil û geh can dibin Tirkên te tîn!

Nakirin **yexma** û talanê xelet!

Çawa tê dîtin, rengê zimanê tirkî di dîwana Mela de ne zêde ye. Ji ber ku tîkiliyên edebiyatên kurdî û tirkî hê nû dest pê kirine ev yek tê fêmkirin.

c. Di Dîwana Mela de Cihgirtina Helbesteke Ehmed Paşa

Ev xala rengvedana edebiyata tirkî li cem Melayê Cizîrî ne bi şêweya bikaranîna zimanê tirkî ye, lêbelê bi şêweya bikaranîna helbesteke erebî ya Ehmedê Paşayê helbestvanê Osmanî (k.d. 1496) ye. Di dîwana Melayê Cizîrî de helbestek heye ku

11 Agah Sırrı Levend, *Türk Edebiyatı Tarihi*, weş. TTK, Ankara 1998, r. 591-603.

varyanteke wê di dîwana Ehmed Paşa de jî cih digire. Bi gotineke di heman helbest hem di dîwana Mela de hem jî di dîwana Ehmed Paşa de heye. Lêbelê di nusxeya Mela de du beytên zêde hene. Helbest di dîwana Ehmed Paşa de ji 5 beytan, lê di dîwana Mela de ji 7 beytan pêk hatiye. Divê ev jî bê gotin ku Ehmed Paşa bi xwe jî ev helbest ji helbesteke Xizir Paşa re wekî nezîreyekê nivîsiye, lêbelê di navbera helbestên wan de cudahiyên mezin hene. Lê têkiliya helbesta Mela bi ya Xizir Paşa re tineye, helbesta wî ne ji ya Xizir Paşa ji ya Ehmed Paşa hatiye wergirtin. Lewra helbestên Mela û Ehmed Paşa ji bilî du beytên ku Mela lê zêde kirine, bi tevahî wekî hev in.¹²

Çawa ku li jorê jî hat gotin, ev helbest bi zimanê erebî û bi şêweya mustezadê ye. Helbest weha dest pê dike:

Ya ramiye qelbî bi sihamî'l-lehezati Heyhate Necatî
 Ma ziltu fidaen leke rûhî ve heyatî Min qebli mematî

Di edebiyata klasîk de eger du helbestvan di demên cihê de bêtî ku ji hev haydar bin misra û beytên wekî hev, yan jî nêzî hev binivîsin, ew helbestvan dikevin nav “tewarud”ê de. Lêbelê tewarud kêm caran çêdibe û eger çêbe jî di çarçoveya yek-du misra yan beytan de çêdibe. Ji ber ku hevbeşiya li vir a di navbera Melayê Cizîrî û Ehmed Paşa de di tevahiya helbestê de ye, îzahkirina vê bi tewarudê hinekî zehmet e. Loma jî divê ev rewş bi awayekî di bê îzahkirin. Ji bo vê jî divê li serdemên her du helbestvanan (Melayê Cizîrî û Ehmed Paşa) bê nêrîn. Dema em li serdemên wan dinêrin, em dibînin ku Ehmed Paşa di sedsala XVem de jiyaye û berî Melayê Cizîrî ye. Ev jî pêwîst didêre ku ev helbest pêşî ji aliyê Ehmed Paşa ve hatibe nivîsandin.

Eger helbest ya Ehmed Paşa be, gelo cihgirtina wê di dîwana Melayê Cizîrî de divê çawa bê şîrovekirin? Bi qeneeta me cihgirtina vê helbesta Ehmed Paşa di dîwana Melayê Cizîrî de bi du awayan dikare bê şîrovekirin. Ya pêşî ew e ku Mela, dîwana Ehmed Paşa xwendiyê û digel zêdekirina du beytan ev helbesta wî xistiye nav dîwana xwe. Ya duyem jî ew e ku piştî Melayê Cizîrî, mustensixên dîwana wî, ev helbesta Ehmed Paşa, ji ber hevbeşiya navên wan, ya Mela zen kirine û xistine nav dîwana Mela de. Bi rastî jî wîqûya vê rewşê mimkin e, lewra di helbestê de mexlesa ku hatiye bikaranîn “Ehmed” e:

Min **Ehmede** fî leyletî esdaxî mîlahin Lahet kelîmatun

Çi Melayê Cizîrî, çî jî mustensixên dîwana wî ev helbesta Ehmed Paşa xistibin nav dîwana wî ferq nake, ji her du rewşan jî tê fêmkirin ku dîwana Ehmed Paşa, yan jî ev helbesta wî ji aliyê wan ve hatiye dîtin û xwendin. Dema em hizir bikin ku Ehmed Paşa ji cihekî wekî Bursayê ye, bi rastî jî gihîştina vê helbesta wî ji Bursayê heta bi Cizîrê û cihgirtina wê di dîwana Mela de tiştekî balkêş e. Ev ji bo nîşandana têkiliya di navbera edebiyata kurdî û tirkî ya wê serdemê de tiştekî girîng e.

12 Ji bo metnên van helbestan bnr. Mela Ehmedê Zivingî, *el-'Iqdu'l-Cewherî fî Şerhî Dîwanî eş-Şeyxî'l-Cezîrî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 830-835.

2. Feqiyê Teyran

Rengvedana tirkî di helbestên Feqiyê Teyran de bi riya hin peyvên tirkî yên ku di helbestên wî de derbas dibin çêbûye. Dikare bê gotin ku rengvedana tirkî li cem Feqî ne di asteke gelekî zêde de ye. Sedemê wê jî ew e ku Feqî jî wekî Melayê Cizîrî di serdema destpêka danûstandinan de jiyaye. Lê digel vê jî Feqî ji Mela gelekî zêdetir cih daye peyvên tirkî. Li cem Mela tenê peyva “yexma”yê, lê li cem Feqî gelek peyvên tirkî derbas dibin ku ew jî ev in: Yoldaş, aslan, ermiş, köpek, savaş, kışla. Li jêrê mînakên hinekan ji wan cih digirin:

Dilo ya pîr bi kêr naye
Eger aqil û zanayê
Mebe yoldaşê dunyayê
Ne **yoldaşek** wefadar e

Ker û gurî **ermîş** û lal
Uftade û xelqê betal
Hîndî nexoş bîname bal
Safî dibûn ji ‘illetê

Kopek di xew de pê re yî
Nazik ji xeflet hîlbeyî
Le’lê di sor kef lê meyî
Rabin bezîna xizmetê

Dema ku bû **sewaş** e
Dergeh ku dane paş e
Bo gazî û şabaş e
Ji hev dêxistin laş e

B. Rengvedana Edebiyata Kurdî di Berhemên Gerok û Burokratên Dewleta Osmanî de

Di serdema destpêkirina danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de (sedsalên XVI-XVII), rengvedana edebiyata kurdî di aliyê tirkî de bi riya hinek gerok û burokratên dewleta Osmanî ku li Kurdistanê rastî kurdan hatine çêbûye. Ew jî Gelibolulu Alî û Ewliya Çelebi ne ku di berhemên xwe de cih dane hinek deqên edebî yên kurdî.

1. Gelibolulu Alî

Rengvedana kurdî li cem Gelibolulu Alî (1541 Gelibolu-1600 Cidde) ew e ku wî di mulemmayeke xwe de ku bi deh zimanan nivîsiye, cih daye kurdî jî. Di vê mulemmaya wî de beyta ku kurdî tê de derbas dibe ev e:¹³

Kürd olan velvele ile bunı îrâd eyler

Dikujim te tu bizânî dirûvê min tu biyâr

Gelibolulu Aliyê ku pîşeya wî ya sereke defterdarî ye, li cihên wekî Misir, Manisa, Kilis, Bosna, Sêwas, Heleb, Erzirom, Bexda û Ciddeyê karen defterdariyê kiriye û li seranserê welatê dewleta Osmanî geriyaye.¹⁴ Gelibolulu Alî ji ber hem xwediyê kesayeteke bihirs bûye, hem jî rexnevanekî xirabiyên civakî bûye, nekariye demeke zêde li cihêkî li ser kar bimîne û loma jî li gelek deveran geriyaye. Gelibolulu Alî di vê çarçoveyê de ji bo waliyê Bexdayê Xizir Paşa şikayetnameyê menzûm nivîsiye û di vir de kêmasî û xirabiyên di civakaserdema xwe de anîne zimên, Alî deh beytên vê şikayetnameyê bi şeweya mulemmayekê nivîsiye û di vê mulemmayê de neh ziman û du lehçeyên tirkî bi kar aniyê: erebî, farisî, kurdî, arnawudî, firengî, sirbî, rûmî, manawî, boşnakî, û lehçeyên osmanî û çagatayî yên tirkî ne. Helbestvan di her beytekê di zimanekî jî van bi kar aniyê, lêbelê ji aliyê wateyê ve heman tişt nivîsiye. Nivîskar di hemûyan de kesekî bêsebir daye xebirdan û ew kes bi zimanê xwe bi lez pere dixwaze.

Ji aliyê kurdî ve girîngiya vê mulemmaya Alî ew e ku hê di serdema destpêka têkiliyên edebiyata kurdî û tirkî de û hê di wê serdema ku kurdiya kurmançî ji aliyê kurdan bi xwe ve di nivîsê de nû hatiye bikaranîn de, kurdiya kurmançî ji aliyê rewşenbîrekî Osmanî ve bi awayê nivîskî hatiye bikaranîn. Herweha ji ber ku kurdî hem wekî zimanekî jîndar ê cografyaya Osmanî hatiye dîtin, hem jî di nav zimanên erdnîgariya Osmanî de piştî erebî û farisî wekî zimanê di rêza sêyem de hatiye qebûlkirin, cihgirtina kurdî di vê mulemmayê de dîsa girîng e. Piştî ku di herdu beytên pêşî de erebî û farisî cih girtiye, cihgirtina kurdî ya di beyta sêyem de vê yekê nîşan dide

2. Evliya Çelebi

Seyahatnameya Evliya Çelebi (1611-1682), yek ji girîngtirîn berhemên bi zimanê

13 Ji bo metnê helbestê bnr. İsmail Hakkı Aksoyak, *Gelibolulu Âlî ve Divanlarının Tenkitli Metni*, Zanîngeha Gaziyê., SBE, teza doktorayê, Ankara 1999, 150/124-133, (Ji Halil Çeltik, *Divan Sahibi Rumeli Şairlerinin Şiir Dünyası*, Zanîngeha Gaziyê., SBE, teza doktorayê, Ankara 2004, r. 211ê neql). Herweha ji bo krîtîka helbesta ya nusxeyên cuda û nirxandina zimanan bnr. Aksoyak, “Divan Şiirinin Dili İmparatorluk Dilidir” *Turkish Studies*, volume 4/5, Summer 2009, r. 1-18.

14 Ji bo jiyan û berhemên wî bnr. Mustafa İsen, *Gelibolulu Mustafa Âlî*, weş. Şule, İst. 1998; H. Mustafa Eravcı, “Mustafa ‘Âlî’nin Nusret-nâmesi ve Onun ışığında Yazarın Tarihçiliği”, *Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Tarih Bölümü Tarih Araştırmaları Dergisi*, b. 24, j. 38, Ankara 2005, r. 163-184.

tirkî ye ku rengê edebiyata kurdî di xwe de dihewîne. Çelebi, li gelek deverên Kurdistanê geriyaye û di sala 1642an de çûye Amêdiyê (navenda herêma Behdînan) û derheqê rewşa edebiyata kurdî ya li wî bajarî jî agahiyên girîng dane. Çelebi, li wir helbestvanekî kurd bi navê Mela Remezanê Ebbasî dîtiye û di berhema xwe de cih daye helbesteke wî.

Çelebi berî ku cih bide helbesta navborî, behsa gelek diyalekt û devokên kurdî yên ku li deverên curbicur ên Kurdistanê tên axaftin kiriye û gihîştîye wê encamê ku ji van diyalekt û devokan a herî zêde fesîh û zerîf û a ku herî zêde rewan tê axaftin, devoka xelkê Îmadiyeyê ye ku ew jî devoka Behdînî ye. Çelebi piştî ku cih daye hinek rîwayetên derheqê zimanê kurdî de gotiye ku ‘beyt û helbestên nazik ên Behdîniyên Îmadiyeyê hene’ û di bin sernavê “Îmadiye Kürdü Kavminin Diliyle Şiir [Bi Zimanê Kurdên Îmadiyeyê Helbest]” cih daye helbesteke Mela Remezan.

Li gorî ku Çelebi dibeje, gelek helbest û qesîdeyên helbestvanên Îmadiyeyê hene ku bi teşeyên muselles, murebba, muxemmes, museddés, musebba û musemman hatine nivîsandin. Çelebi neqil dike ku dema Newroza Siltanî tê, hemû zarok, mezin, zana û helbestvanên vî bajarî diçûne seyrangehan û ji hev re beyt û helbest dixwendin.¹⁵ Ev tev didin nîşandan ku herçiqas Çelebi navê Mela Remezanê Ebbasî tenê dabe û ji wî helbestek tenê neqil kiribe jî, li wî bajarî gelek helbestvanên dî jî hene û ji aliyê wan ve gelek helbestên dî jî hatine nivîsîn.

Li jêrê em cih didin beytên pêşî û paşî yên vê helbesta ku ji 9 beytan pêk hatiye. Çawa ku di beyta paşî de tê dîtin helbestvan xwe wekî “Remezanê Kurdîkî” bi nav kiriye.

Rayê li Asaf diken, walih û hayranê eşq
Dersê Aristo diden, serxos û sekranê eşq

Faş meke razê xwe ey Remezanê Kurdîkî
Şemme nesîmî dibî tazî û uryanê eşq

Çelebi, di Seyahetnameyê de derheqê ziman û edebiyata kurdî de behsa gelek tiştên dî jî kiriye. Di nav van de lîsteyek ji peyvên herêma Farqînê, stranek ji devoka Cizîrê, helbestek ji devoka Rojkiyan û çend hevokên kurdî ji devoka Hekkarî hene.¹⁶

Bêguman ev agahiyên berfireh ên derbareyê rewşa ziman û edebiyata kurdî ya li Kurdistanê sedsala XVIIem, derdixe holê ku di *Seyahatnameya Evliya Çelebî* de rengvedaneke mezin a kurdî heye. Bi taybetî hebûna metnê qesîdeya Mela Remezanê Ebbasî di *Seyahatnameyê* de ji bo tarîxa edebiyata kurdî gelekî girîng e. Lewra bi

15 Evliya Çelebi, *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, YKY, İstanbul, 2010, b. II, r. 711-713.

16 Martin van Bruinessen, “Evliya Çelebi Seyahatnamesi’nde Yansıdığı Kadarıyla 16. ve 17. Yüzyıllarda Kürdistan”, *Kürdolojinin Bahçesinde Kürdologlar ve Kürdoloji Üzerine Söyleşi ve Makaleler*, wer. Mustafa Topaloğlu, weş. İletişim, İst. 2012, r. 136-137.

saya vê, em hem ji helbestvanekî bi navê Mela Remezanê Ebbasî haydar dibin û hem jî metnê helbesta wî bi dest dixin. Bidestxistina vî metnî, ji aliyê tarîxa metnên kurdî ve gelekî girîng e. Çawa ku M. Bruinessen jî bal kişandiye¹⁷, bi rehetî dikare bê gotin ku metnê ve qesîdeyê, ji metnên herî kevin ên edebiyata kurdî ye. Lewra herçiqas heta bi sedsala XVIIem di kurdiya kurmancî de helbestvanên wekî Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Şêx Şemsedînê Exlatî jiyabin jî, metnên destxet ên helbestên wan ên ku di wê sedsalê de gihîştine îro tinene. Loma ev metnê qesîdeya Mela Remezan ê ku di *Seyahatnameyê* de hatiye qeydkirin û gihîştîye roma me, divê ji metnên herî kevin ê edebiyata kurdî bê hesabandin.

III. Pêşveçûna Danûstandinan (Dawiya Sed sala XVIIem-Destpêka Sed sala XXem)

Piştî ku di sedsalên XVIem û XVIIem de danûstandinên di navbera edebiyata kurdî û tirkî de dest pê kirin, di serdema pey wê re van danûstandinan dom kir û heta bi dawiyê Osmaniyan di vî warî de pêşketinên mezin hatin bidestxistin. Loma jî em vê serdema nû wekî serdema pêşveçûna danûstandinan bi nav dikin. Di vê serdemê de sedemê pêşveçûna di danûstandinan de ew e ku têkiliyên siyasî yên ku di navbera kurd û tirkan de dest pê kiribûn bênavber dom kirin, gelek nûnerên nû yên edebiyata kurdî derketin û qet nebe beşeke mezin ji van nûneran li kêleka erebî û farisî xwe fêrî zimanê tirkîya osmanî jî kirin.

Ev serdema pêşveçûna danûstandinên edebiyata kurdî û tirkî, li ser du qonaxan dikare bê dabeşkirin. Qonaxa yekem ji dawiyê sed sala XVIIem dest pê dike û heta bi dawilêhatina mîrektiyên kurdan ku beramberî nîveka sed sala XIXem tê dom dike. Qonaxa duyem jî ji nîveka sed sala XIXem ku wextê dawilêhatina mîrektiyên kurdan e dest pê dike û heta bi destpêka sed sala XXem ku wextê dawilêhatina Dewleta Osmaniyan e dewam dike.

A. Qonaxa Yekem: (Dawiya Sed sala XVIIem–Destpêka Sed sala XIXem)

Qonaxa yekem a serdema pêşveçûna danûstandinên edebiyata kurdî û tirkî, ji dawiyê sed sala XVIIem dest pê dike û heta bi dawilêhatina mîrektiyên kurdan ku beramberî nîveka sed sala XIXem tê dom dike. Kesê ku ev serdem daye destpêkirin di dawiyê sed sala XVIIem de Ehmedê Xanî ye. Piştî serdema destpêkê têkiliya edebiyata kurdî û tirkî di şexsê Ehmedê Xanî de dom kiriye. Bi Ehmedê Xanî re ev têkilî bihêztir bûye û serdema pêşveçûnê dest pê kiriye. Xanî ji bilî bikaranîna îfadeyên tirkî, hem bi çar zimanan mulemmayek nivîsiye ku kurdî û tirkî jî di nav van zimanan de ne, hem jî du helbestên tirkî yên serbixwe nivîsîne. Herweha berhema wî *Mem û Zîn* piştî koça wî ya dawiyê bi demeke kurt bi bal tirkî ve hatiye wergerandin. Di vê serdemê de Melayê Bateyî ku helbestvanekî herî girîng ê edebiyata kurdî ye, di Mewlûda xwe de di bin bandora Suleyman Çelebi de maye. Dîsa di vê serdemê de

17 Bruinessen, h.g., r. 142.

Pertew Begê ku ji mîrên dawî yê Hekkarî ye, xezeleke Fuzûlî ji serî heta bi dawiyê bi bal kurdî ve wergerandiyê. Di helbestên helbestvanên vê serdemê Siyahpoş û Weda'î de jî peyvên tirkî dikarin bèn dîtin. Vê têkiliyê heta bi dawiya mîrektiyan bi zêdebûnê dewam kiriye. Lê ji ber helbestvanên kurd ji navendên mîrektiyan xwe zêde derneketine derve, ev têkilî li gorî serdema peyrew zehf ne zêde ye.

1. Rengvedana Tirkî di Edebiyata Kurdî de

Çawa ku li jorê jî hat gotin, ji aliyê rengvedana tirkî di kurdî de nûnerê pêşî yê qonaxa yekem a serdema pêşveçûnê Ehmedê Xanî ye. Xanî nûnerê ewil ê vê serdemê ye. Piştî Xanî Melayê Bateyî, Siyahpoş û Pertew Begê Hekkarî nûnerên herî girîng in.

1.1. Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî, digel ku zimanên tirkî, farisî û erebî baş dizanibû jî, wî di çarçoveya hişmendiya xwe ya neteweyî de berhemên xwe bi zimanê xwe nivîsandibûn. Lê digel vê jî di nav berhemên xwe de carinan cih daye van zimanan jî. Dema em ji aliyê tirkî ve lê dinêrin, em dibînin ku rengvedana zimanê tirkî li cem Xanî bi sê awayan xwe nîşan dide. Ya yekem bikaranîna peyv û hevokên tirkî, ya duyem bikaranîna tirkî di mulemmayê de, ya sêyem jî nivîsîna helbestên tirkî ye.

Ji aliyê bikaranîna hevokên tirkî ve em dibînin ku Xanî di vê beyta jêrîn a *Mem û Zînê* de misraya duyem bi tevahî ji tirkî saz kiriye:

Êdî çî bibêjim ez nizanîm

*Bilmez ki ne söyleye zebanım*¹⁸

Ji bilî vê Xanî di tarîxa edebiyata kurdî de yekem car mulemmayek nivîsiye ku tirkî jî yek ji zimanan vê mulemmayê ye. Ev mulemmaya Xanî hem ji ber ku di tarîxa edebiyata kurdî de mulemmaya yekem e, hem jî ji ber ku di tarîxa têkiliya edebiyata kurdî û tirkî de renegekî nû ye girîng e. Benda yekem a vê mulemmayê wiha ye:

Fate umrî fi hewake ya hebîbî kulle hal

Ah û nalem hemdemem şod der firaqet mah û sal

Ger benim kanım dilersen çoktan olmuştur helal

Dîn û ebter bûm ji ‘eşqê min nema ‘eql û kemal¹⁹

Wergera wê

(Bi Kurdiya Kurmancî ya Risteyên Erebi, Farisî û Tirkî)

Temenê min her daîm di evîna te de derbas bû, ey xweştirivî!

18 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, (amd. Huseyn Şemrexî), Nûbihar, Stenbol 2009, r. 138.

19 Ji bo metnê tam bnr. Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayîn*, weş. Sîpan, İstanbul 2004, r. 160-162; Abdurrahman Durre, *Şerha Diwana Ehmedê Xanî*, Keskesor, Stenbol 2002, r. 28.

Ji firqeta te, ah û nalînên min bi meh û salan bi min re dom kirin.
Eger tu xwîna min bixwazî, ew zû de ye ji te re bûye helal.
Dîn û ebter bûm ji ‘eşqê min nema ‘eql û kemal

Ehmedê Xanî, herweha bi tirkî du helbestên serbixwe jî nivîsîne. Ji van a ewil museddes/şeşxişteyiyeye ku benda wê ya pêşî wiha ye:

Ey gülün perverde-i gülzar-ı taravet
Vey serv(i)qadin sebze-i bustan-ı taravet
Vechin banadır minber ü mihrab-ı ibadet
Zülfün gamı serhalka-i zünnar-ı hidayet
Peh peh, bu ne şekl ü ne şemail ne kıyafet²⁰

Helbesta duyem a Ehmedê Xanî ya bi zimanê tirkî xezelek e ku li jêrê beyta wê ya ewil û a ku mexlesa Xanî tê de derbas dibe cih digirin:

Beyzay-i fena benim rehğüzerimdir
Ankay-ı bekahimmet hemrah-ı perimdir
...
Alam û cefasıyla hoşum ben reh-i ışkın
Xanî bana bu yolda kadem çeşm-i serimdir²¹

1.2. Melayê Bateyî

Rengvedana tirkî li cem Melayê Bâteyî (1675-1760), xwe bi awayekî nû nîşan daye. Bateyî jî wekî yên berî xwe di helbestên xwe de hin peyvên tirkî bi kar anîne, lêbelê rengê ku li cem wî nû ye, menzûmeya wî ya mewlûdê ye ku di bin bandora mewlûda tirkî ya Süleyman Çelebi (w. 1422) de hatiye nivîsîn.

a. Peyvên Tirkî

Peyvên tirkî yên ku Bateyî di helbestên xwe de bi kar anîne bi giştî ev in: “Gorişme, yol, îlan, eslan, tabur û yaban”. Li jêrê bikaranînên hin ji van peyvên di helbestên Bateyî de hatine nîşandan:

Zivistanê li vê **yolê**
Li vê ber’yê li vê çolê
Gerovê girtî Daholê
Mijê havête zozanê

20 Ji bo temamê vê helbestê bnr. Mûrad Ciwan, *Ahmedê Xanî jiyana, berhem, bîr û baweriyên wî*, weş. Doz, Stenbol 1997, r. 265-266; herwiha bnr. Ehmedê Xanî, *Dîwan*, (amd. Kadri Yıldırım), weş. Avesta, İstanbul 2014, r. 178;

21 Ji bo temamê vê helbestê bnr. Xanî, *Dîwan*, r. 187.

Ew çi dême şahebax e gulşena darul qerar
Sed hezaran nal û awazê di bulbul çar kenar
Helqe pê da bes tu hatin ‘eqreb û **îlan** û mar
Nêrgiza şehla şepal î asemîna mêrxuzar
Lebxemûş î meyfiroş î dêmpeyala kê yî tu

Du **eslanên** we reng hatin
Bi tabûr û tiveng hatin
Bi şimşîr û xedeng hatin
Qirên îna musulmanan

b. Peyrewiya Suleyman Çelebi

Piştî ku Suleyman Çelebi (k.d. 1422) mewlûdnameya xwe ya tirkî nivîsiye, di erdnîgariya dewleta Osmanî de li pey şopa wî bi gelek zimanên dî jî mewlûdname hatine nivîsîn. Hin ji van mewlûdnameyan rasterast jî mewlûdnameya Çelebi hatine wergerandin, hin ji wan jî ne werger in, lêbelê di bin bandora mewlûdnameya wî de hatine nivîsîn. Mewlûdnameya Melayê Bateyî jî ji aliyê M. Tayyip Okiç ve di çarçoveya wergerên mewlûdnameya Çelebi de hatiye jimartin.²² Dema mirov bi vî çavî li mewlûdnameyên Çelebi û Bateyî dinêre, tê dîtîn ku bi rastî jî di navbera wan de gelek hevbeşî hene. Ji ber ku Çelebi di sedsala XVem de, Bateyî jî di sedsala XVIIIem de jiyaye, bi awayekî mentiqî derdikeve meydanê di vê hevbeşiyê de Çelebi yê xwedî bandor e, Bateyî jî yê ku di bin bandorê de ye. Lewra Bateyî pey Çelebi re jiyaye û ne mimkin e ku yê berî wî ketibe bin bandora wî de. Wê demê jî hevbeşiyên di navbera mewlûdnameyên wan de heyî, derdikeve holê ku mewlûdnameya Bateyî di bandora ya Çelebi de ye. Lêbelê divê ev bê gotin ku tîkiliya di navbera mewlûdnameyên Çelebi û Bateyî de ne wekî ku Okiç dibêje bi şeweya wergerê ye, bi şeweya bandoreke sînardar e. Aşkere ye ku ji ber ku Okiç bi kurdî nizane, wî mewlûdnameya Bateyî nexwendiyê. Di mewlûdnameya Bateyî de tenê bûyerên heta bi sê saliya cenabê Pêxember cih digirin, lêbelê di mewlûdnameya Çelebi de bûyerên heta bi wefata cenabê Pêxember cih digirin. Ji bilî vê di rêzkirina beş û beytan de mewlûdnameya Bateyî bi awayekî zelal ji ya Çelebi cihê ye. Loma îmkân tineye ku mewlûdnameya Bateyî wekî werger bê hesibandin. Ew berhemeke orjînal e.

Têkilî û danûstandina di navbera mewlûdnameyên Çelebi û Bateyî di çarçoveya cureyê edebî de çêbûye. Bi gotineke dî bandora Çelebi li ser derketina cureya mewlûdnameyê di edebiyata kurdî de çêbûye. Lêbelê di derketina cureya

22 Bnr. M. Tayyip Okiç, “Çeşitli Dillerde Mevlidler ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri”, *Atatürk Üniversitesi İslami İlimler Fakültesi Dergisi*, j.1, sal: 1975, r. 17-59. Okiç, li vir dibêje ku du mewlûdnameyên dî jî (ya Ehmed Ramîz û ya Melayê Xasî) wergerên mewlûdnameya Çelebi ne. Lêbelê divê bê zanîn ku mewlûdnameya Ehmed Ramîz tune ye, wî di binemaya xwe de mewlûdnameya Bateyî çap kiriye. Okiç bi şaşî ev mewlûdname nisbetî Ehmed Ramîz kiriye.

mewlûdnameyê di edebiyata kurdî de ne bandora Çelebi tenê, bandora Îbn Hecerê xwediyê mewlûdnameya erebî jî çêbûye. Lê niha ev derveyî mijara me ye.

Çawa ku li jorê hat diyarkirin, mewlûdnameya Bateyî bi awayekî berbiçav di bin bandora mewlûdnameya Çelebi de maye. Ev bandor di çarçoveya beytên wekhev û werger de ye. Wate Bateyî ji mewlûdnameya Çelebi hinek beyt wergirtine, hinek beyt jî wergerandine ku li jêrê em dê li ser wan rawestin.

b. a. Beytên Wekhev

Delîla herî girîng a bandora Çelebi li ser Bateyî di mewlûdnameyên her duyan de hebûna beytên wekhev in. Bo nimûne di beşa merhebayê de hinek beytên Bateyî bi tevahî wekî yên Çelebi ne. Ev jî tê wê wateyê ku Bateyî ev beyt ji Mewlûda Çelebi standine. Ev beytên jêrîn bi vî rengî ne:

Merheba ey ‘alî sultan merheba
Merheba ey kan-ı irfan merheba

Merheba ey kurretu’l-eyni’l-helîl
Merheba ey has-ı mahbûb-ı celîl

Merheba ey sırr-ı furkan merheba
Merhaba ey derde derman merheba

Di çarçoveya beyta dawî de ev jî divê bê gotin ku, di misraya duyem a vê beytê de terkîba bi şeweya “derde derman” terkîbeke tirkî ye. Ev jî nîşaneyêke dî ye ku Bateyî ev beyt ji nû ve ne hûnandiyê. Lewra eger Bateyî ev terkîb bi kurdî bigota pêwist bû bi şeweya “dermanê derdan” bigota. Naxwe çavkaniya vê beyta ku ev terkîba tirkî tê de derbas dibe, Çelebi ye. Bî rastî jî beyt bi heman şeweyê di mewlûdnameya Çelebi de cih digire.

b. b. Beytên Werger

Hinek beytên Melayê Bateyî jî ji aliyê wateyê ve bi tevahî beramberî beytên Çelebi tên ku ev beytên Bateyî bi riya wergerê ji Çelebi hatine deynkirin. Li jêrê em dê di vî warî de du nimûneyan pêşkêş bikin:

Nimûne 1: Di mewlûdnameyên Çelebi û Bateyî de “beytên selawatê” yên ku di navbera beşên mewlûdnameyê de wekî neqarat tên dubarekirin bi vî rengî ne. Li jêrê beytên Çelebi û Bateyî cih digirin. Dema misrayên wan bên hevberkirin bi awayekî aşkar tê dîtîn ku misrayên Bateyî wergera yên Çelebî ne:

Çelebi	Bateyî
Misra 1: Ger dilersiz, bulasız oddan necât	Ger divêtin hun ji narê bin necat
Misra 2: Aşk ile, derd ile edin essalat	Bi işq û şewqek hûn bibêjin es-selat

Nimûne 2: Beyta amadehiyê ya berî beşa merhebayê jî beyteke werger e. Eger misrayên wan bên hevberkirin ev rewş dê bi awayekî aşkar bê dîtîn:

Çelebi	Bateyî
---------------	---------------

Misra 1: Cümle Zerrat-ı Cihan idüp nida

Cumle zerratê cihan da ev nîda

Misra 2: Çağrışiban didiler kim merhaba

Kirne gazî pêk ve gotin merhaba

1.3. Siyahpoş

Li gorî doneyên ku ji aliyê me ve hatine bidestxistin, rengvedana tirkî li cem Siyahpoş (Sedsal XVIII-XIX) lawaz e. Wî di beyta xwe ya jêrîn de du hevokên tirkî bi kar anîne.

Zilf û xalên mahr(i)yan **çok Siyahpoş ettiler**

Korkarım ben kara ola çadır û seywanê ma²³

1.4. Pertew Begê Hekkarî

Rengvedana tirkî li cem Pertew Begê Hekkarî (Sedsal XVIII-XIX) bi şêweyekî gelekî orjînal çêbûye. Pertew Beg helbesteke Fuzûlî ji serî heta dawiyê wergerandiye kurdiya kurmancî. Herçiqas beri Pertew Beg Melayê Bateyi ji mewlûdnameya Süleyman Çelebi çend beyt wergerandine jî, lê wergerandina tevahiya helbestekê ji tirkî cara pêşî ji aliyê Pertew Beg ve hatiye kirin.

Li jêrê wekî nimûne em dê ji her du helbestan cih bidin beytên pêşî û dawiyê²⁴:

Beytên pêşî:

Fuzûlî Menüm tek hîç kim zâr û perişan olmasun yâ Rab
Esîr-i derd-i ışk u dâğ-ı hicrân olmasun yâ Rab

Pertew Wekî min qet kesek jar û perişan her nebit ya Reb
Esîr û derd(i)darê daxê hicran her nebit ya Reb

Beytên dawî:

Fuzûlî **Fuzûlî** buldı genc-i âfiyet meyhâne küncinde
Mübârek mülkdür ol mülk virân olmasun yâ Rab

Pertew Ti kuncê meykedê kuncuk tamam ez ‘afiyet **Perto**
Ku kir tehsîlê ew kuncuk qe wêran her nebit ya Reb

2. Rengvedana Kurdî di Edebiyata Tirkî de

Di qonaxa yekem a serdema pêşveçûna danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de (dawiya sedsala XVIIem-destpêka sedsala XIXem), rengvedana edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de bi riya wergera *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî bi bal tirkî ve çêbûye.

23 Siyahpoş, *Seyfu'l-Milûk û Bedî-ul Cemal*, (Amd. Bedirxan Amedî), weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 93.

24 Ji bo helbesta Fuzûlî bnr., Fuzûlî, *Dîwan*, Akçağ, Ankara 1997. r. 145; Ji bo helbesta Pertew Beg bnr. Perto Begê Hekkarî, *Dîwan*, amd. Tehsîn İbrahim Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r. 112. (Em ji ji Mehdi Zana Karan ra spasdar in ku em ji van herdu helbestan agahdar kirine.)

2.1. Ehmed Faîq

Ehmed Faîq ku yek ji mîrên Bedlîsê yên malbata Şerefxaniyan e, di sed sala XVIIIem de *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî di çarçoveya konteksta edebiyata klasîk de wergerandiye tirkî.²⁵ Li jêrê wekî mînak çend beytên pêşî ji vê *Mem û Zîna* Ehmed Faîq cih digirin²⁶:

Tacdîn û Arif ile Çaker
Bunlardı sipehsalar-ı asker

Daderler idi bu üç civanlar
Sarsala beraber idi anlar

Tacdîn ise nerre-i zamane
Benzerdi misal-i kahramane

Ger bendi-i miyan ede silahın
Bulmazdı muhasimî felahın

Nakleyledi bu kelamı nakil
Kim var idi bir civan-ı akil

Adı Mem idi kendi hoş huylu
Deryadil idi ilimle memlu

Geh şî'r ü geh gazeldi pîşe
Derd ile ururdu kalbe tîşe

Tacdîn ile bir ahd ü mîsak
Best eylediler ki fark û nifak

Olmaya aralarında bir dem
Bir saza düzüldü iki hemdem

25 Derheqê Ehmed Faîq û *Mem û Zîna* wî de ji bo agahiyên berfireh bnr. Sırrı Dadaşbilge, *Ahmet Faik Mem o Zin*, y.y., 1969; Mehmet Törehan Serdar, *Rüyalar Şehri Bitlis*, TBMM Kütüphanesi, r. 170-171; Namık Açıkgöz, “Türkçe ve Kürtçe *Mem û Zîn* ile Leylî vü Mecnûn Meznevîlerinin Mukayesesi”, *Karşılaştırmalı Edebiyat Araştırmaları Sempozyumu II*, Çanakkale 16-18 Mayıs 1996; Abdurrahman Adak, “Di Serdema Osmanîyan de li Pey Rêça Ehmedê Xanî: Sê *Mem û Zîn*ên bi Tirkî”, *Nûbihar*, j.120 (havîn 2012), r. 16-23.

26 Dadaşbilge, b n., r. 1, 210.

Xweşbextane ev *Mem û Zîna* Ehmed Faîq hê di demek zû de ji aliyê Sirri Daşaşbilge ve bi tirkî hatiye nasandin. Li gorî ku Beysanoğlu neqil dike, Dadaşbilge cara pêşî di sala 1957an de di kovara *Bilgiyê* de ya ku weşana “Türkiye Muallimler Birliği-Yekîtîya Mamosteyên Tirkiyeyê” ye (jimar: 123, r. 5,6-13) nivîsek bi sernavê “Mem o Zin Hikayesi” (Çîroka *Mem û Zînê*) nivîsiye û di vê nivîsê de cih daye beşek ji *Mem û Zîna* Ehmed Faîq²⁷. Dadaşbilge pişt re di sala 1969an de berhema Ehmed Faîq bi tevahî weşandiye. Dadaşbilge di vê xebata xwe de orjinala berhemê ji tîpên erebî wergerandiye tîpên latînî û xistiye aliyê çapê û tirkiya wê ya îro jî daye û ew jî xistiye aliyê rastê.

Lê xala balkêş ku ew e Dadaşbilge ne haydar e ku *Mem û Zîna* Ehmed Faîq wergera ya Ehmedê Xanî ye. Lewra ew dibêje ku “di kenarê sehîfeya dawî ya berhemê de qeydeke bi tirkî bi şeweya ‘*Malum ola ki Ahmed XaniAhmet Faik dahi*’²⁸ heye, lê hinek cih jê nayên xwendin²⁹. Dadaşbilge dibêje ku ‘di vir de behsa tîkiliyekê di navbera Ehmedê Xanî û Ehmed Faîq de dike, lê em nizanin ka ev tîkilî bi çi şiklî ye.’ Bi bawerîya me, dema mirov bi awayekî mentiqî ciyên vala dagire, hevokeke bi wî rengî derdikeve meydana: “*Malum ola ki Mem û Zîn Ahmed Xani tarafından yazılmış, Ahmet Faik Beg dahi onu tercüme etmiştir.*” Wate di vir de ev hatiye gotin: “*Bila bê zanîn ku Mem û Zîn ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn, Ehmed Faîq Beg jî ew wergerandiye Tirkî.*”³⁰

Bêguman ji bo ku rengê kurdî de edebiyata tirkî de nîşan bide wergerandina berhemeke kurdî bi bal tirkî ve tiştê girîng e û di tîkiliya herdu edebiyatan de renegekî nû ye. Herweha Ehmed Faîq bi vê kirina xwe di tîkiliyên edebiyata kurdî û tirkî de kevneşopiyek daye destpêkirin ku pey wî re ev kevneşopî hatiye domandin û heta roja me jî didome ku di rûpelên pêş ê vê xebatê de dê li ser wan jî bê rawestan.

Gelo Ehmed Faîq bi kîjan saîqî ev kevneşopî daye destpêkirin? Wusa dixuye ku sebebê wergerandina *Mem û Zîna* Xanî ji aliyê Ehmed Faîq ve bi bal tirkî ve ew e ku Tirkî hem zimanê împetoriyê yê fermî ye, hem jî yê kulturî ye û vê taybetiya tirkî bandora xwe li ser rewşenbîrên Bedlîsê jî kiriye. Loma jî Ehmed Faîq xwestiye ku *Mem û Zînê* bi zimanê rewşenbîriyê yê wê serdemê ji nû ve binivîsîne û bigihîne rewşenbîrên wê serdemê. Dikare bê gotin ku pey Ehmed Faîq re di serdema Osmaniyan de Ebdulezîz Xalis û Zulfiqar Fethî jî bi heman saîqî *Mem û Zîn* wergerandine tirkî.

B. Qonaxa Duyem: Ji Dawiya Mîrektiyan Heta Bi Dawiya Osmaniyan

Di danûstandinên edebiyata kurdî û tirkî de qonaxa duyem a serdema pêşveçûnê, ji nîveka sedsala XIXem ku wextê dawilêhatina mîrektiyên kurdan e dest pê dike

27 Beysanoğlu, *Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, San Mat. Ankara 1997, II, 242.

28 “Bila bê zanîn ku Ehmedê Xanî Ehmed Faîqjî”

29 Wênayê rûpelê ku ev îbare li ser hatiye nivîsandin, di beşa pêvekan a xebata Dadaşbilge de cih digire.

30 Dadaşbilge, b n, r. V.

û heta bi destpêka sedsala XXem ku wextê dawîlêhatina dewleta Osmanî ye dom dike ku ji aliyê maweyê ve beramberî 70-80 salî tê. Di vê qonaxê de desthilatdarî, di çarçoveya sîstema merkezîbûnê de ji destê mîrektiyên kurdan hatiye standin û kurd rasterast bi navenda Stenbolê ve hatine girêdan. Ji ber vê yekê jî di vê qonaxê de, berevajiyê qonaxa berî xwe, gelek helbestvanên kurdan ji welatê xwe derketine û çûne Stenbolê. Di encamê de têkiliya di navbera herdu edebiyatan de ji serdemên berî xwe zêdetir bûye û ev têkiliya gihîştîye lutkeya xwe.

Lêbelê navenda van têkiliyan ne Stenbol tenê ye. Piştî belavbûna mîrektiyên Diyarbekirê jî di merkezîbûnê de roleke girîng bi dest xist û ji aliyekî ve tevahiya mîrektiyên di wê de hatin temsîlkirin û bi vî awayî jî bo kurdan bû navendeke girîng. Loma jî dikare bê gotin ku di vê serdemê de têkiliyên di navbera edebiyata kurdî û tirkî de di du navendan de kom bûne: Diyarbekir û Stenbol. Li navenda Diyarbekirê kesên wekî Seydayê Licî, Salih Begê Hênî, Mela Ehmedê Xasî û Şêx Eskerî helbestên tirkî nivîsandine. Zulfiqar Fethî û Ebdulezîz Xalis jî *Mem û Zîna* Xanî bi bal Tirkî ve wergerandine. Li navenda Stenbolê jî kesên wekî Nef'î, Nalî, Kurdî, Pîremerd, Şêx Rîza Talebanî, Hacı Qadirê Koyî, Şêx Es'edê Erbilî, Ebdurehîm Rehmî di helbestên xwe de cih dane tirkî.

Di vê serdemê de di danûstandina di navbera her du edebiyatan de, nivîsîna helbestên tirkî û çî ji zimanê kurdî bal bi tirkî ve, çî ji tirkî bal bi kurdî ve be, werger³¹ wekî şeweyekî zal derdikeve pêş. Li jêrê di çarçoveya rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de û rengvedana kurdî di edebiyata tirkî de dê li ser mijarê bê rawestan.

1. Rengvedana Tirkî di Edebiyata Kurdî de

Di vê qonaxê de rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de bi şeweyekî nû xwe nîşan daye ku ew jî nivîsîna helbestên tirkî yê serbixwe ne. Di qonaxa yekem a pêşveçûna danûstandinan de jî ji aliyê Ehmedê Xanî ve du helbestên tirkî hatibûn nivîsîn, lêbelê di vê qonaxê de ji aliyê helbestvanên kurd ve helbestên ku bi tirkî hatine nivîsîn zêdetir in. Ev rewş di vê serdemê de tiştê gelekî berbelav e û loma jî wekî taybetiya sereke ya vê serdemê divê bê hesabandin.

1.1. Navenda Diyarbekirê

Di qonaxa piştî mîrektiyên de ji bo danûstandinên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî de Diyarbekir bû navendeke girîng. Dikare bê gotin ku du sedemên vê yekê hene. Yek jê ew e ku Diyarbekir hê di serdema Merwanîyan de (sedsal XI) ji bo kurdan bûbû cihê stratejîk û vê taybetiya wê heta bi dawîya Osmanîyan jî dom kir. Piştî ku dawî li mîrektiyên hat dayîn Diyarbekirê ev taybetiya xwe wînda nekir û di pêvajoya merkezîbûnê de ji aliyê dewleta Osmanî ve wekî navenda eyaletê Kurdistanê hat tayînkirin. Sedemê duyem jî ew e ku li Diyarbekirê zimanê kultur û edebiyatê tirkî bû

31 Ji bo vê mijarê bnr. Mesûd Serfiraz, "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî", *Wêje û Rexne*, j. 2, sal: 2014, r. 57-65.

û loma jî rewşenbîrên kurdan jî li wir fêrî tirkî dibûn. Di wê serdemê de rewşenbîrên kurdan ên li derdora Diyarbekirê jî çî di xwendingehên fermî yên Osmaniyan de, çî derveyî wan xwe fêrî zimanê fermî dikirin.

Di encamê de çî li naveda Diyarbekirê, çî li derdora wê rewşenbîrên kurdan fêrî tirkî bûn û bi vî awayî di navbera edebiyatên her du gelan de danûstandineke nû û girîng çêbû. Li jêrê dê li ser çend nûnerên vê danûstandinê bê rawestan.

1.1.1. Seydayê Licî

Rengvedana tirkî li cem Mihemed Hadî/Mela Mihemedê Liceyî/ Seydayê Licî (k.d. 1911 Lice) bi şêweya nivîsandina xezeleke tirkî çêbûye. Wî ev qesîdeya ku ji 27 beytan pêk hatiye bi zimanê tirkî nivîsiye. Li jêrê beyta wê ya dawî cih digire:

Çu hicret Xeyn û Kaf oldu dahi Şîn Wawle saf oldu
Hadî'nin kalbi Kaf oldu muhit oldu bu hat sana³²

1.1.2. Salih Begê Hênî

Rengvedana tirkî li cem Salih Begê Hênî (1873 Hênê-1925 Diyarbekir) jî bi şêweya nivîsîna helbestên tirkî çêbûye. Li jêrê jî helbesteke wî beyta yekem cih digire.³³

Gerçi enzar-ı ehibbadan dahî dûr olmuşuz
Rahmet-i rahmana yaklaşmakla mesrûr olmuşuz

1.1.3. Mela Ehmedê Xasî

Rengvedana tirkî li cem Mela Ehmedê Xasî (1862 Hezan/Lice-1951 Hezan/Lice), bi şêweya nivîsandina helbesteke tirkî û helbesteke bi terzê mulemmayê ye ku her bendeke wê bi Erebi, Farişî, Tirkî, Kurdiya Kurmancî û Dimilî hatiye nivîsîn.³⁴ Destpêk û dawîya helbesta wî ya tirkî weha ye:

Bir kavm kitabsız olsa, dilsiz davara benzer
Dinsiz hayat-ı fani yazsız bahara benzer

..

Kelam-ı hikmet-amiz misk-i Tatara benzer
Hasî makal-ı sadık şems-i nehare benzer

Mulemmaya wî jî bi vê benda jêrîn dest pê dike:
Merheben ya men 'ela bi'l-husni teqwîme'l-beşer

32 Mela Mihemedê Liceyî, *Dîwana Hadî*, amd. Tehsîn Î. Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r. 185-189.

33 Ji bo jîyan û helbestên Salih Begê Hênî bnr. Beysanoğlu, h.b., II, 186-189; Şefik Korkusuz, *Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması*, Melissa Mat. İst. 1996, r. 56-57.

34 Ji bo metnên van helbestên wî bnr. Ehmedê Xasî, *Mewlûda Zazakî*, amd. Zeynelabidîn Amidî, Diyarbekir 1402.

Hafizîş Xaliq şevêd ez çeşmê bednam û nezer
Mucidî esbab û lat û we ma mînha seder
Dil ji qeyda leşkerê xem kir reha wextê seher
Ah û nalînê verênî bî vinî nêmend eser

1.1.4. Şêx Eskerî

Rengvedana tirkî li cem Şêx Eskerî (1898 Aqtepe-1952 Çulî) jî bi şêweya nivîsandina helbestên tirkî ye. Lêbelê wî di helbestên xwe yên tirkî de ji bilî teşeya xezelê teşeyên muxemmes û rubaiyê jî bi kar anîne. Herweha wî hinek maniyên anonîm ên edebiyata tirkî jî di nav helbestên xwe de nivîsandine. Ji helbestên Şêx Eskerî yên tirkî bîna zimanê sade yê edebiyata gel a tirkî tê. Ev taybetî hemû di helbestên Şêx Eskerî de wekî rengên nû derdikevin pêş. Li jêrê wekî mînak bendek ji muexemmesa wî cih digire:

Mehu ettin sen beni ey dilruba
Hicretin nar-ı cahîmdir bana
Ah û derdinle figanım her dema
Bir kerem et Fehmiya gel bu yana
Ateş-i firakınla yandım ben sana³⁵

1.2. Navenda Stenbolê

Di qonaxa piştî mîrektiyan de di tîkiliyên edebiyata kurdî û tirkî de navenda duyem Stenbol e. Di wê serdemê de bajarê Stenbolê, wekî paytexta dewletê û navenda rewşenbîriya Osmanîyan rewşenbîrên her çar aliyên dewleta Osmanî cezbî xwe dikirin. Ji ber ku bi avakirina sîstema merkezîbûnê re welatê kurdan rasterast bi Stenbolê ve hatibû girêdan û rewşenbîrên kurdan jî wekî yên deverên di dixwestin ku Stenbolê nas bikin, Stenbol ji bo rewşenbîrên kurdan jî bû navendeke girîng. Di encamê de bi awayekî xwezayî li Stenbolê di navbera rewşenbîrên kurd û tirkan de danûstandinên edebî çêbûn. Di vê danûstandinê de jî rengê sereke, wekî navenda Diyarbekirê, nivîsîn û wergera helbestên tirkî bû. Li jêrê dê li ser çend nûnerên ku li Stenbolê vê tîkiliyê temsîl dikin bê rawestan.

1.2.1. Pîremêrd

Rengvedana tirkî li cem Pîremêrdê ku li Stenbolê wekî Süleymaniyeli Tewfîk jî hatiye naskirin bi şêweya nivîsîna hinek helbestên tirkî çêbûye. Wî di *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesiyê* de du helbest û di kovara *Jînê* de jî helbesteke tirkî weşandiye.

Di *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesiyê* de helbesta wî ya bi sernavê “Der’agûş” weha dest pê dike:

35 Şêx Eskerî, *Keşkol*, lat. Zeynelabidin Zinar, weş. Doz, İstanbul 2009, r. 129.

Karanlık, çok karanlık leyle-i deycûr-ı istibdad
Derin bir köşesinden ruh-ı millet eyliyor feryad³⁶
Dîsa di heman weşanê de helbesta wî ya bi sernavê “Ravza-i Mutahhara’da...
Efendi Hazretlerine” weha dest pê dike:

Ey tair-ı kudsî, ne mübarek yere uçtun
Cibril-i Emîn’in cevelangâhına düştün³⁷
Di kovara Jînê de jî helbesta wî ya bi sernavê “Kârvan-ı Gam” weha dest pê dike:
Sırtında bir humûle-i takatşiken, giran
Göğsünde bir cılız çocuk inlerdi, nâtuvan³⁸

1.2.2. Şêx Rıza Talebanî

Rengvedana tirkî li cem Şêx Rıza Talebanî (1842 Çemçemal-Bexda 1910) jî, bi şêweya nivîsandina hinek helbestên tirkî ye. Wî beşek ji dîwana xwe ji bo helbestên tirkî terxan kiriye.

Bu şafak kim feleğin lekke-i damanıdır
Paymal etdiği mazlumların kanıdır

Haberin var mı alınmış, ne alınmış? Rüşvet
Alınan şey ne imiş? Lira; kim almış? Hey’et

Medhiye û hicwiyeyên Şêx Rıza yên ku derheqê Siltan Ebdulhemîdê Osmanî de nivîsandina di nav helbestên wî yên tirkî de gelekî balkêş in³⁹:

Serîr-ı saltanat-ı mülkü’l-yemn ‘alî Osman’dır
Hilâfet-i hânedân-ı perverde ‘Abdulhamîd Hân’dır

1.2.3. Xelîl Xeyalî

Rengvedana tirkî li cem Xelîl Xeyalî (1865-1946)⁴⁰ bi şêweya wergerandina du helbestên tirkî bi bal kurdî ve ye. Wergera ewil a Xelîl Xeyalî ku di *Rojî Kurdê* de hatiye weşandin, bi sernavê “Hewar û Fîzar Misilman” ye û wergera helbesteke Mehmed Akîf e:

36 Süleymaniyeli M. Tevfik, “Der’agûş”, *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî-Tirkî*Kürdçe-Türkçe Dergi 1908-1909*, (amd. M. Emîn Bozarlan) weş. Deng, Uppsala 1998, r. 154-155.

37 M. Tevfik, “Ravza-i Mutahhara’da...” h.b., r. 389-390.

38 Süleymaniyeli Tevfik, “Kârvan-ı Gam”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî*Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd. M. Emîn Bozarlan) weş. Deng, Uppsala 1985, b.I, r. 302-304.

39 Derheqê helbestên wî yên tirkî de bnr. Mehmet Bayrak, **Ünlü Kürt Şairi Şeyh Rıza Talabani ve Türkçe Şiirleri**, http://www.navkurd.net/nivisar/mehmet_bayrak/kurt_sairi.htm; Ayhan Geverî, “Şeyh Rıza Talabani ve Sultan Abdülhamid’e Yazdığı Kasideleri”, *Kürt Tarihi*, j. 1, sal: 2012, r. 46-51.

40 Derheqê Xelîl Xeyalî de bnr. Tahir Baykuşak, “Xelîl Xeyalî Modan (1865-1946)”, *Kürt Tarihi*, j.9 sal: 2013, r. 34-39.

Mehmed Akif:⁴¹

Müslümanlık nerde? Bizden geçmiş insanlık bile
Alem aldatmaksa maksat, aldanan yok, nafîle!
Kaç hakiki Müslüman gördümse, hep makberdedir;
Müslümanlık bilmem amma, galiba göklerde dir!

Wergera Xelîl Xeyalî:⁴²

Li kû ye mislimanî! Ji me boriye heta merivayî
Ger xelq xapandine meqsed: kes nake bawerî
Çend misilmanî heqîqî min dî: hemû li qebrê da ye
Misilmanî, nizamî heye ema xala min di heşrê da ye
Wergera duyem a Xelîl Xeyalî jî di *Hetawî Kurd* de wergera helbesteke Tahiru'l-
Mewlewî (1877-1951) ye.⁴³

Tirkiya Wê:

Kulağında küpe olsun unutma
Rûmilinin dağı taşı ağlıyor
Kan içinde her su başı ağlıyor
Parçalanmış gövdelerin yanında
Can çekişen arkadaşı ağlıyor

Wergera Wê:

Bîr meke bile di goy te da guwar be
Dar û berê Rûmilî digirî
Di nav xwîn da her çem û kanî digirî
Li bal cendek[ê]d parî bûyî
Heval[ê] li ser rih danî digirî

2. Rengvedana Kurdî di Edebiyata Tirkî de

Di qonaxa duyem a serdema pêşveçûnê de jî, rengvedana kurdî di edebiyata tirkî de, dîsa wekî qonaxa yekem a pêşveçûnê, bi riya wergera hinek metnên kurdî bi bal tirkî ve çêbûye. Di vê qonaxê de jî wekî qonaxa yekem wergerên *Mem û Zînê* hene, lêbelê jî wê zêdetir wergerên hin helbestên kurdî jî hene.

2.1. Ebdulezîz Xalis

Ebdulezîz Xalis (1867 Diyarbekir-1935 Diyarbekir)⁴⁴ jî ku di serdema Komarê de

41 Ji bo orjînalê helbestê bnr. Mehmet Akif Ersoy, *Safahat*, amd. Cemal Kurnaz û yên dî, weş. MEB, İstanbul, 1996, r.312-313.

42 Ji bo metnê helbestê yê orjînalê bnr. X. Modanî, “Hewar û Fîzar[a] Misilmanî” *Rojî Kurd*, j.2, r. 32, (çapa wekxo), *Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojîyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2013.

43 “Ey Şa’îrê Şêrîn Ziman Rûmî Tahiru’l-Mewlewî”, *Hetawî Kurd*, j.10, Stenbol 20 Hezîran 1330/3 Temmûz 1914, r. 14-15.

44 Ji bo jiyannameya Xalis bnr. Beysanoğlu, *h.b.*, II, 240-241.

paşnavê Çıkıntaş wergirtiye, wekî Ehmed Faîq, *Mem û Zîna* Xanî wergerandiye bi bal tirkî ve. Xalis, *Mem û Zîna* xwe di sala 1906an de li Me'dena Erxeniyê xilas kiriye.⁴⁵

Wergera Xalis jî wekî ya Ehmed Faîq di konteksta edebiyata klasîk de wekî werger dikare bê binavkirin. Wate wan mijara *Mem û Zîna* Xanî ji nû ve bi uslûb û îfadeyên xwe bi zimanekî dî nivîsandine. Lêbelê bi qasî ku xuya dike, Xalis, di wergera xwe de li gorî Ehmed Faîq, zêdetir bi metnê otjînal ve girêdayî maye. Li jêr wekî mînak em dixwazin ji dîbaceya *Mem û Zîna* Ebdulezîz Xalis cih bidin sê beytan ku wergerên lîteral ên sê beytên *Mem û Zîna* Xanî ne:

Xalis

Şerh-i gam-i dil ise fesâne
Zîn û Mem'i eyledim bahâne

Xanî

Şerha xemê dil bikim fesane
Zîn û Memê bikim behane

Dilber Mem için düş enîne
‘Âşîk ede xande derd-i Zîn’e

Dilber li Memê bikin girînê
Aşîq bikenin bi derdê Zînê

Mem küşte-i gadr ü Zîn cefâkîş
Zîn derdgüzîn ü Mem cigerrîş

Derdê di dilê Memê cigerrîş

Zîna ji derûnê dil cefâkîş

2.2. Zulfîqar Fethî

Helbestvanê sêyem ku bi tirkî wergereke *Mem û Zîna* Xanî amade kiriye, Zulfîqar Fethî (dawiya sedsala XIXem) ye ku derheqê jiyannameya wî de kêma agahî di destê me de hene.⁴⁶ Li gorî agahiyên ku Ebdulxenî Fexrî Bulduk dide, Fethî, piştî ku wergera xwe xilas kiriye, ji tirsê ku ew werger dê zererekê bidiyê, ew şewitandiyê.⁴⁷ Digel ku ew berhem negihîştîye roja me jî, lê ji ber ku haydariya me ya li ser wê dê me bigihîne encamên girîng, me pêwîst dît ku li vir behsa wê jî bê kirin.

2.3. Mihemed Mihrî

Mihemed Mihrî, di kovara *Jîn û Kurdistanê* de bi sernavê “Edebîyât-1 Kürdiyyeden Ba’zî Numûneler” pênc nivîs amade kirine û di wan de helbestên Mistefa Begê Kurdî, Nalî, Melayê Cizîrî û Mihrî bi awayekî pexşan wergerandine tirkî. Helbesta Nalî ya ku Mihemed Mihrî wergerandiye û di *Jînê* de hatiye weşandin weha dest pê dike:

45 Ebdulezîz Xalis, *Mem û Zîn*, nusxeya destxet (pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak). Birêz Canîp Yildirim di sala 2005an de ev nusxe li Ankarayê nîşanî me da û fotokopiyêke wê da me. Li vir ez dixwazim spasiyên xwe yê taybet pêşkêşî Yildirim bikim.

46 Alî Emîrî, *Esâmî-i Şu‘arâ-yî Âmid*, Millet Kût., Tarih Bl. 781/1, vr. 40 a; Abdulganî Fahrî Bulduk, *Muxteser el-Cezîre Tarixi*, nusxeya latînzekirî ya neçapbûyî, r. 146; Şevket Beysanoğlu, *h.b.*, II, 49.

47 Bulduk, *h.c.*

Nalî:

*Saqî, be meyfî kone le ser adetî new be
Bişkêne be yek nobe du sed matemî tewbe*

Wergera Mihri:

Ey sakî, eski bir kadeh meyle aşk ve muhabbet âleminde yeni bir âdet ve ayini icra ve bir işretin tareb ve sururüyle tevbe ve tezehhüdden hâsıl olan ikiyüz matemî tar-ü mar et!⁴⁸

2.4. Pîremêrd

Pîremêrd (1867-1950), ji bilî nivîsîna helbestên tirkî, helbesteke Nalî jî, ku ji bo bajarê xwe Şarezorê wekî nameyeke menzûm nivîsiye, wergerandiye tirkî. Li jêrê çend beytên pêşî yên vê helbestê cih digirin:

Kurdiya Helbestê:

Qurbanî tozî rêget im, ey badî xoşmurûr
Ey peykî şareza be hemû şarî Şarezûr

Ey lutfekit xefî-w hewaxwah û hemdemim
Wey sirwekit beşaretî sergoşey huzur

Gahê debî berûh, dekey bawêşênî rûh
Gahê debî bedem, dedemênî demî xurûr

Wergera wê ya Tirkî:

Canım feda güzergâhına, båd-ı hoşmürûr
Ey peyk-i aşınası bütün şehr-i Şehrezûr

Ey gizli gizli lütfün hevahahım, hemdemim
Ey estiğın zaman esiyor kalbime huzur

Ruhunla ruhu yelpazellersin zaman zaman
Nefh eyliyor demin de dema-dem dem-i gurur⁴⁹

BEŞA DUYEM: TÊKILIYÊN SERDEMA MODERN

Piştî belavbûna Osmanîyan, di serdema Komara Tirkiyeyê de di danûstandinên edebiyata kurdî û tirkî yên klasîk de serdemeke nû dest pê kiriye. Ji ber ku di vê serdemê de bi taybetî saziyên klasîk ên kurdan ên wekî medrese û tekkeyan bi awayekî fermî ji holê hatine rakirin û şûna wan xwendîgehên modern hatine avakirin, ev

48 *Jîn*, amd. M. Emîn Bozarslan, I, 220-222.

49 *Jîn*, amd. M. Emîn Bozarslan, b.II, r. 342-346.

serdem di vê xebatê de wekî serdema modern hatiye binavkirin. Bi vê rewşa nû ve girêdayî, di vê serdemê de rengvedana kurdî di edebiyata tirkî de zêde bûye, lêbelê berevajiyê wê rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de kêmbûye. Lewra ji aliyekî ve pêdawîstiya nîfşên xwendîngê modern bi têgihiştina berhemên klasîk ên kurdî çêbûye û jo bo wan klasîkên kurdî bi bal tirkî ve hatine wergerandin; ji aliyê di ve jî têkiliya nîfşên medrese û tekkeyan bi zimanê fermî yê dewletê re kêmbûye û ziman û edebiyata tirkî rengê xwe nedaye berhemên wan ên edebî.

A. Rengvedana Tirkî di Edebiyata Kurdî de

Bi qasî ku xuya dike, di vê serdemê de ji aliyê rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de rawestaneke çêbûye. Dikare bê gotin ku sebebê herî mezin ê vê rewşê, di serdema Komara Tirkiyeyê de qedexekirina saziyên medrese û tekkeyan e ku ev sazî cihên geşepêdana edebiyata kurdî ya klasîk bûn. Di vê serdemê de medrese û tekkeyan bi awayekî ne fermî hebûna xwe domandin û di encamê de têkiliya endamên wan hem bi zimanê fermî yê dewletê re hem jî bi navendên mezin ên edebiyata tirkî re (wekî Stenbol û Diyarbekirê) hat birîn. Ev jî bû sedem ku zimanê tirkî di berhemên nûnerên edebiyata kurdî ya klasîk ên vê serdemê de cih negire. Di encamê de di vê serdemê de têkiliya di navbera edebiyatên kurdî û tirkî yê klasîk de, ji aliyê rengvedan tirkî di edebiyata kurdî de kêmbûye û ketiye asta rawestanê.

Di vê serdemê de nûnerên vê kategoriyê kesên wekî Mela Zeynelabidîn Amidî, Hozan Oflaz û Mela Ehmedê Xelatî ne.

1. Mela Zeynelabidîn Amidî

Mela Zeynelabidîn Amidî, hinek îlahiyên Yunus Emre ji tirkî wergerandine kurdî û di dîwana xwe de bi cih kirine.⁵⁰

2. Hozan Oflaz

Hozan Oflaz ji helbestvanên tirk ên wekî Yunus Emre⁵¹, Ummî Sînan⁵² û Mehmet Akif [Ersoy]⁵³ çendîn helbest wergerandine kurdiya kurmançî.

50 Abdullah Ekici, *Zeynelabidînê Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên wî yê Destnivîsî*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mardîn 2014, r. 30.

51 “Wer bibîn eşq bi mi çi kir”, *Nûbihar*, j.2 (Çiriya Paşin 1992), r. 14; “Min canê cana peyda kir”, *Nûbihar*, j.3 (Berçile 1993), r. 15; “Mi umrê xwe li hîçê xerc kiriye”, *Nûbihar*, j.4 (Çileyê Paşin 1993), r. 26; “Nav xweşik bi xwe xweşik Muhemmed”, *Nûbihar*, j.5 (Sibat 1993), r. 29; “Têkeve rîya rast dilo”, *Nûbihar*, j.6 (Adar 1993), r. 18; “Weke min î vî reben î”, *Nûbihar*, j.11 (Tebax 1993), r. 28; “Ev dinya gepek nan e”, *Nûbihar*, j.12 (Îlon 1993), r. 17.

52 “Bixwaze çavê mi giryan dike dost”, *Nûbihar*, j.6 (Adar 1993), r. 18.

53 “Şeva mewlîdeke pîrr hezîn”, *Nûbihar*, j.1 (Çiriya Pêşin 1992), r. 28.

3. Mela Ehmedê Xelatî

Mela Ehmedê Xelatî, li ser kurê xwe yê ku di qezayeke trafikê de digel destgirtiya xwe rihê xwe ji dest daye bi tirkî du mersiye nivîsîne.⁵⁴

B. Rengvedana Kurdî di Edebiyata Tirkî de

Di vê serdemê de jî ji aliyê rengvedana kurdî di edebiyata tirkî de dîsa wergerên *Mem û Zîna* Xanî di serî de cih digirin. Lêbelê wergerên vê serdemê ji yên serdema klasîk bi du xalan vediqetin.

Xala yekem ew e ku di serdema klasîk (serdema mîrektiyên û dawiya Osmaniyan) de, di wergerandina *Mem û Zînê* bi bal tirkî ve faktora herî girîng bûyera evîndariyê bi xwe bû, wate di vê serdemê de faktora edebî li pêş bû. Lê di serdema modern de faktora wergerandina *Mem û Zînê* guheriyê. Ji ber ku di vê serdemê de mafên kurdan ên neteweyî bi tevahî ji holê hatine rakirin, di wergerandina *Mem û Zînê* de jî mesajên wê yên siyasî zêdetir rol lîstiyê.

Xala duyem jî ev e ku wergerên serdema klasîk ne wergerên lîteral bûn. Loma jî jimara beytên metnê orjînal û wergerên wê ne bi qasî hev bûn. Ew tenê di çarçoveya têgihîştina serdema klasîk de wekî werger dihatin binavkirin; wate mijara xwe ji metnê orjînal digirtin, lê bi uslûb û îfadeyên nû dihatin nivîsandin. Heçî wergerên serdema modern in, ew bi metnê orjînal ve girêdayî ne û jimara beytên wan jî bi qasî hev in.

Di vê serdemê de ji bilî *Mem û Zîna* Xanî ji Mela Xalîlê Sêrtî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran jî hinek werger hatine kirin. Li jêrê em ê bi awayekî kronolojîk û di çarçoveya wergêran de li ser vê mijarê rawestin.

1. Seyyid Tahir Geylanî

Seyyid Tahir Geylanî (serkatibê Şer'iyê û îmamê mizgefta mezin a Bedlîsê) di navbera salên 1946-1950î de *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî bi navê *Hellu'l-Meram Tercemetu Nehci'l-Enam* û bi awayekî menzûm wergerandiye tirkî. Ev berhema wî di sala 1992ê de li Bursa Furkan Ofset'ê bi navê *Manzum Şafî İlmihali* hatiye çapkirin.⁵⁵ Di çarçoveya agahiyên li ber dest de dikare bê gotin ku di serdema Komara Tirkiyeyê de *Nehcu'l-Enam* yekem berhema klasîk a kurdî ye ku bi bal tirkî ve hatiye wergerandin.

2. M. Emîn Bozarslan

M. Emîn Bozarslan, *Mem û Zîna* Xanî wergerandiye zimanê tirkî ku ev di serdema Komara Tirkiyeyê de wergera yekem a *Mem û Zînê* ye. (Çapa yekem: weş. Gün, Stenbol 1968) Lê ev çap jî aliyê hêzên ewlekariyê ve hatiye qedexekirin û

54 Mela Ehmedê Xelatî, *Dîwan Bîra Kul û Derda*, (bê cih û tarîx), r. 235-236.

55 Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*, weş. Nûbihar, ç. 2, Stenbol 2014, r. 329.

doz lê hatiye vekirin. Piştî pênc salan berhemê berat kiriye û di sala 1975an de cara duyem hatiye çapkirin.⁵⁶ (weş. Koral, Stenbol 1975). Çapên berhemê piştê ji aliyê weşanxaneyê Dengê ve hatine kirin (çapa yekem: Swêd 1995, çapa duyem: Stenbol 2005). Vê wergera Bozarşan, heta ku di sala 2008an de diwana Melayê Cizîrî bi bal tirkî ve hat wergerandin, demeke dirêj di tirkîya Tirkîyeyê de bi tena serê xwe edebiyata kurdî ya klasîk temsîl kiriye.

3. Ataol Behramoglu

Dikare bê gotin ku di serdema Komara Tirkîyeyê de bi destê yekî ne kurd rengvedana edebiyata kurdî ya klasîk di edebiyata tirkî de bi bi riya Ataol Behramoglu dest pê kiriye. Behramoglu hinek helbestên klasîk ên edebiyata kurdî bi riya rûsî (yanî ji wergerên helbestên kurdî yê rûsî) wergerandine zimanê tirkî û ev helbest di sala 1970yî de di jimara duyem a kovara *Halkin Dostlari* de hatine weşandin.⁵⁷ Herçiqas wergera van helbestan rasterast ne ji orjînalê wan a kurdî hatibe kirin jî, ev karê ku hatiye kirin di tirkîyên edebiyata kurdî û tirkî de nixekî xwe yê gelekî girîng heye. Lewra di serdema modern de û belkî jî di tarîxa tirkîyên herdu edebiyatan de ev yekem car e ku nûnerekî edebiyata tirkî bala xwe daye edebiyata kurdî û xwestiye edebiyata kurdî di nav derdorên tirkî de meşrûiyetekê bi dest bixe. Ji aliyekî dî ve ev yekem car e ku çend nimûneyên xezelên kurdî bi riya wergerê bi tirkî hatine weşandin. Lewra heta vê demê xezelên kurdî bi tirkî nehatibûn weşandin, tiştê hatibû weşandin *Nehcu'l-Enam û Mem û Zîna* Xanî bû ku ew jî berhemên bi teşeya mesnewiyê bûn.

Ew helbestvanên ku ji helbestên wan nimûne hatine wergerandin heft kes in: Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mîrza Şefî'î Camerezî, Nalî, Hacî Qadirê Koyî, Mîrza Rehîm Wefaî û Sanî ne. Çawa ku tê dîtin di nav vê listeyê de hem helbestvanên kurdî, hem jî yê soran hene ku ev jî xaleke girîng e. Divê ev jî bê gotin ku qewareya wergeran ne zêde ye. Ji her helbestvanekî bi qasî du-sê beytan hatiye wergerandin. Li jêrê wekî nimûne em dixwazin cihê bidin wergera ku ji Melayê Cizîrî hatiye kirin:

Wergera Behramoglu:

Aşkta tek bir inancın sözü edilebilir ancak!

Kutsal tapınakta sevgilinin topuklarına kapanarak!

Sevgili aşkın fatihasını yürekten okuduğunda

Her ayet “Amin!”le biter

56 M. Emîn Bozarşan, (amd.), “Pêşkêşî”, Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, weş. Deng, r. 98.

57 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, Agora Kitaplığı, İst. 2007, c. I, r. IXV-XXX; Selim Temo Ergül, “Türkçe’de Kürt Edebiyatı”, *Dipnot*, j. 2, sal: 2010, r. 222-223.

Biz onun yakut dudaklarından ölümsüzlük suyunu içtik
Varsın ümitsizlik içinde kaçıp gitsin rakipler⁵⁸

Orjînala Wan:

Yek secde tinê ferz e di dînê ‘işqê
Bin ber qedê yarê di mecalê dînê

‘Aşiq ku bi dil fatiheyê ‘işqê xwend
Ayat(i) yekayek dikirin amînê

Me ji le’lê lebê yarê xwe vexwar avê heyat
Exyar(i) bila têk(i) biçin Darînê⁵⁹

4. Şamîl Esgerov

Di vê serdemê de Şamîl Esgerov jî *Mem û Zîna* Xanî wergerandiye zimanê tirkî. Lê taybetiya vê wergerê ew e ku devoka wê ne tirkîya Stenbolê ye, tirkîya azerî ye. Berhem di sala 1976an de li Bakuyê hatiye çapkirin. Wergera Esgerov ji aliyê Mehmet Kaplan ve ji herfên krîlî bi bal herfên latînî ve hatiye guhestin. (weş. Nûbihar 2014).

5. Namîk Açıkgöz

Wergereke dî ya *Mem û Zînê* ji aliyê Namîk Açıkgöz ve hatiye kirin. (weş. Weza-reta Çandê, Ankara 2010). Açıkgöz berî ku vê wergera xwe amade bike, li ser *Mem û Zînê* sê gotar nivîsandine:

“Ahmed-i Hânî’ nin Mem u Zin Adlı Mesnevisi ve Klâsik Edebiyattaki Yeri”, *Türk Dünyası Araştırmaları*, İstanbul, j. 67, Ağustos 1990, r.127-138.

“Mem-i Alan Üzerine Bir Deneme”, *Türk Dünyası Araştırmaları*, Şubat 1993, r.209-216.

Turkish Studies, volume 2/4 Fall 2007, r. 37-50 (Ev gotar cara pêşî di sempozyumekê de hatiye pêşkêşkirin: “Türkçe ve Kürtçe Mem u Zin ile Leylî vü Mecnûn Mesnevîlerinin Mukayesesi”, *Karşılaştırmalı Edebiyat Araştırmaları Sempozyumu II*, Çanakkale 16-18 Mayıs 1996)

Dikare bê gotin ku heta niha ji akademiya tirkî yegane akademisyenê ku li ser berhemeke kurdî xebatên curbicur kirine û pişt re ew berhem wergerandiye zimanê tirkî Açıkgöz e. Ji vî aliyî ve ev wergera Açıkgöz a *Mem û Zînê*, rengvedana edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de ji hemû wergerên dî yên tirkî zêdetir û baştir temsîl dike. Lewra Açıkgöz wekî wergêrên dî ne kurd e û yekem nivîskarê tirk e ku bi taybetî *Mem û Zîn* û bi giştî ber-

58 Temo, h.b.,c. I, r. IXVII.

59 Melayê Cizîrî, *Dîwan Metnê Kurdî-Türkçe Tercümesi*, (Latînzekirin: Selman Dilovan, Wergera Tirkî: Osman Tunç), Nûbihar, Çapa Çarem, Stenbol 2011, r. 448.

hemeke kurdî wergerandiye tirkî. Herweha ji ber ku xebata Açıkgöz ji aliyê Wezaretê Çandê ya Komara Tirkiyeyê ve hatiye waşandin, vî rengê edebiyata kurdî li aliyê tirkî adeta resmîyetek qezenc kiriye.

6. Osman Tunç

Li gorî agahiyên li ber destan, piştî *Mem û Zîna* Xanî û *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî sêyemîn berhema klasîk a kurdî ku li zimanê tirkî hatiye wergerandin *Dîwana* Melayê Cizîrî ye. Herçiqas *Dîwana* Melayê Cizîrî şahesereke kurdî ye ku ji *Mem û Zîna* Xanî jî kevintir e, lêbelê dîsa di serdema Osmaniyan de wekî *Mem û Zînê* bi bal tirkî ve nehatiye wergerandin. Bêguman têkiliya vê yekê bi nîrxê *Dîwana* Mela ve nîne. Sedemê newergerandina *Dîwana* Mela ew e ku di kevneşopiya edebiyata klasîk de ne dîwan, zêdetir berhemên ku bi teşeya mesnewiyê û bi şêwaza hîkayetê bûn dihatin wergerandin. *Dîwana* Mela di serdema Komara Tirkiyeyê de ji aliyê Osman Tunç ve bi bal tirkî ve hatiye wergerandin (weş. Nûbihar, Stenbol, çapa yekem: 2008, çapa çarem 2011). Ev werger paşê ji aliyê Wezaretê Çand û Turizmê ya Komara Tirkiyeyê ve jî hate çapkirin (Ankara, 2012).

7. Serkan Tekin

Serkan Tekin jî wekî Seyyid Tahir Geylanî *Nehcul'-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî wergerandiye tirkî. Ev herçiqas wergera duyem a *Nehcul'-Enamê* ye jî, haya wergêr ji ya Geylanî tune ye û ew vê wergera xwe wekî wergera yekem a *Nehcul'-Enamê* dihesibîne.⁶⁰ Werger bi awayekî menzûm e û li ser kêşa *Nehcul'-Enamê* ya orjînal e (fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl).

8. Kadri Yıldırım

Kadri Yıldırım jî, piştî wergerên di serdemên Osmanî û Cumhûriyetê de *Mem û Zîna* Xanî ji bo weşanê amade kiriye û wergerandiye tirkî. (weş. Avesta, Stenbol 2010), Lêbelê Yıldırım, ji bilî *Mem û Zînê Dîwan*'a Feqiyê Teyran jî wergerandiye tirkî. Divê bê gotin ku wergera *dîwana* Feqiyê Teyran bi bal tirkî ve di tarîxa têkiliyên edebiyata kurdî û tirkî de tiştekî nû ye û girîng e. Lewra bi vê wergerê veguheştina sê berhemên girîng ên sê helbestvanên klasîk ên edebiyata kurdî ya klasîk (*Dîwan*'a Melayê Cizîrî, *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Dîwana* Feqiyê Teyran) bi bal tirkî ve temam bûye. Divê ev jî bê gotin ku Yıldırım wergerên tirkî yên van herdu berheman bi awayê menzûm amade kirine.

ENCAM Ê NIRXANDIN

Di binemaya xwe de edebiyata kurdî ya klasîk, ji edebiyata tirkî zêdetir bi edebiyatên farisî û erebî re têkildar e. Lewra ji aliyekî ve kurd berî ku rastî tirkan werin, rastî faris û ereban hatine, ji aliyê dî ve jî çavkaniyên hizrî yên edebiyata klasîk

60 Serkan Tekin, *Evlîyalar Diyarı Siirt'in Büyük Alimi Üstad Mela Halil'in Nehcul Enam'ının Türkçesi*, Kuşak Ofset, Stenbol ?, r. 3.

ji hînterlanda farîsî û erebî derbasî kurdî û tirkî bûne. Lêbelê digel vê jî di navbera edebiyatên kurdî û tirkî yên klasîk de jî tîkiliyeke girîng çêbûye.

Tîkiliya di navbera edebiyata kurdî û tirkî de paralelî tîkiliyên wan ên siyasî dest pê kiriye, bilind bûye, yan jî lawaz bûye. Ji sedsala XIem heta bi sedsala XVIem bi tîkiliyên wan ên siyasî ve girêdayî, tîkiliyên wan edebî jî lawaz in. Lê di sedsala XVIem de ji ber ku her du gelan wekî du aliyên hevsiyeng hev qebûl kirine û peyman îmze kirine, di vê atmosferê de tîkiliya wan a edebî jî dest pê kiriye. Di serdema dawî ya mîrektiyan de tîkiliyên her du edebiyatan pêşdetir çûye. Di serdema piştî mîrektiyan (serdema dawîya Osmaniyan) de bi merkezîbûna dewleta Osmanî re, tîkiliya di navbera her du edebiyatan de gihîştîye lutkeya xwe. Di vê serdemê de du navendên girîng ên vê tîkiliyê hene: Diyarbekir û Stenbol. Di serdema modernîzmê (serdema komara Tirkiyeyê) de rengvedana kurdî di edebiyata tirkî de zêde bûye, lêbelê berevajiyê wê rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de kêmtir bûye.

Dema em li aktorên van tîkiliyan dinêrin, di çarçoveya vê xebatê de, tabloyeke weha derdikeve holê: Aktorên rengvedana edebiyata tirkî di edebiyata kurdî de, bi gotineke dî ew nûnerên edebiyata kurdî ku di berhemên wan de rengê edebiyata tirkî xuya dike, kesên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bâteyî, Siyahpoş, Pertew Begê Hekkarî, Seydayê Licî, Salih Begê Hênî, Mela Ehmedê Xasî, Şêx Eskerî, Pîremêrd, Şêx Riza Talebanî, Xelîl Xeyalî, Mela Zeynelabidîn Amidî û Hozan Oflaz e. Aktorên rengvedana edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de du beş in: Başa yekem ew nûnerên edebiyata tirkî ne ku edebiyata kurdî rengê xwe daye berhemên wan. Ew jî Gelibolulu Alî, Evliya Çelebi, Ataol Behramoğlu û Namîk Açıkgoz in. Beşa duyem jî ew kurd in ku edebiyata kurdî bi riya wan rengê xwe daye edebiyata tirkî. Ew jî kesên wekî Ehmed Faîq, Ebdulezîz Xalis, Zulfîqar Fethî, Mihemed Mihrî, Pîremêrd, Seyyid Tahir Geylanî, M. Emin Bozarşan, Şamîl Esgerov, Osman Tunç, Serkan Tekin û Kadri Yildirim in.

Eger ji aliyê bandorê ve her du alî bînin berhevkin, dê bê dîtîna ku di navbera her du edebiyatan de tîkiliyeke asîmetrîk çêbûye. Rengvedana edebiyata kurdî di ya tirkî de, di serdema destpêkirina tîkiliyan de (sedsal XVI-XVII) xwe nîşan daye. Di vê serdemê de kesên wekî Gelibolulu Alî û Evliya Çelebi di berhemên xwe de cih dane metnên kurdî ên edebî. Lê piştî re di serdema dawî ya mîrektiyan û serdema dawî ya Osmaniyan de cihgirtîna metnên kurdî di berhemên tirkî de rawestiyaye. Di vê maweya dirêj de zêdetir rengvedana tirkî di edebiyata kurdî de çêbûye. Sebebê vê jî ew e ku tirkî zimanê împeratoriye ye û ji hemû zimanên wê demê zêdetir xwedî îtîbar e. Bi taybetî di serdema dawî ya Osmaniyan de di seranserê împeratoriye de kesên zana û rewşenbîr xwe fêrî tirkî dikirin. Di tevahiya tarîxa siyasî ya kurd û tirkan de, ji aliyê pozîsyona siyasî ve tirkî bihêztir û biavantajtir e. Vê jî kiriye ku rengvedana edebiyata tirkî di ya kurdî de, ji rengvedana edebiyata kurdî di ya tirkî de zêdetir be.

Di tîkiliyên di navbera edebiyatên kurdî û tirkî yên klasîk de ji aliyê cure û şeweyên danûstandinê ve tabloyeke weha heye: Di destpêkirina tîkiliyan de (sedsalên

XVI-XVII) cure û şêweyên danûstandinê, di edebiyata kurdî de bikaranîna peyv û hevokên tirkî û di dîwana Melayê Cizîrî de bicihkirina helbesteke Ehmed Paşa; di edebiyata tirkî de bikaranîna kurdi di nav mulemmayeke Gelibolulu Alî de û bicihkirina hin materyalên ziman û edebiyata kurdî di Seyahetnameya Evliya Çelebi de ye.

Di qonaxa yekem a pêşveçûna têkiliyan de (sedsalên XVIII-XIX.) cure û şêweyên têkiliyê, di edebiyata kurdî de bikaranîna peyv û hevokên tirkî, di mulemmaya Xanî de bikaranîna tirkî, nivîsîna du helbestên tirkî ji aliyê Xanî ve, bandora Mewlûda Suleyman Çelebi li ser ya Melayê Bateyî û wergera xezeleke Fuzûlî ji aliyê Pertew Begê Hekkarî ve; di edebiyata tirkî de wergera *Mem û Zîna* Xanî bi bal Tirkî ve ye.

Di qonaxa duyem a pêşveçûna têkiliyan de (serdema piştî mîrektiyan/dawiya Osmaniyan) cure û şêweyên danûstandinê, di edebiyata kurdî de bikaranîna tirkî di nav mulemmayê de, ji aliyê helbestvanên kurd ve nivîsîna helbestên tirkî, wergera helbestên tirkî bi bal kurdî ve; di edebiyata tirkî de wergera *Mem û Zîna* Xanî û hin helbestên kurdî bi bal tirkî ve ye.

Di serdema modern de (sedsala XX.) cure û şêweyên danûstandinê, di edebiyata kurdî de wergera hin helbestên Yunus Emre, Umî Sinan û Mehmet Akif; di edebiyata tirkî de wergerên *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî, *Mem û Zîna* Xanî û dîwanên Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran bi bal tirkî ve ye.

Ji ber ku têkiliya di navbera her du edebiyatan de têkiliyeke asîmetrîk e, rengên edebiyata tirkî di edebiyata kurdî de, ji yê edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de zêdetir û curbicurtir in. Rengên edebiyata tirkî pêşî bi şêweya peyvên tirkî, piştê hevokên tirkî, piştê di mulemmayan de nivîsandina misrayên serbixwe yê tirkî, piştê wergera hinek beytên tirkî, piştê wergera xezeleke tirkî, piştê nivîsandina helbestên tirkî ye. Heçî rengên kurdî di edebiyata tirkî de ne, ew jî bicihkirina hinek metnên kurdî, wergerên tirkî yê *Mem û Zînê* û dîwanên Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran û wergera hin helbestên kurdî bi bal tirkî ve ye. Çawa ku tê dîtin rengê edebiyata tirkî di ya kurdî de her ku hatiye zêdetir, curbicurtir û nûtir bûye. Lê rengê edebiyata kurdî di ya tirkî de hem lawaz, hem jî statîk e.

Rengê statîk ê edebiyata kurdî di aliyê tirkî de wergerên *Mem û Zînê* yê tirkî ne. Ev reng ewqasî statîk e ku *Mem û Zîn* heta niha di serdemên klasîk û modern de qet nebe heft caran hatiye wergerandin. Bêguman wergerandina berhemeke edebî rengvedaneke gelekî girîng û biqîmet e. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku wergerên *Mem û Zînan*, yek ne tê de, hemû dîsa kurd in. Digel vê jî, bi taybetî ji bo wergerên serdema klasîk divê bê gotin ku pisporî û perwerdeya wan jî di çarçoveya edebiyata tirkî de bû û loma jî ew werger ji aliyekî ve wekî nûnerên edebiyata tirkî ku berê xwe dane kurdî û di derbaskirina rengekî edebiyata kurdî bi bal aliyê tirkî ve bûne aktor, dikarin bên qebûlkin.

Digel ku wergerên *Dîwan*'a Melayê Cizîrî, *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Dîwana* Feqiyê Teyran û hin helbestên kurdî wekî rengên kurdî di edebiyata tirkî de dikarin bên qebûlkin jî, lêbelê ji ber ku wergerên wan dîsa kurd in ew nabin rengê

herî heqîqî. Rengê herî heqîqî yê edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de di destpêka têkiliyan û di dawiya têkiliyan (serdema modern) de xwe daye der. Di destpêkê de Gelibolulu Alî û Evliya Çelebi di berhemên xwe de cih dane hin metnên kurdî û di dawiyê de jî Ataol Behramoğlu hin helbestên kurdî bi riya Rûsî wergerandine tirkî û akademîsyenkî edebiyata tirkî ya klasîk (Namik Açıkgöz) *Mem û Zîna* Xanî wergerandiye tirkî û ev werger di wezaretê çandê ya Komara Tirkiyeyê de hatiye çapkirin. Di vê navbera dirêj de kurdî bi şeweyên cuda rengê xwe nedaye edebiyata tirkî. Wusa tê çavdêrikirin ku êdî, li hinek zanîngehên Tirkiyeyê mêldariya hin pisporên edebiyata tirkî ya klasîk ji bo edebiyata kurdî ya klasîk çêdibe û bi vî awayî ew têkiliya asîmetrîk di lehê edebiyata kurdî de hêdî hêdî ji holê radibe.

REFERANS

- Akif, Mihemmed, “Şeva mewlîdeke pîrr hezîn”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.1 (Çiriya Pêşin 1992), r. 28.
- Alakom, Rohat, *Türk Edebiyatında Kürtler* (çapa sêyem), Avesta, İst. 2010.
- Alî, Gelibolulu, *Künhü'l-Ahbâr'ın Tezkire Kısmı*, (amd. Mustafa İSEN), weş. AKM, Ankara 1994.
- Allouche, Adel, *Osmanlı Safevi İlişkileri Kökenleri ve Gelişimi*, (wer. ji îngilîzî Ahmed Emin Dağ), weş. Anka, İst. 2001.
- Açıkgöz Namık, “Türkçe ve Kürtçe *Mem û Zîn* ile Leylî vü Mecnûn Mesnevîlerinin Mukayesesi”, *Karşılaştırmalı Edebiyat Araştırmaları Sempozyumu II*, Çanakkale 16-18 Mayıs 1996.
- Adak, Abdurrahman, *Ali Emîri'nin Gözüyle Diyarbakırlı Şairler*, weş. Kent Işıkları, İst. 2011.
- Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, ç. 2, Stenbol 2014.
- Şükrî-i Bitlîsî, Uluslararası Tatvan ve Çevresi Sempozyumu, weş. Beyan, İst. 2008.
- “Di Serdema Osmanîyan de li Pey Rêça Ehmedê Xanî: Sê *Mem û Zînên* bi Tirkî”, *Nûbihar*, j.120 (havîn 2012), r. 16-23.
- Aksoyak, İ. Hakkı, “Divan Şiirinin Dili İmparatorluk Dilidir” *Turkish Studies*, volume 4/5, Summer 2009, r. 1-18.
- Aksoyak, İsmail Hakkı, *Gelibolulu Alî ve Divanlarının Tenkitli Metni*, Zanîngeha Gaziyê SBE, teza doktorayê, Ankara 1999.
- Baykuşak, Tahir, “Xelîl Xeyalî Modan (1865-1946)”, *Kürt Tarihi*, j.9 sal: 2013, r. 34-39.
- Beysanoğlu, Şevket, *Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, (4 berg), San Mat. Ankara 1997.
- Bozarslan, M. Emîn (amd.), “Pêşkêşî”, Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, weş. Deng, Stenbol 2005.
- Bozarslan, M. Emîn (amd.), *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî*Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, weş. Deng, Swêd 1985, b. II.
- Bruinessen, Martin van, “Evliya Çelebi Seyahetnamesi'nde Yansıdığı Kadarıyla 16. ve 17. Yüzyıllarda Kürdistan”, *Kürdolojinin Bahçesinde Kürdologlar ve Kürdoloji Üzerine Söyleşi ve Makaleler*, wer. Mustafa Topaloğlu, weş. İletişim, İst. 2012.
- Bulduk, Abdulganî Fahrî, *Muxteser el-Cezire Tarixi*, nusxeya latînezekirî ya neçapbûyî.
- Ciwan Mûrad, *Ahmedê Xanî jiyan, berhem, bîr û baweriyên wî*, weş. Doz, Stenbol 1997.
- Çelebi, Evliya, *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahetnamesi*, YKY, İstanbul, 2010, (b. II)

- Çelebi, Kınalızade Hasan, *Tezkiretü'ş-Şu'arâ*, (amd. İbrahim Kutluk), weş. TTK, Ankara 1989.
- Çeltik, Halil, *Divan Sahibi Rumeli Şairlerinin Şiir Dünyası*, Gazi Üniversitesi SBE, doktora tezi, Ankara 2004.
- Dadaşbilge, Sırrı (amd.), Ahmet Faik, *Mem o Zin*, Matbaa Teknisyenleri Basımevi, İstanbul 1969.
- Durre, Abdurrahman, *Şerha Diwana Ehmedê Xanî*, weş. Keskesor, Stenbol 2002.
- Ekici, Abdullah, *Zeynelabidînê Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên wî yên Destnivîsî*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mardin 2014.
- Emîrî, Ali, *Esâmî-i Şu'arâ-yî Âmid*, Millet Küt., Tarih Bl. 781/1.
- Emre, Yûnis, “Wer bibîn eşq bi mi çi kir”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.2 (Çiriya Paşin 1992), r. 14;
- “Min canê cana peyda kir”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.3 (Berçile 1993), r. 15;
- “Mi umrê xwe li hiçê xerc kiriye”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.4 (Çileyâ Paşin 1993), r. 26;
- “Nav xweşik bi xwe xweşik Muhammed”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*; j.5 (Sibat 1993), r. 29;
- “Têkeve rîya rast dilo”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.6 (Adar 1993), r. 18;
- “Weke min î vî reben î”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.11 (Tebax 1993), r. 28;
- “Ev dinya gepek nan e”, wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.12 (Îlon 1993), r. 17.
- Epözdemir, Şakir, *İdris-i Bitlisi ve Kürt Meselesi*, weş. Fanos, Ankara 2011.
- Eravcı, H. Mustafa, “Mustafa ‘Âlî’nin Nusret-nâmesi ve Onun ışığında Yazarın Tarihçiliği”, *Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Tarih Bölümü Tarih Araştırmaları Dergisi*, b. 24, j. 38, Ankara 2005, r. 163-184.
- Ergül, Selim Temo, “Türkçe’de Kürt Edebiyatı”, *Dipnot*, j.2/ 2010 (Temmuz-Ağustos-Eylül), r. 213-231.
- Ersoy, Mehmet Akif, *Safahat*, amd. Cemal Kurnaz û yên dî, weş. MEB, İstanbul, 1996.
- Fuzûlî, *Dîvan*, weş. Akçağ, Ankara 1997.
- Geverî, Ayhan, “Şeyh Rıza Talabanî ve Sultan Abdülhamid’e Yazdığı Kasideleri”, *Kürt Tarihi*, j. 1, sal: 2012, r. 46-51.
- Hekkarî, Perto Beg, *Dîwan*, amd. Tehsîn İbrahim Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.
- Hetawî Kurd, “Ey Şa’îrê Şêrîn Ziman Rûmî Tahîrû’l-Mewlewî”, j.10, İstanbul 20 Haziran 1330/3 Tîrmeh 1914, r. 14-15.
- İsen, Mustafa, *Künhü’l-Ahbar’ın Tezkire Kısmı*, weş. AKM, Ankara 1994.
- Gelibolulu Mustafa Âlî*, weş. Şule, İst. 1998.
- Khizri, Haidar, “Mîratî Şûm: Wênêy Kurdekan le Kulturî Turkî da”, *Kovara Nûbihar Akademî*, 1/1, Stenbol 2014.
- Korkusuz, Şefik, *Tezkire-i Meşayîh-i Amid*, weş. Kent Işıkları, İstanbul 2004.
- Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması*, Melissa Mat., İst. 1996
- Köprülü, M. Fuad, “Türk Edebiyatı’nda Aşık Tarzının Menşeyi ve Tekâmülü Hakkında Bir Tecrûbe”, weş. TTK, Ankara 1999.
- “Çağatay Edebiyatı”, *İA*, b. III.
- “Anadolu’da Türk Dili ve Edebiyatının Tekamülüne Umumi Bir Bakış”, *Türk Edebiyatı Tarihi*, weş. Akçağ, Ankara 2003.

- Latîfî, *Latîfî Tezkiresi*, (amd. Mustafa İSEN), weş. Kùltür Bakanlıđı, Ankara 1990.
- Lazerîv, M. S., *Tarîxu Kurdistan* (wer. Ebdî Hacî), weş. Spîrêz, Hewlêr 2011.
- Levend, Agah Sırrı, *Türk Edebiyatı Tarihi*, weş. TTK, Ankara 1998.
- Liceyî, Mela Mihemedê, *Dîwana Hadî*, amd. Tehsîn Î. Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.
- Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Ulusçuluđu (1900-1920)*, weş. Vate, İstanbul, 2010.
- Minorsky, V., "Kürtler", *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, İstanbul 1993.
- Modanî, X. "Hewar û Fîzar[a] Misilmanî" *Rojî Kurd*, j.2, r. 32, (çapa wekxo), *Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2013.
- Okiç, M. Tayyip, "Çeşitli Dillerde Mevlidler ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri", *Atatürk Üniv. İslami İlimler Fak. Dergisi*, j.I, sal: 1975, r. 17-59.
- Serdar, Mehmet Törehan, *Rüyalar Şehri Bitlis*, TBMM Kütüphanesi.
- Serfiraz**, Mesûd, "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî", *Wêje û Rexne*, j.2, sal: 2014 (gulan-hezîran-tîrmeh-tebax), r. 57-65.
- Sertkaya, Osman F., *Osmanlı Şâirlerinin Çağatayca Şiirleri*, Edebiyât Fakültesi Mat., İst. 1970.
- Silopi, Zinnar, *Doza Kurdistan*, Stewr Basımevi, 1969.
- Sinan, Ummî, "Bixwaze çavê mi giryan dike dost", wer. Hozan Oflaz, *Nûbihar*, j.6 (Adar 1993), r. 18.
- Siyahpoş, *Seyfu'l-Milûk û Bedî-ul Cemal*, (amd. Bedirxan Amedî), weş. Nûbihar, Stenbol, 2011.
- Şêx Eskerî, *Keşkol*, amd. Zeynelabidîn Zinar, weş. Doz, İstanbul 2009.
- Temo, Selim, *Kürt Şiiri Antolojisi*, weş. Agora Kitaplığı, İst. 2007, (c. I) .
- Tevfîk, Süleymaniyeli M., "Der'ağûş", *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî-Tirki*Kürdçe-Türkçe Dergi 1908-1909*, (amd. M. Emîn Bozarşlan) weş. Deng, Uppsala 1998.
- "Ravza-i Mutahhara'da..." *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi Kovara Kurdî-Tirki*Kürdçe-Türkçe Dergi 1908-1909*, (amd. M. Emîn Bozarşlan) weş. Deng, Uppsala 1998.
- "Kârvan-ı Gam", *Jîn Kovara Kurdî-Tirki*Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd. M. Emîn Bozarşlan) weş. Deng, Uppsala 1985.
- Xalis, Ebdulezîz, *Mem û Zîn*, nusxeya destxet (pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak).
- Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, (amd. Huseyn Şemrexî), weş. Nûbihar, Stenbol 2009.
- Dîwan*, (amd. Kadri Yıldırım), weş. Avesta, İstanbul 2014.
- Xasî, Ehmedê, *Mewlûda Zazakî*, amd. Zeynelabidîn Amidî, Diyarbekir 1402.
- Varlî, *Dîwan û Gobideyê Ahmedê Xanî yêd Mayîn*, weş. Sîpan, İstanbul 2004.
- Zekî, M. Emin, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, (Wer. V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan), weş. Nûbihar, İstanbul 2010.
- Zivingî, Mela Ehmedê, *el-'Iqdu'l-Cewherî fi Şerhî Dîwanî eş-Şeyxi'l-Cezerî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

DI PEYWENDA EDEBIYATA KLASÎK DE MESNEWIYA MEM Û ZÎNÊ

Zehra Toska*

Bi pênaseya “edebiyata klasîk” amaje bi kevneşopiyeye edebî ya pîrzimanî û pîrçandî hatiye kirin ku vê kevneşopiyê di çarçoveya çand û medeniyeta Îslamê de cara yekem bi zimanê ereb û farisan hatiye avakirin û bi tevkarîya zimanên wekî tirkî, kurdî, sîndî, pencabî, ûrdûyî û peştûyî jî li ser erdnîgariyeye fireh bi sedan salan hukma xwe domandîye. Ev edebiyata ku ji zemîna hevpar a dinyaya bawerî û zanîna Îslamê geş bû, xwedan rêzik û pîvanên estetîk bû. Di nav vê kevneşopiyê de, ji nezîreyê heta tercumeyê, pêwendiyên navmetnî yên berhemên ku bi awayekî curbicur hatibûn nivîsîn, gelek tişt hebûn.

Di vê edebiyatê de karê nivîskaran qet ne sivik bû ku ji gotinê zêdetir girîngî dida bikaranîna zimanê hunerî. Ew mecbûr bûn ku helbestên xwe bi teşeyên nezmê û qalibên erûzê; hest û ramanên xwe jî bi vegotinên tematîk, têgeh û klîşeyên ku sînore wan bi kevneşopiyê hatiye sînorkirin, binivîsin û dîsa mecbûr bûn ku di nav van rêzikên hişk de vegotin û wateyê tecdît bikin û alaya nezmê hêj bilindtir bikin. Bedewî û rindiya dilberê û evîndarî mijarên sereke bûn.

Mem û Zîna ku yekem mesnewiya bi zimanê kurdî ye, berhemeke vê kevneşopîya edebiyatê ye. Ev berhema navdar ku Ehmedê Xanî li Bazîdê nivîsiye, “wekî alegoriya têkoşîna gelê kurd hatiye nîrxandin û taybetiyên wê yên edebî zêde bala kesî nekişandiye”¹ wekî Remezan Alan² û Selîm Temo jî diyar kirine. Vegotinên derbarê realîteya kurdan de ku Xanî di destpêka berhemê de tîne ziman, dibe sedem ku em metnê bi vî awayî bixwînin. Turgut Karabey dibêje ku van vegotinên ku em behs dikin, piştî li metnê hatine zêdekirin û weşanên derbarê vê berhemê de jî wekî angaşt dibîne:

* Prof. Dr. , Zanîngeha Boğaziçi, Beşa Ziman û Edebiyata Tirkî.

1 Selim Temo Ergül, “An Overview of Kurdish Literature in Turkish,” *Tension, Tradition and Translation in Turkey* (eds.) Şehnaz Tahir Gürçağlar, Saliha Paker, John Milton. Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company (ber bi weşandinê ye).

2 Remezan Alan, “Di Nav Lepê Şîroveyan de Mesnewiyeye Mîstîk”, *Sempozyûma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî* (30-31 Gulan 2008), Diyarbekir, 2008, 183-202. Hemûya gotarê, wekî bersivê ye ji bo şîroveyên bêhed.

*Zanyarên rojavayî yên li derveyê welêt û hin lêkolînerên li Tirkiyeyê, ka bê ji ber çi di lêkolîn û weşanên xwe de, li ser vê taybetiya Ehmedê Xanî nasekinin ku ligel pêşengiya xwe ya olî, bi Îslamê ve hişkehişk girêdayî ye û Îslamê wekî sernasnameyekê qebûl dike. Herwiha Xanî, nasnameya kurd bi wateya îroyîn bikar neaniye. Îro çend beşên di mesnewiya Mem û Zînê de gumanbar in. Kesê yekem ku ev rewş ferq kiriye civaknasekî rojavayî Martin V. Bruinessenê hollandî ye. Lewra di van beşên berhemê de raman û nêrînen ku aîdê sedsalên pêşerojê ne cih digirin. Gelo, ev raman û nêrîn piştî Ehmedê Xanî, li berhema wî hatine zêdekirin, em nizanin? Ji ber ku, di berhemê de beşên ku ne li gorî kevneşopiya mesnewiya klasîk in, hene.*³

Karabey, derbarê “beşên ne li gorî kevneşopiyê” de tiştek negotiye. Dîsa negotiye ka çawa gihîştîye vê encamê û ew malik û beşên ku lê hatine zêdekirin li gorî kîjan qaîdeyan hatine tespîtîkirin. Ji ber ku xwe naspêrê metneke bi edîsyon krîtîk, wisa dixuye ku Karabey, bişik ev berhem xwendîye. Karabey çapa yekem a berhemê jî dixwîne ku di sala 1335/1919’an de li Stenbolê, ji aliyê Kürt Tamîm-i Ma’arif ve Neşriyât Cemiyeti ve, bi pêşgotina Hemze Begê Miksî û bi tîpên erebî hatiye nivîsîn, lê wekî em di gotina wî ya “ka bê çima hemû xebat xwe dispêrin vê kitêbê” de jî dibînin, baweriya xwe pê nayîne. Herwiha dibêje, ew weşana ku Rudenko li ser nêzî 10 destxetên ji Bakûrê Kurdistanê berhev kiriye û dîroka wan 1731-32 ye, jî “ew şik ji holê ranekirine”.⁴ Ji ber ku di vê weşanê de jî metn nehatiye dayin.⁵ Nêrînen Turgut Karabey ên derbarê berhemê de gelekî erênî ne. Ew dibêje ku, Xanî destana Memê Alan gihandiye serdema xwe û bi şêwazeke nûjen nemirandiye. Berhema xwe bi şêwazeke herikbar, bi hunermendî, bi şayesên zindî û bi awayekî serkeftî nivîsiye. Di dawiyê de dibêje ku *Mem û Zîn* berhemeke tesewûfî ye ku bi şêwaza *Leyla û Mecnûn*, *Ferhat û Şîrîn*, û *Husn û ‘Eşq* hatiye nivîsîn.

Wisa dixuye, ji bo ku em baş têbigihên girîngiya *Mem û Zînê* û niyeta nivîskar, pêdivî bi berhemên domdar heye. Ev nivîs angaşteke wisa hilmade ser xwe ku valahiyeke wiha dagire. Lê belê hêviyeke wê jî heye ku derî hinekî veke. Berhema Xanî gelek kûr û girift e. Lê di vê nivîsê de em ê zêdetir li ser taybetiya wê ya tesewuffî bisenin. Di destpêk û beşa dawiyê de nivîskar dibersivîne ka wî ev berhem çima û çawa nivîsiye. Wek metod em ê li ser wan gotinan û sepandinên wan ên di metnê de

3 Turgut Karabey, “Ahmed-i Hânî (1651-1707) Hayâtı, Eserleri ve Mem o Zîn Mesnevisi” *Zanîngeha Atatürkê Kovara Türkiyet Araştırmaları* Jimar 30, Erzurum 2006, 63-64.

4 Gotinên Hemze Begê Miksî di sala 1968’an de ji aliyê Mehmet Emîn Bozarşlan ve bi tercumeyeke wê ve hatiye weşandin, lê ew beşên fikaredar jê hatine derxistin. Xebata doktoraya Margareta B. Rudenko jî digel pêşgotina Qanadê Kurdo ve, di sala 1962’an de li Moskovayê bi tercumeyeke wê ya rusî ve hatiye weşandin. bnr. Karabey, r. 62.

5 Em li vir diyar bikin ku, hemançapa vê destxeta Pirtûkxaneyê Muzeya Arkeolojiya Stenbolê ku Wezaretê Çanda Tirkiyê weşandiye, şik û gumanên Karabey ji holê ranekirine. *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Amd. Namık Açıkgöz, Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı, 2010 (çapa duyem 2011). Ji bo rexneyên vê wergerê bnr. Kadri Yıldırım, *Kültür Bakanlığı'nın Mem û Zîn Çevirisine Eleştirel Bir Yaklaşım*, İstanbul: Weşanên Avesta, 2011.

rawestin. Em ê hewl bidin ku beşên berhemê li gorî vebêjyên wan û motîfan tespît bikin û zimanê hunerî yê metnê bi alîkariya çend malikan nîşan bidin.

Beriya analîz û nirxandina metnê, ez dixwazim çend tiştên ku min bi pêşxwendina xwe tespît kiriye, bibêjim.

Li Tirkiyeyê, berhema ewil a derbarê Xanî û berhemên wî de me agahdar dike ku ev pirtûka ku di sala 1293/1876an de hatiye nivîsin, *Mir'âtü'l-Fevâ'id fî Terâcimi Meşâhiri Âmid* a Alî Emîrî Efendî ye ku avakerê Pirtûkxaneyê Milletê ye. Alî Emîrî Efendî, di nav helbestvanên Cizîrî de behsa Xanî û çar berhemên wî jî kiriye. Gotina Alî Emîrî ku ji çavkaniyên din ciyawaz e, Xanî bi zimanê erebî kitêbeke tecwîdê nivîsiye. Alî Emîrî ku bi hezaran berhemên destxetî xwendiyê, dibêje ku *Mem û Zîn* pirtûkek e ku cil û bergê romanê li xwe kiriye, bi awayekî serkeftî qala her ilmê dike, çîroka wê jî Cizîrê ye û di nav Kurdan û yên ku wî zimanî dizanin de gelek navdar e.⁶

Li ser *Leyla û Mecnûn û Mem û Zîn*:

Mem û Zîn, di nav çîrokên ku ji eşqa mecazî derbasî eşqa îlahî dibin de, herî zêde dişibe *Leyla û Mecnûn*. Bi heman weznê, bi behra xeffî (mef'ûlu mefa'îlun fa'ûlun) hatiye nivîsîn. Xanî jî wekî Nîzamî (k.d. 1204) çîrokeke gelêrî, bi normên edebiyata klasîk ji nû ve afirand, bi tam û çêja zimanê wê demê nivîsî û ew derxist asta edebiyata klasîk. Ji Nîzamî cudahiya wî ev e ku Xanî çîroka xwe ji çanda xwe hîlbijartiyê.⁷ Bandora Fuzûlî cih bi cih di berhême de dixuye, lê wekî Îzedîn Mustefa Resûl jî dibêje Xanî behsa Fuzûlî nekiriye.⁸ Namîk Açıkgöz jî qala çend manendiyan kiriye.⁹ Di dûmahîka nivîsê de carinan em ê li ser wan manendiyan rawestin.

6 “Zatekî bi navê Ehmedê Xanî berhemê wekî romanê, bi kurdî nivîsandiyê. Di her ilmê de bimaharet e û çîroka wê li Cizîrê di sala 1061 [1650-51] de derbas dibe. Mehlesa xwe carna wekî Ehmed, carna wekî Xanî dinivîse. Ji bo kesên kurd û yên wê zimanê dizanin nîrxê wê berhemê bilind e. Dîsa bi navê Nûbehar lugateke wî ya erebî-kurdî heye û ji bo kurdan girîng e. Dîsa wekî neh deh rûpela behsa eka'îdê dîniyyeyê dike. Herwiha, bi navê Nûshayê Tecwîd derbarê tecwîda kelama Rebbê Mecîd pirtûkeke wî ya bi erebî heye. Dibe ku telîfên wê yên din jî hebin. Katibê sencaxa Bazîdê bû. Li Bazîdê wefat kir û ziyaretgeha wî li wir e. Alî Emîrî, *Mir'âtü'l-Fevâ'id fî Terâcimi Meşâhiri Âmid*, Amd. Günay Kut, Mesut Demir, Abdullah Ögmen, Stenbol: Tirkiye Serokatiya Berhemên Destnivîsar, 2014, 28. (Berhem di 1105/1694-95' de hatiye nivîsandin. Dîroka ku Emîrî daye dîroka dayikbûna Xanî ye. Dibe ku xeletiyek be ji ber xwendina bilez ya beşa xatimeyê. Bnr. *Mem û Zîn*, 60/55-56.)

7 Ji bo têkiliya *Mem û Zîn* û çîroka gelerî Memê Alan ku 12 guhertoyên wê hatine tespît kirin, bnr. Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Stenbol: Weşanên Avesta, 2010, 40-44.

8 “Xanî di destpêka berhema xwe de behsa Nîzamî û Camî dike, lê behsa Fuzûlî nake. Lê dema em “*Mem û Zîn*” a Ehmedê Xanî û “*Leyla û Mecnûn*” ku Fuzûlî bi zimanê azerîkî yan jî bi tirkî nivîsiye, bidin ber hev em dibînin ku tesîra Fuzûlî ji aliyê retorîkî û ziman ve dixuye. Îzzettin Mustafâ Resûl *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf olarak Ehmedê Xanî ve “Mem û Zîn”*, Wergera ji erebî. Kadri Yıldırım, Stenbol: Weşanên Avesta, 2007, 10

9 Namîk Açıkgöz, “Türkçe ve Kürtçe Mem û Zîn ile Fuzûlî” nin Leylî vü Mecnûn Mesnevisinin Mukayesesi” *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 2/4, Fall 2007, 37-50. Herwiha bnr. Eyüp Azlal, *Mem*

Mem û Zîn, li dorhêla edebiyatê ku di bin bandora farisî, erebî û tirkî de ye, weke *Mem û Zîn*, li dorhêla edebiyatê ku di bin bandora farisî, erebî û tirkî de ye, weke *Leyla û Mecnûnê* ne xwediyê silsileyê dirêj be jî, bo gelek zimanan hatiye wergerandin. Berhema pêşî ye ku ji kurdî bo tirkî hatiye wergerandin. Di dema Osmaniyan de sê lib tercûme/wergerên mesnewiya *Mem û Zînê* hatine tespîtîkirin. Em ê bi kurtî derbarê wan de agahiyan bidin.

Mesnewiyên *Mem û Zîn* di Tirkî de:

Di tirkî de mesnewiya *Mem û Zîn* a yekem a Ehmed Faîqê Bidlîsî ye. Di vê berhemê de ku di sala 1206/1791-1792an de hatiye nivîsîn¹⁰ qet behsa Xanî nayê kirin. Beşên wekî munaca'at, na'at, nezmê sebeb û hwd. di vê berhemê de cih nagirin. Lê, piştî malika duyem ku armanca nivîsîna xwe rave dike, wekî *Leyla û Mecnûnê* derbasî mijarê dibe.

Sarf eyle kelâm-ı dürr-i meknûn
Mânend-i kitâb-ı Leylî Mecnûn

Wergera yekem ku dîroka wê 1273/1856 e, aîdê Nazmî ye.¹¹ Di hin lêkolînan de ev berhem wekî ya Ehmed Faîq dixuye, lê ev tespîteke xelet e. Wergêr di berhemê de ji beşa munaca'atê û vir de navê xwe wek Nazmî nivîsiye, qedrê navê Xanî jî girtiye. Di destpêkê û beşa xatîmeyê de gotiye ku çiqas ji destê wî hatiye wergerandîye tirkî. Em dikarin bibêjin ku Nazmî hin malik hema wekî xwe, hin malik jî bi guhertinên biçûk wergerandiye û bi piranî jî serwaya berhema resen bi kar anîye. Em ê du minakan bidin:

Bu Nazmî'ye rehber olsa Hânî
Belki bula cân-ı câvidânî (57b)
Ol mîve-i Kürdî idi elhak
Türkî diline bu geldi ancak (6b)

Wergera duyem ku dîroka wê 1906 e, aîdê Abduleziz Halis (Çıkıntaş, k.d.1935) e.¹² Halis, di dibaceya xwe de ku pexşankî nivîsiye, derbarê Xanî û berhema wî *Leyla*

u Zîn Mesnevîsinin İncelenmesi ve Fuzûlî'nin Leylâ vü Mecnûn Menevîsiyle Mukayesesi ya Ahmed Fâik, Zanîngeha Stenbolê, Enstîtuya Zanistên Cîvaki, Teza Lîsansa Bilind, 2013, 209-238.

10 Sırrı Dadaşbilge meşhûrîya nivîsandina vê berhemê sala 1730 nişan daye. Ev dîroka di hemû xebatan de derbas dibe. Lê li gorî hesabê ebcedê ev dîrok ne rast e. Ahmed Fâ'ik, *Mem o Zîn*, amd. Sırrı Dadaşbilge, Stenbol: Matbaa Teknisyenleri Basımevi, 1969. ; Eyüp Azlal teza Mastîrê amade kiriye. Bnr, jêrenot 9.

11 Nazmî, *Kitâb-ı Mem û Zîn (-i Türkî)*, destnivîsên Tahrân, Kütüphaneyê Meclîs-i Şuerâ-yı Millî, nr, 9385. Spasiyên xwe ji Meryem Babacan re pêşkêş dikim ku ji bo vê metnê alîkariya min kiriye.

12 Berhemê hê jî wekî miswedeyê ye. Spasiyên xwe ji Selîm Temo re pêşkêş dikim ku derbarê

û *Mecnûnê* ne xwediyê silsileyê dirêj be jî, bo gelek zimanan hatiye wergerandin. Berhema pêşî ye ku ji kurdî bo tirkî hatiye wergerandin. Di dema Osmanîyan de sê lib tercûme/wergerên mesnewiya *Mem û Zînê* hatine tespîtîkirin. Em ê bi kurtî derbarê wan de agahiyên bidin.

Mesnewiyên *Mem û Zîn* di Tirkî de:

Di tirkî de mesnewiya *Mem û Zîn* a yekem a Ehmed Faîqê Bidlîsî ye. Di vê berhemê de ku di sala 1206/1791-1792an de hatiye nivîsîn¹³ qet behsa Xanî nayê kirin. Beşên wekî munaca'at, na'at, nezmê sebeb û hwd. di vê berhemê de cih nagirin. Lê, piştî malika duyem ku armanca nivîsîna xwe rave dike, wekî *Leyla û Mecnûnê* derbasî mijarê dibe.

Sarf eyle kelâm-ı dürr-i meknûn

Mânend-i kitâb-ı Leylî Mecnûn

Wergera yekem ku dîroka wê 1273/1856 e, aîdê Nazmî ye.¹⁴ Di hin lêkolînan de ev berhem wekî ya Ehmed Faîq dixuye, lê ev tespîteke xelet e. Wergêr di berhemê de ji beşa munaca'atê û vir de navê xwe wek Nazmî nivîsiye, qedrê navê Xanî jî girtiye. Di destpêkê û beşa xatîmeyê de gotiye ku çiqas ji destê wî hatiye wergerandiye tirkî. Em dikarin bibêjin ku Nazmî hin malik hema wekî xwe, hin malik jî bi guhertinên biçûk wergerandiye û bi piranî jî serwaya berhema resen bi kar aniyê. Em ê du minakan bidin:

Bu Nazmî'ye rehber olsa Hânî

Belki bula cân-ı câvidânı (57b)

Ol mîve-i Kürdî idi elhak

Türkî diline bu geldi ancak (6b)

vê berhemê de ez agahdar kirim.

- 13 Sırrı Dadaşbilge mêtûya nivîsandina vê berhemê sala 1730 nîşan daye. Ev dîroka di hemû xebatan de derbas dibe. Lê li gorî hesabê ebcedê ev dîrok ne rast e. Ahmed Fâ'îk, *Mem o Zîn*, amd. Sırrı Dadaşbilge, Stenbol: Matbaa Teknisyenleri Basımevi, 1969. ; Eyüp Azlal teza Mastirê amade kiriye. Bnr, jêrenot 9.
- 14 Nazmî, *Kitâb-ı Mem û Zîn (-i Türkî)*, destnivîsên Tahran, Kütüphaneyi Meclis-i Şuerâyî Millî, nr, 9385. Spasiyên xwe ji Meryem Babacan re pêşkêş dikim ku ji bo vê metnê alîkariya min kiriye.

Wergera duyem ku dîroka wê 1906 e, aîdê Abduleziz Halis (Çıkıntaş, k.d.1935) e.¹⁵ Halis, di dibaceya xwe de ku pexşankî nivîsiye, derbarê Xanî û berhema wî de agahiyan dide û dîsa dibêje ku, herçiqas di şopa Fuzûlî de çûbe jî bi bedewiya xurtbûna hizrî, firehiya xiyalî, afirandina tiştên nû ve Xanî xwediyê şêwazeke resen e. Xwe wekî mutercîm û nazim dide naskirin. Diyar kiriye ku, metna resen carinan bi wateyî carinan jî bi awayekî berfirehkirî veguhestiye û hin cihan jî ji ber ku pêwîst bûye (hasbe'l-icâb) qut kiriye. Dîsa diyar kiriye ku armanca wî bi vê wergerê tenê xizmet bûye. Dîsa di beşa “sedema wergerandinê” de dibêje ku şêwaza berhema resen dijwar bûye, ji ber vê yekê li ser devoka Botanê xebitiye û zehmetî kîşandiye.

*“Noksânını görme olsa da kem
Bir nâme ki Kürdîden mütercem
Söz başka selika lehçe başka
Türkî dili başka Kürdçe başka
(...)
“Bûtî dilin tetebbu‘ itdüm
Oldukça biraz temettu‘ itdüm
Türkâne idüp o Kürdi tezyîn
Geydürdüm ana libâs-ı rengîn” (r. 14)*

MEM Û ZÎN

(Naverok, sebebê nezm, li gorî tehkiyeyê beş, şayese, motîf)

Mesnewî ji 60 beşan û 2656 malikan pêk hatiye. Beriya mijara sereke (beşên 1-8.) besmele, tewhîd, munaca’et, ne’et, şefa’et, mîrac, pesindayîna gelê kurd û sebebê nezmê hene. Piştî mijara sereke (beşên 8-57.) di bin sê beşên dawiyê de têgehên wekî evîn, fenafillah, bekaîllah û nêrînên olî-tesewîfî hatine vegotin. Berhem, bi dua û xetîmeya ku dîroka nivîsîna berhemê (1061/1694) dide, dawî dibe. Di metnê de cureyên nezmê yên cuda tunene. Her serenavek kurtiya mijarê ye û gelek ji wan serenavan bi awayekî dirêj hatine nivîsîn. Ew serenav di heman demê de îşareta herrikandina mijaran dikin. Beşa methiye/îthafê ku ji yekî re tê pêşkêşkirin, ji bo gelê kurd hatiye veqetandin.

Xanî, di beşên 6. 7. û 58. de behsa sedem û çawaniya nivîsîna xwe kiriye. Em ê niha bêtî ku reseniya hin bêjeyan û termînolojiyê xera bikin van yekan bi kurtasî rave bikin.¹⁶

Sebebê Nezm/ Çima û Çawa Nivîsiye:

-
- 15 Berhem hê jî wekî miswedeyê ye. Spasiyên xwe ji Selîm Temo re pêşkêş dikim ku derbarê vê berhemê de ez agahdar kirim.
- 16 Ji vir û pê de, jêgiranên wergeran rasterast yan jî bi kurtasî ji Kadîrî Yildirim hatine wergirtin. [Di wergera kurdî de, wergerên wan malikan ji Şîrove û Kurdiya Îro ya Mem û Zînê ya Jan Dost hatiye wergirtin. Nîşeya wergêr.]

*Xanî ji kemalê bêkemalî
Meydana kemalê dît xalî
Ye'nî ne ji qabilî û xebîrî
Belkî bi te'essub û 'eşîrî
Hasil ji înad eger ji bêdad
Ev bîd'ete kir xîlafê mu'tad
Safî şemirand vexwarî durdî
Manendê durrê lisanê Kurdî (6/1-4);*

*Da xelqî nebêjitin ku "Ekrad
Bê me'rifet in bi esl û bunyad
Enwa'ê milel xwudankitêb in
Kurmancî tenê di bêhisab in
Hem ehlê nezer ku "Kurmanc
Işqê nekirin ji bo xwe amanc
Têkda ne di talib in ne metlûb
Vêkra ne muhibb in ew ne mehbûb
Bêbehrê ne ew ji işiqbazî
Farix ji heqîqî û mecazî (6/5-10);*

*Şerha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim behane (7/36)*

*Mehbûb û libas û gûşîware
Milkê di min in, ne muste'ar e
Elfaz û me'anî û 'ibadat
Înşa û mebanî û îşarat
Mewdû'û meqasid û hîkayet
Mermûz û menaqib û dîrayet
Uslûb û sîfat û me'ne û lefz
Esla nekirin me yek ji wan kerz (7/61-65)*

Wiha gotiye Xanî. Em ê di bin çend serenavan de gotinên helbestvan rave bikin û çend tiştan bidin ber hev:

"Xanî ji kemalê bêkemalî, meydana kemalê dîtî xalî"

Gotinên Xanî yên derbarê nejhâtîbûn û nezanbûna wî de, di kevneşopiyê de wekî gelek helbestvanan tevazûyê nişan dide. Di dema wî de hamiyên ji huner, helbest û ilmê fêm dikin tunebûn. Ji ber vê yekê qada kemalê vala bû û ji bilî wî kesek tunebû. (6/13-19) Xanî wiha dibêje:

“Ger dê hebûya me jî xwedanek
 Alîkeremek, letîfedanek,
 îlm û huner û kemal û îz’an
 Şê’r û xezel û kîtab û dîwan,
 Ev cins biba li ba wî me’mûl
 Ev neqd-i bi ba li nik wî meqbûl,
 Min dê elema kelamê mewzûn
 Alî bi kira li banê gerdûn
 Bînave ruha Melê Cizîrî
 Pê hey bi kira Elî Herîrî
 Keyfek we bi da Feqiyê Teyran,
 Hetta bi ebed bi mayî heyran
 Çi’bkim ku qewî kesade bazar
 Nînin ji qumaşêra xerîdar”

Ev gotin ji me re dibêjin ku berê dorhêla edebiyatê geştir bûye û dîrokeke edebî hebûye ku ev jî Fuzûlî tîne bîra me. Fuzûlî jî di serdema xwe de gazindan dike ku ne tenê li Bexdayê -ku li wê derê dijiya- li Hindistan, Îran, Xorasan, Rom, ‘Ecem û Şîrwanê hostayên gotinan nemaye. Ji ber vê, nîrx û qîmeta nezmê daketiye û xwaziya xwe bi berê aniye. Di demên berê de li war û welatên ereb, rom û eceman padişahên ku ji helbestan hez dikirin û piştgirî didan helbestvanan, hebûn. Fuzûlî jî behsa wan helbestvanan dike û dibêje ku ew di vê qadê de tenê maye û dîsa gotiye ku ew ê nezmê rake ser pêyan.¹⁷

Peyv û terkîbên ku min bi van îfadeyan di vê berhevokê de nivîsiye, di zimanê hunerî de nêzî hev in.¹⁸

<p> <i>Bir devrdeem ki nazm olup hâr</i> <i>Eş’âr bulup kesâd-ı bâzâr</i> <i>Ol rûbede kadr-i nazmdür dîn</i> <i>Kim küfr olunur kelâm-ı mevzûn (284-85)</i> <i>Lâzım mana oldu hıfz-ı kânûn</i> <i>Zebt-ı nesek-ı kelâm-ı mevzûn (319)</i> <i>Deme ki bulup kesâdı bâzâr</i> <i>Bulmaz bu metâumuz hurîdâr (452)</i> </p>	<p> <i>Min dê ‘elema kelamê mewzûn</i> <i>‘Alî bikira li banê gerdûn (6/16)</i> <i>Çibkim ku qewî kesad e bazar</i> <i>Nînin ji qumaşî ra xerîdar (6/19)</i> </p>
--	---

17 Fuzûlî, “Bu arz-ı ‘adem-i kudretdür ve Özl-i fakd-i kuvvetdür” *Leylâ ve Mecnûn: Metin, wergera pexşanî, Not û ravekirin*, Amd. Muhammed Nur Doğan, İstanbul: Çantay Kitabevi, 1996, 50-59. Ji bo jêgiranên li vir û pê de, ev weşana hatiye bikaranîn.

18 Ji bo nêrînên di vê mijarê bnr. Alan, b n., 186.

Van her du helbestvanên ku ji helbestvaniya xwe bawer in, xwestine ku wekî Nîzamî di serdema xwe de wek şairekî mezin werin qebûlkin, lê hamiyên wan tunebûne. Vegotinên Fuzûlî û Xanî yên li jor wek bersiv in ji bo gotinên Nîzamî yên li jêr:

Ez, ew helbestvan bûm ku min alaya vegotinê li lûtkeyê hejand û ez bi qelema xwe şareza bûm. (...) Ey padişahên dewlemend, ger tu mezin î ji min tiştê bixwaze, karekî hêja bide min. (...) Hema hingê postevanek hat û fermana Hezretî Şah anî. Ferman bi nivîseke xweş hatibû nivîsîn û ji 15 rêzan pêk dihat. Fermanê wiha digot: “Ey Nîzamî, mehremiyeta xelqeya koletiyê, sêrbazê cihanê bi bêhna xwe ya tesîrker, sêrekî bike li ser gotinan, (...)”¹⁹

“Safî şemirand vexwarî durdî” (Meya pak hêla vexware ya durdî)

Pisporên edebiyata kurdî, bi gotina “meya pak hêla vexwar ya durdî” wiha rave dikin. Bi meya “pak” qesda Xanî erebî, farisî û tirkî ye û li gorî wan pisporan ji bo Xanî nivîsîna helbestan bi zimanên din, ji kurdîyê hêsantir e.²⁰

Kesekî di ku dev ji meya pak berda jî Fuzûlî ye. Dîsa di heman beşê de, behsa helbestvanên kevn dike: “Dema ku wan meclis dixemilandin, hem meya pak bû hem jî meclis nû hatibû avakirin. Ji wan re vexwarina meya pak bû nesîb û ji min re jî herareta birîna tengasiyê ma. Min dilê xwe bi vê durdîyê re girê da, lê ez nizanim gelo wê şahiyê bide an na.”²¹

Xanî ji Fuzûlî cudatir dibêje, dilê wî razî nabe ku dek û dolaban bike, ji ber vê yekê zimanê xwe yê wekî sifrê sor e, tercîh kiriye.

*“Ev pulî egerçî bêbuha ne
Yekrû ne û safî bibebeha ne
Bêhîle û xurde tamam in
Meqbûlê mu’amela ‘ewam in
Kurmançî ye sirf e bêguman e
Zêr nîne bibên sipîd mane
Sifrê meê sor e, aşîkar e
Zîv nîne bibên ku kêr ‘eyar e*

19 Nîzamî, “Kitabî Nazmetmenin Sebebi”, *Leyla ile Mecnun*, Wergêr. Ali Nihat Tarlan, İstanbul: Milli Eğitim Bakanlığı, 1990, 26-28.

20 Mewlana dewsa tirkî bi farisî nivîsiye. Johanson di derbarê vê de wiha dibêje: “Li şûna mirov derfetên farisî derbasî tirkîyê bike, nivîsandina bi farisî hêsantir bû, ji ber ku di farisîyê de gotinên dewlemend, terzeke baş ji bo nivîsandinê hebû.” (Ji Johanson vgh. Nurettin Demir, “Batı Türk Yazı Dilinin Oluşumu”, *Türk Edebiyatı Tarihi*, C.I, Ankara: Wezaretê Çand û Turizmê, 2006, 295). Birastî jî di sedeya 14’an de di pêvajoya avakirina zimanê edebî de çend helbestvan helbestên xwe yên yekem bi farisî nivîsandine. Ew helbestvanên ku erebî û farisî nedizanîn û tirkî dinivîsandin jî, ji qelsbûna zimên gazin dikirin. Lê mîr, bi nivîsandina zimanê tirkî gelekî bi bîryar bûn û bi piştgiriya wan, çalakîyên wergerê destpê kir û dîsa parastina wan a mirovên zanist û helbestvanan, pêşveçûna zimên pêk anî.

21 Muhammed Nur Doğan, *b.n.*, 59.

*Neqdê me mebêje kê m buha ye
 Bê sîkkeê şahê şahrewa ye
 Ger dê bibuwa bi derbê menqûş
 Nedma wehe bêrewac û mexşûş” (6/31-36)*

Gotinên di vê beşê de dîsa ji Nîzamî re wek bersivê e:

“(Şah:) Tu dizanî ku ez ji gotinan fê m dikim, ez dikarim helbestên nû ji yê n kevn veqetînim. Ew gotinên te yê n wekî zêrê xalis hene, wisa berhemên nîvqîmet çê neke.”;“(Nîzamî) Pereyê ku li ser navê te hatiye derbkirin wekî pereyên xelîfe, ne tenê li Şîrwanê, li her derê derbas dibin. Ew xutbeya ku li ser navê te tê xwendin heke pif bikine erdê, hingê dê jierdê zêr bipejiqe. Ger navê te li ser kevîran binivîsin û bikin pere, kes destê xwe dirêjî zîv û zêran nake.”; Ez bi qalibeke baş pere çêdikim; ew jî çêdike, lê pereyê qelp.²²

“Da ku xelq nebêjtin ekrad, bê marîfet in bê esl û binyad”

Wekî ku ji vê jêgirane jî tê fêmkirin, Xanî ev berhem wekî bersivêkê dinivîse ji bo ew kesên ku dibêjin kurd ji eşqê fê m nakin. Em nizanin gelo di meclîsan de suhbeteke dilteng çêbûbû an çênebûbû lê diyar e ku karîgerek, fîtek li holê heye. Piştî ku Xanî, ew berhem (*Nûbehara Biçûkan û ‘Eqîdeya Îmanê*²³) bi nasnameya xwe ya perwerdekar nivîsîne, ev berhema xwe wekî bersivêk ji bo şa’irên ku di mijara “îşq”ê de ketine pêşbaziyeke mezin, nivîsiye.

Li gor Tehkiyeyê Beşên Berhemê

Li gorî tehkiyeyê berhem ji sê beşan pêk tê: I-Destpêk (‘Ilme’l-yeqîn) II- eşqa mecazî (merheleya ‘eyne’l-yeqîn) III- eşqa heqîqî (heqqe’l-yeqîn)

I- BEŞA DESTPÊKÊ (‘Ilme’l-yeqîn) (8-10)

Vegotin, di demên berê de li Cizîrê, bi nasandina mîrê Cizîra Botan Zeyneddîn û xwîşkên wî Zîn û Sitî destpê dîke. Zeyneddîn bi regeza xwe ya ku digihê Xalid b. Welîd, bi hêza xwe ya ku li ser ereb, rom û eceman hukm dîke wek şexsiyetekî rastîn hatiye qedimandin. Rêvebirekî baş, serdarekî çê, camêr, mirovekî oldar û yekî dewlemend e.

Zîn û Sitî di xwîşkên qasî hev bedew in. Digel ku bi eşkere nehatiye gotin jî, hin îfadeyên di berhemê de ji me ra, wan wek cêwî nîşan dide.²⁴

Xanî, bi çend teşbihan balê dikişîne ser bedewiya wan, lê di destpêkê de zimanekî bi muqayeseyî bi kar neaniye û yek ji wan ji ya din bedewtir nedîtiye. “Herdu jî du

22 Nîzamî, *b.n.*, 28, 38, 44. Di jêgirana dawiyê de Nîzamî, ew helbestvanên ku wî teqlîd dikin, rexne dîke.

23 Ji bo derbarê wan pirtûkan bnr. Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyatı*, İstanbul: weş. Avesta, 2008, 39-43 û heman nivîskar *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, İstanbul: weş. Avesta, 2010, 22-30.

24 Bnr. *Mem û Zîn*, 29/2-3.

şıtlên baxê iffetê” (8/24), “Du şehzade bûn li ba wî şahî (Zeyneddîn), mîna du rojên pir bi ronahî” (8/25), “Yek di baxê rastiye de dar bû, ew jî bi navê Sitî navdar bû” (8/27), Navê ya ku wekî horiyan (li bihiştê ew jinên çavreş ên xweşik) bedew bû, Zîn bû:

*Rawî wehe gote min mu'emma:
Ew hûrî bi navê Zîn musemma” (8/29)*

Xanî dibêje kesê ku ev bêqerarî xistiye şiklê mamikan “rawî” bi xwe ye û bi vê yekê jî bi awayekî sergirtî diyar kiriye ku ew vê lîstikê bi zanebûn dilfize. Lê gava mirov şibandinên di malikan de û zimanê bi hunerî dişopîne, di destpêka metnê de diyar dibe ku ya ku ji bo Xanî bedewtir, Zîn e.²⁵ Em dûmahîka vê malikê binêrin.

*Yek zêde şîrîn, ziyâde mehbûb
Yek rûhê û bi qulûb û hûrê meqlûb (8/30)*

Yek ji wan (Sitî) pir “şîrîn” û pir “mehbûb” bû. Yek jî “ruh”ê dilan, vajiyê “hur”ê bû. Li vir bi hunera qelbî, helbestvan dibêje ku Zîn ruh e; xwendina peyva “hur”ê ji vajî ve, “ruh” e. Ji bilî vê, di vê malikê de mezmûna neynikî heye. Helbestvan Zîna ku wek hurî ye, di neynika dilê evîndaran de mînanî “ruh” nîşanî me daye. Piştî van gotinan “Herçendî Sitî wek sitêran bû Zînê wekî heyva çardehan bû” (8/54) diyar dike ku Zînê raserî Sîtiyê ye.

Ev danberhevên sergirtî vebêjîyê herikbar dike. Lê belê armanca eslî, “Ew hurî û perî di bêbedel bûn, lewra ku ji bedewiya (Lem yezel) bûn.” (8/32)

Xanî, têgeha “bedewî”yê di ser Sitî û Zînê re vegotîye û piştî jî ew kesên ku talibê vê bedewiyê ne dihejmêre. Kes tune ku ew bedewiyê nexwaze û ne talibê vê wisalê be wekî şêx, mela, mîr an jî derwêş, dewlemend an jî xizan. Lê belê hinek ji wan dibin talibê bedewiya Xwedê û hinek ji wan jî dibin talibê wê bedena fanî, lê dostê herduyan jî yek e. Di navbera wan de wekî mejî û xavika mejî ferqeke biçûk heye:

*Kes nine ne talibê cemâlê
Kes nine ne rexibê wisalê
Hin raxibê husnê La Yezal in
Hin talibê qalibê betal in
Lêkîn hemyan yek e yeqîn dost
Ferqa heye ji lexz heta post (8/63-65)*

25 Izzettin Mustefa Resûl jî li ser vê mijarê disekine, dibêje: “Dê ji wan herduyan kijan di nêva bûyeran de cih bigire û bibe serleheng? Helbestvan bersiveke rasterast nade vê pirsê. Lê ev tişt di dûmahîka berhemê de hêdî hêdî derdikeve holê. (...) bûyîna muptelayê eşqê helbestvan ji bo çîroka xwe hîlbijartîye û ji bo jiyana xwe wekî armanc hîlbijartîye, peyderpey wan dibe du riyên cuda. Bi ya min ev gotina ku paşê derdikeve holê ya hîlbijartî Zîn e, ne rast e. Ji bo rûberûkirinê bnr. Izzettin Mustefa Resûl *b.n.*, 195.

Ferqa navbera ew talibên ku eşqa îlahî û yê n mecazî/cismanî/tabîî dibêje:

Lê aşiq û bulhewes cuda ne

Hin faîdexwaz û hir fîda ni (9/13)

Bi malika ku ji Fuzûlî wergirtiye, qesda “evîndarê fidakar û xwedanhewesê (bulhewes)” wiha tîne ser zimên:

Canan taleb in hinek ji bo can

Hin can taleb in ji boyî canan (9/13-14)

Cânî kim cânânî için sevse cânânın sever

Cânî için kim ki cânânın sever cânın sever (Fuzûlî)

Di dawiya beşê de “kesên heweskar wekî Tacdîn gihîştinê dixwazin. Lê yê n wekî Mem û Zîn jî derd hildibijêrin” dibêje û bi vî awayî ew rêwiyên eşqa mecazî û ya îlahî, yanê, serlehengên çîrokê kî ne hinek diyar kiriye. Navên Tacdîn û Mem cara yekem li vir hatine gotin:

Hin wesil hebîn ji reng-ê Tacdîn

Hin derd-guzîn wekî Mem û Zîn (9/15)

Bi vê serenavê “Kişandina gem û hevsarê / Êdî hatina ber bi qedandina gotinê” (10), Xanî diyar dike ku beşa destpêkê diqede û esasiya wê eşqa li dor Zîn û Sityê rave dike. Herkesê ku di xizmeta mîr de dixebite, evîndarê wan e. Lê tu kesî rûyê wan nedîtine. Ji hev guhdar kirine û bi vî awayî li ser wan evîndar bûne. Derbarê vê de Xanî guhdaran wiha hişyar dike.²⁶

Lîkîn ne bi dîtî û şehadet

Belkî bi bihîstin û rîwayet (10/7)

Digel Mem, Tacdîn û birayên wî Arif û Çeko ku mêrxas, egîd û şervan in, cara yekem li vir tî n nasandin. Dîsa cara yekem mijara hevaltîyê li vir tî n gotin. Tacdînê kurê wezîr, di nav “kesên xas û am” de ji xwe re Mem wekî hogir hilbijartiye ji bo ku derd, xem û dilşahiye n xwe bi wî re parve bike. Rojekê wî nebîne dilê wî teng dibe. Memê kurê katibê dîwanê jî ji bav, bira û apên xwe zêdetir wek evîndarekî ji Tacdîn hez dike. Xanî vê rewşê wiha rave dike:

Ew herdu cuwan we lêk di aşiq

Ew herdu bira we pêkve sadiq

Yek Qaysê zemanê yekî Leyla

Yek Wamiqê ‘asr û yekî ‘Ezra (10/24-25)

26 Yek ji wan motifên eşqê ne ku di mesnewiyan de tî n bikaranîn. Yê n din, eşqa ku bi dîtina wêneyên wan an jî bi dîtina di xewnê de çêdibe. Motifên eşqa bi dîtina wêneyan an jî bi dîtina di xewnê de çêdibe.

Ew jî wekî her evîndarî aşiqên Zîn û Sitiyê ne, lê dîsa jî bi awayekî awarte ji hev hez dikin. Peywendiya wan gotinan bi honandina metnê re heye. Xanî, mijara xwe ya sereke “Husna Mutleq” û û eşqa ser wê tenê bi destpêkekê rave dike û niyeta metnê ji xwendekaran re dihêle.

Em vê jêgiranê ji Atilla Şentürk distînin. Ev têgehên di edebiyata klasîk de ji bo dost û evîndaran tên bikaranîn çima wekî hev in, ji me re rave dike:

“Li gorî nêrîna giştî, wê bedewiya yekem ku mirov nas dike “cemal” a Xwedê ye. Ew nasîna ku bi bedewiyê re cara yekem di “Bezma Elestê” de çêdibe. Ruh, dema ku vê bedewiya derasayî dibînin mest dibin û ji xwe ve diçin. Dema ku vedigerin dinê, di bin hişa wan de ew bedewî dimîne û qet ji bîr nakin. Dîsa li gorî wê baweriyê, her bedewiya ku piştî mirov vedigere dinê li ser evîndar dibe yan jî hez dike, di rastiya xwe de siha jibîrkirina wê zewqê ye yanê bedewiya ku yekem car tam kirine.”²⁷

Bi beşa destpêkê de şema û mijara sereke ya tehkiyeyê kifş dibe. Mijara sereke ya çîrokê bedewî, evîndarî û dostanî ye. Xanî mijara eşqê wekî mecazî û heqîqî veqetandiyê û li gorî wê, rol daye lehengên berhemê. Sifî û Tacdîn rêwiyên eşqa mecazî; Mem û Zîn jî rêwiyên eşqa îlahî ne. Metna xwe bi sê beşên sereke nivîsiye wekî “ilme’l yeqîn” (zanîna bi zanîne) “eyne’l yeqîn” (zanîna bi dîtîne), “heqqe’l yeqîn” (zanîna teqez û zelal). Beşa destpêkê merheleya ‘ilme’l yeqîn e.

II) EŞQA MECAZÎ (Merheleya eyne’l-yeqînê)

a) EVÎNDARÎ (11-25)

Di edebiyata klasîk de bihar, demsala evîndarbûnê ye û bûyer wê demê derdikewin holê. Destpêkeke nû û geşbûnê diyar dike. Ji ber wê, helbestvan bi piranî beriya gotina bûyeran bi teswîreke biharê dest bi mijaran dikin. Ji nû ve geşbûna sirûştê bi şîroveyên mîstîk, şibandin û bi hêmanên xiyalî teswîr dikin. Bi vî awayî hostatiyên xwe yên hunerî pêşkêş dikin. Lê di wan gotinan de demeke rasteqîn tune ye.

Xanî, ne bi teswirên bax û baxçeyan lê bi teswira jinûvehatina biharê dest pê dike û vê vegotinê heta afirandina asîmanan dibe. Hinek ji wan giran, hinek bextewer, hinek çeleng, hinek bêyom, hinek katib, hinek seyda, hinek sazband, hinek ji wan jî cellad in. Xanî, bi îstî’areyêke girtî heft gerestêrkên wek zuxal, muşterî, utarîd, zuxre, merîx, roj û heyv dihejmêre û dibêje, çerxa salekê bi tevgera wan çêdibe. (11/1-15) Ji rûspiyeke bihîstiyê ku li her derê, her sal meha Adarê gava ku roj dikeve burca Hemelê pîrozkirina sala nû kevneşopiyêke kevn e:

Weqtê we ku şehsuwarê xawer

Tehwili dikir di mahê Azer

Ye’nî ku dihate burcê sersal

Qet kes nedim adi mesken û mal (11/16-17)

Xanî, Zîn û Sitiyê, di destpêka saleke nû de ango di Newrozê de derdixe pêşberî

27 Ahmet Atilla Şentürk, “Klasik Şiir Estetiği”, *Türk Edebiyatı Tarihi* c.I. Stenbol: Wezaretê Çand û Turizmê, 2006, 349.

aşiqên wan.

Pîrozbahiya Newrozê, Bûyer û Motifên Vebêjiyê:

Ji bo pîrozkirina Newrozê ji xortan bigire hetanî kalan, ji gundiyan bigire hetanî bajariyan, ji xizanan bigire hetanî dewlemendan ji her çînê kes ango hemû gel derdikevin mêrg û çîmenan. Çiya, deşt, zozan, newal bi mirovan tijî dibin. Zîn û Sitî bi kincê mêran tîn, Mem û Tacdîn jî piştî herkesî cil û bergên jinan li xwe dikin û tîn pîrozbahiyê. Gava ku li nav bajêr digerin rastî mirovên serxweş, mirovên xwe li erdê vedigevêzin, yên dîn bûyî, yên ketine govendê, yên feryad û fixanan dikin, tîn. Di cihê xwe de şaş û mat dimînin, sedema wê rewşê ji Hz. Xidir dipirsin. Xidir ji wan re dibêje ku “du ciwanên qeşeng û bi bejn û bal, bi xemzeyên xwe yên şûrîn û bi tîrên awirên xwe mirovan dikujin”. Mem û Tacdîn ji nişkê ve wan her du ciwanên ku wekî padişahê stêrkan dibiriqin, dibînin. Wan, ew ciwanên ku cil û bergên wan weke hev in, hîç li nav bajêr nedîtibûn. Dema ew her du bedewên melekrû, sifetperî dibînin, wekî Mecnûn hişê xwe wenda dikin û holî erdê dibin. Ew herdu bedewên wek firîşteyan, dema ku wan dibînin û nêzî wan dibin, bi bedewiya wan a wekî rojê, dibin wekî nêçîra di sekeratê de (seydê nîm-bismil).²⁸ Bedewiya van xezalan dilê wan nerm dike û tîn merhemetê. Evîndarê wan du keçikan, lê xan û eşîra wan nizanin. Gustilkên xwe bi yên Mem û Tacdîn re diguherînin û diçin qesra xwe.

Mem û Tacdîn vedigerin malên xwe lê ji bo wan êdî ferqa şev û rojê nemaye. Di heman demê de li vir behsa yeksanbûna şev û rojê jî dike:

Roj û şev waqt subh û êvar

Yeksan dinim ali wan bi yekcar (14/70)

Piştî hefteyek şûnde encax tîn ser hemdê xwe (15/4-5) û gustilkên ku tiliyê wan de diçilvilin, dibînin. Li ser gustilka Mem ku bi yaqûtê ve hatiye neqîşandin, navê Zînê; li ya Tacdîn ku bi gewherên deqdeqî ve hatiye xemilandin jî navê Sitiyê nivîsiye. Bi vî awayî têdigihên ka kî ne ku ew wisa bêhal, perîşan û bêzar kirine. Di vê beşê de ew motifên derdikevin pêş guhertina cil û bergan û jixweveçûyîn e.

Motifên Cil û Berg Guherandin û Jixweveçûyînê:

Ev motifên wek “veşartina nasnameyan”, “cilguherandin” ji bo ku neyên naskirin û “jixweveçûyîna evîndaran” gava ku hev dibînin, di gelek çîrokan de hene. Di mesnewiyan de lehengên çîrokê, piştî ji hev vediqetin gava ku cardin hev dibînin ji xwe ve diçin. Fonksiyona motifan di vê beşê de hinek cudatir e û bi hev ve têkildar e. Mirov dikare vê rewşa ku Mem û Tacdîn bi cilên jinan, Zîn û Sitî jî bi cilên mêran

28 Teşbiha “Nîm-bismil”, wekî “bismil” bi hevdişîna Leyla û Mecnûnê di berhema Nakam (k.d. 1905) de jî derbas dibe. Li vir vegotîneke hevaheng heye: Besân-1 murg-1 bismil Leylî-i zâr/ Ururdi dest u pâ nâçâr nâçâr// Besân-1 mürdegân Mecnûn-1 nâlân/ Düşüp toprakta kalmışdı bî-can. Bnr. Ağah Sırrı Levent, *b.n.*, 350.

beşdarî şahiyê dibin, xweş nebîne. Ev, yek ji wan tiştan e ku Xanî pê balê dikişîne ser metnê û hem jî bi vî awayî vegotina metnê xweştir û bişahînet dike. Piştî ku qîzîk, serpêhatiya xwe ji daye Heyzebûnê re dibêjin, hingê dadê jî bi awayekî heyirî wiha ji wan dipirse: “qet kesek dîtiye, qîz li ser qîzan bûye evîndar?” Xanî, di dawiyaya mijaran de van daxuyanîyan dide:

Sırra dilî kir bi hev te'elluq
Nûra ruxê wan bi hev te'aşşuq
Mekşûfî terîqê aşînayî
Rûhan qe nekir ji hev codayî
Yekrengê sirfê 'alema xeyb
Zahir dikir ittîhadê la reyb (14/38-39)

Ev, rewşa hevnaşkirin û hevhezkirina ruhan e. Evînê ew kirin girtiyen hev, ciwaniyê ew kirin xwestiyên hev. Te digot bi can û laş ew her çar, herçî dilber û herçî evîndar. Bi awayê “çi talib û çi metlûb”ê hevnaşîna wan ji berê “qedîm” ve (bezmê elest) tê. Ev enînivîsa Xwedê ye. Yên ku li wê derê bi hev dikin, li vir jî hev dinasin. (14/41- 48) Ev vegotinên bi kurtî hatine dayîn, xwe dispêrin hedîseke pêxember.²⁹

Xanî, li dawiyaya berhemê, derbarê Memê de ku êdî ber bi mirinê ve diçe, dê vê raveyê bike:

“Ê çêkirî neynika cemalê
Tîra xwe numa bi zulf û xalê
Fanosê beden kirî mutella
Tê da ji me ra kirî tecella” (52/80-81)

Motîfa Guherandina Gustîlkan:

Motîfa guherandina gustîlkan di hin mesnewîyan de heye. Dilketî û dildar bi saya gustîlkê hev dibînin. Lê fonksiyona gustîlkê li vir gelekî cuda ye. Ew qaşa yaqût a li ser gustîlka Mem, bi şev wek çirayekê diçirûse û di honandina çîrokê de xwedan roleke gelekî girîng e. Yaqût, di vê edebiyatê de îstîfara ye ku lêvên dilberê nîşan dide. Lêv, temsîleke tesewîfî ye ku dilê mirov temsîl dike. Yanê, ew dilê ku evîndar li wê derê fena dibe û digihîje asta beqayê. Herwiha, gencîneya sirran jî temsîl dike. Gustîlk wek hêmanekê tê texeyyulkirin ku li ser qelbê Mem bandorê dike, wî diguherîne û ruh dide wî û dîsa remzeke qedere ye û hîlbijartina Mem wekî qurbanekî nîşan dide. Herwiha gava çîrok zelal dibe, Sitî û Tacdîn dizewicin, Zîn û Tacdîn jî ji hev diqetin. Lewra, Zîn xwedanê gustîlkê yê eslî nîne. Ew bi tenê wek gihîner, wek veguhêzerek e. Ji ber vê yekê Mem, dikeve pey dilbera heqîqî.

29 Kadri Yıldırım bal kîşandiye ser vê hedîse ku wiha dibêje: “Ruh wekî leşkerên bi nîzam hatine afirandin. Ew ruhên ku beriya bedenên xwe hatine afirandin li ‘alema xwe yên ji hev hez dikin, piştî ku tîna dinê jî ji hev hez dikin; li wê derê yên ji hev hez nakin, li dinê jî ji hev hez nakin.” Bnr., *b.n.*, 89. jêrenot, 197.

Daweta Sitî û Tacdîn, Qetana Zîn û Mem:

Di metnê de, daweta Sitî û Tacdîn ku heft roj û heft şev dewam kiriye û di vê peywendiyê de qîzxwestin, xemilandina bûkê, dawet, şahî û ziyafeta dawetê, şeva zîfafê bi awayekî hûrgilî û coş hatine vegotin. Dema mirov vegotina van bûyeran dibîne mirov dibê qey Xanî bixwe çavdêriya wan kiriye, ji ber vê yekê bandoreke rasteqîn li ser mirovan çê dike.

*Dê şubhetê vê demê di xweş bin
Ya dê bimirîn û ya nexweş bin
Hubla ne leyalî ey mewalî!
Kanê çi dizên 'ele'î-tewalî!
Ew şîwên û şahî teweman in
Ev çerx û felek di bêeman in
Geh nûrî numa ne gahi muzlem
Geh sûrî numane gahi matem (22/31-34)*

Ev gotinên Mîr, îşareta veqetanê ne. Mem û Zîn, ji ber fesadiya Beko nikarin êdî hev bibînin û vegotin jî li vir mînanî weris li hev diale. Li vir tam cihê wê ye ku em hinekî qala Beko bikin.

Bekoyê Ewan (26):

Dilê mîr hebû wek Sitiyê, Zînê jî bide dilberê wê. Lê, kesek hebû ku Mîr ji vê biryara wî veqetand û bû sedema veqetanê. Ew kes jî dergevan û qehwevanê Mîr, Beko bû. Beko kesekî ewan, paşgo, minafiq, xapînok, bêyom û tirsonek bû, nîjada wî jî ne diyar bû. Lê ne ji Botanê bû. Gelê Botanê ji wî şerm dikir. Wekî xûyê wî rûyê wî jî kirêt bû û Tacdîn çend caran ji Mîr re gotibû ku baweriya xwe bi Beko neyîne. Lê Mîr jî wê demê gotibû “Aşê me bi fetl û ba ye”. Mîr, bi xeysetê Beko beled e. Diyar e ku piştî zewacê qedrê Tacdîn wê li cem mîr zêdetir bibe û piştî zewaca Mem û Zîn jî qedr û hêza Tacdîn û Mem wê li bal Mîr bilintir bibe û pozisyona Tacdîn jî wê biguhere. Beko, fikrên Tacdîn baş dizane ji ber vê ji wî ditirse, hesûdiya wî dike û rikê wî jê tê; ji bo ku hêza Tacdîn bişikêne ji Mîr re dibêje: Tacdîn û Mem wê xwe bikine yek û serî li ber te hildin. Xêncî dostaniya Tacdîn tu rola Mem di vê şerî de tune. Xanî di çîroka xwe de bedewî û xweşikiyê bi hêla Zîn û Sitiyê tîne zimên. Di vê beşê de Xanî xerabiyê tîne pêş, a rastî Bekoyê ku temsiliyeta Îblîs dike tîne pêş û di wê baweriyê de ye ku ji bo ku başbûn were fêmkirin divê xerabî jî hebe.

Wî Îblîsê ku ji ber ku li hember Adem nehatiye xwarê ji bihuştê hatiye avêtin, herdem mutesewif mijûl kirine. Mutesewifên wekî Xellac û Senaî heq dane şeytan, ji ber ku di wê baweriyê de bûne ku îradeya Xwedê ya ezêlî û ebedî ferman daye ku ji wî pêştir li hemberî kesî neyêne xwarê.³⁰ Resûl li gorî jêgirana li jêr gotiye ku Xanî jî di bin bandora van mutesewifan de maye û heman tişt gotine:

30 Annemarie Schimmel, b n., 208-211

*Ey Xwedayê Jorîn, beriya ku Adem ji te re were secdeyê / Te ew kir qible ji bo ku jê re secde bikin (...) Heçî Îblîsê belengaz ku qet guneh nekirine: Ya xwedatî berê te piştewaniya wî kir // Wî her roj ji Te re bi hezaran îta 'et dikir / Di vê meselê de te taqet û kuwet dabû wî // Ji xêncî Te, ji kesî re neçû secde / Te ew ji deriyê xwe qewirand, ji ber vê hate lanetkirin (...)*³¹

Li gorî vê jêgirana ku ji dawîya Munacatê hatiye hildan, divê em li gorî cihê van gotinan û di peywendîya mijarê de niyeta helbestkar hinekî cudatir bixwînin. Helbestkar di vê beşê de kes û mijaran referê dîke ku wê di çîrokê de behsê bike û balê dikişîne ser kesê rola ku Îblîs dilîze ango ser Beko. Resûl di wê baweriyê de ye ku Xanî “qebûl nake ku Îblîs jêderka xerabiyê û afirînerê gunehan e, berevajî wê bawer dîke ku afirînerê başî û xerabiyê Xwedê ye (...)”.³² Ev mijareke nîqaşî ye. Xanî ku wiha dibêje:

*“Xelkê heye şubheyek di dînî
Behsê bi cedel biket ji dînî
Qur'an û xeber çî mu'cizat in!
Aya û suwer çî beyînat in!” (3/57-58)*

Ne mimkun e ku derbarê Îblîs de şîroveyên awarte bike. Armanca Xanî ew e ku bi riya Beko balê bikişîne ser Îblîs. Bi rola xwe ya di çîrokê de Beko rola Îblîs hildide ser xwe “ku sond xwariye heta roja qiyametê, ji bilî evdên bi îxlas, her kesî ji riya başiyê derxe”.³³ Dîgel ku her tiştî dizane û hertiştî dide kirinê, Xwedê îradeya cuzî daye evdê xwe ku riya xwe bixwe hîlbijêrin, wekî Xanî jî dibêje.³⁴

Xanî, di dawîya çîrokê de behsa dara serwî û çamê dîke ku li ser qebra Mem û Zînê şîn dibe û wan temsîl dîke û dîsa behsa dara kinêrê dîke ku dikeve navbera wan (56/7-8). Bi vî awayî ji mirovan re dibêje ku peywira Îblîs û şeytan ji bîr nekin. Ji ber ku her tişt bi dijberê xwe ve tê zanîn, divê em bibêjin ku di serê vê beşê de ku Xanî qala Beko dîke, cih dide çend têgehên ku dijberiyê nîşan didin, wekî: erd-esman, ronahî-tarî, sar-germ, ter-hişk, dewlemend-xizan, mîr-parsek, veqetan- pevgîhan, mirin-jîyan, dojah-bihuş.

b) JI HEV VEQETÎN Û MECNUNÎ (26-43)

Di vê beşê de em ê behsa veqetîn û tenêtiyê û tesîra fîzîkî û ruhî ya li ser evîndaran bikin. Ji ber ku Xanî dixwaze balê bikişîne ser tenêtiya giran a Mem û Zînê, vebêjiya xwe bi motifên rewşê û bi teswiran domandiye. Vebêja ku ji ber veqetîna navxweyî hinekî westar dibe, bi motifên buyerê yê li dawîya beşê dê dîsa çalak bibe.

Piştî Tacdîn û Sitî dizewicin û diçin mala xwe, Mem û Zîn êdî mînanî berê nikarin

31 Dewama jêgeranê, Ji bo nîqaş û şîroveyên Resûl bnr. *b.n.*, 259-274.

32 Resûl, *b.n.*, 263.

33 Derbarê Îblîs û Şeytan de gelek ayet hene. Li ser mijara me bnr. Qû'ran, Sûreyê Sad : 38/39-85

34 Ji bo îradeya cuzî û âyetên derbarê wê de bnr. Orhan Hançerlioğlu, *İslâm İnançları Sözlüğü*, Enqere: Pirtûkxaneya Remzi, 1984, 202-203.

wan bibînin. Mem û Zîn ne tenê ji hev, ji hogirên xwe jî dûr ketine ku ger li cem wan bana wê di ber dilê wan de bidana, derd û kulê wan guhdar bikirana. Ji ber kesera jihevveqetîne rewşa wan a fîzîkî û ruhî roj bi roj xerabtir dibe.

Guherînen fîzîkî û ruhî di Zîn de/ Rewşa evîndaran:

*Çil roji nexwor ne xab Zînê
Ser ranedibû ji ser girîne
Xwûna dili bû xida û xwarin
Hêstir bixwe şerbet u vexwarin
Hemware biroj eger bi şev bû
Wê hal ji firqetê her ev bû
Rojan digirî bi şev dikir ah
Ewreng geriya de'if ew mah (27/13-16)*

Ji ber veqetanê Zîn çil rojan tu tiştêkî naxwe, ranazê, bi şev û roj digirî, ax û waxan dike. Ji ber van sedeman û hinek sedemên din Zîn bêhal dikeve, roj bi roj lawaztir dibe:

*Bedra rûyê wê bûye hilalek
Tel'et dinuma wekî xiyalek (27/17)³⁵*

Hewldanên hevalê wê ku di ber dilê Zînê de werin:

Gava şênbûn û geşbûna Zînê êdî ne wek berê ye, hingê hemtemenên wê û heval hogirên wê dibêjin qey ew ji Sîtiyê dûr ketiye lewma wisa xemgîn û giryan e. Hevalên wê, bedewiya wê tîne bîra wê ku cardin were ser halê xwe ye berê. Lê ew şîretên hevalê wê dikin, qet nakevin guhê wê. Xanî bi riya van şîretan hema hema hemû hêmanên bedewiyê ku di edebiyata klasîk de ji bo evîndaran tê bikaranîn û listeyeke tesîrên wan li ser evîndaran, dide. Çend Mînak:

*Min be'di xeman ji qelbî rake
Teşbihê bi zulfê ber vi ba ke
Çin çin bike tureê di şebreng
Gul gul veke arîdê di gulreng (27/23-24)
Me'zun biki turreê di tarar
Da hukmi bikin li şah u xwundikar
Perdê ruj i ber gulan hilîne
Bêsebrîyê bulbulan bibine (27/36-37)*

Bêdengî û hîskirina tenêtiyê di nav komekê de, digel teseliya hevalan jî aşnebûn di Fuzûlî de jî heye.³⁶ Lê ew rewşa ji halketîne, xwe peritandinê wekî di mînakên

35 Heman gotin di Nîzâmî' de jî berbas dibin: "Rûyê wê ye wekî hîva çarde rojî guherî heyikê, dişîbiya xiyaleke bejnîbilin wekî serwiyê." Ev malik di Nîzâmî de ji bo Leylîya ku li ber sekeratê ye hatiye gotin. Nîzâmî, *b.n.*, 227.

36 Ya ji bo van malikan îlhamê dide Xanî, Nîzâmî ye. Nîzâmî vê tiştê wekî motifek nanîrxîne,

jor de jî diyar e, dirêjtir û cudatir hatiye gotin. Her wiha metn xwediyê asteke tîr a xeyalê û wateyê ye. (27/19-45).

Motîfên vegotina halê ruh:

Di metnên kevn de, bi taybetî di mesnewiyan de ravekirina halê ruhê mirov bi riya şibandinê axaftina bi tiştan re, rêbazeke berbelav e. Di vê beşê de axaftina Zînê bi xem, mûm û perwaneyê re; axaftina Mem bi dilê xwe, Dicle û bayê sebayê re motîfên bi vî awayî ne ku behsa halê wan dikin. Ev motîf herwiha çar hemanan (anasirê erbaa), yanê av, hewa, agir û erdê temsîl dikin. Axaftina bi mûmê, perwane û bi bayê sebayê re di Fuzûlî de jî heye.³⁷ Wekî di jêgiranên li jêr de dixuye bandora Fuzûlî li ser Xanî herî zêde di vê beşê de derdikeve holê. Ka em yek bi yek ji van vegotinên motîfî binêrin:

Axaftina Zînê bi xemê re (28):

“Kî”ey hemnefesê di bênewayan, feryadresê di picefayan; Hemderdê di derdemendan, hemperdeê sîrrê mustemendan; Hemrazê dilê di dilbirinan, hemxwabeê xatirê hezînan; Hemkaseê xwanê bête’eman! Bi vê xîtabê Zîn di dilê xwe de dibêje aşiq bêyî ku xeman bikişînin nagihîjin “cemalê” û “salik” jî nagihîjin “celal”ê. Di dilê wê de ji bilî xemê tu hevalê wê nemane, ji ber vê dilê wê şên e. (28/5-6,7)

Carcaran di xebirdanên xwe de ji Sîtiyê re dibêje: “Ji te re şahî (Tacdîn), ji min re jî xem (Mem) bûye qîsmet. Ev qewimîneke “teqdîra ezê” ye. Ji ber ku xem ketine sûreta Mem, ez li ser hev xemê dikişînim.” Ez vê xeyala cuda û balkêş jê werdigirim:

Xem çunkû li sûretê Mem ne

Lew xem ji mir ali ser xemê ne (29/10)

Bi vê beşa bi deh malikî Xanî dibêje ku di çîrokê de tişta ku bûyeran bi rê ve dibe ev “teqdîra ezê/Xwedê” ye. Zîn jî wekî Mem, a hatiye hîlbijartin e.

Axaftina bi mûmê re (30):

Zîn, tevî mûmê digihîje sibê û bi agirê di dilê xwe de wekî mûmê dihele. Lê ji mûmê jî teseliyekê nabîne. “Ya ku ji te de dihele fitîl, a min jî rişteyî giyan/ bendê giyanê ye. Tu tenê şevan dihêlê lê ez şev û roj”. Ev motîfa bi vî awayî behsa şewatê dike û digel Fuzûlî di gelek mesnewiyan de tê hemberî me. Lê dîsa jî Xanî hêmayên nû dîtine:

Derdê min û te ji yek biferq e

Ew ferqi ji xerbê ta bi şerq e

lê wiha qala Leylaya ku ji bo xemgîniya xwe bi kesî nede hîskirin şevên xwe bi giriyê derbas dike bi vê teşbiha mûmê, dike: “Wekî mûman di nav kenên bijan dijiya (...) Ji ber agirê veqetanê wisa dişewitî ku, ne dûyê wê derdiket ne jî ronî dida” Nîzamî, Leyla ile Mecnun, wer. Ali Nihat Tarlan, İstanbul:1990, 101.

37 Ji bo danberhevê bnr. *“Bu Leylî ahvâlınden bir haberdür ve Ma’sûk-îâşık-pîşe etvârından bir eserdir”, b.n., 206-210).*

Maşriq tu yî agîrê te zahir

Mexrib ez û batinê min agir (30/5)

Di vê danberhevê de peyvên wekî “Rojhilat/Şerq” û “Rojava/Xerb” hatine gotin ji bo ku ferqa wan were nîşandan. Di malika duyem de têkiliya peyvên “Rojhilat/Maşriq” û “Rojava/Mexrib”ê bi rojê re heye. Wiha tê gotin: “Agirê te wekî rojê rasterast dixuye. Agirê min naxuye ji ber ku agire min di hundur de ye. Ez ew cih im ku roj lê diqulibe, ango ez Mexrib im.” Ew roja ku diqulibe rengê gogeke agir dide û bibîrxistinên wekî dilê Zînê, tesewura Mem wek rojê³⁸ di vê malikê de hene; herwiha temsîla roj-hîvê jî heye. Di axaftina Zînê bi perwaneyê re ev temsîla bêtir hatiye qalkirin:

Wê cism munewwera melekrûh

Beydaqemera muqabelet Yûh (31/11)

Axaftina Zînê bi perwaneyê re (31):

Di vê beşê de Zîn xwe raserî perwaneyê dibîne û em dikarin bibêjin ku di vê beşê de Xanî Fuzûlî tenzîr dike/bersivê dide wî.³⁹ Li jêrê gotin û wateyên nêzî hev hene û malikên ku gotinên wan nêzî hev in, hatine rêzkirin:

<i>Fuzûlî</i>	<i>Xanî</i>
<i>K'ey tâir-i âşiyâne-i aşk</i> <i>Ser-geşte-i âb u dâne-i aşk (1268)</i>	<i>K'ey tairê aşiyânê firqet</i> <i>Wey bulbulê bositanê hîrqet (31/2)</i>
<i>Sensen reh-i aşk içinde sâdik</i> <i>Âşık ammâ tamâm âşık (1268)</i>	<i>Ey güccetê aşiqê di saib</i> <i>Vey mübşilê müdde 'ayê kazib (31/3)</i>
<i>Bir görmege yâri can verürsen</i> <i>Bir zevke iki cihân verürsen (1270)</i> <i>Hani sitem-i belâya dözmek</i> <i>Aşka düşüben cefâya dözmek (1280)</i> <i>Müşkil ki menüm kimi olup zâr</i> <i>Mence ola sende şevk-i didâr (1273)</i> <i>Bir şu 'leye sen nisâr edüp cân</i> <i>Düşvâr gamun kılursen âsân (1276)</i>	<i>Merdane dibaxşi canî erzan</i> <i>Heyfa ku bi mergiran î lerman (31/4)</i> <i>Bêsebr î û bêsukûn û bêtab</i> <i>Lewra xwe dikî bi zûyî pirtab (31/7)</i>
<i>Hoşdur taleb-i fenâda hâlün</i> <i>Güya ki fenâdurur visâlün (1271)</i>	<i>Nawestî demek li ber hewayê</i> <i>Napuxte teleb dikî fenayê (31/5)</i>

38 Ya ji bo van malikan îlhamê dide Xanî, Nîzamî ye. Nîzamî vê tiştê wekî motifek nanirxîne, lê wiha qala Leylaya ku ji bo xemgîniya xwe bi kesî nede hîskirin şevên xwe bi giriyê derbas dike bi vê teşbiha mûmê, dike: “Wekî mûman di nav kenên bijan dijiya (...) Ji ber agirê veqetanê wusa dişewitî ku, ne dûyê wê derdiket ne jî ronî dida” Nîzamî, Leyla ile Mecnun, wer. Ali Nihat Tarlan, İstanbul:1990, 101.

39 Fuzûlî, “Leylînin pervâneye keşf-i râzıdır”, *b.n.*,214-216. (malikên 1267-88.) Ji aliyê vebêjiyê dişibe Fuzûlî û di “ji felekê şikayet” de derdikeve holê.

Ferqa herî mezin a ku di navbera herdu berheman de dixuye eve ku: di Xanî de Zîn bi daxwaza fenabûnê ku ruh bide, dibêje perwaneyê “di navbera yên xam û nexam de ferqek heye û yên pijiyane tu carî naşewitin, tune nabin.” Bi vî awayî mînaka semenderê dide û refereyê Hz. Îbrahîm dike. (31/8-10)

Ev asta tehkiyê behsa guherîna ruhî ya Zînê dike. Bi riya van motîfan tê gotin ku Zîn di nav tenêtiyeke kesîf de ye, bi agirê xemê disoje û bi xeyala Mem ku dilê wê bi tamamî ketiyê ve dijî. Tarîfî, awayekî halê ruhê Zînê ye.

Guherînên fîzîkî û ruhî di Mem de (32):

Zîn wek Leylayê li quncikekê ketiye înzîwayê; Mem jî wekî Mecnûn li cihekî nekariye bisekine û ji mirovan, ji bajêr dûr ketiye. Di sernavê beşê de hatiye ravekirin ku Mem jî wê bibe wekî Mecnûn: “*Mecnûniya Memê ye ji eşqa Leylâyî Wamiqiya wi ye ji derdê ‘Ezrayê’*”

Xanî bi mijara “hesret”ê dest bi meseleyê dike. Mem, wisa dixwaze yara xwe bibîne ku hiş di sêrî de nemaye:

Mem jî ji xiyalê rûyê dildar

Ye`ni ku ji arizûyê didar

Bû dînekî dilpezîrê sewda

Mecnûnekî bênezîrê şeyda (32/1-2)

Di van malikan de ji bo ravekirina halê Mecnunkî peyvên wekî “evîndarî, şeyda, dînîfî (hiş di sêrî de nemayin), saw, wehşet, teşne-leb” gelek caran derbas dibin.

Xanî, dîsa cih dide rola qederê û dibêje Tacdîn wîsal e, ew destê digihîje Mem jî melal e. (32/10) Mem wisa bûye, êdî nikare bi destebirakê xwe Tacdîn re jî xeber bide ku bêhna wî fireh bibe û dostaniya xwe bidomîne. Ji bajêr dûr dikeve û Şetê Kûr/Çemê Dîcleyê dike hemderdê xwe.

Axaftina Mem bi Şetê Kûr/Çemê Dîcleyê re:

Av, di edebiyata klasîk de teşbîheke klîşe ye û bi paqijî û xwerûbûna xwe dil, giyan, ruhê aşiq temsîl dike. Çem, çivan dide xwe û bi coş diçe. Bi vî awayî dişibe aşiqên ku li evîndarên xwe digerin. Mem, Dîcleyê dişibîne ruhê xwe, diçe cem û dipirsê çima wisa bêsebr, bêqerar diherike û çima li rex Cizîrê wisa sergeşte dibe. Dîcleyê, wekî evîndarek Cizîr hildaye nav milê xwe, lê dîsa jî ruhê wê sukûtê nabîne. Mem li ber vê rewşê şaş dibe, baş fehîm nake. Bi kurtasî dibêje: “Ger ez bigirîm we ger binalim, ez bimirim we ger bikalim; Herçî ku ez bikim rewa ye... Dêrê dilê min ku bêdewa ye. Dîcleya heqîqî ez im.”

Dîcle, motîfek e ku asta wateyî ya metnê bilindtir dike. Dîcle, wekî hêmaneke erdnîgariyêke realîst û wekî dilsoziyêke vî erdnîgariyê hatiye hîlbijartin. Ger ne şîroveyeke awarte be Dîcle, çemek e ku xweliya laşê Xellacê Mensûr ketiye nav.

Axaftina bi bayê sebayê re:

Mem, paşê xema dilê xwe ji bayê sebayê re dibêje û ji bayê dixwaze ku nameyekê ku halê xwe tê de dibêje, bibe ber deriyê yaran xwe û dema vegeriya jî ji xaka ber deriyê wê tutiyan bîne. Ev herdu peyv, yanê “tutiya “ û bi taybetî jî “seba” ya ku xeberên evîndaran radigihîne hev, ji aliyê helbestkaran ve zehf tîen bikaranîn.

Ew deriyê bextiyariyê ku bayê sebayê wê biçê li erşê ye. Zîn bedeweke bejn bilind e jirêzê nîne, “Sîdretu’n nîhaye” (Dara Sînorê ya dawî) ye. “Sîdre” bi wateya xwe ya tesewufî rawestgeha dawî ye ku mirov Xwedê nas bike û rawesgeha dawî ya zanîne ye. Sebayê here cihê dawî⁴⁰ ku Cibraîl nikaribû biçûyayê, ger biçûya jî wê bişewitiya û wê rîsaleya hesretê ragihîne ku Mem bi xwîna dilê xwe li bîbîka çavê xwe nivîsiye:

Ev name ku xwûnê dil mîdad e

Ev sefhe ku merdumek sewad e (34/10)

Ku li bîbîka çavê mirov bi hibrê hatibe nivîsîn, ji girîne zêdetir çavê mirov bi xwîne hatibe girtin tê wê wateyê ku çavê Mem ji Zîne wêdetir her ji tiştî re girtî ye. Xwîn made ye. Xwîngîrîn tê wê wateyê ku mirov êdî ji madeyê/masîwa, xwe şuştîye. Ev malika nîşan dide ku êdî Mem di eşqê de pêşde çûye û êdî amade ye ji bo tecelliya îlahî. Mem di nameyê de ji bo Zîne dibêje tu “metleê nûrê Zulcelal î”, “menbeê Kewser a zelal î”, “menzer û mezhera îlahî” yî. Yanê tu yî, cihê ku nûra Xwedê dest pê dike, çavkaniya ava Kewserê û neynika ku nûra Xwedê tecellî dike û wekî “qiblegeha min” gazî Zîne dike: (34/13-15)

Bêjê ji me ra ku padişâhim

Benden ana sôyle kiblegahum (34/13)

Em dizanin dema ku mirov nimêj dike, berê xwe dide Kabeyê. Li vir, ew cihê ku Zîne lê ye wekî erdekî pîroz, wekî Kabeyê hatiye teswîrkirin. Di dawîya çîrokê de jî ev tesewir derdikeve holê. Zîn tê zîndana ku Mem tê de ye û Mem li wir li dora Zîne dizivire wekî Kabeyê tewaf bike du caran dizivire û dibêje wê “tu qiblegeha min î”. (52 / 48) Li vir divê êdî em rasterast bibêjin ku bi çavê Mem, Zîn êdî bûye hemû kaînat.

Axaftina Mem bi dilê xwe re (35) :

Mem, hêj beriya ku teceliya îlahî pêk bê, ruhê xwe di hefsa bedenê de dihêle û bi tena serê xwe dikeve pey xwestekên (hewa) xwe. Bangî dilê xwe dike û ji ber ku dilê wî xwe bi sûretê ve giredaye, şerê dilê xwe dike. Halbûkî, ew regezên bedewiyê wekî por, şanik û birû kemîn in. Ev kemîn ji bo ku wî bixapînin, zimanê xwe şîrîn dikin.

Xanî têkoşîna ku Mem bi nefsa xwe re dike, bi axaftina hundirîn dide. Di vê axaftinê de ku Mem nikare hukmî dilê xwe bike, ev gotinên li jêr girîng in:

Lewra tu numûnedarê zat î

Ayîneê sûretê sîfat î (35/15)

40 Ji bo zêdetir agahî li ser peyvê bnr. Yıldırım, *b.n.*, 136. jêrenot, s.283.

Sabit be ku da ne naxelef bî
Da waqîfê sirrê “men’eref” bî (35/20)

Di tesewufê de dil, ango xezîna razan; ew cih e ku Xwedê nezer lê dike, kemalat û cernalata îlahî herî baş li vir tecalla dike.⁴¹ Wekî ku Xanî dibêje, hindî ku çira canê neşewite esasa razan dernakeve holê. (35/12)⁴² “Eşqa navbera Mem û Zîn û guherîna ji mecazî ber bi heqîqî, bi kurtahî wiha hatiye derbirîn:

Ew çendî ewî digel dilî got
Naçarî dilê dilî bi wî sot
Dûkel ji herareta suweyda
Rabû tijî bû mehellê sewda

...

‘Ewrek te digo ji erdê rabû
Evrasi li asîmanan cema bû
Wî ‘ewrî ji nîveka hinavan
Xwûnbarî dikir bi herdu çavan⁴³
Seyla cegerê wisa li gurr hat
Goya ku bi ser Erez ve Gur hat

...

Sehra hemû bûye sehnê bustan
Sahîl bûye gulşen û gulistan (35/36-45)

Mem, ji ber vê guherîna ruhî û bedenî nexweş dikeve û tam 40 rojan bêhemdê xwe li ber çemekî dimîne. Di qelbê mirov de cihê îdrakê yanê suweyda tevdigere ango bi hatina feyza îlahî halê wecd/coşî dest pê dike. Ev rewş bi siruştta ku bi destpêka biharê re ji nû ve can dide, tê teswîrkirin.⁴⁴

Bi germbûna axê, zêdebûna hilm û dûkela avê, tevgerên ewran, barîna baranên geş çemên Erez, Gur, Ferat û Dicle coşî dibin, siruşt cardin vedije. Xanî, di heman demê de vê erdnîgariya ku bi xwe lê dijî, li ber çavê me wek wêneyeke mezin radixe.

Di merhaleya mecûnûnbûyîne de sê bûyêr tên vegotin: çûyîna nêçîrê ya Mîr, di baxçeyê de rastîhevhatina Mem û Zîn, vegeza ji nêçîrê, şewitandina mala Tacdîn,

41 Uludağ, *b.n.*, 140

42 Ji bo ew têgehên ku di vê beşê de derbas dibin, bnr. Yıldırım, *b.n.*, jêrenotên rûpelên 288-92.

43 Bnr. *Quran*, Sûreyê Nûr: 24/43. “Ma tu nizanî ku Xwedê Teala (ku derê bivê) ewran diajo ser wir; piştê wan tîne bal hev, piştê wan li ser dike şiker, vêca tu dibînî ku ji nava wan (ewran) baran dibare. Xwedê Teala ji ewrên mîna çîyan teyrokê lê dixê, kê jî bivê wê ji (ser) wî vedigerîne. Hindik dimîne ku ronîya birûskan çavan kor bike!”

44 Ew “çola” ku bi hêstirên Mem şil bû û ji nû ve vejîya, belê, li ser vê meselê Xwedê bizane çend helbestvan şî’r nivîsîne, lê bawerim ku ji nav wan ya herî rind ya Baqî ye: “Giryân o Leylîvêş n’ola sahrâya salsa Bâkî’yi/ Mecnûn’un âb-î çeşmine hâk-î beyâbân teşnedür”

agahdarbûyîna Mîr derbarê evîna Mem û Zîn de, kişiklîstina Mem û Mîr û têkçûna Mem û ketina zindanê. (36-45)

Rastîhevhatina Mem û Zînê, Şayes û Motîfên li vir (36-37) :

Serenava “çûyîna nêçîrê ya Mîr/ji xilasbûna qeyd û zincîran a Mem û Zîn” (36), diyar dike ku metn dê ji westariyê derkeve. Beriya ku derbasî vegotina bûyerê bibe, ji bo nîşandayîna guherîna demê û hem jî ya lehengên çîrokan, teswîrên bax (baxçeyê Mîr) û demsala havînê hatine kirin.

Şayesandina Demsala Havînê:

Herçend di metnê de demsal bi eşkereyî nehatibe gotin jî (rojêke xweş bi fêsl û eyyam 36/2) şayeseyên li vir diyar dike ku rojek ji rojên havînê ye ku ronak û xweş e:

Ferraşê qeda bi sun 'ê qudret
Xebra kiribû misalê cennet
Meşsate sîfet cihanê dîrîn
Tezyîn kiribû 'erûse ayîn
Her yek ji newal û kûh û deştan
Reh şubhetê goşeyê bihiştan
Her rewde riyadê xuldê ekber
Her çeşme ji 'eynê abê Kewser
Her kûh ji rengê Tûrê Mûsa
Ji enwarê tecelliyê teyîsa
Her nehrek ji rengê ejdeha bûn
Her sebze bi mucî'zan 'Esa bûn
Her dar ji feydê newbeharî
Têk şu'le dida ji nûrê Barî
Her gul ji misalê ateşê Tûr
Yek meş 'elê bêqusûr ê pîrnûr
Her murxê seher bixwe Kelîmek
Her tûtî û qumriyek nedîmek
Her nexlî nîdakunende her gah
Teşbihê Şecer digo: “Enellah”(36/2-12)

Bi kurtî, ew şayeseyên havînê yên ku ji germa her derê diqijilîne, refereyên ayetên Quranê⁴⁵ nîşanî me dide ku Mem xwedanê wesfên celalî û cemalî ye. Mirov dibêje qey siruşt her wekî bûye tecelîgeha Mûsa pêxember; di hemû firişteyên sax

45 Di berhemê de ji bo refereyên Quranê derbarê Hz. Musa de bnr. A'raf: 7/142-44; Taha 20/17-21; Kasas: 28/29-31. Herwiha ji bo agahiyên berfireh yên tefsîran jî dihundurîne bnr. Yildirim b.n. r. 294-95.

û nesax de nûra Xwedê kifş dibe. Mirov dikarê vê rewşê wekî xilasbûna ji tarîtiya nefsê, bixwîne.

Baxçeyê Mîr (37):

Ew bax û baxçeyê Mîr Zeynedîn ku bi baxên Îremê re tèn qiyaskirin wek şaye-seyeke bihiştî hatiye vegotin. Ew her dar û çivîkên li baxçe, mirov dibêje qey horî û qesrên cennetê ne. Ew çemê diherike û diçe, wekî ava Kewserê ye ku parêzerê bihiştê Ridwan ji bo şuştina dest û rûyê mirovan sebîl dike:

Baxek we hebû Emîr Zeynedîn

Bexê Îremê diçû bi mizgîn

Her dewhe ji wî û her tuyûrek

Yek qesir ji cennetê û hûrek

Bo şuştinê dest û pê û çavan

Kewser kiribû sebîlê Ridwan (37/1-3)

Ew serwiyên ku gihîştine “meqamê sidreyê”, tîtavên ku dişibine firîşteyan, darên çinar û kevot, darên fêkiyan ên curbicur û hemû hebûnên di vî baxçeyê de Mem û Zînê nîşan dide:⁴⁶

Teşbihê Mem dilê senewber

Sad pare ji işqê qeddê-i ‘er’er

Narinc û turuncê şubhê Zînê

Zer bûyî ji ‘illeta evîne (37/5-6)

Naverasta vî baxçeyê ji gelek şahî û fasilan pêk tê ku weke kurtneye pirtûkekê ye:

Sahna rezî mucmela kîtabek

Her qit’e û fasle fasl û babek (37/11)

Ev îfade, di naverasta berhemê de wekî mînyaturek dixuye.⁴⁷ Xêncî vê, Xanî raserî vî baxçeyê şibandiye salnameyeke ku munecîmekî amade kiriye. Ew kulîlkên baxçe jî naveroka vê salnameyê ye, her yek ji wan jî wekî xetên reş û kesk in ku xweşî û nexweşiya bextê mirov nîşan didin. (37/12-15) (Ew kulîlkên reyhan û sunbul, îşareta xettê reyhanî û sunbulî dikin).

Li gorî nîşanên zimanî yên Xanî, em dikarin bibêjin ku nîveka vî baxçeyê wekî şewqvedana bihiştê Ednê ye. Di ferhengê de “edn”, ew cihê ku herdem li wê rûdinên,

46 Ev şayeser, di mesnewiyên Yûsif û Zuleyxa de, ji diwarên Zuleyxayê bigire hetanî mefraşatên wê, li her derê teswirên wê û Yûsif bi hev re hatibû çêkirin, tîne bîra mirov. Hz. Yûsif di vê koşkê de dikarê dawênpakîya xwe biparêze û bireve lê, dê bikeve zindanê. Dîsa, gava jinên Misrî rûyê Hz. Yûsif dibînin şûna hûrkirina wan turuncan tiliya dibirin; ev peyvên “narinc û turunc vê sehneyê tîne bîra mirov.

47 Gava ku em vê derbirana “Nîveka wê baxçê kurteya kitêbekê bû” mêze dikin, wekî ew mînyatûrên ku kurteya mijara berhemên destnivîsar in, dixuye. Li binê rûpelê hewzek (Kewser), bi îxtîmaleke mezin figûreke mirovekî bi per û bask heye ku dêrî vedike (Ridwan), gul û kulîlk û dar û ber û hwd. Ev beşa pirtûkê bi refereyên xwe yên eşkere wekî vegotina nimînandî ya Sûreyê Rehman (Sûreyê 55.) e ku bi jimara xwe tam di nîvekê de ye.

îkamet dikin; nîveka an jî navenda tiştêkî; kana gewher û madenan e, lê di Tewratê de ew baxçe ye ku Hz. Adem piştî ku hatiye afirandin li wir jiyaye. Li vir, behsa çemekî dike ku piştê dibe çar çiq, behsa darên serwî û senewberan û behsa fêkiyên şîrîn û xweşik tên kirin. Di Quranê de jî behsa wan tên kirin wekî qesr û xaniyên rind, text, kincên kesk û tenik ên bi zîv û durran ve hatine xemilandin, fêkî û xwarinên têvel, ew horiyên ku girêdayî hevsera xwe ne û çavên wan ji yekî din nabîne. Di tefsîrên Quranê de jî behsa wan qesr û serayan tên kirin û dîsa dibêje ku di nav wan de kaniyên bi navê “tesnîm” û “selsebil” bi xweşikî diherikin û diçin.⁴⁸

Herwiha di dawîya metnê de Mem dibêje ku em hêj negihîştine bihiştê Ednê lê ji ber ku em bêyî ku zîna bikin terka vê meskena fanî dikin, nîkaha me dê li bihiştê bê birîn. Dîsa dibêje ku ev der cihê gihîştina Xwedê ye, bihiştêke taybet e ji bo evîndaran, em vê bihiştê dixwazin û dûre duayên wan tên pejirandin û piştê berzê jorê dibin. (52/84-96)

Niha em ê li vê serenavê ku bi îşaretên tesewufî re têkildar e, binêrin:

Dastanê bostanê cennetnîşan ê mirân/ Ku bûye “mecmeu’l-behreyn” a eşqa herdu dîlfikaran/ Metleu’n-neyyîreyn” a şewqa husna herdu gul’îzaran (37)

Di tesewufê de Mecmeu’l-Behreyn meqama Kabê Kewseyn; meqama cem’u’l-wucûd e ku li vir navên îlahî û heqîqetên kewnî xwe digihînin hev û du. Ji ber ku alema madî û manewî di dil de dibin yek, îşaretî qelb tê kirin.⁴⁹ Ji pêkvehatina heyv û rojê re “îçtîma”⁵⁰ tê gotin ku hingê heyv wekî serê dasê zirav dixuye. Ew munecîmên ku li gor dûrbûna stêrkan kesan ji tiştên bêyom û biyom agahdar dike, di vê beşê de derbas dibe ku têkiliya vê bi bêjeya “neyyîreyn”ê re heye. Zîn ji ber xema eşqê her diçe dihele, lê gava ku dibe weke heyva nûzayî duayên wê qebûl dibin û êdî dikare Mem bibîne. Encax hingê deriyê baxçê vedibe û Mem dikare bikevê. Lê ev kemîn e. Mem, ew roja ku herkes diçe nêçîrê tê dikeve baxçeyê Mîr. Lê nizane ku bi xwe jî nêçîr e, ji bo dîtina xezala xwe di wê baxçeyê de dê bibe nêçîr. Bi vegotina motîfên kevneşopî çûka dil, di baxçeya bedew de ku rûyê evînê dinimîne, dê bikeve tora şê û biskan. Muqederata reş û spî ku qeder/munecîm wê diyar dike dê li vî baxçeyî pêk bê; Mem û Zîn wê li vî baxçeyê hev bibînin, Mîr ji Mem re dê li vî baxçeyê şahê bikişîne û bibêje “mat”. Ev baxçe ne tenê ye Mîr Zeyneddîn e, “Baxçeyê Mîran” e û bo çîroka vê jî nivîseke din divê.

Zîn û Baxçe:

Zîn, çûyîna (nêçîrê) Mîr û hemû mêrên Botanê ji xwe re wek fersendekê dibîne, xwe ji xizmetkaran xilas dike û bi hêviyekê ku ji xwe re hemderdekî bibîne derdikeve baxçe. Bihîstiyê ku ew bilbilê ku bextê wî ji rengê qijîkê reştir e, li vî baxçeyê ye.

48 Bnr. maddeya “Adn”, *Diyanet Vakfî İslam Ansiklopedisi*, İstanbul: 1988, 390-91

49 Uludağ, *b.n.*, 321.

50 “Vêca gava çav şaş û zeloq dibin... Heyv xerab dibe... Roj û heyv li hev tên civandin (û dibin yek)” *Quran*, Sûreyê El- Qiyamet: 75/ 7-9.

Bi rengê hemderdî û ehlê hal ji wî dermanê derdê xwe dipirse.⁵¹

Zîn gava ku derdikeve baxçeyê dibîne ku ne tenê bilbil; helale, gonce, pelên darê, hemû kevir û mermer, hemû hebûnên li wê derê jê re dibin hemderd. Hemû jî li ber Zînê dikevin. Zîn û baxçe êdî bûne yek. (38/7-31) Zîn bi wan re bûye hemhal û hemderd.

Xanî vê şayeseya xwe li ser remza neynikê ava kiriye. Zîn, di her parçeyî de heman rûyî ango rûyê xwe dibîne. Tiştê ku ji her yekê wan şewq vedide bi tenê eşq e. Wekî li motîfên li jêr jî dixuye Xanî diyarbûna eşqê barî ser milê têgehên mecazî jî kiriye. Mecazên ku dilberê nîşan didin jî êdî bengiyê dinimînin.

Axaftina Zînê bi gulên zer re:

Zîn çavên xwe li baxçeyê digêrîne û ji bo ku wan zêdetir dişibîne xwe, bi gulên zer re diaxive. Zîn, wan wekî xwe rengzer, zeîf, xemgîn, derdkeş, nexweş, hezîn, sîng-perçivî, zelîl û bênesîb dibîne. Dihizire ku ew jî ji evîndarên xwe dût ketine û bilbil bi gulên sor re elaqedar in. (38/32-38)

Ew gula ku bi kevneşopî temsîla dilberê dike, li vir wek sifetê evîndariyê bûye gula zer. Mirov dikare vê rewşê wek nûjeniyê bibîne ku ji sînorên hizrên asayî yên helbesta klasîk derketiye. Di mînaka li jêr de mirov dibîne ku gul û bilbil jî evîndar in.

Pejmurde kirin bi rengî sorgul

Efsurde kirin bi dengî bulbul (38/30)

Xanî dê dûre gul û bilbil ji bo teşbîha Mem bi kar bîne:

Xweşreng û letîf e şubhê sorgul

Yan jar û ze'îf e mislê bulbul? (45/38)

Xanî, cihêtiya navbera wan an ji holê rakiriye yan jî hinek jê biriye. Lewra dixwaze ku me bibe dawiyekê ku “eşq, dildar, dilketî û yên din hemû dê bibêjin: Ew”.

Şewqvedana heman baxçeyê di Mem de hinekî din cudatir e. Yek kulîlk jî di nav vî baxçeyê de nedigihîşte neynika Zînê. Wî bilbilê ku ji her çar aliyê dinyayê jî bo gulan fixan dike, lome dikir. Lê belê Zîn, wekî teyrê Enqa li pişt perdê ye ku mirov nikare xwe bigihîne wê. Jê re wiha dibêje: “Di dirûvê meşûqê de horî yan jî melek hebin, ew nikarin bibin dermanê qet tu derdan. Lê, ger weke Zîn yan jî teyrê Enqa bêhevta be, ji xêncî sebr û mirinê jê re tu derman nîne.” (29/26-29) Bi van gotinan, mirina Mem hatiye vegotin.

51 Motîfa “piştî qetanê rojê biharê digihîjin hev” di hemû metnên Leyla û Mecnûnê de hene. Herçiqas fonksiyonên wan cuda be jî, ev şayeser a ku di *Mem û Zînê* de heye herî zêde dişibe ya Nîzamî. Di Nîzamî de Leyla, salekê piştî qetanê, ji bo derbarê evîndara xwe tiştê bibîne, dilê xwe hinek fireh bike derdikeve baxçeyê ku “derdê xwe ji bilbila serxweş re bibêje, derdên xwe ji nû ve taze bike”. “Bilbila serxweş” a Nîzamî, di Xanî de bi wesfên rûhî û bedenî ya Zîn, bi awayekî giştî hatiye vegotin. (38/9-15). Li vir, ew bilbila ku bextê wê wekî qijika reş e, dibe ku pêwendiya wê bi qijika (Axaftina Mecnûn bi qijikê re) Nîzamî re hebe. Ji bo danberhevan bnr. Nîzamî, *b.n.*, 135-36

Zîn dikeve binê ebayê Mem (40):

Di hemû çîrokên evînê de evîndar biharî rastî hev tên û hevhezkirina wan di hinekan de kêr, di hinekan de jî bi hûrgilî û bi mecazên teşbîhî hatine vegotin. Xanî jî yek ji wan e ku çî ji destê wî hatiye, kiriye. Evîndar di baxçeyê de rastî hev tên û jî hev hez dikin. Di hemû çîrokên Leyla û Mecnûnê de jî ew hevhezkirin heye lê ev hevhezkirin jî şehwetê dûr e. Xanî, wê tiştê wiha tîne zimên: “evîşandibûn teserrûf”, “serheddê zerafetan kemer bû”, “nakit çû qebûliya ecaset” (39/57, 59, 61).⁵²

Di vê beşê de yek ji wan bûyerên girîng ev e ku, Zîn gava dengê Mîr dibihîse ku jî nêçîrê vedigere, xwe di bin ebaya Mem de vedişêre. “Ketina bin ebayê” yekparebûnê û bi paya “berzah”ê jî holê rabûna duyatiya obje-suje, ez-tu temsîl dike. Ev temsîla wekî “di bedenê de du can” tê ravekirin, jî Nîzamî bigirin heta çend helbestvanên ku li pey wî hatine, bi çend veguherînên biçûk ev guherto wek motîfa “qalik-kakil”⁵³ bi kar anîne. Xani ev temsîl wekî mijar hildaye û di vê peywendê de bi bûyer û motîfên wiha bi kar anîye û vegotin berfirehtir kiriye: Veşartina rêzan, serxweşê Mem, ji bo ku Mem xelas bikin Tacdîn û Sîtî agir berdane mala xwe û bi vî awayî dostaniya rasteqîn hatiye fehmkirin. Xanî, di destpêka mijarê de (dema xitabî saqî dike) dibêje ew bi xwe jî “serxweşê bezmê elest e” û xwe bi lehengên çîroka xwe ve yek digire û balê dikişîne ser vê motîfê:

Zîna hewesa dilê hewayê

Min dabite nave xwe ‘ebayê (40/12)

Mimkun e mirov peywendiyê di navbera vê motîfê û “Alê Aba” de bibîne.⁵⁴

Du guliyên Zînê bi mora Şahmeranê:

Dîtin du kezî ji mişkê Tatar

Manendê du ser bi muhre şehmar

52 Nîzamî wiha dibêje: “Ew eşqa ku ji aliyê pakiyê ve Îlahî be, ewpêwendiya wê ‘eşqê bi şehwetê re tu nabe (...) ew eşqa ku xwe dispêre şehwetê nikare zêde bidome”. Ji bo vegotinên Nîzamî û yên din, bnr. Agah Sırrı Levent, *Arap, Fars ve Türk Edebiyatlarında Leylâ ve Mecnun Hikâyesi*, Ankara: Türk Tarih Kurumu, 1959.

53 Di Nîzamî de dema Mecnûn li çolê digere li cihekî dibîne ku navên herduyan li cem hev hatiye nivîsandin û navê Leylayê li erdê paqij dike û dibêje “hi me herduyan re nîşanek bes e”. Dema jê pirs dikin “ka te çima navê Leylayê paqij kir, yê xwe hîşt” ew jî dibêje: “ne rast e ku ez bibim kakil û ew bibe qalik; divê ez bibime qalik”. Di Emîr Husrev de wiha tê gotin “du magz ber yekî pust”, du heb ketine nav qalikekî. Bnr. Levent, b.n. 19,39 û helbestanên din.

54 Di tevsîra sûreya Ahzab de Pêxember Hz. Elî, Fatîma, Hesen û Husên hildaye bin ‘ebaya xwe û gotiye ev Ehlê Beyt in. Ji ber vê jî Xwedê xwestiye ku ew ji her kirêtî û nebaşiyê werin paqijkirin. Ji ber vê ye ku tevayî Pêxember ev pênc kes re Alê Aba - Ehlê Kîsa tê gotin. Wateya wê kesên ketine bi ebayê ye. bnr. Abdûlbâkî Gölpinarlı, *Tasavvuf’tan Dilimize Geçen Deyimler ve Atasözleri*, Ankara: İnkilâp û Aka, 1977, 3-4

Gerdayî di paşila Mem da

Mem mayî di heybet û xemê da (41/4-5)

Peywira vê motîfê di çîrokê de ew e ku Zîn porê xwe yê hûnandî nîşanî Tacdîn dike û alikariya wî dixwaze. Xanî motîfa Şahmeran ji bo Mîr jî bi kar tîne û dibêje ji ber ku hikumdar xwedî jehra kujer û mor in, ji nijada şahmeran in, mirovên biaqil divê ji maran dûr bikeve. (12/35-37)

Por, kesretê temsîl dike. Bi şikl, reng û kujerîya xwe û tîrsa ku dide mirov, dişibe maran. Wekî marên li ber deriyê xezîneyê porên Zînê li bedena wê aliyaye, dilê Mem xezîne ye û Mem hê ji kesret û sûretê xelas nebûye û rewşa wî ya kabz (teng), nîşan dide. Porên ku dişibe mar cûka can tehdît dike. Ev malika Necatî Beg (k.d.1509) rewşa Mem xweş rave dike:

Sarılp çıktı dirahî-i ömrüme mâr-ı ecel

Âşiyân-ı tende yatur bülbül-i cân bî-haber (Necatî)

Paşxaneyêke mîtolojîk ya vê tabloyê heye ku veguherîneke demsalî nîşan dide.⁵⁵

Lîstika Kişikê (43)

Mem, ji ber ku bê destûr ketiye baxçeya Mîr sûcdar e. Tu kesî ew bi Zînê re nedîtiye lê rastî tu dem nayên veşartin lewma jî di demeke kurt de evîna wan derdikeve holê. Evîna wan di devê gel de dibe benîşt. Bekoyê xirab, fesad û şeytan xwe digihîne Mîr û jê re dibêje “ev xeber li gorî namûsê ne dirust e”. Ji Mîr re dibêje bi şertê “çi di dilê te de hebe bêjî” bide ber Mem û pê re bi kişikê bilîze. Dema ku te ew têk bir tu yê rastiyê bizanî û siyaseta ku heq dike bidî wî.⁵⁶ (42/20-32) Li gorî biryara ku hatî girtin ji bo lîstika sibê amadehî tê kirin.

Xanî, bi şayesandina şeveqê dest bi mijarê dike: “Salarê mewakibê kewakib, Serdarê tewalî û xewarib; Sultanê serîrê çerxê rabî, Weqt weku bû ji meşrîq talî”; Setrenciyê mah û cundê exter, Bîlcumle li ser bîsatê exder; Şehmatî kirin bi beydeqa nûr, Te digo hemî bûn di nûrê mestûr. (43/1-4) Di têkoşîna navbera tarî û roniyê de roj bi ser ketiye û bûye sibe. Ger wisa be di dawîya lîstikê de em dikarin di hêviya xilasiya Mem de bin.

Mîr pêşiyê Mem vedixwîne, dema ku wext tê lîstika kişik û nêrdê, ji Mem re dibêje “îro li gel te şer û cenga me heye”. Dest bi lîstikê dikin. Mem dide nîşan ku di lîstikê de hoste ye. Şans jî li gel wî ye lewra duşêş diavêje. Her sê lîstikan jî ji Mîr dibe. Mîr û eqilmendê wî Beko heyîrîm dimînin. Ji ber vê rewşê Beko dest bi fêlekê

55 Ji bo hêmanên mîtolojîk yê derbarê esman de pêdiviya xebateke din ya vê berhemê heye. Ev motîfa dişibe motîfa ku bedena wî ji aliyê marekî ve hatiye pêçandin û singê wî de serê şêrekî heye. Ji bo wêneyên figuran bnr. David Ulansey, *Mitras, Gizlerin Kökeni, Antik Dünyada Kozmoloji ve Din*, Çev. Hüsnu Ovacık, İstanbul: Arkeoloji ve Sanat, 1989, 19, 41, 59, 139, 141, 142.

56 “Siyaset” û “siyaset kirin” li vî derî di wateya cezakirin bi taybetî jî ji bo cezaya darvekirinê de hatiye emilandin.

dike. Dibêje rêgeza listikê ew e ku Mîr û Mem cihên xwe biguherînin. Piştî ku cihên xwe guherandin, Mem dît ku Zîn ji paceya koşkê li listikê dinêre. Êdî nikare çavên xwe jê bizivîrîne. Filê, wezîrê û hespan beyhûde dide. Pêrgan ji xwe re distîne û bi vî awayî di şex listikan de li ser hev li ber Mîr têk diçe.

Bi vî awayî çarenûsa Mem diyar dibe. Çawa ku ji peyva “mat”ê yanê “ mirin”ê jî aşkere ye, Mem di listika kişika dinyayê de di binî de ma, lewra jî dê bimire biçê. Pêrg, hesp, fil û wezîrên wî yanê Tacdîn, Çeko, Arif û belkî hemû gelê Botan ev ceng ji dest da; lewra nekarîn Mem biparêzin û ji zindanê derxînin; ji fêla Beko fêma nekirin û baweriya xwe bi gotina Mîr anîn.⁵⁷

Çawa ku di vê mesnewiyê de jî derket holê listika kişikê nîşan e ku cengê temsîl dike. Titus Burckhard dibêje ku “depa kişikê” wekî “qada bizavê” ya hêzên xudawendî hatiye dîzaynkirin ku nîşaneyê hebûnê di xwe de dihewîne. Çarçikên reş û sipî, nîşana artêşên tarî û roniyê ne. Cenga ku li ser depa kişikê tê listên di navbera “xudawend”, “tîtan”, “firişte” û “şeytan”an de tê leyîstin. Burchard, li gorî hedîseke Hz. Mihemmed dibêje ku ev ceng li ser rêgezê şerkirina du artêşên dinyayî (cîhada bîçûk) û giyanê mirov ku di tariyê de şer dike (cîhada mezin) temsîl dike. Li vê derê ez nikarim bikevim nav hûrgiliyên dîroka mîti ya kişika depê. Burchard bi 64 çarçikan balê dikişîne ser vê meselê ku békêmasiya gerdûnî temsîl dikin û wan li gel îkonografiya mabed an jî pêşnûmayên bajarên pîroz têkildar dibîne.⁵⁸

Li gorî van agahiyên em dikarin bibêjin ku Xanî “navenda baxçe”, “salnameya ku stêrnas xêzkiriye” û bi listika kişikê “baxçeya Mîran” û bi saya van Cîzreyê wekî navendeke pîroz, bajarekî pîroz dîtiye. Herwiha çawa ku wê di jêgirtina dûmahîka nivîsa min de bê dîtin Xanî vê derê wekî navend bi bîr tîne; giyanê Memî ji vê navendê ber bi esman ve bilind dike. (50/69, 52/96)

Şîroveya tesewufî ya listika ku Mem di vî baxçeyê de leyîstî ku mat bibû ew e ku Mem nemiriye dê herdem hebe. Mem listîkvanekî baş e lê ji ber deka (cihguherandin) Beko dikeve zindanê. Lê ev fêl di rastiyê de tê wateya pejirandina vê çarenûsê, hêza Xwedayî, hezkirina ku yara rastî nîşanê hezkiriya xwe daye û temsîla derbasbûna ji

57 Di vê beşê de Tacdîn û birayên wî ji bo ku Mem ji zindanê xilas bikin ji bilê pevçûnê rêyeke dî nabînin û dest bi amadehiyan dikin. Beşa ku pê re tê(47) bi şayesa sibe re dest pê dike ku temsîla tarî û roniyê ye. “Roj wekî siwarekî hespên reş li nêrdê dihêle, li hespên gewr siwar dibe û gurzê xwe yê ji agir, şûrê xwe yê tîrêjên zer diweşîne digire bi destê xwe. Cihan ji ber heybeta wî zer dibe. Lûtkeyên çîyan bi şûra wî parçe parçe dibin.” Ji bo analîza hunerî a van herdu beşan bnr. Perwîz Cihanî, “Mem û Zîn’de Edebi Temsil”, *Uluslararası Ehmedê Xanî Sempozyumu (30-31 Mayıs 2008)*, Diyarbakır: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi, 2008, 123-25.

58 Ji bo peywendîya ku Titus Burckhard di navbera şayesa Qudûsa pîroz ku di mînyatûrekî bi navê “Wahya Severê Pîroz” ji destxetêke sedsala 11’an de cih girtiye û di xêza “Bihîştê Vaikuntha”yê ku baweriya hindû de; ji bo agahiyên fireh derbarê direfşaniya nêrdê de bnr. “Kudûs-ü Şarîf ve Vaikuntha Cenneti” ve “Satranç Simgeçiliği”, *Akıl Aynası, Geleneksel Bilim ve Kutsal Üzerine Denemeler*, İstanbul: İnsan Yayınları, 157-164; 113-117.

kesretê bo wahdetê ye.⁵⁹

III) BEŞA DAWÎ (Heqqe'l yeqîn)

Ji bo Mem, zindan dê bibe cihê têgihîştin û azadbûnê. Mem dibêje “Dinya ku bihiştta kafiran e” (44/24) û piştta xwe li wê dizivire. Li vê zindanê terbiyeya nefsa xwe tamam dike û digihe meqamên “beriya mirinê mirin” (44/45), “fena” û “beka”yê.⁶⁰

Serlêdana Zînê bo Mem ku li gel wê Sîtî, Heyzebûn û berbûk jî hebûn bûyereke girîng a vê beşê ye. Armanca serlêdanê ew e ku bila bibêjin, Mîr destûr daye û amadehiyên dawetê dest pê kirine. Kesên ku çûne serlêdanê bi awayekî kêfxweş ji Mem re gotine êdî jihevduymayîn qediya. Di dawiyê de bext û talihên wan vebû.

Ev mijara dawetê jî di rastiyê de fêleke Beko ye. Mem gava ku rûyê Zînê bibîne dê di wî de hêz nemîne û bimire. Lê çî ye ku Mem vîna xwe daye destê xwedê, kemîlîna xwe tamam kiriye û gihaye meqama welîtîyê, rastiyê dibîne û nakeve vê kemînê. Mem wiha bersiva wan dide:

Em çûne huzûrê Mîrê Mîran

Wî hakimê hakim û feqîran

Şahînşehê mîr û padîşahan

Bexşendeê tuhmata gunahan (52/78-79, 83)

Yek daxwaza wan ji Xwedayê ku daweta Mem û Zînê li bihiştta Ridwan çêkiriye maye:

“Biçîne bihiştta Ednê cihê ku derkevîne dîwana wî”.⁶¹ (52/88, 91-92) Daxwaza Mem tê pejirandin û deriyên li bergiya wî vedibin. (52/88-92)⁶²

Schimmel bi me dide zanîn ku “ji berê ve ji aliyê hemû mutesewifan ve dereceyên keşfên cuda ku derî rastiyên siruştî ne û bi mentiqî nînin hatine pejirandin” û “ilmê ledûn ku ji zanîna din tê cudakirin” wiha tê salixdayîn: ji qada Xwedê hatî û wateya hikmeta li gel Xweda û ji ber rehma Xwedê ku bexşê arifê kiriye.⁶³ Ev agahî bi

59 Schimmel dibêje ku li Îranê hêmaya Xwedê ku wekî listikvanê mezin ê kişikê tê pejirandin, paradoksa wahdet û kesretê bi hêmayên kevîrên kişikê tîna temsîlîkirin. Di listikên kişik û nerdê(listikeke ku bi navê “şeş derî” tê nasîn û di rewşên herî xirab de şeşdar tê gotin) de li gorî sofîyan dinya di navbera “şeş derîyan” de hatiye dorpêçkirin lewra jî ev hêma tê bikaranîn. Û dibêje di helbestên Camî de ev hêma gelek caran derbaz dibin. Bnr. Annemarie Schimmel, *İslamın Mistik Boyutları*, İstanbul: Kabaalçı, 302-303.

60 Ji bo vê beşa dawî bnr. Remezan Alan, a.g.m., 193-198.; Resûl, “Xanî ve tasavvuf”, *h.b.*, 313-354.

61 “Mafê wan li ber qada xwedê, erdên ku li ser çem diherikin û cihê ku dê herdem di tê de bimînin, bihiştên Adnê ne. Xwedê ji wan qaîl maye, ew jî bi xwedê qaîl mane. Ev hemû ew kes in ku ji xwedê ditirsin.” *Kur’an*, Sûreya Beyyineyê: 98/8; “(...) Vaye mafê kesên ku xwe ji gunehan dûr xistine.” Sûreya Tahayê: 20/76

62 Qesta ji derîyan 9 deriyên gerdûnan in. Mutasawwif van wekî neh derî /neh rengdêr şîrove dikin. Ev: emmare, levvame, mûlheme, mutmaîne, raziye, marziyye, kamîle (safîye) û ruh û raz. Ahmet Ögke, *Vâhib-i Ümmî'den Niyâzî-i Mısri'ye Türk Tasavvuf Düşüncesinde Metaforik Anlatım*, Van: Ahenk, 2005, 220.

63 Schimmel *b.n.*, 208.; ji bo zanîna zêde bo “İlmê ledûn” bnr. Süleyman Uludağ, *h.b.*, 246

portreya Mem ji hev digirin. Mem êdî weliyek e ku xwediyê razên îlahî, zanînen veşarî yên kesan yanî xwediyê zanîna “ilmê ledûn” e û ji bo rêwitiya veşerê amade ye. Xanî, Mem bi van gotinan bi rê dike:

*Teyrê ku qefes li ber vebûyî
Ew rengi firî wekî nebûyî
Destê xwe ji qeydê gil kişandin
Çengê di dilê xwe raweşandin
Şebaz ji qeydê merkeza Ferş
Perwezi kir û gîhîşte Zi 'l- 'Erş (52/94-96)⁶⁴*

Ev beşa dawî, ne tenê ji aliyê tasawwûfî ve girîng e; di vê beşê de rexne û nêrînen Xanî yên derbarê rêvebiran de jî balkêş in:

*Ez naçime hezreta tu mîran
Ez nabime bendeê esîran
Ev mîr û wezîriya mecâzî
Ev şe'bede û xeyalibâzî
Bilcumle betal û bêbeqa ne
Bêaqîbet in hemî fena ne
Mîrê ku mîrin hebit ne mîr e
Me'zûlî hebit ewî esîr e (52/74-77)*

Li ber çavên Mem, mîrê rastî êdî Xwedê bi xwe ye lewma jî qîmeta mîr û wezîren dinyayî nemaye. Ev gotin ji ber meqama ku Mem gihaye, li vegotinê tîn. Li gel gotinên ku ji bo Zeynedîn hatine gotin, hinek jî tam neaşkereyî ji bo Tacdîn hatine gotin: “*Ez nabim bendeyê tu kesî ku bi xwe dil in*”, “*Eger mîrek ji payeya xwe dikeve êdî ew dil e.*”

Dijberiya di navbera mîrên cîhanê û Xudayê xwediyê milkê yê rastîn de wiha didome:

*Ew mîrê hekîm e Zulcelal e
Bî'ezl û texeyyur û zewal e
Tezwici kirin di 'alema xeyb
Teb'îdi kirin bi emrê lareyb (52/82-83)*

Xanî bi vê mebestê mîrên dema xwe rexne dike û dibêje mîrîtî êdî bi awayekî rengê lîstika evîniyê girtiye:⁶⁵

*Ev mîr û wezîriya cîhanî
Ev begmekizîriya zemânî (49/30)*

Bûyerên Dawî:

64 “Bende heta ku ji bendên axî xilas nebe nagihe qada daxwaza xwe.” Resûl dibêje ku Xanî vê şayesa ku aîdê Kaşanî ye dubare dike. Resûl, *b.n.*, 326.

65 Ji lîstika “Mîr-Kizîr” Kadrî Yıldırım vê raveyî kiriye: Ev lîstika ku berê di nav kurdan de navdar bû û bi awayekî lîstikeke kapê ye. Di vê lîstikê de wateya rûyê kapê yê biqul “mîr”, rûyê piştê jî “kizîr” e ku di wateya wezîrê de ye. *bnr.*, *b.n.*, 353, nîşeya 183.

Bûyerên derbarê mirina Mem û Zînê de bi berfirehî hatine vegotin. Ger bi kurtî bîn vegotin: Tacdîn ji ber mirina Mem pir hêrs dibe û bi pîşadî Beko derdikeve beriya Tacdîn û bi destê wî tê kuştin. Bi qehra xwe dibe wekî ejdehayekî û kî derkeve pêşiya wî dixwaze ji holê rake. Ketiyê halekî ku kes nikare pêşiya wî bigire. Ji ber vê rewşê bi mecbûrî agahî didin Mîr û wî bi zincîran girê didin. Tacdîn qêr û nalîna di dema rakirina cenazeyê de dibihîze, zincîrên xwe diqetîne, deriyê kelehê vedike, xwe digihîne laşê Mem û darbista wî li ser serê xwe bar dike. Ji her çîn û ji her temenê gelê Botan wekî di dema Newrozê de dadikevin kolanan; vê carê bi zêmaran, bi girîn û axînan, bi cilên reşpûşayî wekî rêçûna qitayî ya leşkeran⁶⁶ bi rê ketine. Zîn jî wekî stêrka gelawêjê daye li gel sazê bi reqs⁶⁷ ber bi cenazeyê çûye. (53) “Şehîdê eşqê cellad; Meqtûlê sîtem, qetîlê bêdad”(55/1) Mem, wiha tê veşartin. Piştî veşartina Mem, Zîn tê li ber serê wî rûdine, wiha bangê wî dike: “Ey malikê milkê cism û canî, ez baxîçe û tu baxîban î” (55/18). Xanî li vê derê spehîtiya Zînê vê bi şayesa baxçeyê vedibêje. Armanca Zînê ew e ku vê spehîtiyê serûbinî bike. Lê wisa bawer e ku dê Mem ji ber vê yekê gazindan bike. Lewma dev ji vê daxwaza xwe berdide. Bi gotina xwe ya “ez vê emaneta Xwedê teslîm bikim û bi vê xeml û spehîtiyê bigihînim te” xwe berdide ser gora Mem û li wê derê canê xwe dide. “Ew her du guher (dikin nav) di durcekê de, ew şems û qemer (dikin nav) di burcekê de. Mîr bangê Mem dike: Ji bo te meşuq! ... Ji qebrê sê caran seda tê: Merheba” (55/51-54)

Çîrok bi vegotina şêx a derbarê jiyana Mem, Zîn, Beko û Tacdîn a bihiştê de diqede. Dawiya vê çîroka ku bi evîna îlahî diqede encam li holê ye, ne hezker ne hezkirî ne jî dijber dimîne.

Encam:

Mem û Zîn ji nav çîrokên temsîlî yên ku xweşikiya heqîqî û evîna bo vê xweşikiyê dikin, herî zêde dişibe *Leyla û Mecnûnê*. Lê belê bi bikaranîna hinek neqşên ku di vegotina reftarên gîyanî de û wekhevîyên di vegotinî de *Mem û Zîn* bêhtir bi tekstê Fuzûlî re têkilîdar e. Her du metn jî bi zimanekî têkel hatine nivîsîn û ji aliyê bikaranîna peyvên erebî-farisî û terkîbên wan de hevrengeyê heye. Herçiqa Xanî navê Fuzûlî qet bi kar neaniye jî em dikarin bibêjin ku Xanî xwe nêzî Fuzûlî dîtiye. Em dikarin bibêjin ku ji ber rewşên siyasî ên li herêma wan û ji ber cengan ev herdu helbestvanên mezin xwediyê heman çarenûsê bûne. Bexda ji destê Akkoyunluyan ber bi destê Sefewîyan û piştê jî bi yê Osmanîyan geriyaye û vê jî Fuzûlî xistiye rewşa ku her dem li parêzgerê bigere û gelo vê rewşa Fuzûlî bandor li Xanî kiriye an ne; an em nizanin gelo ji ber bandora vê rewşê, wî berhema xwe diyariyê qewmê kurd kiriye. Lê di “sebeba nezm”ê de ku bi vegotinên xwe wek bersiva Nîzamî ye

66 Yıldırım ji bo vê gotina leşkerî dibêje ku di artêşa Selaheddîn Eyyûbî de seba hinek qitayan hatiye emilandin. *b.n.*, 382, nîşeya 210.

67 Ev neqş di mesnewiya Leyla û Menûnê de jî heye. Mecnûn bi xwendina xezelan û bi reqs heta goristanê li gel darbista Leyla diçe. Dibe ku cara pêşîn di Emîr Hûsrevî de bihurîbe. *b.n.*, 40

ku ew di bin baskên şahekî mezin de jiyabûye, li gel Fuzûlî li heman rêzê disekine.

Mem û Zîn çîrokeke temsîlî ye ku ji aliyê xwe yê tesewufî ve nêrîna wehdetê wucûdê dihewîne û çîroka giyanên ku peydabûna wan li qada hebûnê ye ku soza xwe ya li bezmê elestê dabûn bi bîr tînin û di veqera wan ber bi welatê eslî de ye. Li gorî tesewufê armanca afirandinê pala xwe dide hedîsa qudsî ku dibêje: “Kuntu kenzen mehfiyyen” (ez gencîneyeke veşartî bûm, min xwest bêm zanîn; lewma jî min gerdûn afirand). Dîsa li gorî hedîseke din a qudsî Xwedê mirov bi armanca ku dîmena wî di neynika giyanê bendeyê wî de; mabeda xwe jî di dilê wî de bê dîtin, afirandiye. Ji destpêka bizavên pêşîn ên tesewufê ve di hedîsên bi vî rengî de û “Xweda mirov ji axê afirand û bi giyanê xwe pifê wî kir”⁶⁸ bi ayetên vî rengî ku derbarê afirandinê de ne, ji bo şîrovekirina van ayet û hedîsan hêmaya “neynik”ê herdem hatiye bikaranîn. Di vê mesnewiyê de jî bi erd û esmanan, bi hemû aferîdeyên veşartî û eşkere, alema heyînê neynikek e û di ya van neynikan de dixuyên tenê sipehîtiya “Husnê Mutleq” e. Xwedê ev neynika hebûnê ji bo sipehîtiya xwe bibîne û nîşan bide afirandiye. Armanca afirandinê ji ber eşqa li ser spehîtiya xwe ye. Raza ku ji vê hikmetê fêhm bike dil e. Dilê Mem jî di rêbertiya evînê de ji sûretê ber bi rastiyê ve çûye, bi destxistina zanîna marîfetê, bi zanîna xwe, bi têgihîştina yê ku dibîne yê ku tê dîtin jî tenê Xwedê ye, dilê wî dibe neynikek. Bi vê fehmê bo ku peywira xwe bi cih bîne û emanetê bigihîne cih veqeriyaye welatê eslî.

Ji serî heta binî *Mem û Zîn* li ser van hîmên tesewufî hatiye nivîsîn. Xanî bi pêşnûmakirina mesnewiya xwe bi awayekî yekgirtî bi piranî mesnewiyên din cuda kiriye. Di beşa destpêkê de ji risteya duyem pê ve; bi Tewhîd, Munacaat û Neetê avahiya ramanî ya berhema xwe, nêrînên xwe yên hebûnê destnîşan kiriye. Di Tewhîd û Munacaatê de Xwedê wekî hezkiriyê rastî, hezkerê ku hewceya bi sipehîtiya hezkiriyê nabîne, alema hebûnê çawa û ji bo kê afirandiye û hemû hêz û çarenûs di destê wî de ye, bi me dide zanîn; di Neetê de li ser kesayetiya Hz. Mihemmed peywendiya hezker-hezkiriyê vedibêje. Ev destpêk ji ber ku temsîl û mecazên ku di çîrokê de diborin dihewîne girîng e. Lewra ji bo fêmkirina çîrokê ev temsîl û mecaz rê nîşanê me didin. Di beşên ku piştî mijara eslî de tên (58) Xanî wek helbestvanekî mutesewif derbarê xwe û yê berhema xwe de agahiyên dide. Xanî bi me dide hîskirin ku ew jî sermestê evîna îlahî ye û bi vê evînê (mîna Mem) kemiliye. Dibêje ku wî berhema xwe ji bo ku bêtêmaniya evînê biselimîne û sipehîtiya evînê ku wekî neynikê Xwedê dide nîşan, derxîne meydanê nivîsiye. Dawiya mesnewiyê bi gotûbêjên qerfî diqede. Dawiya dawî ev berhem ne bi pênuşa Manî hatiye nivîsîn ku xwe mezin, kustah û ressam dihesiband, lê bi destê Xanî yê ku ew pênuş girtiye hatiye nivîsîn. Lê belê rewşa wî wekî rewşa pênuşa dîl e. Ew jî tenê karmendek e. Xanî van ji ber meya ku saqî pêşkêş kiriye/ji ber evînê nivîsiye. Xwediyê eslî yê xetê Xwedê ye.

Bi van ravekirinan bi zelalî tê dîtin ku sûjeya çîrokê Xwedê bi xwe ye. Di vê

68 Di Quranê de derbarê afirandina alema heyînê de gelek ayet hene. Ji bo ayeta “Pifkirina Ruhê” bnr. Sûreyê Secde: 32/9

çîrokê de kadroya lehengan heta gelê Botan berfireh dibe lê Tacdîn, Beko û erkên wan girîng in. Xanî di belavkirina erkan de ji mesnewiyên evînê yên dî berhema xwe cuda dike û li ser “dijayetî”, “cudatî”yê ava dike. Bi erkên Tacdîn û Beko, vê belavkirinê bi “pevçûn”ê saz dike. Xanî li gel têgehên dijminayetî û dostaniyê li ser têtîngên sipehîti û evîna ku dilbesteyê sipehîtiyê ye sekiniye. Xanî bi hevserîtiya Tacdîn û Sitî hem cudahiya di navbera evîna îlahî û mirovî de zelaltir kiriye hem jî bi saya wan mijara dostaniyê vegotiye. Lê di navbera Tacdîn û Mem de cudahiyeke afirandiye û ew di mecazê de hiştiye. Nişan daye ku Tacdîn dostekî qenc e lê herçiqas dostekî şervan, wêrek be û li piştê wî şervanên wekî Arif û Çeko hebin jî ne kariye pêşiya zindanîkirina Mem bigire, ne jî kariye wî ji zindanê xilas bike. Cara pêşîn li ber fermana Mîr serê xwe tewandiye û di ya duyem de jî herçiqas zaniye ku Beko aqilmend e lê dîsa jî xwe ji bîr kiriye û bi gotina Mîr bawer kiriye. Lewra jî bi kêmanî ye. Rûyê tarî yê alema mecazê jî bi riya Mîr ku bi hevkarîya Beko temsîlê şeytan e, tê nîşandan. Bi erka xwe ya mîrê dinyayê Zeyneddîn li hember mîrê rastî Xwedê radiweste. Cihê wî çî ye ku li ser riya şeytan çûye dojeh e. Taybetiyên Zeyneddîn wekî ji eslê Xalidê kurê Welîd, rêveberekî hêzdar, qehreman, destvekirî, dîndar û heyîdar tê nîşandan lê qet wekî rêveberekî dadwer nayê nîşandan. Pişre tê fêmkirin ku rêveberekî çiqas nezîrek, nedadwer û zalim e.

Di çîrokê de Beko bi erka şeytan ku ji bihiştê hatibû avêtin cihê xwe digire û erkeke girîng e. Lewra bi saya vê erkê xirabî û başî ji hev cuda dibin û mirovan herçend kêmbê jî viyana xwe çawa bikaranîne tê fêmkirin. Di nirxandinên li ser çîrokê de Beko wekî sedema mirina Mem, kujerbûna Tacdîn, nûnerê awanî û awanê, xirabiyê hatiye dîtin. Ev pênase ji aliyê evîna mecazî ve rast e. Beko astengker e. Lê ji aliyê evîna îlahî ve rola Beko diguhere. Gihîna evîna îlahî ya dildaran, bi saya Beko ye. Xanî, bi Zînê vê rewşê dide ravekirin:

Ji ewwel ve egerçî wî cefa kir

Axir bi me ra ewî wefa kir

Zahir wî eger muxalefet kir

Batin bi me ra muwafeqet kir

Ger ew nebuwa di nêv me haîl

Eşqa me dibû betal û zail (54/13-15)

Zînê jî ber vê sedemê Bekirê ku ji aliyê Tacdîn ve hatiye kuştin wek şehîd hesibandiyê û xwestiyê li ber qebra wan bê veşartin. (54/18-21)

Yek ji unsûrên bingeşîn ên ku hûnandinê pêk tîne jî bawerîya bi qederê ye. Aqûbeta Mem, li gor baweriyên qedîm, qedera ku li gor rewşa gerestêrk û stêran tê diyar kirin, li Newroza ku qismet lê tê belavkirin bi gustîlka ku xistine tiliya wî diyar dibe. Qedera/hilbijartina Mem wê rojê diyar dibe. Gustîlk, peyama wê qederê ye ku hatiye nivîsîn. Teqdîrê qeza, di lîstika kişîkê de jî dertê. Ji ber ku Mem lîstikvanekî qels e yan jî ne ji ber hîlekariya Bekir, bi vîna Xwedê têk çûye û bo bigihîje meqamê

* Li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, di beşa Ziman û Çanda Kurdî de lêkoler in.

TESÎRA MODERNÎZMÊ LI SER XEBATÊN PÊŞÎ YÊN FOLKLORA KURDÎ Û TIRKÎ

Ramazan Pertev*

“Folklorê herî meraqdar li welatê tirkan peyda dibe.”

Selim Sırrı Tarcan, 1922

“Her çî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rohelatê nîzing de folklorê tu milletî ne gihastîye dereca folklorê me.”

Celadet Bedirxan, 1941

Destpêk

Çarçoveya vê lêkolînê, tesbîtkirina taybetmendiyên xebatên folklorê kurdî û tirkî yê pêşî ne. Wekî mêjû mebesta me ji xebatên pêşî, nivê duyemê sedsala XIX. û serê sedsala XX. e. Di vê xebatê de em dixwazin tesîra modernîzmê ya li ser xebatên folklorê kurdî û tirkî lê bikolin û xebatên her du aliyên ên di vî warî de berawird bikin. Herwekî tê zanîn, folklorê wekî qadeke lêkolînê ya serbixwe ligel têgînên “ziman”, “neteweyî”, “welat” û “şaristanî” ketiye rojeva rewşenbîrên osmanî.¹ Ev hemû bi modernîzmê ve eleqedar in. Em ê jî di çarçoveya van têgînên de di xebatên pêşî yê folklorê yê tirk û kurdan de li şopên modernîzmê bigerin û piştî jî wan berawird bikin. Lewma di vê nivîsê de, xebatên ku hatine kirin, bi piranî bi awayekî kronolojîk hatine nirxandin.

Folklor, zargotin, gelnasî an zanista gelêrî, li ser dab û nêrît, bawerî, berhemên edebî û unsûrên madî yê civakê bi awayekî zanistî xebatan dike, wan dicivîne, disenifîne û dinirxîne. Herwekî tê zanîn xebatên li ser folklorê xwediyê dîrokeke kevin in. Hîn ji serdema antîk ve kesên wekî Pausanis, Herodot, Strabon, Plutarch çavdêriyên xwe yê li ser gel û erdnîgariyên cûrbicûr nivîsîne. Di sedsala X. de gerzanên ereb Îbnu Fazlan û Ebû Dulef, di sedsala XIII. de Marco Polo, di sedsala

* Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstitûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

1 Arzu Öztürkmen, *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik*, Weşanên İletişim, İstanbul, 2009, r.19.

XIV. de jî Îbnu Batûta di seyahatnameyên xwe de der barê welatên ku lê geriyane de gelek agahiyên folklorî dane. Herwiha di sedsala XVII. de gerzanê navdar Ewliya Çelebî jî di pirtûka xwe ya bi navê *Seyahatnameyê* de li ser taybetiyên gelan agahiyên gelek girîng dane. Di sedsala XVII. de li Ewropayê ne sistematîk be jî xebatên li ser folklorê dest pê kirin. Piştî lêhaybûna girîngiya çanda gelêrî, komkirin û tomar-kirina xebatên berên folklorê jî zêde bûn. Lêkolîna folklorî ya bi awayekî zanistî di sala 1646an de ji aliyê zanyarê îngîlîz Thomas Browne ve bi navê *Lêkolînên li ser Xurafeyên di Nav Gel de* hatiye kirin.²

Wekî zanist peydebûna folklorê di sedsala XIX. de ye. Lewra cereyana romantîzmê û tevgerên neteweperweriyê li ser xebatên folklorê tesîreke mezin çê kirine. Zanyarê elman Johann Gottfried Herder (1744-1803) yekem ji wan kesan bû ku bal kişandiye ser têkiliya çand û neteweyê. Li gorî Herder, berdewamiya serxwebûna neteweyan girêdayî parastina çand û berhemên gelêrî yên wê neteweyê ne. Di sala 1818an de Wilhelm Grîmm û Jacob Ludwig Karl Grîmm ku bi navê *Birayên Grîmm* bi navûdeng in û wek îlhama ekola romantîzma elmanî tîr qebûlkirin, li ser folklorê elmanî û Ewropeyê gelek xebat kirin. Xeberoşk, efsane û menqibeyên elmanî berhev kirin. Birayên Grîmm bi awayekî zanistî li ser devok û awayên wan jî rawestiyên. Herçend li Elmanyayê di wateya zanista gelêrî de peyva “volkskunde” ji aliyê Friedrich Eckard hatibe bikaranîn jî, peyva “folklor”ê yekem car ji aliyê arkeologê îngilîz William John Thoms ve hatiye bikaranîn. Nivîskar di hejmara 22ê Tebaxa sala 1846an a kovara “Atheneum” de nivîsek daye weşandin. Wî, di vê nivîsa xwe de peyva *folklorê* bi kar aniyê. Piştî gotara Thoms, di vî warî de rêbazên zanistî bêtir derketin pêş û ev qad wekî “zanist” hate qebûlkirin.³

Di destpêka sedsala XX. de li Ewropayê gelek keresteyên folklorî hatin tomar-kirin û kovarên folklorî hatin weşandin. Yekem komeleya folklorê ya bi navê “Folklore Society” (Komeleya Folklorê) di sala 1878an de li Îngiltereyê hat avakirin. Di zanîngehan de perwerdehiya folklorê dest pê kir. Bo nimûne di sala 1886an de di bin banê “Zanîngeha Oslo”yê de yekem kursiya folklorê hat damezirandin. Xebatên ewropeyîyan ên li ser komkirin û tomar-kirina berên folklorî bala welatên din jî kişandiye û bi taybetî di dawiya sedsala XX. de van welatan jî lez dane xebatên folklorî.

Xebatên serdema pêşî yên li ser folklorê tirkî û kurdî

Nimûneyên pêşî yên li ser berhevkariya folklorê tirkî di sedsala XI. de *Divanü Lûgat-it-Türk* a Kaşgarlı Mahmut û di sedsala XVII. de *Seyahatnameya* Ewliya Çelebî ne.

Ev *Seyahatname* ji aliyê folklorê kurdî jî girîng e.⁴ Li gorî Tosinê Reşîd kevintîrîn

2 Arnold van Gennep, *Le Folklore*, Paris, Weş. Libraire Stock, Paris, 1924, r.69.

3 W.J.Thoms, “Folklor”, *Kovara Attentum*, London, 1846.

4 Evliya Çelebi, *Seyahatname*, (veg. Yücel Dağlı, Seyit Ali Kahraman, İbrahim Sezgin), Weşanên Yapı Kredi, Stenbol, 1999-2001. *Seyahatname* ji 10 cildan pêk tê, cildên 3, 4 û 5an

xebata ku li ser folklorê kurdî hatiye kirin û gihastiye roja me destnivîsarek e ku di sala 1711an de ji aliyê Mêsrop Maştos ve li Ermenîstanê hatiye nivîsîn û niha li Enstîtuya Destnivîsarên Kevin li Yerêvanê tîr parastin.⁵ Ev destnivîsar bi elfabeya ermenî ye û tê de 115 gotinên pêşyan ên kurdî hene. Lê belê em ji arşîva Aleksandr Jaba dizanin ku Mela Mûsayê Hekarî hîn di sedsala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yêr gelêrî berhev kirine û ew bi navê *Duru'l Mecalîs* wekî pexşankî nivîsîne.⁶ Ji aliyê berhevkarî û tomarkirinê xebata herî berfireh di salên 1850î de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) hatine kirin. Wî di gelek beşên folklorê kurdî de berhem dane. Du pirtûkên wî yêr bi navên *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye* û *Camîya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* ji bo folklorê kurdî berhemên giranbuhane. *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye*, xebateke civaknasî, etnografî û folklorî ye. Ji rabûn rûniştinê heta awayên zewacê, ji baweriyên gelêrî heta navên jin û mêr ên kurdan, ji taybetmendiyên cilûbergên kurdewarî heta xwarin û vexwarinan, der barê çand û civaka kurdan de agahî hatine dayîn. *Camîyê Rîsale û Hikayetê Ekradiyye* li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Tê de 3 meqale û 40 çîrokên gelêrî hene.

Rewşenbîrê osmanî Abdülazîz Bey di sala 1910an de bi sernavê *Adat ve Merasim-i Kadîme, Tabîrat ve Muamelat-ı Kavmiye-i Osmanîye* berhevokek amade kiriye.⁷ Ev xebat wekî naverok nêzî xebata Bazîdî ye.

Li gorî M.Öcal Oğuz rewşenbîrêr wek Ziya Paşa û Ahmet Vefîk Paşa bi awayekî zanistî li ser folklorê sekinîne. Ziya Paşa paradîgmaya folklorê diyar kiriye, Ahmet Vefîk Paşa jî di sala 1885an de yekem car peyva “folklor”ê bi kar anîye.⁸ Rewşenbîrê kurd Celadet Bedîrxan di vî warî de wiha nivîsiye: “folklor, zanîn an zanistîya xelkê ye. Ev bêje bi eslê xwe îngilîzî ye. Lê îro ketiye hemû zimanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Jixwe kurdên Qefqasê beriya me ev bêje xistine zimanê xwe û kitêbek bi navê *Folklorê Kurmancî* belav kirine.⁹ Wiha tê fehmkirin ku di nav kurdan de peyva “folklor”ê cara pêşîn ji aliyê Heciyê Cindî û hevalên wî ve di salên 1930î de hatiye bikaranîn.

bi kurdan re eleqedar in, bi taybetî di cilda 4. de der barê kurdan û Kurdistanê de agahiyên gelekî berfireh hene.

5 Bnr. Tosînen Reşîd, pêşgotina pirtûka *Folklorê Kurmanca*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008.

6 Bnr. Arşîva Aleksandr Jaba. Kopyeyeke arşîvê ya dijîtal di sala 2013yan de ji aliyê Beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê ve li Petersburgê hat zêdekirin û niha li Mêrdînê ye.

7 Öztürkmen, b.n., r.25. ev xebat piştê bi sernavê *Osmanlı Adet, Merasim ve Tabîrleri* ji aliyê Prof. Dr. Kazım Arısan û Duygu Arısan ve hatiye amadekirin û di 1995an de Weşanên Tarih Vakfî ve li Stenbolê çap bûye.

8 M.Öcal Oğuz û yêr din, *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı*, Weşanên Grafiker, r.22, Ankara, 2012

9 Celadet Bedîrxan, “Ferhengok”, *Hawar*, j. 30, Şam, 1941, r. 759; berhema ku Celadet li vir behs dike, pirtûka *Folklorê Kurmanca* ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal e. Ev pirtûk ji nû ve hatiye çapkirin, bnr: Heciyê Cindî û Emînê Evdal, *Folklorê Kurmanca*, wer. Tosînen Reşîd, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2008.

Ziya Gökalp ji bo ku disîplîna folklorê bide naskirin çend gotar li ser vê mijarê nivîsîne. Wî wek têgîn peyva “xelqiyat”ê bi kar anîye.¹⁰ Piştî Gökalp, M. Fuad Köp-rülû bi sernavê “Zanisteka Nû: Xelqiyat-Folklor” nivîsek di rojnameya *Îqdamê* de weşandîye.¹¹ Herwekî ku tû dîtîna navên “xelqiyat” û “folklor”ê bi hev re bi kar anîne. Rıza Tevfik Bölükbaşı di rojnameya *Peyamê* de bi sernavê “Folklor-Folk Lore” go-tarek nivîsiye.¹²

Nivîsên der barê folklorê kurdî de di dawîya sedsala XIX. û serê sedsala XX. de di weşanên wekî rojnameya *Kurdistan* (Qahîre-1898-1902), *Kürd Terakki ve Teavun Gazetesi* (Stenbol-1909), kovarên wekî *Yekbûn* (1913), *Rojî Kurd* (1913), *Hetawî Kurd* (1909), *Jîn* (1918-20), *Kurdistan* (Stenbol-1919-21) de belav bûne.

Hikmet-i avam û lîsan-ı avam / Zanista gelêrî û zimanê gelêrî

Ji bo avakirina hişmendiyeke neteweyî, zimanê deverî wasîteya herî girîng e. Lewra rewşenbîr divê bi zimanekî ku girse jê fehm bike bangî wan bike ku ew tevli şoreşê bibin.¹³ Rewşenbîrê tirk Namik Kemal zimanekî sade parastîye, lê belê zêde guh nedaye berhemên edebiyata gelêrî. Wî ziman wekî wasîte dîtîye.¹⁴ Hîn di dawîya sedsala XIX. de helbestvanên wek Hacî Qadirê Koyî, Şêx Evdîrehmanê Aqtepî di helbestên xwe de li ser girîngiya kurdînivîsînê sekinîne. Ji aliyê balkişandina girîngiya ziman di rojnameya *Kurdistanê* de “hişyarî”yek heye ji bo xwendevanan ku behsa eleqeya biyaniyan ên wekî elman, nemçe û îngilîzan ji bo kirîn û xwendina rojnameyê dike. Bi taybetî behsa Mösyö Martîn Hartman dike, dibêje ew li ser zimanê kurdî lêkolînan dike. Li vir tû hêvîkirin ku helwesta Hartmann ji bo lêkolîner û edebiyatzanên kurdan jî bibe mînak.¹⁵ Kurdîzade Ahmet Ramîz di sala 1906an de dema ku *Mewlida* kurmancî ya Melayê Bateyî çap dike, di rûpela piştê de nivîsiye ku “min niyet heye ez pirtûk û berhevokên kurdî çap bikim û biweşînim. Ji kerema xwe an ji bo xîret û namûsa qewmê xwe ez tika dikim ku pirtûkên kurdî yê li ber destên xwe ji bo ku ez çap bikim, ji min re bişînin.”¹⁶ Ji bo xurtkirina hişmendiya neteweyî ya di warê xwedîlêderketina zimanê kurdî de, ev bangeke girîng bû.

Li Tirkiyeyê eleqeya li ser folklorê di nîvê duyemîn ê sedsala nozdemîn de dest pê kir.¹⁷ Wê demê pêwîstîyeke wiha peyda bûbû ku zimanekî neteweyî ava bibe da

10 *Halka Doğru*, j. 14, 1913

11 *Rojnameya Îqdam*, j.6091, 1914

12 *Rojnameya Peyam*, j.20, 1914

13 Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernite ve Estetik Kültür*, Metis, r.69.

14 Öztürkmen, b n., r. 23.

15 “İntibah”, *Rojnameya Kurdistan* (1898-1902), j.3, amd. M.Emîn Bozarslan, weşanxaneya Deng, Swêd, 1991.

16 Malmîsanîj, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Abdullah Cevdet*, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1986, r. 44.

17 Agahiyên der barê xebatên folklorê li Tirkiye de, bi piranî ji van sê berhemên hatine wergirtin,

ku piraniya gel jê fehm bike. Ahmet Mîthat Efendî li ser vê yekê wiha nivîsiye:

“Zimanê me yê edebiyatê, ne zimanekî neteweyî ye. Erebi, farisî û tirkî jî nîne. Şaheserên edebiyata me ji aliyê erebek an farisekî nayê fehmkirin. Em jî nikarin îdfîa bikin ku ev edebiyat edebiyata me ye. Lewra em jî vê edebiyatê fehm nakin. Gelo bê zimanekî em dikarin bibin neteweyek? Na, lewra gelê me xwediyê zimanek e ku jê fehm dike. Hingê divê em zimanê xwe yê edebiyatê û zimanê wan cih biguherînin, ji xeynî wî zimanî zimanekî neteweyî biafirînin.”¹⁸

Kurdiyê Bitlîsî (Yuzbaşî Emîn Beg) di nivîsa xwe ya “Kürdçeye Daîr” de, li ser têkelî û giraniya zimanê klasîk sekiniye û ji bo zimanekî hevpar û xwerû bal kişandiyê ser “axaftina gel” ku wiha nivîsiye:

“Ji hêla helbestvan û edîben kurd ve dîwan, helbest û malikên nivîsandî û hinek kitêben ku bi neesasî hatine berhevkirin jî hene. Digel ku awarteyê wê hene jî, hema hema hemûyên van dîwan û helbestan ji aliyê bikaranîna xwe ya dem û derdorê ve zimanekî têkel û xerf e ku bi peyvên erebî û farisî tije ye û pirr dîrî zimanê gel e ku zimanê resen ê neteweyê ye. Tevî ku destjêgerîna ji hebûna wan ne mimkûn be jî sûda ku dê ji van berheman were girtin bisînor e.”¹⁹

Di vî warî de pêşniyazên wî sûdwegirtina ji *gencîneya resen* a di nava gel de ye:

“Îro bi giştî qaîdeyek heye tê qebûlkirin ku zimanê xwerû yê neteweyê, zimanê girseyê ye, ne yê rewşenbîran e, bi taybetî jî ew zimanê ku pîrejin pê diaxivin. Ji ber vê yekê ez jî dixwazim ku di berhevkirina keresteyên ziman de bila usûl û peyvên awamê esas bin. Ev gencîneyeke resen e...”²⁰

Nivîskarên Tanzîmatê ji bo ku edebiyateke bi zimanê resen ê tirkî biafirînin ku bi tesîrên biyanî nehatibe têkelkirin, berê xwe dane folklor û edebiyata tirkî ya gelêrî.²¹ Di navbera salên 1860 û 1900î de gelek rewşenbîr, nivîskar, helbestvan, romannûs di bin vê cereyanê de berhem afirandin. Şinasi di sala 1859an de yekem şanoya tirkî ya bi navê “Şair Evlenmesi” bi “İsan-i avam” (zimanê gelêrî) nivîsand. Em dibînin ku Evdirehîm Rehmiyê Hekarî jî yekem şanoya kurdî “Memê Alan”, bi zimanekî sade nivîsiye û li ser wê îbareyeke wiha daniye: “Tiyatroya kurdan fezîleta kurdan noşî didit”.

Şinasi, di sala 1863yan de *Durub-u Emsal-i Osmaniye* weşandiye.²² Rewşenbîrê kurd Law Reşid (Dr. Ziya Wehbî) di kovara Jînê de bi navê “Kürdlerde Durub-ı Emsal” (Gotinên Pêşyan ên Kurdan) weşandiye.²³

M.Öcal Oğuz û yên din, *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı*, Weşanên Grafiker, Ankara, 2012; Arzu Öztürkmen, *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik*, Weşanên İletişim, İstanbul, 2009, İlhan Başgöz, “Türkiye’de Folklor Çalışmaları ve Milliyetçilik”, (wer. Serdar Uğurlu), *Turkish Studies*, r.1535-1547, 6/3 Summer, Türkiye, 2011.

18 Vgz. Başgöz, b n., r.1536.

19 Kurdiyê Bitlîsî, “Kürdçeye Dair”, Kovara *Jîn*, j. 15., Stenbol, 1919.

20 H.g.

21 Başgöz, b n.

22 H.b., r.23.

23 Law Reşid, “Kürdlerde Durub-ı Emsal” *Jîn*, j.3-4-5-7-8. Stenbol, 1918.

Ahmet Mîthât Efendî ji gotinên pêşyan ên ku Şinasi berhev kirine, kurteçîrok nivîsîn. Abdulhak Hamîd listikeke xwe ji gotinên pêşyan û vegotinên herêmî ve xemiland. Ebu Ziya Tefvîk (1849-1913) li ser meddahiyê yekem car du gotarên zanistî nivîsîne.

Ziya Paşa diyar kiriye ku ziman û edebiyata tirkî ya resen, ên ku di nav gel de ne. Helbest û manzûmên me yê neteweyî hîn jî di nav ozan û gel de zindî ne. Wî bal kişandiyê ser “Aşık Edebiyatı” û ji bo zimanekî xwerû wek çavkanî nîşan daye.²⁴

Bi heman awayî Xelîl Xeyalî Modanî (1865-1965) jî ji bo pêşdebirina zimanê kurdî li ser girîngiya dengbêjan sekiniye. Bi gotina Jusdanis wî yekîtiya ziman û kanoneke neteweyî²⁵ xwestiye:

“Ji bo xwendin û nivîsandinê herfek, li ser tarzek nû elîfbayek, ji bo zanîna temamê zimanê kurdî ferhengê, îlmî halek, tarîxa bav û kalên kurdan û dab û nêrîtên wan, welatê kurdan û adet û tebê wan we mîqdar û navên eşîrên wan, kitêba hesabê, kitêba rêziman, tercemeya halê mezinên kurdan, edebiyata kurdan û navê şairên wan”, ji bo çêkirina van tiştan çiqas kitêbên kurdî heye lazim e ewan bişînin. Ji dengbêjan lawjok û çîrok û qewlêd kurdan pirs bikin û binivîsin û rê kin.”²⁶

Di vê mijarê de Babanzade Îsmâîl Hakkî (1876-1913) ku di serdema pêşî ya desthilatiya Îttihad û Teraqî de wezîrê perwerdeyê bû, ji bo pêşketina kurdan behsa girîngiya zimanekî xwerû û resen ê nivîskî kiriye.²⁷

Baban Abdulazîz di nivîseke xwe de edebiyat û helbesta kurdî ya berê rexne dike. Li gorî wî heta niha di nav edîb û helbestvanên kurdan de “huner ji bo hunerê” dihat afrandin. Lê belê ji niha pê ve dive huner ji bo gel be.²⁸

Rewşenbîrê kurd Abdullah Cevdet (1869-1932), ji ber ku hêsantir e û ew ê di nav zarokên kurdan de rêjeya xwendevaniyê zêdetir bike, bikaranîna elfabeya lafîni pêşniyaz kiriye.²⁹ Kemal Fewzî di kovara *Kurdistanê* de wiha nivîsiye: “Di nav me de dev ji xelkê berdî gel çend ciwanên kurd ji Dîwana Nalî fehm dikin? Lewma îro divê em ligel hemû dijwariyan çanda kurdî berhev bikin, bikin pirtûk û belav bikin.”³⁰

Mehmed Mihrî ku yek ji rewşenbîrên çalak ê wê demê bû di rêzenivîsa xwe ya “Edebiyat-ı Kürdiyeden Bazı Numuneler” (Hinek Nimûne ji Edebiyata Kurdî) de, nivîsiye ku li Stenbolê gelek rewşenbîr hene ku dibêjin gelo ma edebiyata kurdî heye? An jî zimanê kurdî têra edebiyatê dike? Lewma ez ê jî ji bo bersiva van pirsan ji edebiyat û stranên gelêrî yê zaravayên kurdî, goran û kurmanc çend xezel, beyt,

24 Pertev Nailî Boratav, *Folklor ve Edebiyat-1*, Weşangeriya Adam, Stenbol, 1982

25 Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernite ve Estetik Kültür*, Metis, r.60.

26 M.X.(Xelîl Xeyalî), “Ziman”, *Rojî Kurd*, j.3, 1913.

27 Babanzade Îsmâîl Hakkî, “Kürtlerin Tealisi”, *Rojî Kurd*, j.3, Stenbol, 1913.

28 Baban Abdulazîz, “Edebiyatımız ve Edeplerimizden Bir Rica”, *Rojî Kurd*, j.4., Stenbol, 1913.

29 Abdullah Cevdet, “Bir Hitap”, *Rojî Kurd*, j.1., Stenbol, 1913.

30 Malmisanij, *Bütünlü Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri*, Stockholm, 1993, r.90.

stran, goranî, lawje, heyranok, lawik û bêrîteyan binivîsim û wergerînim û di rûpelên kovara *Jînê* de pêşkeşî xwendevanan bikim.³¹ Di dawiya nivîsê de di bin sernavê “Kurmanc Şivesi Üzerine Avama Mahsus Istran” de straneke kurdî ya gelêrî weşandiye. Ji nimûneyên wî diyar dibe ku li nik helbesta klasîk, wî qîmet daye berhemên gelêrî jî.

Li vir helwestên rewşenbîrên tirk û kurd ên li hember edebiyata kevin jî tam ne wekî hev e. Wek Remezan Alan jî temas kiriye, li gorî rewşenbîrên tirk di nav rewşenbîrên kurdan de li hember edebiyata klasîk helwesteke neyênî xuya nabe.³² Lê belê di nav rewşenbîrên kurdan de jî daxwaza zimanekî nû û çêkirina kanoneke neteweyî heye. Modernbûn li ser rediyeya yên berê ava dibû: yê modern an xwe ji rabirdûyê qut dikir, an jî îspat dikir ku layiqê wê ye. Lê belê mîrasa klasîk ku wek utopyayê serdemî dihat dîtîn, li gorî îcaba pênaseya xwe, ne ew tişt bû ku serî li ber bihata hildan, tenê tiştêkî bêrîkirinê (an xwezîlêanînê?) bû.³³ Lewra di nivîsên rewşenbîrên wek Abdullah Cewdet, Xelîl Xeyalî, Babanzade Îsmâil Hakki, Kurdiyê Bitlîsî û Kemal Fewzî de kêma zêde daxwaza zimanekî xwerû û gelêrî heye.

Hişmendiya Welat û Neteweyê

Di dawiya sedsala XIX. de bi qasî Panslavîzm, Helenîzm û Tirkîtyê, tevgerên neteweyên wek ermen, bulgar û sirban jî di warên çalakîyên çandî de gelek pêş ketibûn. Herwiha gelek ji van xwendingeh û komele vekiribûn. Li gorî Öztürkmen di encamê de ev hemû di nav sînorên Osmanî de dijîyan yanî bi wateya fireh ev “rewşenbîrên osmanî” bûn ku tesîr li ser hevûdu çêdikirin.³⁴ Öztürkmen qet behsa kurdan nake ku mirov dibêje qey li ser vê yekê sondxwarî ye. Dema ku em li rewşenbîrên kurdan ên wê demê dinihêrin, wan jî daxwaza belavkirina zimanê kurdî, nûkirina elfabeyê, berhevkirina keresteyên folklorî yên kurdî, amadekirina pirtûkên kurdî, avakirina xwendingehên kurdî kirine. Heta hin ji van jî pêk anîne. Helbet em baş nizanin xebatên wiha bê ka çi tesîr li ser gelê kurd kiriye. Lê belê neteweperweriya kurdî hem ji tevgera neteweyî ya ermenan, hem jî ji rikberiya siyasetên dewleta Osmanî û rûsan tesîr girtiye ku wan dixwest kurd û ermenan bera hev bidin. Herwiha tevgera mixalefetê ya li dijî II. Abdulhamîd jî tesîr li ser kurdan kiriye.³⁵ Fewzî, di kovara *Kurdistanê* de behsa hestên neteweyî dike, gelo bi lavijên neteweyî yên Xrîsto Botev neketina çoş û hêcanê, Bulgaran ew ê karîbûna di navbera 30-35 salan de civaka xwe nû bikira.³⁶

31 M.M. (Mehmet Mîhrî), “Edebiyat-ı Kürdiyeden Bazı Numuneler”, *Jîn*, j.2., Stenbol, 1918

32 Remezan Alan, *Folklor û Roman*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013, r. 46-47.

33 Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, Metis, Stenbol, 1998, r.107.

34 Öztürkmen, b.n., r. 21.

35 Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbakir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, r.11., Vate, Stenbol, 2010.

36 Malmîsanij, *Bitlisli Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri*, Stockholm, 1993, r.90.

Lê belê piştî hilweşîna dewleta Osmaniyan û avabûna Komara Tirkiyeyê, ev hewldan û xebat jî li Stenbolê nivco mane.

Erkeke neteweyî: Eleqeya li ser kok û dîrokê / Gazindên hevpar: Çima em nayên dîtin?

Li gorî Abdullah Cevdet eger neteweyek ne xwedî dîrokeke nivîskî û birêkûpêk be, ew netewe herwekî qet nejiyabe. Herwiha Cevdet dipirse gelo ji bo dîroka kurdan em dikarin qîma xwe hew bi pirtûka *Şerefnameyê* bînin. Li gorî wî *Şerefname* têra vê yekê nake. Divê kurd hay ji rabirdûya xwe hebin ku bikarin dahatûya xwe jî diyar bikin. Divê em li xwe mukir werin ku pirtûkeke me ya dîrokê nîne ku şayanê vê serdemê be.³⁷

Li gorî Köprülü, têkiliya folklorê ya bi neteweperweriyê re tenê bi welatperweriyê girêdayî nîne. Zanyariyên folklorî ji bo rêveberên siyasî di heman demê de zanyariyeke bikêrhatî ye jî. Li gorî Köprülü, dewletên mêtînger ji bo rêvebirina mêtîngehan, zana û lêkolînerên xwe dişînin wan deran. Ew, demeke dirêj di nav wan gelan de dijîn, dîrok, adet, bawerî, ziman, stran û çîrokên wan dicivînin, tomar dikin. Di vî warî de qasî zanistên din, folklor jî xizmeta wan dike. Köprülü gazindên xwe jî wiha tîne ziman: “Lê belê em wiha nakin, gelo me heta niha li bajarên herî nêzîk ên Anatolyayê jî lêkolînên folklorî kirine?”³⁸

Köprülü vê mijarê wekî erkeke neteweyî dibîne. Li gor wî danasandina folklorê tirkî bi zanayên Rojavayî re berpîrsiyariya rewşenbîrên tirk e. Xebateke bi vî awayî ji bo neteweya tirk belkî xizmeta herî mezin e.

Rewşenbîrê osmanî Selim Sırrı Tarcan di gotara xwe ya bi navê “Mürebbliler Arasında Folklor” (Di nav Mirebiyan de Folklor) de lêkolînên li ser folklorê tirkî wiha teşwîq dike:

“Ey tirkê serbilind ku di dema xwe de li ser sê parzemînan hukimran bû! Ey lehengê fedakar ku navê te destan bû li Rûmêf, Asya û Anatolyayê!.. Deşt û çiya û kanî, derya û daristanên te çi qas menqibeyên mîrxasiyê vedişêrin. Çîrok û serpêhatî, stran û reqsên te bi camêrî û fedakariyan tijî ne. Folklorê herî meraqdar a cihanê li diyarê tirkan peyde dibe. Hezar caran radimûsim destên ku ew ê wê binivîsin.”³⁹

Kurdiyê Bitlîsî jî nêzî van ramanên Tarcan, gazindan ji kêmbûna lêkolînên li ser kurdan dike û vê erkê dixwe ser milên nişînan dahatûyê:

“Kurd û Kurdistan heta niha meçhûl mane. Karakterê kurdan, rewşa siruştî ya Kurdistanê, kêmbûna wasitayên pevragehandinê bûne sedem ku herêmen ku kurdîti lê desthilat e baş neyên zanîn. Hûn ji vê bawer bikin ku destên ku ew ê perdeya nezaniyê ji ser kurd û Kurdistanê rakin ew ê ne destên biyaniyan be. Ev şeref dê aidê zarokên kurdan ên dahatûyê be ku ew dê bi zanistên nûjen re bêne xemilandin. Ev peywîr a wan e.”⁴⁰

37 A.Cevdet, h.g.

38 Vgz. Öztürkmen, h.b., r.32.

39 Vgz. Öztürkmen, b.n., r. 33.

40 Kurdiyê Bitlîsî, “Kürdler Münasebetiyle”, *Jîn*, j.2., 1918.

Hîn di salên 1918yan de di hinek weşanên tirkî de înkarkirina kurdan dest pê kiriye. Ji aliyê weşanên Mühacirin Müdüriyeti (Rêveberiya Koçberan) bi navê *Kürdler pirtûkek hatiye weşandin ku tê de nivîsiye koka kurdan nayê zanîn. Di kovara *Jîn* de Kurdiyê Bitlîsî xwestiye bersiva wan bide.⁴¹ Di nivîsa xwe ya bi navê “Efsaneya Dehak” de behsa serhildana Kawa kiriye. Bitlîsî gazindan ji lêkolîneran dike ku çi li Rojava, çi li Rojhilat li ser kurdan kêr xebat hatine kirin. Xebatên ku hatine kirin jî ne cihê baweriyê ne, kêr û şaş in, di wan de gelek xeletî hene. Di encamê de dibêje ku Kurd neteweyeke Îranî ne û ewên ku li dijî Dehak serî hildane kurd in.⁴² Di jimareyên din de jî li ser vê mijarê rawestiyaye. Bi vê yekê xwestiye hebûna kurdan di dîrokê de bide nîşandan û eger hinek hêz bixwazin kurdan tune bikin, dê kurd berxwedaneke bihêz nîşan bidin.*

Memdûh Selîm Beg jî bi nivîsa xwe ya “Roja Kawe ya Taybet-31ê Tebaxê” li ser bûyera Kawa sekiniye.⁴³ Ji bilî van nivîskaran di hejmara 25an de nivîseke bînasnav a bi navê “Der barê Kawe da Meteloka Dîrokî” weşiyaye.⁴⁴

Memdûh Selîm di nivîsa xwe ya bi sernavê “Mijara Tesbîtkirina Rojên Me yên Taybet” de behsa pêdiviya rojên taybet dike, dibêje ku rojên taybet rojên coşbûnê ne. Şahî, aheng, kenînên hevpar hem mafê neteweyan e, hem erkên wan e. Di van rojan de fersenda têgehîştina hebûna xwe heye, mirov ji xemên rojane bêtir bi kesayeta bilind a neteweyî re eleqedar dibin. Ruhê neteweyî di van rojan de xuya dibe. Herwiha rexneyên rewşenbîrekî ewropî li ser kêmbûn û nediyarbûna rojên taybet ên kurdan jî vediguhezîne, divê rojên taybet ên neteweyî ên kurdan bêne diyarkirin. Divê der barê rojên taybet de hişmendiyeke xurt hebe. Divê em xwe bizanin û bi yên din jî bidin zanîn. Li gorî wî, ev yek ji bo ku em wekî neteweyekê bijîn pêwîstiyeye misoger e.⁴⁵

Mehmet Sakîn ji *Encyclopedia Britanicayê* wergerek kiriye. Ev werger kurteya xala “Dîroka Kurdan” e. Li ser dîrok, bawerî, ziman û edebiyata kurdan agahiyan dide. Behsa xebatên Jaba, Samuckhea, Prym, Socîn, Ferdînad Justî dike û dibêje vana gelek çîrok û destanên kurdî berhev kirine.⁴⁶

Kurdiyê Bitlîsî, di wergera ji Henrî Mathieu de li ser nijad, bawerî, dab û nêrît, binyada civakî agahiyên kurt dide.⁴⁷ Dîsa nivîseke wî li ser nîqaşên *iranîbûna* kurdan e. Li vir îtîrazên wî hene li hember îdiayên ku dibêjin kurd Samî an Tûranî ne.⁴⁸ Di vê peywendê de ew ê bê bîra me ku yewnaniyan ku di navbera “modela Antîk” û

41 Kurdiyê Bitlîsî, “Dehak Efsanesi”, *Jîn*, j.1., Stenbol, 1918.

42 h.g. j.1.

43 Memdûh Selîmbeg, “Kawe Yewm-i Mahsusu-31 Ağustos”, *Jîn*, j.25., 1919

44 ?, “Kawe Hakkındaki Tarihi Fıkra”, *Jîn*, j.25.

45 Memdûh Selîmbegî, “Eyyam-ı Mahsusamızı Tesbit Meselesi”, *Jîn*, j.16., 1919.

46 Mehmet Sakin, “Kürd Tarihinden, Asar-ı Kadimesi”, j.11., Stenbol,

47 Kurdiyê Bitlîsî, “Kürdlere Dair”, *Jîn*, j.13, Stenbol, 1919.

48 Kurdiyê Bitlîsî, *Kürdler İrani Değil midir?*, *Jîn*, j.18, Stenbol, 1919.

“modela Arî” de di erênayê de mabûn, piştî şikestina şerê serxwebûnê, modela Arî hîlbijartin.⁴⁹

Di mijara dîroka kurdan de nivîseke balkêş, a Şîlanlızade Eyub Sabrî ye ku bi referansên berhemên lêkolînerên biyanî yên wek Henry Binder, Emilie Hamlin, Mösyö Reklos, û ji pirtûka dîrokê ya “Faste de la Nation Kourde” nivîsiye ku kurd neteweyeke dîrokî û qedîm in.⁵⁰

Kemal Fewzî (1891-1925), di kovara *Jînê* de rêzegotarek li ser çîrçîrokên kurdan nivîsiye. Di pêşkêşiya gotara xwe de Fewzî behsa têkiliya dîrokê bi çîrçîrokan re kiriye. Di gotara wî de nêrîneke antropolojîk heye. Li gorî wî eger mirov li destan û çîrçîrokên neteweyekê binihêre mirov dê bikare hin rastiyên dîrokî yên seretayî yên wê neteweyê ronî bike. Bes ku xebat bi rê û rêbazên zanistî bin. Li vir bandora xebatên folklorê yên rojavayî êşkere ye. Li gorî wî mirov nikare qîma xwe tenê bi dîtînen dîroknasan bîne. Lewra ew dikarin di hin waran de xwedî nêrînen subjektîf bin.

Fewzî behsa taybetiyên efsaneyan dike. Li gorî wî bingeha hemû efsaneyan yek e.

“Çawa ku hin netewe ji aliyên ziman, rewşa civakî û adetên civakî de dişibin hevûdu, herwiha çîrçîrokên wan jî dişibin hevûdu. Ev jî nişan dide ku hemû mirovatî ji heman kokê ve derketine û veqetiyane li ser şaxên curbicur. Ji ber vê yekê tu efsane tune ye ku ne melez be. Çawa ku gelek efsaneyên ereban ji efsaneyên farsî îlham girtine, di efsaneyên yewnanî yên kevin de gelek baweriyên pûç ên rojhilatê hene, ew efsaneyên ku îro di edebiyata erebî de di cihekî bilind de ne.”

Fewzî mîtolojiya kurdî bi ya cihanê berawird dike û têkiliyên di navbera wan de lê dikole. Ji aliyê berawirdkirina berhemên edebiyata gelêrî ve ev yek gelek balkêş e.

“Jixwe Tîtanên ku di xurafeyên yewnanan de hene ku rojhilatî ne, ew çî bin. Hûtên heftserî yên di çîrçîrokên kurdan de jî ew in. Em dikarin bibêjin ku xurafeyên kurdan, ji ber ku rojhilatî ne, ji yên din kevintir in û bêguman îlhama xwe jî, ji wan negirtine. Çêdibe ku di navbera wan de hin wekhevî hebin. Lê belê ne ku kurdan jî ta ji demên pêşî bi hin tiştan bawer nedikirin. Helbet Kea, Rea, Hîra, Apollon, Mînrew û Zeûsê wan jî hene. Lê belê ya girîng ev e ku divê mirov vana ji xurafeyên kurdan der bixe, têxe bin çavênîya zanistê.”⁵¹

Modelên şaristaniyê û girîngiya perwerdeyê: Tirkî û kurdî

Li gorî Ziya Gökalp “xelqiyat” ew zanist e ku li ser şaristaniya manewî lêkolînan dike ku qaydeyên wê ne nivîskî ne û tenê bi riya devkî ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin. Li gorî hizra wî du şaristanî hene: “şaristaniya fermî”, “şaristaniya gelêrî”. Di nav tirkan de li gorî neteweyên din di navbera van her du şaristaniyan de cudahiyeke mezin heye.

49 Jusdanis, h.b., r. 55.

50 Şîlanlızade Eyüb Sabrî, “Kürdler Tarihi Bir Miletir 1-2”, *Jîn*, j.17-18.

51 Kemal Fewzî, “Kürd Masalları”, *Kovara Jîn*, j. 22., Stenbol, 1919.

Mehmed Fuad Köprülü dema ku təkiliya di navbera folklor û neteweperweriyê de rave kiriye, bi qasî çekên şer behsa girîngiya xebatên çandî jî kiriye. Li gorî wî dema ku neteweyên Balkanan, Rûmelî di navbera xwe de parve dikir, wan ne tenê bi çekan, herwiha bi belgeyên dîrokî, zimanî û însanî ve jî xwe amadeyê vê yekê kiribûn.⁵² M.Salih Bedirxan jî di nivîseke xwe ya bi navê “Berî Şûr Qelem” de li nik şûr girîngiya pênuşê yanî perwerdeyê anîye ziman. Divê kurd tenê bi erd û şûr re girêdayî nemîne, di heman demê de dest û serên ku wan erd û şûran bi rê ve dibin li gorî vê çaxê divê xwe bi zanist û îrfanê bipêçin.⁵³

Di beyana Komeleya Hêvî (Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti) de di vî warî de tesbîtên wiha hene:

“Em îro qenc bizanin ku di dewra ha da bi tufenk û şûr û xencer miletek najî, ber wan ‘ilm û sin’et lazim e. Îro her miletek di ‘ilm da, di sin’et da, di danûstan da, di cotyarî da bilind bûye û pêşve çûye û roj bi roj wekî birûsk diçe. Em ji bo gihana wan lazim e ku wekî berq û birûsk bixebitin bi şev û roj nesekinin.”⁵⁴

Evdirehîm Rehmiyê Hekarî jî di nivîsa xwe ya “Şerê Topan Xilas Bû, Îro Şerê Qeleman e” de behsa vê mijarê dike.⁵⁵

Babanzade İsmail Hakki behsa komeleya fransî “Alyans Fransez” û komeleya Cihûyan a “Alyans İsrailî” dike û di mijara perwerdeyê de wan wekî model nîşan dide.⁵⁶

Abdullah Cevdet, nivîsiye ku kurd û ermen li nik hev dijîn. Gelê ermen li gundên xwe Şekspir, Hamlet, Makbet, Jul Sezar, Qral Lîrê dixwînin. Li gundên ermenan pirtûkên kesên wek Alfîrî, Dante, Montesku, Darwîn bi zimanê ermenî tîn xwendin. Cevdet di vî warî de kurdan bêpar dibîne û rexneyan li hikûmetê digire.⁵⁷

Memdûh Selîm di nivîsa xwe ya “Jinên Kurd” de behsa girîngiya rola jinan di civakê de dike. Di civakên medenî de jin bi rastî jî nivê civakê ne. Mafên wan jî bi qasî yên mêran in. Piştî Li ser girîngiya perwerdeya jinan disekine.⁵⁸

Ew di nivîsa xwe ya bi navê “Di Kurdîtiyê de Cereyanên Pêşketinê” de jî li ser mijarên şaristaneyê çawa disekine. Li gorî wî, Kurdîtiya ku nûjenbûn li ser wê ferz e, dê ne li derveyî qaîdeyên giştî be. Kurdîtî jî dema ku nûbûnên li gorî pêdiviyên şaristaniyê nepejirand (...) ew ê qurbanan bide. Selîm tercîha xwe jî bi awayekî eşkere diyar dike:

“Em razên hêzên cihangiştî yên îro ku çavkaniya wan Ewrope û Amerîka ne, fehm dikin û êdî em dizanin ku cereyanên ku ji wan alîyan tîn ne bayên jehrî ne, bayên jîyanê ne.”⁵⁹

52 Vgz. Öztürkmen, b n., r.31.

53 M.Salih Bedirxan, “Berê Şîrê Qelem”, *Rojî Kurd*, j.3.

54 *Hetawî Kurd*, j. 4-5, r. 11-14.1, Stenbol, 1914.

55 Ebdurehîm Rehmiyê Hekarî, “Şerê Topan Xilas Bû, Îro Şerê Qeleman e”, *Jîn*, j.7.

56 Babanzade İsmail Hakki, “Kürdlerin Tealisi”, *Rojî Kurd*, j.3., 1913.

57 Cevdet, “İttihad Yolu”, *Rojî Kurd*, j.2., 1913.

58 Memdûh Selîmbegî, “Kürd Hanımı”, *Jîn*, j. 14.

59 Memdûh Selîmbegî, “Kürdlükte Terakki Cereyanları”, *Jîn*, j. 17.

Li gorî Memdûh Selîm, di demeke kurt de kurd miseît in ku bikarin şaristaniyeke bilind bipejirînin û geşedaneke gelek xurt jî pêk bînin. Ji nivîsên van rewşenbîran jî xuyaye ku modela şaristaniyê Rojava ye.

Helwest û metodên zanistî

Herwekî tê zanîn di xebatên folklorî de yek ji aliyên rêbaza zanistî nîşandana çavkaniyan e. Mela Mehmûdê Bazîdî di serê çîroka xwe ya *Mem û Zînê* de navê Ehmedê Xanî bi bîr tîne û wekî çavkanî nîşan dide:

“Ji şairê di kurmancan, bi zimanê kurmancî, di tarîxa hezar û şeş sedî da di qeseba Bayezîdê da, hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telif kiriye bi wezn bi navê Mem û Zînê, aşiq û maşuq, li wechê muxteser beyana wan dîke.”⁶⁰

Bazîdî di berhema xwe ya bi navê *Camieya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* de di rêza sî û çaran de behsa destana Dimdimê dîke û dibêje Melayê Bateyî ev ji meclîsan wergirtiye û bi awayê menzûm nivîsiye. Di dawiya çîrokê de navê Melayê Bateyî bi vî awayî bi bîr tîne:

“Êdî ji wê rojê heta niha jî Kela Dimdimê wesanê xalite el-xaliye xerabe dimîne. Êdî ava nebûyî, eve qezya şerê Kela Dimdimê qewî meşhûr û me’rûf e di Kurdistanê da. Melayê Bateyî M.H. li vê qîseyê muezun dastanek însa kiriye, ekserê ekradan wê destanê di meclîsan da dixwînin û ji boyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirînin û duayê dikin.”⁶¹

Ji aliyê mijara nîşandana çavkaniyan ve ev gelek girîng in. Lewra hem nîşaneyên hebûna tradîsyona nivîsînê ya bi zimanê kurdî ne, hem jî bêhna metodolojîyê ji wan tê.

Îbrahîm Şinasi di berhema xwe ya bi navê *Durub-ı Emsal-i Osmaniye* de nêzî du hezar gotinên pêşîyan ên tirkî berhev dîke û der barê çavkanî û kesên çavkanî de agahîyan dide. Li gorî M.Öcal Oğuz ev dikare wekî yekem helwesta zanistî bê şîrovekirin.⁶²

Ziya Gökalp ku berê li ser çand û zimanê kurdî dixebitî⁶³, paşê berê xwe dabû kereseteyên folklorî yên tirkî û ew berhev dikirin. Çend gotarên wî der barê rêbazên berhevkirina çîrokan de hene.⁶⁴ Gökalp di nameyeke xwe de ji Fuad Köprülü re wiha nivîsiye: Ez li vir (Diyarbakir) çîrokên gelêrî berhev dikim. Hêvî dikim ku wan di “Küçük Mecmua”yê de biweşînim. Herwiha ez ê baweriyên gelêrî jî berhev bikim.

60 Xelîl Duhokî, “Mela Mehmûdê Bazîdî” *Gulistan*, j.1., 2002, r.73-84.

61 Mela Mehmûdê Bazîdî, *Camieya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avcı, Weşanên Lîs, Stenbol, 2010, r.117.

62 M.Öcal Oğuz, b n., r.17.

63 Di vî warî de nivîseke Kemal Fewzî heye ku rexneyên tund lê digre û ew bi tirkîkirina çîrokên kurdî sîcdar dîke. Li gorî Fewzî, Gokalp çîrokên kurdî wek çîrokên *Dede Korkut* ên tirkî nîşan dide. Bnr. Kemal Fewzî, “Kürd Masalları”, Jîn, 1919.

64 “Usullere Dair: Halkiyat I. Masallar”, *Küçük Mecmua*, 1922; “Masalları Nasıl Toplamalı?”, *Halk Bilgisi Mecmuası*, 1928.

Em li Diyarbekirê stranên antîk ên gelêrî jî berhev dikin. Herwiha ez li ser eşîrên tirk, ereb û kurdan jî lêkolînên etnografîk dikim û hêvî dikim ku muzeyeke biçûk a etnografîyê ava bikim.⁶⁵

Siyasetmedar û rewşenbîrê kurd Kemal Fewzî jî di rêzenivîsên xwe yên bi sernavê “Kürd Masalları” yên kovara *Jînê* de behsa rêbaza berhevkirina çîrokên kurdî kiriye. Fewzî behsa xetereyên jibîrkirin û windabûna efsaneyên kurdî dike û vê yekê wekî xetereyeke mezin dibîne. Behsa ihtimala varyantan dike û vê yekê normal qebûl dike. Piştî jî rêbaza xwe eşkere dike: Di dema berhevkirinê de kesên çavkanî jê re çawa gotibin, ew ê jî bi wî awayî tomar bike.

“Wek her tiştên wê, wan efsaneyên rind û şîrin ên vê neteweya bêçare jî di bin xweliya jibîrkirinê de mane. Ez tiştên ku dibihîzim, bêyî ku tiştê ji xwe li ser zêde bikim bi wî awayî vediguhezînim. Ne dûrî ihtimalan e ku ev efsane di demên cuda de û li deverên cuda teşe guhertibin. Heman çîrçîrok li devereke kurdan bi awayekî din dikare bê vegotin. Piştî ku bingeh yek bin, di hûrgiliyan de tu mehzûr nîne...”⁶⁶

Kemal Fewzî, di dewama vê de wiha nivîsiye:

“Bi qasî ku ez bizanim û bikarim, ez ê efsaneyên Kurdan di rûpelên *Jînê* de li ber çavên însaf û lêkolana efsanezanan daynim. Belkî di van nivîsaran da, bêînsafiya wî nankorê Diyarbekirî jî derkeve meydanê; ew nankorê ku efsaneyên Diyarbekirê ên xweş guhartine û xistine şiklê çîrokên Dede Korkut.”

Diyar e ku Fewzî rêbazeke zanistî daye ber xwe. Fewzî yekem ji wan kurdan e ku di xebatên folklorê de daxwaza şopandina rêbaza zanistiyê kiriye.

Rıza Tevfik (Bölükbaşı) ku yek ji nivîskarên xurt ên wê serdemê bû, ji nav keresteyên folklorî ew bêtir li ser gotinên pêşîyan^{67*} sekiniye. Lewra li gorî wî mirov bi saya gotinên pêşîyan dikare neteweyekê baştir nas bike. Hetta gotinên pêşîyan li gorî vegotinên dîrokî yên nivîskî bêtir agahî didin.⁶⁸ Li gorî Tevfik, folklor ne tenê gotinên pêşîyan e, çîrokên gelêrî, mamik, destan û stran û listikên gelêrî jî di nav de ne.

Dema ku em li pêşgotina xebata Law Reşîd a bi sernavê “Kürdlerde Durûb-i Emsal” dinêrin, em dibînin ku wî jî tesbîten bi wî awayî kirine.⁶⁹ Wî di dawîya xebata xwe de, beşên din ên folklorê jî rêz kirine. Law Reşîd an bi navê xwe yê rastîn Dr. Ziya Wehbî (1893-1960?) Xwendengeha Bijîşkiyê (Mektebî Tibbiye) qedandiye û bijîşkî kiriye. Ew birayê Kemal Fewzî bû.⁷⁰ Demeke dirêj wî sertebîbiya Nexweş-xaneyê Gumuşxaneyê kiriye. Wehbî, di kovara *Jînê* de bi navê “Kürdlerde Durub-i

65 Vgz. İlhan Başgöz, h.g., r.1539.

66 Kemal Fewzî, “Kürd Masalları”, *Kovara Jîn*, j. 22-23-24, Stenbol, 1918

67 * Peyva “folklor”ê bi osmanî “hikmet-î avam” e ku di çanda osmanîyan de di wateya “durub-i emsal” yanî gotinên pêşîyan de dihat bikaranîn.

68 Vgz. Öztürkmen, b.n., r.28.

69 Law Reşîd, “Kürdlerde Durûb-i Emsal” *Jîn*, j.3, 1918.

70 Me ev agahî ji biraziyê wî Veysi Hizal stendin.

Emsal” li ser gotinên pêşiyên ên kurdan rêzegotarek nivîsiye.⁷¹ Di nivîsa xwe de behsa xebatên Aleksandr Jaba* jî dike û li ser tîkiliya wî ya bi Mela Mehmûdê Bazîdî re hin agahiyan dide. Wehbî, daye zanîn ku gotinên pêşiyên, hem ji aliyê nîşandana asta pêşketina ziman, hem ji aliyê naskirina rewşa gel, xwedî qîmeteke mezin in.⁷² Ew bi rêbazeke sistematîk gotinên pêşiyên ên kurdî wekî Îctîmaî (Civakî), Hamasî (Mêrxasî), Edebî, Hukmî (Darazî), Mîzahî (Pêkenokî), Tarîhî (Dîrokî), Efsanewî, Aîlevî (Malbatî), Ziraî-Rasadî (Çandinî-Azmûnî), Hadîsewî (Çîrokî) li gorî naveroka wan dabeş dike û digel kurdiya wan wergerên wan ên tirkî jî dide. Ziya Wehbî di dawiya vê xebatê de wiha nivîsiye:

“Me berê jî gotibû, ji tertîb û neşirkirina van gotinan meqsed ew e ku *xizmeteke zanistî* û *xîreke neteweyî* jê hasil bibe. Herwiha ji ber ku gotinên pêşiyên xwedî naverokeke hêja ne, ew ji bo danasandina neteweya kurdan ji bo dost û biyaniyan jî bi kêr tîn.”⁷³

Yanî rasterast behsa rêbaza zanistî dike. Xaleke din a balkêş jî ev e ku Law Reşîd ji xeynî gotinên pêşiyên balê dikişîne ser beşên din ên folklorê wek “edebiyata kurdî, muzîka kurdî, reqşên kurdî, xeml û cilûbergên kurdî. Yanî xebatên li ser beşên din ên folklorê kurdî jî pêşniyaz kiriye.

Kurdiyê Bitlîsî Di nivîsa xwe ya “Kürdler münasebetiyle” de li ser nijada kurdan û diyar kiriye ku di diyarkirina kokên neteweyekê de li gorî hinek lêkolîneran dab û nêrît, vegotinên dîrokî, nezîkahiya zaravayan, hevşibiyên fîzyonomî û karakterî girîng in, li gorî hinekan jî sazîyên zindî yên wekî jiyana eşîrî û malbatî, edebiyat, fehma exlaq û aboriyê girîng in. Li gorî wî ev hemû heta radeyekê rast in, lê belê ya herî girîng ew e bê em di berçavkên xwe de xwe çawa dibînin. Bitlîsî piştî dibêje ku li gorî van esasan em li ser neteweya kurdî lêkolînan bikin. Ew behsa xurafe/efsaneyên kurdî dike û dibêje ev xurafeyên gelêrî nehatine berhevkirin:

“Wek hemû neteweyên îslamî, xurafe/efsaneyên neteweyî yên kurdan jî hene. Lê belê divê em van bikin du beş. Yên berî îslamê û yên piştî îslamê. Ji ber ku yên piştî îslamê hem di demeke kurt de ne û hem ji ber tesîra ereban, ne guncan in ku em li ser wan bisekinin. Hingê di destê me de hew yên berî îslamê dimînin. Gelo ev xurafeyên ku di nav gel de belav bûne hatine berhevkirin?”⁷⁴

Kurdiyê Bitlîsî jî bo xebatên meydanî şertên pêwîst wiha rêz kirine:

“Ji bo zanîna efsane û adetên neteweyekê, gelek şert û mercên pêwîst hene. Herêmen ku ew gel lê dijîn divê bi salan mirov lê bigere, demeke dirêj di nav wan de bimîne, hezkirina wan peyde bike da ku mirov bikare têkeve nav malbatên wan, zimanên wan baş bizane, ji bo lêkolîneke bingehîn ev şert û merc pêwîst in.”

71 Bnr. Law Reşîd, “Kürdlerde Durûb-î Emsal”, *Kovara Jîn*, j. 3-4-5-7-8, Stenbol, 1918

* Law Reşîd wî wek “Iskender Jaba” nivîsandiye.

72 Law Reşîd, “Kürdlerde Durûb-î Emsal”, *Kovara Jîn*, j. 3, Stenbol, 1918

73 Law Reşîd, “Kürdlerde Durûb-î Emsal”, *Kovara Jîn*, j. 8, Stenbol, 1918

74 Kurdiyê Bitlîsî, “Kürdler Münasebetiyle”, *Jîn*, j.2., Stenbol, 1918.

Di nivîsê de ew li ser karê berhevkirinê jî sekiniye û çend xal wiha diyar kirine:

“Çi exlaqî, çi derveyê exlaqê bin, divê hemû gotinên pêşiyar werin berhevkirin û nivîsîn. Çi exlaqî, çi derveyê exlaqê bin, divê hemû çîrok, çîrçîrok û xurafeyên gelêrî bi awayên ku tînan gotin werin berhevkirin. Mijarên wan çi dibin bila bin beyt û hemû cureyên helbestên ku di nav zimanê gel de hene, werin berhevkirin û lêkolandin...”⁷⁵

Di vê mijarê de pêşniyazê wî ji “Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti” (Komeleya Kurd Ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan) re heye ku dibêje bila “lijneyeke ziman” were avakirin û herçi kesên ku gotinên pêşiyar ên ku nehatine qeydkirin berhev bikin û digel çîrokên wan binivîsin, bişînin û lijneyê, divê ew bi pereyekî mezin werin xelatkirin.

Xebatên folklorê yê dezgehî

Muzeya yekem a Osmanî di sala 1846an de li Stenbolê ava bû, di sala 1869an de wekî Müze-i Humayun hate binavkirin. Di muzeyê de gelek berhemên gelêrî dihatin pêşandan.⁷⁶ Ev sazî, yek ji tesîra modernîzmê ya Rojavayê bû li ser guherîna fehma osmaniyan. Lewra bi qewlê Anderson, muze jî ew hêza tesewira ku muzeyan çêdike jî bi awayekî xurt siyasî ye.⁷⁷

Herwekî tê zanîn di sala 1908an de rêxistina Îtîhad û Terakî bû desthilatdar. Di vê serdemê de xebatên çandî di bin banê weşan û saziyên wek “Türk Derneği” (1908), “Genç Kalemler”, “Türk Yurdu Cemiyeti” (1911) û “Türk Ocakları” (1912) de dewam kir. “Türk Derneği” (Komeleya Tirk) di sala 1908yan de tê dameziran-din. Vê komeleyê girîngî dida lêkolînên ser ziman, dîrok, etnografya û etnolojiya komên etnîk yê tirk. Weşana wan a bi navê “Türk Yurdu Dergisi” (Kovara Welatê Tirk) dixwest ku tirkîya osmanî xwerû û resen bike û herwiha elfabeyê jî bi tîpên nû biguherîne. Herwiha komeleyê şaxên xwe teşwîq dikir ku stranên gelêrî, gotinên pêşiyar, çîrokên gelêrî berhev bikin, der barê dîroka malbatên mezin ên tirkî de lêkolîn bikin, li ser derman û bijîşkiya gelêrî xebatên meydanî bikin.

Di sala 1912yan de “Türk Ocakları” (Oxên Tirk), bêtir bi aliyê xwe yê nijadperestîya tundrew li pêş bû. Di bernameya xebatê ya vê saziyê de berhevkirina dab û nêrîtan, komkirina çîrok, gotinên pêşiyar, stranên gelêrî, lêkolînkirina zaravayên cuda, şayesandina reqsên deverî û lêkolînkirina der barê mezheb û komên koçeran de dihatin teşwîqkirin. Herwiha dihat pêşniyazkirin ku her şaxek ji bo pêşangehên sinet û zenaetê bila muzeyê “hars”ê (çand), ji bo pêşangeha keresteyên tradîsyonî û navgînên çandîyê muzeyê “îrk”ê (nijad) damezirîne.⁷⁸ Li jorê jî me nivîsîbû, berî van Ziya Gökalp jî di nav hewldana avakirina muzeyê etnografîyê de bû.

75 H n.

76 Vgz. Öztürkmen, h.b., r.24

77 Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler*, Metis, Stenbol, 1995, r.198.

78 Öztürkmen, h.b., r.51.

Di heman serdemê de hinek saziyên kurdan jî behsa pêwîstiya damezirandina muzeyekê kiriye. Di sala 1912an de “Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti” (Komeleya Hêvî) hatibû damezirandin. “Komeleya Hêvî” herçend di beyannameya xwe de behsa girîngiya ziman û edebiyata kurdî dike jî, ji bo komeleyê ev xal ne armancên rasterast in, an jî em dikarin bibêjin ku fehm û hişmendiya folkorê tê de zêde xuya nabin. Piştî “Hêvî”yê, “Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti” (Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan) di sala 1919an de li Stenbolê hatiye damezirandin. Komele dixwaze ku gelek xebatên çandî, civakî û perwerdeyî bike. Damezirînerên komeleyê di wê baweriyê de ne ku rizgarbûna neteweya kurd tenê bi xebatên siyasî ne mumkin e. Divê li gorî bingeheên zanistî xebatên çandî, edebî û perwerdeyî jî bên kirin. Di jimareya 10an a kovara *Jînê* de “Belavoka Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan” hatiye weşandin. Di vê belavokê de dema ku bernameya Komeleyê ya xebatan tên eşkerekirin, li wir çend xalên girîng hene li ser rewşa folkora kurdî. Di bernameyê de li ser berhevkirin û weşandina berhemên folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî tesbîtên balkêş hene. Girîngiya wê ew e ku cara pêşî saziyeke kurdî behsa xebatên folklorî kiriye. Di beyannameyê de xalên ku daxwaza yekîtiya ziman û kanoneke neteweyî dikin ev in:

Xal 2: Ew pirtûk û dîwan û helbestên ku hemî bêjezan û hozan û zanyarên Kurd bi zimanê Kurdî afirandine, komele dê wan bi awayekî rast û bedew bide çapkirin.

Xal 6: Komele dê kovareke gotinên pêşiyên ên Kurdî sererast bike û biweşîne; gotinên pêşiyên ên ku di zaravayên curbicur de tînin gotin, ên her zaravayekî dê di kovarê da beşekî pêk bînin.

Xal 7: Komele dê haydariyên li ser adet û toreyên Kurdî yên her hêlek berhev bike; herwiha, dê çîrok û kurteçîrok û stranên gelî yên Kurdî berhev bike.

Xal 9: Ew pirtûkên ku bi zimanên Rojhilat û Rojava li ser Kurdistane û Kurdan hene, komele dê wan wergerîne û biweşîne.

Xal 10: Kurden naskirî yên berê û niha, komele dê serpehatiyên wan binivîsîne.

Xal 19: Komele dê bixebite ku muzeyekê saz bike; ew muze dê ji tiştên şexsî û yên malan ên ku mîr û pîrekên Kurd bi kar tînin û her tewir alet û edewatên herêmiyê bê sazkin. ⁷⁹

Diyar dibe ku komeleyê bi fehmeke modern di bernameya xwe de cih daye xebatên folklorî û li ser girîngiya wan sekiniye.

Encam

Di vê xebatê de me xwest ku em tesîra modernîzmê ya li ser xebatên folklorî kurdî û tirkî lê bikolin û xebatên her du aliyan ên di vî warî de berawird bikin. Wisa dixuye ku ji aliyê fehm û xebatên folklorê ve di navbera herdu aliyan de hevterîbîyek heye. Lewra daxwazên wek zimanekî xwerû, desthilateke neteweyî, welatekî serbixwe û şaristaniyeke hemdem (Rojavayî) armancên sereke yên wê serdemê ne. Ji ber vê

79 M.Emin Bozarlan, *Jîn*, c.II, Swêd, 1985, r. 489.

yekê fehm û xebat ji gelek aliyan ve dişibin hevûdu. Ji ber ku di nav Împaratoriya Osmaniyan de tirk neteweya serdest bûn, wan berî gişan hay ji pêşketinên Rojavayê çêdibûn. Lewra mirov dikare bibêje ku modernîzm bi wasîteya rewşenbîrên tirk digihaşt aliyê kurdan. Ev yek jî gelekî tabî ye. Jixwe heta serê sedsala XX. ji bo hemûyan têgîna “rewşenbîrên osmanî” dihat bikaranîn. Yanî rewşenbîrên kurd jî li ser osmaniyan dihatin hesabandin.

Folklornasê tirk Dursun Yıldırım, serdemên geşedanê yên lêkolînên folklorê tirkî bi vî awayî dabeş dîke:

“Serdema Veşartî: 1839-1908; Serdema Tirkperest: 1908-1920; Serdema Sentezkar: 1920-1938; Serdema Kovargeriyê: 1939-1966; Serdema Zanistî: 1966 û heta îro.”⁸⁰

Lê belê qonaxên geşedanê yên folklorê kurdî wiha tam ne zelal in. Bi baweriya min di dîroka lêkolînê li ser folklorê kurdî de jî divê serdemên wisa bînin ronîkirin. Ji bo vî jî li ser arşîvan xebateke sistematîk pêwîst e. Herçend di dîroka folklorê kurdî de navê herî girîng Mela Mehmûd Bazîdî be jî ji ber ku cara pêşî di xebatên folklorê de behsa rêbazên zanistiyê kirine divê mirov cihekî taybet bide kesên wek Xelîl Xeyalî, Kurdiyê Bidlîsî (Yuzbaşî Emîn Beg), Memduh Selîmbeg, Kemal Fewzî, Law Reşîd (Dr. Ziya Wehbî) û yên din. Wan di kovarên kurdî yên wek *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd* û *Jînê* de gelek gotar nivîsîne. Ji bilî xebatên xwe yên siyasî em dibînin ku ew di warê folklor û edebiyata kurdî de jî serwest in. Lewra wan di warê tomarkirin, berhevkirin û weşandina berhemên folklorê kurdî de bikaranîna rêbazên zanistiyê pêşniyaz kirine û herwiha li ser girîngiya xebatên berawirdkirinê jî sekinîne.

Wekî encam çawa ku li cihanê hişmendiya neteweperweriyê û xebatên folklorê bi hev re têkildar bûne, di nav xebatên tirk û kurdan de jî heman tişt tê dîtin. Bi peydabûna fikra tirkîtiyê di nav rûpelên kovar û rojnameyan de nivîsên li ser folklorê jî zêde bûne. Herçend nivîs rasterast ne yên folklorê bin jî ji aliyê dîroka lêkolînê folklorê ve gelek girîng in.⁸¹ Heman rewşê em di kovar û rojnameyên kurdî yên wê demê de jî dibînin. Ligel bilindbûna hişmendiya neteweperweriyê, rewşenbîrên kurd jî bêtir bala xwe dane berhemên gelêrî û hewl dane ku wan ji bo armanca hişyarkirina gel bi kar bînin.

80 Dursun Yıldırım, *Türk Bitiği-Araştırma/İnceleme Yazıları*, Ankara, 1998; Vgz. Bayram Durbilmez, “Millî Folklor”, j. 99, 2013.

81 Ruhi Ersoy, “Folklor Çalışmalarının 100.Yılında ‘Folklor-Milliyetçilik’ İlişkisi Üzerine Bazı Düşünceler”, Kovara *Millî Folklor*, j.99, r. 56.

EFSANEYA ŞAHMERANÊ Û JINÛVENIVÎSÎNÊN EFSANEYÊ KU WÊ BI MÊRDÎNÊ VE GIRÊ DIDIN

Nur Gürani Arslan*

“...Tepsî danî ser text. Di nav tepsiyê de marekî biçûçik hebû ku serê wî dişibiya serê mirovekî. Gewdeyê wî çilspî bû. Mar ji porê xwe, ji serê tiliyê xwe dinêrî bi awayekî bêdeng. Camsap bi tirseke naskirî çogê xwe şikandin: Ev Şahmerana xweşik bû ku xort di şevên havînê de di xewnên wan de dixapandin, keçên xama jî dema sîng û berê wan mezin dibû ew bi deverû dixistin xewê.”¹

Tomris Uyar di çîroka xwe ya bi navê “Çîroka Şahmeran” de pênaseya Şahmeran bi awayekî arketîpî wiha dide: Mar ji ber qilafeta xwe ya vezeloqî û silîndîrikî di şiklê penîsê de ye û wek sembola zêdebûn² û zayendiyê ye. Lê belê ev wekheviya sembolan encax aliyê mar temsîl dike. Fuat Yöndemli ku berhemeke wî ya bi navê *Tarih Öncesinden Günümüze Yılan* heye, dibêje ku “li ser rûyê erdê bi qasî maran tu ajal tune ye ku wateyên dijberî hev li wan tîn barkirin.”³ Li aliyekî jî ber şiklê xwe organê mêran yanî mêran temsîl dike li aliyekî din gelek caran jinan temsîl dike.

Demê ku Pervîn Erbil tîkiliya jinan a bi maran re şîrove dike, balê dikişîne vê yekê ku di serdemên paleolîtîk de maran hêkên xwe, jinan jî zarokên xwe di heman şikeftan de vedişartin û bi vî awayî jî jin û marên ku ji aliyekî dijmin bûn û ji aliyekî jî hevqeder bûn, “di gelek çîrokan de li gel hev in, çîrokên ku koka wan digihêje serdemên berê”. Erbil bi ser de dibêje ku di hin çîrokên bi vî rengî de mar û jin wekî di heman laşê de tîne pêşkêşkirin. Heta mirov dikare bibêje ku di hemû çandan de mexlûq hene ku wekî nîv-mar û nîv-jin tîn teswîrkirin. Di çîroka Herkulê ku diçe welatê Sktyhe de mexlûqeke ji navê berjor jin û ji navê berjêr jî mar heye. Medûsaya ku bi serê xwe yê pormar kesên ku wê didîtin metelmayî dihişt

* Doç. Dr. , Zanîngeha Boğaziçi, Beşa Ziman û Edebiyata Tirkî.

1 Tomris Uyar, “Şahmeran Hikâyesi”, *Ödeşmeler ve Şahmeran Hikâyesi* (İstanbul: YKY, 2003), 108.

2 Pervin Erbil, *Kibele'den Pandora'ya Kadının Tarihsel Yenilgisi* (Ankara: Arkadaş Yayınevi, 2008), 95.

3 Fuat Yöndemli, *Tarih Öncesinden Günümüze Yılan* (Ankara: Piramit Yayıncılık, 2004), 17.

ya mîtolojiya yewnanan e û dîsa Şahmerana ku ji Yewnanîstanê heya Anatoliyayê ji Misrê heya Hindîstanê tê zanîn⁴ du jinemarên vê erdnîgariyê ne.

Erbil dibêje mar unsûreke girîng a wêjeya devkî û nivîskî ye û lê zêde dike: Li Misrê li bajarê Tebê heyîneke pîroz e ku laşê wî li perestgeha Zeus hatiye veşartin. Di Gilgamêşê de dizekî ku giyayê abadîniyê didize li Sumerê li bin koka darê İnanna hêlînekê çê dike; li Babilê parêzgerê zîvan Xweda Ra, sembola hêzan Xwedawend Hera ye. Her çend di mîtolojiya Yewnanan de nobedarê kaniyan, bexçeyan, şaristaniyên pîroz û postê zêrîn be jî qatîlê rahîbê Apollon Laokoon û zarokên wî ye. Asayê di destê Musa de, bav û kalikên jin ên Skyhiyan e, li zozanên Anatoliya xwediyê hin çêlekên û porê Medûsa ew e, di nav Hîttîyan de Îlûyankaya birêz e, di nav Hînduyan de heyîniyek pîroz e ku destdana wê hem qedexa û hem jî sûc e.⁵

Barbara Walker di pirtûka xwe de ya bi navê *The Womens's Encyclopedia of Myths and Secrets* dibêje ku di hemû mîtolojiya çandan de marek heye û ev mar bi pîranî bi zanîn, başkirin, pêngav, zanîna veşartî an jî şikilguhertin, mirin û vejînê tê pêwendîdarkirin. Çimkî mar sembolek e ku di nav xwe de nakokiyên dihewîne. Ji ber ku mar bi binyada xwe ya zîvonek di jiyana jinan û di laşê wan de serdemên diyar temsîl dike beriya olên monoteîst ji bo jinan perçeyêke jiyanê ye û ajalek e ku hatiye êwirandin. Van agahiyan Sheila Foster di gotara xwe ya bi navê “Eve, Snake and the Awakening of Kundalini” de vedigûhezîne û dibêje mar sembola Xwedawenda Dayika Mezin (Great Mother Goddess) e.⁶

Foster dîsa balê dikîşîne ser navê Hawa ku bi jiyanê ve eleqedar e, ji ber ku Hawa wekî dayika hemû mirovahiyê tê qebûlkirin pir guncaw e ku mirov têkiliya wê bi jiyanê re dayne. Lê bele bêjeya Hawa di zimanê Aramî de nêzî wateya mar e. Foster dibêje di serdema ku Genesis hatiye nivîsîn de li Rojhilata Navîn gelek xwedewandên mar hebûne û balê dikişîne ser têkiliya çîroka Hawa û Mar ku di olên monoteîst de têne vegotin.

Dema ku ji pergalek maderşahî derbasî sîtemên pederşahî bûn payeya maran jî wekî jinan daket. Dema olên politeîst cihê xwe dan olên monolîst bi serweriya mêran hem jin û hem jî mar bûn sembola jehrdayîn û xapandinê. Tu cîyawazî di navbera Hawa ku bi mereqdariya xwe û bi alikariya mar ve Adem teşwîqî gunehê yekem dike û Pandoraya – û heta Lilith jî- tuneke ku hemû nebaşiyên di nav xwe de dihewîne.

Her çend Şahmeran di teswîrên Murathan Mungan de wekî “mêr lê belê rûyê wî jin serê wî wek mirovekî, jêra wî mar û xwediyê çil lîngan, taca wî bi sîm û neqş, teriya wî digihêje heya serê wî”⁷ ku hem tirsnaq û hem jî xweşik û car caran wekî

4 Erbil, *Kibele'den Pandora'ya Kadının Tarihsel Yenilgisi*, 96.

5 Erbil, *Kibele'den Pandora'ya Kadının Tarihsel Yenilgisi* 93-94.

6 Foster dibêje ku mar di hin mîtan de wekî jin û di hin mîtan de wekî mêr derdikeve pêşberî me. <http://www.templeofthesacredfeminine.com/articles/SnakeHerstory2.pdf> Dîroka herî dawîn. 20.9.2014.

7 Murathan Mungan, “Şahmeran'ın Bacakları”, *Cenk Hikâyeleri* (İstanbul: Remzi Kitabevi, 1989), 16. Çîrok di navbera rûpela 13-94 de ye. Adnan Binyazar ku şîroveyeke biçûk a çîroka

mêr, car caran jî wekî bêcinsiyet, hem jin û hem jî mêr derkeve pêşberî me jî, bi piranî jin e.⁸

Heger em bi kurtayî behsa efsaneyê bikin kurê tiral ê Danyalê zana -ku navê wî di pirtûkên zanistî û pîroz de wekî pêxember derbas dibe-⁹Camsab ji hêla hevalên xwe yê çavbirçî tê avêtin binê bîrê. Camsab ji qula ku vedike dikeve welatê Şahmeran ê bi navê Yemliha û demeke dirêj dibe mêvanê Şahmeran heta di hin vegotinan de dibe dergistiyê wê jî. Yemliha dizane ku digel viyan û armanca baş a Camsab wê îxanetî wan bike û naxwaze wî bişîne ser rûyê erdê. Lê Camsab bi daxwaza xwe ya bergerî Şahmeran bêzar dike û dema vedigere mala xwe her çend li ber xwe bide jî laşê wî yê ku dema şil dibe vedigûheze laşê marekî, wî mecbûrî îxanetê dike. Serdarê welat Keyhusrev nexweş dikeve û yekane tişt ku dikare pêşiya mirina wî bigire goştê Şahmeran e. Bi rêberiya Camsab dê Şahmeran bê dîtin û goştê wê ji bo başkirina Keyhusrev were bikaranîn. Lê belê Şahmeran nemir e, dema ew bimire dê keça wê wek Şahmeran derkeve ser text û bi ser de jî dê giyana diya xwe jî di nava xwe de bihewîne.¹⁰ Camsab jî dê bi saya Şahmeran û tiştên ku vedibêje kamil bibe û wekî bavê xwe dê bibe Hekîmê Loqmanekî zana.

Ligel pevbestîna çerçoveya çîrokê rêwîtiya Belqiya û Ukup ku li gustîlka Sulayman digeriyan, Cîhanşah û metnên ku serpêhatiya jina wî ya bi derpiyê kevokan Gevherengîn dihate vegotin, di çîrokên gerdişî de gelek caran ku şeweya çîrok di nav çîrokê de diqewime. Tê zanîn ku hin ji van çîrokan bingeha xwe ji Hînt-Îran hinek jî bingeha xwe ji Îbraniyan distînin. Li gor Seyit Battal Uğurlu ku gotareke wî ya li ser îmajê Şahmeran heye:

“Heger li çavkaniyên Hînt, Îran, Yewnan, Îbranî û Ereban bê nêrin, em dikarin şopên van candan di çîroka Şahmeran de bibînin. Em dikarin bibêjin ku li ser avakirina Şahmeran

Murathan Mungan di bin sernavê “Yılanlar Padişahı Şahmeran” de cih daye dibêje ku li ser diwarên xaniyên yek ode de teswîrên Şahmeran hebûn û min nikaribû Şahmeran bişibanda tu tiştêkî. “Serçavê wê serçavê jinan ê herî xweşik bû, lêbelê ne jin bû Şahmeran; ew mêr bû. Nermahiya çavê jinan tunebû di nêrinên wî de. Wekî mêran bi hişkahi dinihêrt.” Bnr. Adnan Binyazar, “Yılanlar Padişahı Şahmeran”, *Halk Anlatıları* (İstanbul: Can Yayınları, Nisan 2011), 117.

- 8 Hatice Üzgül Şahmeranê bi van gotinan teswîr dike: “Ew nîv însan nîv jî mar bû, nîv jin, nîv mêr bû wekî ku pêdiviya wî/ê ji zayendê tunebe.”. Bnr. Hatice Üzgül, *Efsanenin Adı Şahmeran* (İstanbul: Bilge Kültür Sanat Yayınları, 2013), 42.
- 9 Mustafa Erkan, “Câmasbnâme”, *İslam Ansiklopedisi* (Türk Diyanet Vakfı, 1993), cilt 7, 43-45. Wekî tê dîtin navê Camsab di vê xalî de cihê hatiye nivîsandin. Di hin vegotinên efsaneyê de navê Camsab bi vî şiklî heta wekî Hasîp derbas dibe. Bi heman şeweyî navê Şahmeran wekî Şahmaran û car caran jî wekî Şah-ı Maran tê bikaranîn. Di hin çavkaniyên li ser wan tene nîqaşkirin de ji ber ku Camsab hatiye tercîhkirin di gotarê de bi vî şiklî nav tene bikaranîn.
- 10 Sedema nêrina ku bi taybetî Şahmeran bi giştî mar nîşaneya nemirinê ye, ji destan Gilgamêşê tê. Marê ku ji hêla Gilgamêş ve di rêberiya Utnapiştîm de hatiye dîtin ji ber ku gihayê nemiriyê dixwe bi rêya kirasguhertîne her dem ciwan dimîne.

karîgeriya kulta jinemar a di çandên Mezopotamya û Anatolyayê de jî heye. Kevneşopiya Camasbname ya Îranê, çîroka Eshab-i Kehf a civakên Îslamê tev li şopên ku ji şaristaniyên Asyaya Navîn, Anatolya û Mezopotamya bûye, dibe ku şikil dabe *Çîrokên Hezar û Yek Şevê* ku wekî çavkaniya eslî tê dîtin û li hemû cîhanê li ser jiyana fikir û hunerê bandoreke mezin çê kiriye. (Onaran, 1997; 6).¹¹

Piştî agahiyên giştî yê li ser Mar û Şahmeran dema em li wêjeya xwe dinêrin em dibînin ku hin şair û nivîskarên Osmanî jî elaqeyek nîşanî vê efsaneyê dane. Camasbnameyên ji farisî hatine wergerandin ku îlhama xwe ji vê efsaneyê stendine,¹² di sedsala 16. de vegotinên Şahmeran ên ku ji hêla Abdî hatine nivîsandin û wekî çîrokên gelêrî hatine vegotin û îro wekî kevirneqşî gihîjtine destê me¹³ nîşan didin ku gel û rewşenbîrên Osmanî ne biyaniyê vê efsaneyê ne.

Dema em di edebiyat modern a tirkî de li ser îmaj û efsaneya Şahmeranê vekolinê dikin em rastî dewlemendiyeke bêhempa tîn.¹⁴ Hin jinûvenivîsîna efsaneyê li gorî zarokan hatiye nivîsîn û di şêwaza çîrokî de ye.¹⁵ Di hemû antolojiyên efsaneyan de çîroka Şahmeran cih digire.¹⁶ Kî diaya Şahmeran bixwîne¹⁷ digihîje mirada xwe, rastî feqîrtiyê nayê, digihîje hezkiriyê xwe, dema yekî rastî mar tê, baweriyê hildana navê Şahmeran ji bo xilaskirinê rêyek e, ev nîşan didin ku îmaja Şahmeran niha jî di nav çanda gel de zindî ye. Li vir divê bê bibîranîn ku di nav gel û gelek metnên nivîsandî de marên hinek qelew û tirsnaq wekî Şahmeran têne binavkirin.¹⁸

11 Seyit Battal Uğurlu, “Çağdaş Türk Edebiyatında Şahmeran İmgesi: Arketipsel Bir Yaklaşım”, *Uluslararası Asya ve Kuzey Afrika Çalışmaları Kongresi: Bildiriler: Edebiyat Bilimi Sorunlar International Congress of Asian and North African Studies* (38th: Ankara: 2007), cilt 3, 1691-1718.

12 Erkan, “Camasbname”, 44

13 Amd. Sibel Üst, Fikri Uslucan, Mehmet Dursun Erdem, *Eski Türkiye Türkçesi Şâh-Mârân Hikâyesi* (İstanbul: Akademik Kitaplar, 2009), 13.

14 Ji bo gotareke din di Edebiyata Modern ya Tirkî de niqaşên li ser îmaja Şahmeran bnr. Sevda Çalışkan, “Literary Representations of the Snake Woman Motif: A Comparative Analysis”, *Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi*, 15/2 (1998:), 91-103.

15 Çend mînak: Yücel Feyzioğlu, *Cırttan ile Şahmaran Kızı* (İstanbul: Babil Yayınları, 2004); Cuma Karataş, *Şahmaran* (İstanbul: Şimşek Yayınları, 2014); Sennur Sezer, *Şahmaran* (İstanbul: Kırmızı Kedi Yayınları, 2014).. Metneke wekî şanayo zaroka hatiye nivîsandin: Gülşah Gülebenzer, *Şahmaran-Savaş Çiçekleri* (İstanbul: Mitoz Boyut, 2009), 5-61. Di nav lêkolînên xwe de rastî çavkaniyeke bi kurdî jî hatim: *Çend Varyantên Efsaneya Şahmaran* (İstanbul, Peri Yayınları, 1998).

16 Ji bo mînakeke bnr. Amd. Necati Aydın, *Tarihte ve Mitolojide Aşk* (İstanbul: Paraf Yayınları, 2012), 102-109. Binnîvîsa pirtûkê “Aşk Ölüm Getirir.” e.

17 Tankut Sözeri, *İnançlarda Şahmeran* (Bursa: Asa Kitabevi, 2006), 51. Pirtûka nivîskar ya bi sernavê *Kültürlerde Şahmeran* a jî heye. (İstanbul: İm Yayın Tasarım)

18 Mînakek: Bayram ji kurê xwe dibêje: “Di Güroluk erda çaman de Şahmeranek hebûye. Bi tena serê xwe li wan deran digeriya. Şahê hemû maran bûye. Nedihişt ku lingê mirovekî jî bi wan deran bibe. Fakir Baykurt, *Yılanların Öcü*, (İstanbul: Literatür Yayınları, Mart 2013). Di metnekê bi sernavê *Şahmeran ile Keje* ku ku bi zimanek û rastnîvîsek serobero hatiye

Di vê xebatê de piştî vê astê hemû metnên ji nû ve hatine nivîsîn ên ku li jor kurteya wan hatine dayîn wê neyên nîqaşkirin, bi taybetî li ser sê metnên ku efsaneyê bi herêma Mêrdînê ve girê didin em dê bisekinin: vegotina bingehîn çawa hatiye şrovekirin û nirxandin, wê bê tespîtîkirin û di van metnan de tîkiliya efsaneyê û Mêrdînê di çi astê de ye dê bê dahûrandin. Ev sê metnên cihê wê nîşanî me bidin ka efsaneyek di serdema me de çawa û ji bo kîjan armancan hatine bikaranîn.

Wekî ku li jor jî behs lê bû mirov nikare vekolînên karîgeriya efsaneya Şahmeran û cihê zayîna wê bi Tirkiyê sînor bike.¹⁹ Li Tirkiyê du herêm tîn nîşandan. Herêma Başûrê Anatolya û Başûrê Rohhilatê Anatolyayê. Gelek metnên di destê me de nîşan didin ku welatê Şahmeran Tarsûs an jî Misis-Adana ye.²⁰ Di avabûna vê baweriyê de mirov guman dike ku karîgeriya Hemama Şahmeran ku derheqê wê de tê gotin ku dema Şahmeran ji hêla zilamê Keyhûsrev ve hatiye kuştin xwîna wê heya niha jî li ser diwarê wê Hemamê ye û Yılankale jî heye ku li gor hin riwayetan Şahmeran tê de jiyaye. Lê belê efsaneya Şahmeran ji bo Başûrê rojhilat, Mêrdîn û gelê kurd jî girîng e:

Mîtosa mar di mîtolojiya kurdan de gelek caran derdikeve pêşberî me. Aferîdeya ku di nav kurdan de wekî Şahmeran tê binavkirin, marek e ku serê wê di şiklê jinan de ye. Li gorî me ev motif jî ber ku kurd di demên antîk de civakeke maderşahî bûn derdikeve pêşberî me. ... Taybetmendîya Şahmeran a herî balkêş ew e ku nîşaneya zêdebûnê ye. Di hemû olên polîteîst de xwedawend di destê wê de mar hene û ser serê wê jî mar girtine.²¹

Îhtîmal e ku ev efsane aîdê wê herêmê ye û em di pirtûka bi navê *Kutsal Kitaplar ve Mitolojide Kürdler* rastî du delîlan tîn. Faysal Dağlı îfade dike ku hem pêxember Danyalê ku di Camsabnameyan de wekî bavê Camsab tê pênasekirin û hem jî di efsaneyê de

nivîsandin de tê gotin ku dema Keje dixwest marê ku xwe bi piştî bavê wê de pêçandibû bikuje bi şaşî bavê xwe dike. Kuştina marê ku bi sedsalane ku malbata wî li gund dijiya û bi ihtîmalek mezin jî ber ku çelîka wê bû êrîşî mirovekî dike ji hêla gundiyan ve wekî kuştina marê tê şrovekirin û tê gotin ku Şahmeran wê dev jî keçikê bernede. Bi rastî jî di demeke kin de malbat belawela dibe. Piştî gelek êş û eleman dema dîsa li gund dicivin. Keje li nav bexçe marekî dibîne û taseke şîr tîne jê re. “Hatîna marê biçûk bi çivdank jî bo xwarina şîr bi kêfxweşî temaşe dike. Êdî wê bi maran re bibûna heval û hogir. Ajal jî mirovan bêtir dost bûn. Ew dê li hember ajalan bi xweşdivî tevbigeriya. Mükerrrem Çetinalp, *Şahmeran ve Keje* (İstanbul: Alfa Aktüel Yayinevi, 2006), 91.

- 19 Di berga pirtûka ya bi navê *Mitolojik İran Efsaneleri* de hem teswîra Şahmeran heye û hem jî kurteyê efsaneyê berbelav jî hatiye dayîn. “Versiyoneke efsaneyê jî bi Tarsûsê ve tê girêdan lêbelê çîrok gelek cihê ye. Melika ku di nav hevldanekê de ye ku xelateke giranbûha bide Sardanpal Şahmeran dibe Tarsûsê. Lê belê Şahmeranê ku dikeve odeya şîfayê beriya Sardanpal walî wê dibîne û hewl dide ku wê bikuje. Ji ber vê yekê hemû mar êrîşî ser Tarsûsê dikin. Mehmet Korkmaz, *Mitolojik İran Efsaneleri* (Ankara: Alter Yayıncılık, Eylöl 2012), 229-240. Li vir bal tê kişandin li ser du babetên ku niha jî ji hêla gel ve tê bawerîkirin. A yekem biwêja ku di pirtûka “Fatoş Tekbaş ya bi navê *Şahmeran ve Lokman Hekim* de cih digire ew dê paşê li ser vê lêkolîn were kirin. Roja ku mar bihîstin ku Şahmeran hatiye kuştin “Tarsûs jî maran, Misis jî bayê, Edana jî bayê” wê weran kirin. “Fatoş Tekbaş, *Şahmeran ve Lokman Hekim* (İstanbul: Artshop Yayıncılık, 2012), 179. Yê din jî baweriyek e ku li ser diwarê Hemama Şahmeran yê li Tarsûsê niha jî jina Şahê maran heye.

20 Mînakek: Uyar, “Şahmeran Hikâyesi.”

21 Cemşid Bender, *Kürt Mitolojisi* (İstanbul: Berfin Yayınları, Mayıs 2007), 90

gihîştina ruhên wan ên mertebeya Loqman Hekîmtiyê, koka xwe li herêma Diyarbekirê şîn kiriye. Dağlı dibêje ku “nasnameya Loqman ku di Quranê de wekî şexsiyetekî mîtolojîk a bajarê Amedê derbas dibe, ne diyar e”. Nivîskar balê dikşîne ku Loqman hin jî di nav kurdan de cihekî girîng digire û navê wî li gelek avahiyên tendurustiyê û zarokên kurdan hatiye danîn û dibêje, Diyarbekir di jiyana wî de cihekî girîng digire. Li aliyekî din Dağlı dibêje gora Danyal (Di Tevratê de wekî Daniel) li Başûrê Kurdistanê di nava Kela Kerkûkê de ye.

Di edebiyata me ya îro de Murathan Mungan çîroka Şahmeran a herî xweşik nivîsiye û her çend bi awayeke eşkere nebêje jî mekan Mêrdîn e. Di tespîtîkirina mekan de biyografiya nivîskar û çavkaniyên berhemên nivîskar yên mekanên zaroktî û ciwantiya wî li wir derbas bûye dibin palpişt ji bo me. Seyit Battal Uğurlu dibêje, Munganê ku heya hîvde saliya xwe jiyana xwe li Mêrdînê bihûrandiye gelek caran di “helbest, ceribandîn, bîranîn, çîrok, senaryo û çîrokên xwe de an Mêrdînê vedibêje an jî di binekokê de cih dide Mêrdînê.”²² Wekî ku Nüket Esen dibêje Mêrdîn ji bo Mungan objeyeke nivîsînê ye,²³ li gor gotina wê bajarê xeberoşkan e.²⁴ Di nav metnê de nîşaneya yekem ku berê me dide Mêrdînê ev e ku ez Îlyas ku şagirtê Mahir Hosteyê ku teswîrên Şahmeran çê dikin ku ew û bajarê Mêrdînê bûne yek, ya din jî gotina Îlyas e ku piştî dibe nivîskarekî navdar “careke din ber bi wî bajarê çeperî ve” dibêje û bi vî awayî cihê ku Xwedê ew daye û li wir mezin bûye nîşan dide.²⁵

Mungan fikra xwe ya derheqê motîfa Şahmeran de ku di dema zaroktiya xwe de nas kiribû wiha vedibêje:

“Motîfa Şahmeran û çîroka wê ya dilsoj; sermirov, gewdemar û nasnameya wê ya dualî, bi laşê xwe yê pûlên sor pêçandî, bi awayekî dîtbarî û ramanî bandoreke xurt li ser min hiştibû heta ez dikarim bibêjim ku min efsûnî kiribû; dîsa jî bi min hêsan bû ku wê wekî xurafeyêke dînî bifikirim, min di navbera xwe û wê de têkiliyên veşartî ava kiribû lê dîsa jî min hewl dida wê û bandora wê ji xwe dûr bihêlim. Lê belê min çiqasî dikaribû xwe dûr bihêlim ji vê erdnîgeriya ku min hewayaya wê dikişand hundirê xwe û avhewayaya ji wan xeberoşkên ku ez tê de jiyame.”²⁶

Çîroka Mungan wekî vegotinên gerdişî ji vegotinek çarçoveyî û ji vegotinên helezonî pêk tê. Serpêhatiya şagirtiya Îlyas li kargeha Şahmeran çarçoveya derveyî pêk tîne, di çarçoveya hundirîn de dengên Mahir Hoste û karakterên efsaneyê hema bêjin tam li gor metna esil hatine vegotin. Ciyawaziya herî girîng di vê berhemê de ew e ku piştî mirina Şahmeran kişandina înzîwayê ya Camsab e, di vê berhemê de dema cîhana me ya îroyîn û ya efsaneyê ewqas nêzî hev e ku ne diyar e ka kîjan

22 Seyit Battal Uğurlu, Bellek, Tarih ve Kültür: Murathan Mungan’da Mardin İmgesi” *Uluslararası İnsan Bilimleri Dergisi*, 4/2 (2007), 1-23. Jêgirt, ji rûpela 4an e.

23 Nüket Esen, “Yaşamı Gerçek Kılan Yazı: Paranın Cinleri,” *Modern Türk Edebiyatı Üzerine Okumalar* (İstanbul: İletişim Yayınları, 2006), 253.

24 Murathan Mungan, “Ben Aşkını Yazıyorum” *Yeni Gündem*, 63, (Mayıs 1987): 56

25 Murathan Mungan, “Şahmeran’ın Bacakları”, 93.

26 Murathan Mungan, *Murathan 95*, (İstanbul: Metis Yayınları, 1994), 114.

‘rastiya mirov’ vedibêje.

Di şiklê efsaneyê de ku heya îro hatiye, tiştê ku derdikeve pêş têgeha îxanetê ye. Hin xwendinên cihê ku weke îxaneta Camsab li Yemliha, îxaneta mêran li jinan, îxaneta însan li xwezayê dikare bê nirxandin, jinûvenivîsîna efsaneyê ji hêla Mungan ve li ser van îxanetan, îxaneta Îlyas li Mahir Hosta jî zêde kiriye. Lê belê hostayê wî roja yekem dema ku çîroka Şahmeran ji wî rê vedibêje dibêje ku “hunermendekî Şahmeran divê teswîran li ber hemû zor û zehmetiyan û bêyî ku îxanetê li karê xwe bike çê bike. Hunermendekî Şahmeran herî zêde divê vî tiştî bizanibe: dûrketina ji bêbextiyê.”²⁷

Çîroka Îlyas ku paralelî vegotina bêbextiyê ye ku li Şahmeran hatiye kirin, di heman demê de çîroka kamilbûna Îlyas e jî. Ew bi saya hostê xwe bi rasteqîniya xeberoşkê an jî îmajên xeberoşk û efsaneyan de behs li wan dibe û bi hestan dihesê; ne tenê bi zanîneke şênber, bi hin îmajan difikire ku wê dîroka mirovahiyê ronî bikin. Leyla Burcu Dündar di teza xwe ya bi sernavê “Rexneya Kevneşopiya Zayendîperest di Xeberoşkên Murathan Mungan de” balê dikişîne ser vê yekê:

“Bi meydariya pevbestîna hunerî ya nivîskar ku roleke sereke di berhemên wî de dilîze, motifên ku ji heyamekê ber bi heyameke din dihatin veguhestin di berhemên çandî de careke din tîne rojevê. Armanca Mungan di pêkanîna vê veguhestinê de ew e ku xwîneran bi hin arketîpên ku li gorî wî di vê serdemê de jî berdewam dikin, rû bi rû bihêle. Nivîskar pirsîyariya hin dînamîkên civakî beramberî motifên ku di nav kaniya demê de dikemilîn dike û bi vî awayî kemilandina civakî ronî dike.”²⁸

Mungan dema behsa Şahmeran dike aliyekî behsa qisseyaya Adem û Hawa dike, behsa Hazret-i Yusuf dike ku birayên wî ew xistine binê bîrê û ji aliyekî din jî çîroka Tavus-ı Azam bi bîr tîne, helbet ev yek ne tesadufek e. Niçikên îxanet û xapandinê yên di binyada van vegotinan de hene ne rastiya xeberoşkan in, rastiya dema cîhanê ye.²⁹ Jixwe mirov bi hezaran salan e bi heman unsûrên arketîp çîrokên xwe vedibêjin. Wekî mar tevnepîrka Belqiya û Ukap ku devê şikefta Suleyman girtibû bûye îmajek ku tê bikaranîn. Li ser vê yekê vebêj tevnepîrka ku devê şikefta Hazret-i Muhammed girtiye jî tîne bîra xwîner.

Di vegotina çarçoveya çîrokê de Îlyas jî digel hemû hişyariyên hostê xwe wekî Belqiya bi pey îhtîrasên bêdem dikeve. Çîroka Belqiya û Îlyas nîşan dide ku zan.

27 Şahmeran’ın Bacakları”, 20.

28 Leyla Burcu Dündar, “Murathan Mungan’ın Çağdaş Masallarında Cinsiyetçi Geleneğin Eleştirisi” (Yüksek Lisans tezi. Bilkent Üniversitesi, Haziran 2001)

29 Mungan di *Geyikler Lanetler* û “Kasım ile Nasır” de jî heman tiştî dike. Her çend ku gakoviya ji hêla Hazer Beg ve hatiye kuştin wekî xwîna yekem a pergala dêmanî bê pênasekirin jî li aliyê din ve xwîna ku li Kerbelayê hatiye rijandin tê bibîranîn. Destpêka hemû xwînrîjandinên bi dîrokê ve tîne girêdan. Hevaltiya mar û mirovan (em dikarin dijmintiyê jî li vê zêde bikin) di “Şahmeran’ın Bacakları” de bi dîrokên kevnare, heya bi dîroka sêvê tê girêdan.” “Şahmeran’ın Bacakları,” 23. Kitekiteke din ku berê xwîner dide vê agahiyê ew e ku di bexçeyê Şahmeran de tu darê sêvan tunene. B n. , 31.

yariya bêdem bi kêrî tişteki nayê, ancax dema ku hin tişt bèn ceribandin mirov dikare bigihîje agahî û zanyariyên rast. Seyit Battal Uğurlu dibêje ku “Her çend tiştê ku guhdarî dike nikare dahûrîne jî di encamê de têdigihêje ku çîroka Şahmeran çîroka wî ye. Zanîna rastîn, cureyeke zanîna xwebûnê ye...”³⁰ Heke bibe sedema îxaneta hostayê xwe jî zanîna rast wê Îlyas arasteyî xwenaskirinê, şiklê afirîneriyekê û nivîsandinê bike, bi riya nivîsîna “Çîpên Şahmeran” (Şahmeran’ın Bacakları) deynê hosteyê xwe wê bi awayekî din bide.

Her wiha di berhemê de rola zanînê ya di hilberandinê de jî tê nîqaşkirin. Mahir Hoste “Zanebûn mirov vedicinîqîne, ditirsîne. Zanebûn hinekî lanetlêkirin e.”³¹ Piştî van gotinan jî Îlyas xêzkirina Şahmeranekê dixwaze. “Di destpêkê de zanebûn pir ne hewce ye. Zanebûn di nav kaniya demê de hewce ye.” Şahmeranên ku bêzanebûn hatine xêzkirin wê bişibin Şahmeranên berê hatine xêzkirin. “Divê mirov jî vê pêvajoyê derbas bibe.”³² Helbet Îlyas di xêzkirinê xwe yê ewil de di bin bandora hostayê xwe û yê beriya wî de maye, bi xebat û xêzkirinê bi pêş ve çûye, di karê xwe de resen bûye. “... di xêzkirinê te de Şahmeran tenê jî wênebûnekê derdikeve û dibe hebûneke zindî ku êşê dikişîne, berpîrsiyariyê hîs dike û hestên xwe nîşan dide. Di zeneata me de ev tişteki, bûyereke nû ye.”³³ Lê belê ew jî têra Îlyas nake. Ew ê bibe sedema mirina Hosteyê xwe ku jî xwe re şagirtêk/hevrikek gihandibû.³⁴ Bi çûyîna bajarê mezin dev jî xêzkirina Şahmeranan berdide û dest bi vegotina Şahmeranê dike, hostê wî bê zarok û bê şagirt dimîne û di dawiyê de dibe sedem ku kargeha hostê wî jî belav bibe: “Piştî min tu şagirtêke wî dahatûyek wehd nekiriye./ Bi çûna wî agirê wî jî vemiriye.”³⁵

Têkiliya Hoste û Îlyas nîqaşên Freud ên li ser têkiliya/kişkişandina bav û kur, nêrîna Odîpal tîne bîra mirov ligel hin nîqaşên zanîn-berhem/ resenî-hevbandorî jî teoriyeke helbestê ya Harold Bloom a bi navê “Metirsiya Bandorbûnê” (Etkilenme Endişesi) tîne bîra mirov. Dema Bloom hewl dide ku têkiliyên helbestvan -li vir hunermend- bi selefê xwe, bi nêrîna Odîpal rave bike, dibêje ew jî şeş kategoriyên revîzyonê derbas dibin. Di berhemên Mungan de şopandina van şeş kategoriyên hem

30 Uğurlu, “Bellek, Tarih ve Kültür: Murathan Mungan’da Mardin İmgesi”, 14.

31 “Mungan, Şahmeran’ın Bacakları”, 19.

32 Heman weşan.

33 B n. , 92.

34 Têkilya Îlyas û Mahir Hoste têkiliya hoste û şagirt ya di “Usta Beni Öldürsene” de tîna bîra mirovan *Göçmüş Kediler Bahçesi* (İstanbul: Metis Yayınları, 2014), 106-120. Kitekiteke din di nav çîrokê de ku Bilge Karasu tîne bîra mirovan bûyera balkişandina Belkiya ku di dema kurmoriyan di nav têkoşinê de ye gotina wî ya mirov di berdêla nêçîrvan be bûna nêçîr “Cenk Hikâyeleri”, 71

35 B n., Mungan bi vê yekê balê dikîşîne li ser çêbûnê qirêj li welêt. “Ne ew bixwe kargeha wî jî ne di cih de bû; jî zû ve hilweşiyabû li cihê wî avahiyek nû hatibû avakirin... Li pêşiya wê avahiya derewîn û qirêj a ku di berdêla kargeha hostê min de hatibû avakirin ji carekê ve min bedbextiya di vegeirên Camsab dît.” Bnr. , 93-94

zehmet e hem jî nepêwîst e lê belê bi riya hewildanên hunermend ji bo afirandina berhemên orjînal, gihîjtina wî ya asta pêncan û ramanên Îlyas derheqê veqetîna ji hostê xwe û dîtina karekî din beramberî hev tèn: “Hem qabiliyeta xwe û hem jî qabiliyeta Hostê xwe yê însanî muxeyyel ji ber ku ji yên din veqetîna datîne aliyekî din...”³⁶ Îlyas di serdema ku di hunera xwe de derketibû asta herfî bilind, ji bo xwendinê çûbû bajarê mezin bi wî awayî difikirî ku ew ji karê xwe û ji hostê xwe dûr ketiye lê belê di nav şaşiyê de bû: “Ez di wê baweriyê de me ku karê ez dikim çêkirina Şahmeranan e.”³⁷ Îlyas di çend salên dawîn de “li gel êş û eleman û bi berdêlên mezintir wê têbigihîje ku hemû jiyana wî çirokeke Şahmeran e.” “Bi naskirina xweşik û mirinê... / Çimkî ez hîn nehatibûm avêtin bo binê bîrekê, ez bo keşfîkirina bîra xwe derneketibûm...”³⁸

Di hemû vegotinên gerdîşî de lehengê mêr ê ku di nav hewildanê de ye ji bo gihîjtina objeyê maddî/dergîstî di nav mekanên wekî bîreke tarî û teng, mexzen û şikeftê, rêyên fetlonekî de rastî ezmûneke mecbûrî tê. Îmaja bîrê ku di efsaneya Şahmeran de cihekî girîng digire bi têgeha Joseph Cambell ya “Rêwîtiya Leheng a Bêdawi” (*Kahramanın Sonsuz Yolculuğu*) ku dibêje cihê ku divê ez biçimê ango “zikê balînayê” re li hev dike.³⁹ Di hemû deverên cihanê de mayîna di zikê balînayê de bi tena serê xwe îmajê malzarokê ye⁴⁰ ku kuştin û îşkenceyê bîne bîra mirovan jî, di rastiyê de asta yekemîn a gihîjtinê ye. Demên di nav bîrê de bihurî pêvajoyê hêviya gihîjtinê, jinûvê zayînê û derfeteke xwebûnê ye.⁴¹ Bîra Mungan jî cihê tenêbûn, tefekkur, jinûvezayîn û bûyîna hunermendiya biêş e.

Vegotina Hilmi Yavuz a bi navê *Kuyu*⁴² çîroka gerîna bîrekê ye ku tê de mirina serleheng -mirina xwe- dinivîse. Motîfa bîrê li vir jî bi tenêbûn, hilberandina hunerî lê herfî zêde bi mirinê ve tê girêdan. “Çimkî bîr jî mirin jî tarîfî ye...”⁴³ Li aliyekî din “xwegirtinek ku şûna dayikeke êdî tuneye” - cureyê otîzmê? Gelo bîr daxwaza vegera makazarokê ye⁴⁴ ne diyar e. Bîr ku di çanda Rojava û Rojhilat de, bi wateyên xwe yê metaforîk derdikeve pêş û weke problematîkeke bingehîn ya metnî xuya dibe behsa gelek filozof û mîtan dike, gelek çaran serî li arîşeya bingehîn ya navmetnîtiyê

36 Harold Bloom, *Etkilenme Endişesi*, wer. Ferit Burak Aydar (İstanbul: Metis Yayınları, 2008), 55.

37 “Mungan, Şahmeran’ın Bacakları”, 21

38 H.b. , 107.

39 Joseph Campbell, *Kahramanın Sonsuz Yolculuğu*, wer. Sabri Gürses (İstanbul: Kabcacı Yayınevi, 2010.),

40 H.b. , 107.

41 Di derheqê vê mijarê de ji bo agahiyên bêhtir bnr. Ahmet Doğan, “Bireyleşim/Kemalat Sürecinde Kapalı ve Dar Mekânlar”, *Bilig*, 37, (Bahar 2006), 115-130.

42 Hilmi Yavuz, *Kuyu* (İstanbul: Afa Yayınları, 1994).

43 H.b. , 54.

44 H.b. , 56.

dide.⁴⁵ Metin beravajî berhema Murathan Mungan efsaneya Şahmeran nake amûreke bingehîn. Heta di destpêka pirtûkê de xwîneran li hember vê yekê hişyar dike:

Na wekî ku hûn ferz dikin ez ê behsa xewna Hilmi Yavuz û piştî dîtina wê xewna vebûna quleke li deriyê bihûştê, di nav bêhna mîsk û emberan de tûşîbûna keçikeke ciwan û bedew ku ew di rastiya xwe de Şahmeran e ji we re nekim.

...

Ew neketibû pey bîreke xeberoşkan ku ev bîr ji quleke bin xwe vedibû li mîrgên bihûştê, li welatê Şahmeran, na!⁴⁶

Lê belê Hilmî Yavuz dîsa jî di dawiya metin de kurteya efsaneya Şahmeran dide. Li vî bajarî spî li rojhilatê başûr ku kalê wî lê dijiya û zarokatiya xwe lê bihurandibû, bîranîna bûyereke ku di nav qonaxa bi hewşeke mezin û xwedî du bîr⁴⁷ de derbas bibû, efsane careke din bi bîr dixist.” Di nav dewlikekê de ku ji nav bîrê hatibû kişandin, di berdêla topa zarokan pisîkek mirî hebû. “Ew pisîk kurê Danyal Hasip e”⁴⁸ Yavuz dibêje ku çîroka Hasip ji “Li Almaniyayê çîrokeke ku karkerekî ... derdora salî vedibêje, ji qeyda bandekê ye ku di sala 1982an de hatiye girtin.”⁴⁹ veguheztiye. Di heman demê bi rêya jêrenoteke ji xwînerê xwe dide zanîn ku di bingeha vê çîrokê de Çîrokên Hezar û Yek Şevê (*1001 Gece Masalları*) heye û derheqê efsaneyên *Şahmeran û Melusineyê* çavkaniyekê pêşkeş dike.

Çîroka hatiye vegotin ji bilî du kitekîtan efsaneya Şahmeran e. Hasip piştî ku hat avêtinî binê bîrê di navbeyna çend rojan de qulekê vedike û li ser sifreyeke ku her cure xwarin li ser heye û ji bo niştecihên qesrê hatiye amadekirin zikê xwe têr dike û bi hêviya xelaskirinê, berê xwe dide bîrê. Lê belê tê zeftkirin û wî derdixin pêşberî Şahmeranê: “Şahmeran li ser dîwaneke bihîştîşam raketiye; ji navê berjêr mar e û ji navê berjor jî gewdeyeke mîna keçikeke panzde salî ku wek hîva çarde şevan e.”⁵⁰ Şahmeran dergistiyê xwe tembîh dike, ji bo ku bibe Hekîmê Loqman divê ava tasa çaremîn ku ji goştê wê derdikeve vexwe û bi vî awayî kurte diqede.⁵¹

Digel ku Yavuz jinbira xwe Îngeyê wekî periyeye ku nîv însan, ji navê berjêr jî wekî pisîkekê teswîr bike û di nav vê teswîrê de her çend îmajê bîrê hebe jî, efsaneya Şahmeran ku xwe di nav hemû metnê de dide nîşandan, bi evîn, hestên dilsozî û bi mirinê ve girêdayî ye. Lewma jî di nav hemû metnê de belav nebe jî perçeyeye girîng ya vegotinê ye.

Dema em werin ser mînaka xwe ya sêyem romana bi navê *Şahmeran ve Lok-*

45 Uğurlu, “Çağdaş Türk Edebiyatında Şahmeran İmgesi: Arketipsel Bir Yaklaşım”, 1705

46 Yavuz, *Kuyu* 12-13.

47 H.b. 60.

48 H.b. 61

49 H.b. 62

50 H.b. 63

51 Yavuz, *Kuyu* 59

*man Hekîm*⁵²(Şahmeran û Hekîmê Loqman) ku wekî roman tê nirxandin dîsa em ê bibînin ku temaya sereke îxanet e. Nivîskarê pirtûkê Fatoş Tekbaş di destpêkê da behsa mekanê ango bi giştî behsa mekanên efsaneyan dike. Ew behsa qeraxa çemê Nîlê Tarsusê ku dibêje care yekem efsaneya Şahmeran ji vir belav bûye, Hindîstan, Adana, bi kurtî behsa hemû Rojhilatê dike û navê Mêrdînê jî bi bîr tîne.

Ew bi malên xwe yên kevir, kuçe û kolanên xwe yên teng, bi dêr û mizgeftên xwe û qonaxên xwe yên mezin bi roj wekî goristanekê, bi şev jî gerdeneke mircanî bû. Ew bajar Mêrdîn nûnerê sê olan bû, sê ziman di nav de dihatin axaftin. Her çend karakterê jibîrbûyî careke din ji nû ve venajîne jî, wî bajarekî ku di nav axa Mezopotamyayê de cara yekem reşkê Şahmeran pêşkêşî mirovahiyê kiribû ku di her heyamê de derfeta jiyana wê hebû.⁵³

Tekbaş dibêje ku hem Mêrdîn hem jî Tarsus cihê zayîna efsaneyê ye bi vî awayî dikeve nava nakokiyên, çêkirina Şahmeranan bi Mêrdînê ve eleqedar dike lê belê tê femkirin ku teswîrên hatine çêkirin naecibîne. Di dawiya metnê de efsane ji bo demeke kurt dîsa vedigere Mêrdînê. Camsab di dema xewa de xwe diçe kargeha “Hosteyê Sifrê yê Mêrdînî” û teswîra ku dibîne rexne dike:

“Dergistiyê wî ne wisa tompiz û bi mirûzekî firewnî bû. Ji keçeke devbiken, nazik û bedew wêdetir, mexlûqeke kirêt teswîr dikirin. ... Li ser dîwêr ewqas cureyên sifir û wênayên Şahmeran ên rengdar ên bi neqşên cam hebûn, hemû kin topikî di rastiya xwe de bûcirkî bûn. Di teswîra mehsî de serekî mezin, laşekî mezin û rûçikekî mezin ê bêwate hatibû xêzkirin. Di beşa teriyê heft marên ku berê xwe dabûn xwe dihatin teswîrkirin.”⁵⁴

Tekbaşê ku çîroka xwe li qeraxa çemê Ceyhanê bi cih dike, erdnîgariya mît û efsaneyan bi israr tevîhev dike û navê dayika Hekîmê Loqman Hera, yê cîranên wî jî Pose-dion datîne. Lê belê ev kes nehatine pêşvebirin û di heman demê de tu taybetmendiyê wan naşibe wekî hevnavê wan ê yên mîtolojiyê. Teswîra Şahmeran a ku di metnê de bi qasî du rûpelan hatiye dayîn, zayendiya mexlûqê bala mirov dikêşîne:

“Sîwana ronahiyê ku di nav porê wê yê direj û reş de dibiriqîn mîna ku ketibûn... laşê keçika ciwan tazî bû, di nav porê wê de, singê wê yê çepê ku mîna sêvekê bû dihat xuyakirin. Li ser singa wê ya dihat xuyakirin kevirê safir hatibû pêvekirin. Laşê wê mîna mermerê şayîk û çilspî bû. Hinarikên wê sor lêvên wê têrgoşt, pozê wê mîna yê kîvroşkekê biçûk û bilind bû.”⁵⁵

Camsabê dema teriya Şahmeran û heft seriyê maran di bin navka wê de dîtibû, hestên wekî “tirs, ecibandin, hezkirin, daxwaz, xwestin”⁵⁶ hemûyan di heman demê

52 Fatoş Tekbaş, *Şahmeran ve Lokman Hekim* (İstanbul: Artshop Yayıncılık, 2012).

53 H.b. , 10.

54 Tekbaş, *Şahmeran ve Lokman Hekim*, 193-194.

55 H.b. , 34.

56 H.b. , 35.

de jiyabû. Şahmeran di nav xwêdanê de maye ku di rastiya xwe de navê wê Yemliha ye û Camsab ji ber xwestina li hember hev di demeke kurt de digihîjin zewqa bihevşabûnê ku wan ji nîvbûnê xilas dike. Ne tenê ew di heman demê de bi hezaran mar bi hevdu şa dibin. Di dawiya metnê de şeva zîfafê ya Camsab û keça Keyhusrev bi şêweyekê tê vegotin ku nêzî pornografiyê ye.

Şahmeran di vir de jî çîrokbêj û rênîşandêr e lê belê di gihîjtina Camsab de tenê keda wê tune. Metnê ku tê de efsaneyên derheqê Medusa, Sardanapal û Musa têne vegotin her dem bi mezinbûna pêxember Muhammed û Xwedê tê girêdan têgihîştina ku her tişt bi îrade Xwedê çê dibe yanî têgeha qederê tê nîşandan û şîretên dayika Mîsîsî Hera ku li kurê xwe dikir jî di nav metnê de xwe dide der. “Ji xayinan tu carî deyn nestîne, ... tu carî jina xwe meke hevparê sirê xwe, ... bi şev ranebe û avê venexwe, li ser piyan qet avê venexwe... Heger tişteke ji te nehatibe pirsîn bersiv nede.” (r. 22)

Wekî ku tê dîtîn di nav şîretên Herayê de hişyariya pêbawernebûna jinan jî heye. Çimkî li gor Tekbaş jin dikarin bi hêsanî ji rê derkevin, bi hêsanî jî dikarin mêran bixapînin, heta tenê ew dikarin mêran bixapînin. Sedema nêzbûna Şeytan ya Hewayê jî jixwe ev e.

Tekbaş efsaneyan ji bo bîr û baweriya Îslamê, lê zêdetir têgeha qederê bîne rojevê, bi kar tanî lê belê ji hêlekê ve vê nêzikahiya cinsî tev li kitekitan vedibêje û bi metirsiya hemû meselên moda di nav metnê de vedibêje, behsa sehneya rasthatina keçikeke gundî ya 13-14 salî ya bi Loqman re dike, ji ber ku li ser wê difikirin ku biheml e û wê didin ber keviran. Di rastiya xwe de keçikê dema av vexwariye, marek daqurtandiye. Camsab marê ji nava wê derdixê û wê xilas dike.⁵⁷

Metna Fatoş Tekbaş nimûneyek e balkêş e ji bo şîrovekirin û bikaranîna xelet ya efsaneyê. Fûsun Akatlı di nivîsa xwe ya bi sernavê «Vefalî Bir Şahmerancî: Murat-han Mungan» de wiha dibêje: “Mirov her dem ji qisseyan bendî hîsseyekê ne û ew

57 Hatice Üzgül di berhema xwe ya bi navê “efsane-roman” *Efsanenin adı Şahmeran* de efsaneyê ji bo telkîna mezinahiya Îslamê bi kar tîne. Di metnê de di berdêla çîroka Belkiya û Cihanşahê de qisseyên afirandina cihanê, Adem û Hewa têne vegotin. Metin di qada vegotinê de bi tevahî Îslamîze bûye. Têgehên wekî îteata ji Xwedê û qederê di rûpelên paşîn ên di metnê de wê hîn zêdetir derkevin pêş û bi taybetî di beşên dawî de wê bê gotin “qeder ji hemû tiştî serdesttir e.” (136); “Dem tenê nikare ji qederê çareyeke bibîne” (157) bi şêweya ecel bendî nasekine wê bê dubarekirin. Di heman demê de vegotinên ku hin varyantên efsaneyê de hene wekî evîna Şahmeran û Camsab û têkiliyê wan î cinsî li vir nayê vegotin pêşiya wan hatiye birîn. “nîv mirov nîv mar û nîv jin, nîv zilam wekî ku pêdivîya wî ji zayendê tunebû.” (42) Camsab, Şahmeran bi van peyvên pênase dikir û di temênê xwe yî sêzde salî de rastî wê hatibû û di navbera wan de ji bilî têkiliyêke dostane/ murîd û murşîti pê ve tu têkiliyêk çênabe. Tê gotin ku Şahmeran ji nîşandina evîna fîzîkî hez nake. (139) Ciyawaziyeke balkêş di nav metnê de ew e ku Şahmeran dibêje cara yekem mar îxanet li mirovahiyê kiriye yanî xayin mar bixwe ne. Dibe ku sedema vê yekê bîr û baweriya Îslamê be ku li gor vê baweriyê mirovahî ji hemû mexlûqan mezintir e û di nav metnê de hevokên wekî “ez fêr dikim ku Xweda hemû mexlûqan ji bo we afirandiye” (140) jî hene û ew yek referans in ji bo qisseyaya Adem û Hewayê.

bendewariya hîsseyê dema bikeve kirasê edebiyatê min ditirsîne. Yan nîrxên cîhana mêran bi awayekî mêrane li ser xwe digirin, yan jî exlaqekî diyarkirî pîroz û her pîroz dikin...”⁵⁸ Vegotina pederşahî di metna Tekbaş de ku Akatlı dixê nav metirsîyekê ji hêla jinekê ve hatiye afirandin ku pergala maderşahiye nerênî dibîne. Dîsa hewildana saloxdayîna bîr û bawerîyeke diyar di nav hewlidanên vê metnê de heyê. Tekbaş tenê sewirandina çîrokî ya efsaneyê werdigire û xemgîniya têkçûyîna pergala maderşahî li hember cîhana pederşahî û vegotina hêza mêmîyîyê ya bi ihtîşam nabîne û bi şîroveyeke şaş ku ji sedî sed desthilatdariya pederşahî salox dide, qebûlkirina îqtîdara mêran û Xwedê hîn dîke û xeletîyeke trajîk dîke.

Her çend metna Hilmi Yavuz jî efsaneyê ji ber îmajê bîrê mîna ku amûrek be bi kar tîne, xuya bike jî wekî ku berê jî hatibû gotin her du vegotin jî di evîna Şahmeran ku jiyayê de û di wê îxanetê de ku lê hatiye kirin –lê belê kesê ku li vir îxanetê dîke jinbira Yavuz Müstehase ye- û di xala mirinê de hevdu digirin.

Dema em werin berhema Murathan Mungan em ê bibînin ku wî efsane qet neguherandiye û ji cewhera efsaneyê dûr nexistiye, efsane gihandiye dema me û berhemek serbixwe derxistiye holê. Mungan ji hêlekê ve bi alîkariya arketîpên wekî hezkirin, sadiqbûn, dildarî, tundiyê vediguhêze ji hêlekê din ve ji xwîner di çîroka çarçove de çêbûna pêvajoya berhemê vedibêje û bi vî awayî berhemeke serbixwe ku tê de nîqaşên di hunerê de resenî û karegerî têne kirin derdikeve holê.

Di nav berhemên Efsaneya Şahmeran de ku efsaneyê bi Mêrdîn ve girê didin de tenê “Şahmeran’ın Bacakları” û *Kuyu, Şahmeran ve Lokman Hekim* nimûneyên balkêş in ji bo şîrovekirina an jî çawa neyê şîrovekirina efsaneyê.

Wergêr: M. Şirin Filiz*

58 Fûsun Akatlı, “Vefalî Bir Şahmerancı”, *Öykülerde Dünyalar* (İstanbul: Boyut Yayınları, 1997), 130.

* Li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, di beşa Ziman û Çanda Kurdî de lêkolêr.

**WEKE QADA RENGVEDANEKE NETEWEPERWERIYÊ
DÎ PRATÎKÊN TÏRK Û KURDAN DE
NÎQAŞÊN LI SER ALFABEYÊ**

Mikail Bûlbûl*

“Tu alfabeke xweşik bidî min, ez ê zimanekî
xweşik û bi qasî wê xweşikbûnê jî neteweyekî
xweşik ji te re çê bikim.”

(Leibniz)

Destpêk

Di pêvajoyên tevgerên neteweyî de endezyariyên civakî pir tên kirin û di van pêvajoyan de li gorî hinek texeyulan, civak ji nû ve tê avakirin. Di dema van nîqaşên endezyariya civakî de jî, di gelek civakan de alfabe û nîqaşên li ser revîzyon an jî guhertina alfabeke weke navgîneke ji bo avakirina civakê hatiye dîtin.

Nîqaşên ku li ser alfabe û guhertina wê tê kirin, piştî heyama ku tevgerên neteweyî weke pêlekê tesîr li Osmanîyan û gelên di bin banê wan de dijiyan kir, bû yek ji wan qadan ku neteweperwerî rengvedana xwe didiyê. Gelek gelên ku di bin banê Osmanîyan de dijiyan jî, piştî ku bi sed salan alfabeke Erebî bi kar tanîn, di vê heyama ku neteweperwerî belav dibû, dest bi nîqaşên revîzekirin ango guhertina alfabeke kirin. Bi tesîra belavbûna fikra neteweperweriyê tirk û kurdan jî li ser revîzyon û guhertina alfabeke nîqaş kirine. Nîqaşên ku tirk û kurdan kirine bêtir piştî Meşrutiyeta Duda û dema Komarê ne. Armanca vê gotarê bi kurtahî tesbîtkirin û ravekirina helwest, fikir û refleksen hevbeş û cuda ne, di van nîqaşên ku tirk û kurdan li ser alfabeke kirine.

Avakirina Neteweyê û Navgîn

Çawa ku tê zanîn armanca tevgerên neteweyî, avakirina nasnameyên kolektîf e. Nasnameke kolektîf jî ji bo ku ava bibe pêwîstî bi navgîneke ku nixê hevbeş ava bike û belav bike heye. Yek ji van navgînan belkî ya herî xurt jî ziman e. Nîqaşên li

* Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstitûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

ser alfabeyê jî gelek caran di vê konteksê de çê bûne. Piştî ku Şoreşa Fransızan çê bû û girîngiya gel bêtir derket pêş û hat famkirin ku gelek tişt bi gel re dikare biçe serî, endezyariyên ku vê nasnameya kolektîf li ser gel ava bike jî zêde bûne. Ji ber ku nasnameyeke kolektîf eger gel hebûya dikaribû ava bibûya. Şoreşa Fransızan nîşan dabû ku mirov divê bi gel re hereket bike. Edî gel bûbû zemîna gelek tiştan ku yek ji wan jî fikra neteweperweriyê bû. Loma divê mirovan bi gel re hereket bikira. “*Bêyî ku mirov xwendin û nivîsandinê nîşanî mirovan bide jî ne mimkun bû ku bi gel re hereket bike. Ji bo ku gel bibe xwende jî mecbûrî bû ku navgînên xwendin û nivîsandinê bihatina hêsankirin.*”¹ Loma dikare bê gotin ku ziman û bi ziman ve girêdayî alfabe ji ber ku navgînên gihîştina gel in, divê navgînên guncav û hêsan bûna.

Di wan deman de ku fikra neteweyî dest pê dibe û bi wê fikrê jî dîzaynek nû li ser civakê tê ferzkirin, têgehek pir tê bikaranîn heye û ew jî *yekitiya neteweyî* ye. Lewre ji bo yekitiya neteweyî nixê hevbeş lazim in û ji bo ku nixê hevbeş ava bibin jî pêdivî bi navgîneke hevbeş heye. Celadet Alî Bedirxanê ku alfabe Latîni ku em îro bi kar tînin çê kiriye dema qala yekitiya neteweyî ya kurdan dike (1932) ku wê çawa çê bibe, “*Yekbûna kurdan jî bi yekitiya zimanê kurdî çêdibe. Yekitiya zimanî jî bi yekitiya herfan dest pê dibe*”² dibêje. Yanî dibêje yekitiya kurdan bi yekitiya alfabayê mimkun e. Li vir em dibînin ku dîzayn û endezyariya civakî çawa di ser ziman re û bi ziman ve girêdayî di ser alfabayê re tê texayulkirin. Dîsa kadroyên Komara Tirkî yê neteweperwer, li gorî dirûşmeya “*Yekitî di ziman, fikir û kar de*” tevgeriyabûn.³

Dema em li pratîka nîqaşên li ser hêsankirin, revîzekirin an jî terkkirina alfabayê ya kurdan û tirkî dinê em dibînin ku fikra bingehîn jî ev yek e. Yanî ji bo ku gel ji cehaletê xelas bibe û pêşketin çê bibe û ew nasnameya ku em dibêjin kolektîf e ava bibe, divê xwendegeh vebin, gel hîn xwendin û nivîsînê bibe û ji bo vê jî navgînek hêsan lazim e ku ew jî alfabayek guncav e. Leîbnîz ji bo rol û girîngiya alfabayê dibêje: “*Tu alfabeke xweşik bidî min, ez ê zimanekî xweşik û bi qasî wê xweşikbûnê jî neteweyekî xweşik ji te re çê bikim.*”⁴

Ne di pratîka kurdan û tirkî tenê de di pratîka gelek milletên din de jî gelek mînakên nîqaşên alfabayê hene. Dema em li Arnawidên di bin banê Osmaniyan de dijiyan binêrin jî em dibînin ku piştî hestên neteweyî bi pêş dikevin nîqaşa alfabayê kirine.⁵ Arnawid ji bo ku yekitiya neteweyî nîqaş bikin kongreyekê çê dikin û herî

1 Gülmez, Nurettin, “*Tanzimattan Cumhuriyete Harfler Üzerine Tartışmalar*”, weşanên Alfa Aktüel, İstanbul, 2006, r. 38. vgz. Celal Sahir, “*Lisanımız*” Serveti Fünun, 27 Ağustos 1325, no:953, r. 261.

2 Bedirxan, Celadet Alî, “*Bi Hinceta Pîroznamekê*”, Hawar, h. 3 r. 489.

3 Altun, Mustafa, “*Alfabe Değişiminin Tarihsel Gelişimi Üzerine Bir Değerlendirme*”, Cumhuriyetimizin 81. Yılına Armağan, Sakarya Üniversitesi Rektörlüğü Atatürk İlkeleri ve İnkılap Tarihi Araştırma ve Uygulama Merkezi Müsürlüğü, 2004, r. 62.

4 Tansel F. Abdullah vgz. Gülmez, Nurettin, h.b., r. 4.

5 Budak, Ali, “*Münif Paşa Batılılaşma Sürecinde Çok Yönlü Bir Osmanlı Aydını*”, Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2012, r. 599

zêde li ser yekitiya alfabeyê nîqaşan dikin. Tiştê balkêş ew e ku di vê kongreyê de dirûşmeyerê diqîrin û dibêjin “*Bijî alfabe*”⁶. Yanî ji bo yekitiya neteweyî çê bikin di-civin û kongreyekê çê dikin û dirûşmeya *bijî alfabe* diqîrin. Ev heman mekanîzmaya fikrî ye ku dîzayna civakî di ser alfabeyê re tê texayulkirin. Jixwe Arnawid ji bo vê kongreya bi armanca yekitiya neteweyî çê dikin (1908) *kongreya alfabeyê* jî dibêjin.⁷ Arnawidan di nav xwe de sî salî zêde nîqaş kirin û bi vî awayî dikarîbûn derbasî herfên Latîni bibûna.⁸

Piştî Meşrûtiyeta Dudan çawa ku tevgera Tirkitiyê ku temsîla wê Îttîhad û Teraqî dike hêdî hêdî xurt dibe rewşenbîrên kurd ên wê demê jî dikevin nav hinek hewildanan. Di 1910an de Kürt Neşr-î Maarîf ava dibe û armanca wê belavkirina zanîne ya li Kurdistanê ye. Jixwe dibistanekê jî li Stenbolê ava dikin.⁹ Em dizanin ku di wan deman de, hinek ferheng, rêziman û kîtabên hînkirinê tî amadekirin ku ew jî weke nîşanên neteweperweriyê tî qebûlkirin. Weke mînak Muhammed Mîhrî ferheng û gramera kurdî amade kiribû.¹⁰

Dema em li nîqaşên tirk û kurdan dinêrin aliyekî din ê hevbeş û xurt heye ku tê gotin herfên erebî pir zahmet in, zarok pir dereng hîn dibin û sebeba cehaleta nav me, ev e. Yanî sebeba paşdemayîna me kêmbûna rêjeya xwendin û nivîsandinê ye û ew jî ji ber wê ye ku em alfabeyeke baş û guncav bi kar naynin. Gerçî nîqaşên nav tirkan ji aliyê kronolojîk ve kevintir in û digihîje dema Tanzîmatê lê ew jî dîsa bi mantixa ku sebeba cehaleta me ji ber zorbûna alfabeya me ye, hatine kirin. Dikare bê botin ku di pratîka tirkan de nîqaşên ku dema Tanzîmatê de hatine kirin bêtir bi modernîzasyon û rojavabûnê ve tekîldar in lê di dema Meşrûtiyeta Dudan û komarê de bêtir bi saîqên neteweyî ve tekîldar in. Lazim e ev jî bê gotin ku hinek tirkperestan jî ji ber ku nedixwestin milletên din ji bin kontrola wan derkevin, alfabeyeke din red dikirin.¹¹ Ji ber ku alfabeya hevbeş erebî bû. Her wiha tevgera Osmanîtiyê jî belkî tevgera neteweperwer ya tirkan dereng dixist. Ji ber ku hîn gelek netewe di bin banê Osmaniyan de dijiyan.

Yek ji kesên ku di nav tirkan de ewilî behsa meseleya alfabeyê dike Munîf Paşa ye. Munîf Paşa piştî ku yek ji sebebên paşdemayîna û cehaletê weke pîrsgirêka alfabeyê

6 Can, Bülent Bilmez, Toplumsal Tarih, sayı 179, Kasım 2009, r. 28.

7 Can, Bülent Bilmez, h.b., r. 23

8 Dönmez, Cengiz, “*Atatürk ve Harf İnkılabı*”, Türkiye’de Cumhuriyet Politikaları Sempozyumu, Ankara, 2010, r. 6.

9 Malmîsanij, “*Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*”, Jina Nû, Yayınları. 1986, Uppsala r. 41-42.

10 Badıllı, Kemal, “*Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*”, vgz. r. 6. Mukaddime-tül irfan, İstanbul, h. 1336, s. 4, 51.

11 Koçak, Cemil, “Latin Alfabeti Milliyetçi Refleksle Türk Alfabetine Dönüştü”, 20 Nisan 2012 xyz.stargazete.com/yazar/cemil-kocak/guncel/latin-alfabeti-milliyetci-refleksle-turk-harflerine-donustu/yazi-547956+&cd=1&hl=tr&ct=clnk&gl=tr İnternette İndiriliş Tarihi 15 Ekim 2014

dibîne ji bo çareseriyê du pêşniyazan dike 1. *Bikaranîna hinek îşaretan* 2. *Nivîsîna cuda ya herfan*¹². Li nav kurdan bi awayekî ciddî nîqaşên derbarê alfabe-yê de, di kovara Rojî Kurd(1913) de hatine kirin. Abdullah Cevdet di nivîsa xwe ya “Xîtabek” de qala rewşa kurdan û meseleya alfabe-yê dike û ji bo çareseriyê rewşa kurdan a xerab wiha dibêje: “*A ewil divê rêjeya xwendin û nivîsînê bi kêmanî bibe ji sedî çil. A dudan, qebûlkirina herfan e ku zarokekî heft-heşt salî herî zêde di mehekê de hînî xwendin û nivîsandinê û rastxwendina tiştên dixwîne bike û terkkirina wan herfan e ku heta niha me ew bi kar tanîn.*”¹³ Dikare bê gotin ku Abdullah Cevdet yek ji wan kesên ewil e ku aliyê wî yê neteweperweriyê pir xurt e û berovajî gelek rewşênbîrên kurdan ku dixwestin di bin banê Osmanîyan de bijîn, wî demekê daxwaza Kurdistaneke serbixwe kiriye.¹⁴ Jixwe di heman nivîsa ku nîqaşên li ser alfabe-yê dide destpêkirin “*Em di serdemekê de ne ku netewe derdikevin pêş û ava dibin*”¹⁵ dibêje. Atatürk jî dema behsa armanca çêkirina alfabe-yê nû dike dibêje, *armanca xelaskirina ji cehaletê ya milletê tirk e.*¹⁶ Di kovara Yekbûnê de ku 1913an de li Stenbolê derdiket ji bo ku rêjeya xwendin û nivîsînê qe nebe bibe ji sedî 40-50 banga “*Vegerin çiyayên Kurdistanê yên bilind ji zarokên gel re rêberî û mamostetiyê bikin*”¹⁷ dihat kirin. Di pratîka tirkan a dema Komarê de kesê ku yekem car nîqaşa alfabe-yê aniye meclîsê wekilê Îzmîrê Şukru Saracoğlu, di axaftina xwe de digot kebahata herî mezin a herfên Erebi ne ku rêjeya xwendin û nivîsînê ji sedî dudu-sisê ye.¹⁸ Dîsa Xelîl Xeyalî ku yek ji neteweperwerên kurd ên wê demê ye, di 1913an de di nivîsa bi navê “Ziman” de dibêje deh tişt hene ku kurd lazim e bikin. Di wê nivîsê de du maddeyên ewilî ev in: “*1. Ji bo xwendin û nivîsandinê herf 2. Ser terzek nû alîfbayek*”¹⁹. Di 1914an de mebûsên Hakkarî Munîp û Mehmet Hamza ji meclîsê dixwazin ku ji bo xwendin û nivîsandinê butçeyek bê dayîn lewre rêje ji bo ku ji deh hezaran yek bibe ji hezarî yek.²⁰ Mesûdê Suleymanî di Rojî Kurd de dibêje: “*Ji bo hînkirina zarokan ya sî û sê herfan zêdeyî du sed şiklên bêhereke lazim e ku ev jî eşkere ye ku hem mamoste hem jî xwendekar çiqasî zahmetiyê dikşînin. Ev îspat dike ku cehaleta imûmî ji ku*

12 Budak, Ali, “*Münif Paşa Batılılaşma Sürecinde Çok Yönlü Bir Osmanlı Aydını*”, Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2012 r. 591

13 Cevdet, Abdullah, “*Bir Hitab*”, Rojî Kurd, Weşanên Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, h. 1, r. 99

14 Malmîsanîj, “*Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*, Jina Nû, Yayınları. 1986, Uppsala r. 76.

15 Cevdet, Abdullah h.b. r. 99.

16 Cumhuriyet, 2 Kasım, 1928, vgz. Cengiz Dönmez, “*Atatürk ve Harf İnkılabı*”, r. 52.

17 Malmîsanîj, h.b., r. 58.

18 Altun, Mustafa, “*Alfabe Değişiminin Tarihsel Gelişim Üzerine Bir Değerlendirme*”, r. 59. Vgz. Agah Sırrı Levend(1972) “*Türk Dilinde Gelişme ve Sadeleşme Evreleri*”, TDK, Ankara r. 395

19 M.X., “*Ziman*”, Rojî Kurd, h. 3. r. 186-187.

20 Malmîsanîj, “*Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*”, Jina Nû, Yayınları. 1986, Uppsala r. 56.

tê.”²¹ Ataturk di axaftina xwe de ku di Meclîsê û roja qebûlkirina alfabeya Latînî de dike, “*Milletê Tirk ê Payebilind bi kedeke hindik û bi riyeye kurt tenê bi navgînekê ku zimanê wî yê xweşik û asîl bi hesanî lê tê, xelas bibe.*”²² dibêje. Jixwe roja ku cara yekem behsa vekirina “Mektebên Miletî” ji aliyê serokwezîr Îsmet Înonu ve hatiye kirin û qebûlkirina alfabeya Latînî heman roj in.²³ Navê alfabeya tirkî bixwe bi mejiyekî neteweperwer hatiye danîn. Lewre navê wê ku di eslê xwe de Latînî ye weke “*Alfabeya Tirkî*” hatiye danîn. Li gorî Înonu bi “herfên tirkî” dê “*milletê bilind ê tirkî dê têkeve alemeke nû ya nûranî*”²⁴.

Lê piştî qebûlkirina alfabeya Latînî, Ataturk axaftinekê li parka Gulhaneyê dike ku mînakeke baş e hem ji bo têkiliya alfabe û netewetiyê hem jî têkiliya guhertina alfabeyê û reddiya mîrasa kevin:

“Herfên nû ên Tirkî divê em zû hîn bibin. Nîşanî hemû hemwelatî, jin, zilam, himal û keştivanan bidin. Vêya weke **wezîfeya welatperwerî û neteweperweriyê** zanibin. Dema hûn vê wezîfeyê bikin bifikirin ku ji sedî deh, bîst xwendin-nivîsînê zane lê ji sedî heştê-not ê millet û civakê nizane, ev şerm e. Kesên ku insan in divê ji vêya fedî bikin. Ev millet ne milletek e ku ji bo fedî bike, hatiye xuliqandin. ... Eger ji sedî not ê millet xwendin-nivîsînê nizanibe şaşî ne di me de ye. Şaşî di wan de ye ku karektera Tirkan fam nekirine û serê wan bi hinek zincîran girê dane. Em di dema **paqijkirina kokên şaşiyên rabirdûyê** de ne.”²⁵

Di nîqaşên li ser alfabeyê de fikra ku erebî zimanekî Samî ye û kurdî û tirkî ne di malbata zimanê Erebi de ne û ji ber vêya jî alfabeya erebî ne guncav e, gelek caran hatiye gotin. Di kovara Jînê(1918) de ku rewşenbîrên kurdan li Stenbolê derdixistin û di vê kovarê de fikir û refleksên xurt ên neteweperweriya kurdî pir in, îlanek heye ku dibêje: “*Em çi bikin, zimanê Arî di şiklê alfabeyê Samî de tenê ewqas bi fêde ye. Îbretê jê bistînin.*”²⁶ Balkêş e ku ev îlan di gelek hejmaran de hatiye dubarekirin. Celal Nûrî jî di “Tarih-i İstiklal”(1912) de “*Ji dêvla ku heta Altayan em biçin, em ziman û edebiyata Tirkî ya gelekî zigurd, tasfîye û paqij bikin, em ê Tirkîtiyeye mezin bikin. Mesela: Em terka herfên Samî ku qet li ruhê zimanê me nayê bikin.*”²⁷ dibêje. Bi rastî gelek mînakên bi vî rengî hem di nav kurdan hem jî di nav tirkan de peyda dibin.

Dema em bala xwe didin destpêka nîqaşên li ser alfabeyê, bi giştî meylek heye ku di alfabeyê de revîzyonê dixwazin lê terkirina alfabeya Erebi naxwazin. Di vî warî de hinek refleksên hem kurdan hem jî tirkan hene ku dikare bê gotin ji heman

21 Mesûd, Suleymanyeli, “Hurûfûmuz ve Teshîl-î Kira’atî” Rojî Kurd, h. 1, r. 112-113.

22 Şimşek, Derya, “Cumhuriyet’in İlk Yıllarında Türkiye’de Yeni Dil ve Kültür Siyasetinin Oluşması”, r. 8.

23 Şimşek, Derya, h.b., r. 8.

24 Şimşek, Derya, h.b., r.7.

25 Öztürk, İsa, “Harf Devrimi Ve Sonuçları”, Adam Yayınları, ç.1, İstanbul, 2004, r. 31.

26 Jîn (1918-1918), *Kovara Kurdî- Tirkî*, wer. M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Upsala, 1985 c. 4, h. 20, r. 850.

27 Öztürk, İsa, h.b., r. 17.

